



ZANÎNGEHA BÎNGOLÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê EDEBIYATA KURDÎ
TESEWIRA ESTETÎKÊ LI NIK MELAYÊ CIZÎRÎ

Amadekar

Nevzat EMİNOĞLU

TEZA DOKTORAYÊ

ŞÊWIRMENDÊ TEZÊ

Dr. Öğr. Üyesi Hemin Omar AHMAD

Bîngol - 2022

BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE EDEBİYATI ANABİLİM DALI

MELAYÊ CİZÎRÎ'DE ESTETİK ANLAYIŞ

Hazırlayan
Nevzat EMİNOĞLU

DOKTORA TEZİ

TEZ DANIŞMANI
Dr. Öğr. Üyesi Hemin Omar AHMAD

Bingöl – 2022

NAVEROK

BİLİMSEL ETİK BİLDİRİMİ	v
TEZ ONAY SAYFASI	vi
KURTE	vii
ÖZET	ix
ABSTRACT	xi
PÊŞGOTIN	xiii
KURTEBÊJE	xvi
DESTPÊK	1
1. Çarçoveya Teorîk	1
1.1.Mijara Tezê.....	1
1.2. Çarçoveya Tezê	2
1.3. Armanca Tezê.....	2
1.4. Giringiya Mijarê	3
1.5. Rêbaza Tezê	4
1.6. Çavkanîyên Tezê	7
1.6.1. Nirxandina Çavkaniyan	9
1.7. Termînolojiya Estetîkê	17
1.7.1. Term û têgehên Sereke yên Estetîkê.....	18

BEŞA I

SEYRA TARÎXÎ YA HIZRA ESTETÎKÊ

1.1. Nêrîneke Gelemperî Li Dîroka Geşedana Estetîkê	23
1.1.1.Ciwan û Ciwanî di Serdema Yûnana Dêrîn de.....	24
1.1.1.1.Eflatun (B.Z. 427- 347).....	25
1.1.1.2. Aristo (B.Z. 384- 322)	26
1.1.1.3. Plotinos (P.Z. 205-270).....	26
1.1.2. Ciwan û Ciwanî di Serdema Navîn a Alema Rojava de.....	27
1.1.2.1. Augustinus (P.Z. 354-430)	27
1.1.2.2.Aziz Thomasê Aquînoyî (P.Z. 1225-1274)	27
1.1.3.Ciwan û Ciwanî di Serdema Modern a Rojavayê de	28

1.1.4. Ciwan û Ciwanî di Serdema Klasîk a Îslamî de	31
1.1.4.1 Estetîka Hikemî û Kesayet û Ekolên Wê.....	31
1.1.4.1.1 Îbnî Sîna (980-1037).....	31
1.1.4.1.2. Mekteba Meşşayî	32
1.1.4.1.1. Mekteba Îşraqî	32
1.1.5.1. Estetîka Îrfanî û Kesayat û Ekolên Wê.....	33
1.1.5.2.1. Îbnî Erebî (1165-1240)	33
1.1.5.2.2. Mekteba Wehdet'ul-Wucûdê.....	34
1.2.Nêrîneke Gelemperî li Problema Ciwaniyê.....	36
1.3.Zanista Ciwaniyê: Estetîk Yan jî Ciwanînasî.....	40
1.4. Mijara Estetîkê	41
1.4.1. Estetîka Gelemperî.....	42
1.4.2. Estetîka Taybet	42
1.4.3. Dîroka Hunerê.....	42
1.5. Estetîk û Berhema Hunerî	43
1.5.1. Huner Ji Hêla Felsefî ve.....	46
1.5.2.Teoriya Çavkaniya Hunerê: Mimesîs	47
1.5.3. Afirandin, Pêkanîna Hunerî û Estetîk	48
1.5.4 Ji Ciwaniya Sirûştê Ber Bi Ciwaniya Hunerî	52
1.5.5. Wesfên Ciwaniyê.....	53
1.6. Têkiliya Ciwanîyê Bi Hest û Kategoriyên Din ên Estetîkê re.....	54
1.6.1 Ciwanî û Heqîqet /Rastî.....	54
1.6.2. Ciwan û Qenc.....	55
1.6.3. Ciwan û Xweş.....	55
1.6.4. Ciwan û Faydedar	56
1.6.5. Ciwan û Berz/ /Muteal.....	57
1.7. Binyad û Taybetiyên Darazên Estetîk	57
1.7.1. Darazên Hevpar ên Estetîk	59
1.8. Çavkaniya Fıkra Estetîkê Rojava ye yan Rojhilat.....	62

BEŞA II

ESTETÎK Û EDEBIYAT

2.1. Ciwan, Ciwanî û Edebiyat.....	66
2.1.1. Edebiyat û Girîngiya Ziman Di Edebiyatê de.....	66
2.1.2. Zimanê Edebî û Zewqa Edebî.....	69
2.1.3. Ciwankarî yan jî Hunerên Edebî.....	72
2.1.4. Şêwaz Di Edebiyatê de.....	72
2.1.5. Estetîk û Poetîka	74
2.1.6. Estetîk Wek Wesfê Sereke yê Edebiyatê.....	75

BEŞA III

HIZRA ESTETÎKÊ DI NÊRÎNA MELAYÊ CIZÎRÎ DE

3.1. Nêrîneke Gelemperî li Fêmdariya Estetîk a Şîra Kurdî ya Klasîk	78
3.2. Jîyan û Kesayetiya Edebî ya Melayê Cizîrî.....	84
3.2.1. Jiyana Melayê Cizîrî	84
3.2.2. Kesayetiya Edebî ya Melayê Cizîrî.....	86
3.3. Ciwan û Ciwanî di Helbestên Melayê Cizîrî de	88
3.4. Çavkaniya Ciwaniyê Li Gor Melayê Cizîrî.....	94
3.5. Termînolojiya Ciwanînasiyê Di Helbestên Melayê Cizîrî	97
3.6. Têgehên ku Rasterast Ciwaniyê Tînin Ziman di Şîrên Cizîrî de.....	98
3.6.1. Cemal	99
3.6.2. Husn.....	102
3.6.3. Ciwan	103
3.6.4. Zîba	104
3.6.5. Xûb.....	105
3.7. Têgehên ku Ciwaniyê bi Rêya Teşbîhê Tînin Ziman Li Nik Cizîrî	105
3.8. Prototîpên Ciwaniyê di Estetîka Şîra Melayê Cizîrî de.....	106
3.8.1. Lehengên Efsanewî yên Eşqê	107
3.8.2. Hêmanên Razber	108
3.8.3. Hêmanên Sirûştî.....	109
3.8.4. Hêmanên Hunerî yên Maddî.....	110

3.8.5. Hêmanên Kozmîk	111
3.9. Zimanê Mecaz û Heqîqetê.....	112
3.10. Cureyên Ciwaniyê Li Gor Melayê Cizîrî	114
3.10.1. Ciwaniya Mutleq a Îlahî	115
3.10.2. Ciwaniya Nûra Muhemmedî.....	116
3.10.3. Ciwaniya Husna Muqeddes: Eql û Ruh.....	118
3.10.3.1. Ciwaniya Mêr	120
3.10.3.2. Ciwaniya Jinê.....	121
3.10.4. Ciwaniya Sirûştî.....	122

BEŞA IV

EŞQ Û ESTETÎK LI NIK MELAYÊ CIZÎRÎ

4.1. Mahiyeta Eşqê di Cizîrî de	125
4.1.1. Eşq û Evîn.....	125
4.1.2. Sirra Eşqê.....	127
4.1.3. Eşq Wek Çavkaniya Hebûnê	131
4.1.4. Cureyên Eşqê	146
4.1.4.1. Eşqa Heqîqî.....	146
4.1.4.2. Eşqa Sûrî.....	149
4.1.4.2.1. Eşqa Ruhanî	150
4.1.4.2.2. Eşqa Cîsmanî	151
4.1.5. Rewşên Eşqê Li Gor Mela	158
4.1.5.1. Firqet û Mirin.....	159
4.1.5.2. Hudûs.....	163
4.1.5.3. Mest û Serxoşî	164
4.1.6. Têkiliya Eşq û Estetîkê	165
ENCAM.....	171
ÇAVKANÎ.....	178
JÎNNAME	Hata! Yer işareti tanımlanmamış.
PERWERDE.....	189

DANEZANA ETÎK A ZANISTÎ

BİLİMSEL ETİK BİLDİRİMİ

Doktora tezi olarak hazırladığım *Tesewira Estetikê Li Nik Melayê Cizirî* adlı çalışmanın öneri aşamasından sonuçlanmasına kadar geçen süreçte bilimsel etiğe ve akademik kurallara özenle uyduğumu, tez içindeki tüm bilgileri bilimsel ahlak ve gelenek çerçevesinde elde ettiğimi, tez yazım kurallarına uygun olarak hazırladığım bu çalışmamda doğrudan veya dolaylı olarak yaptığım her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve yararlandığım eserlerin kaynakçada gösterilenlerden oluştuğunu beyan ederim.

28/06/2022

Nevzat EMİNOĞLU

RÛPELA TESDÎQA TEZÊ

TEZ ONAY SAYFASI

BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Nevzat EMİNOĞLU tarafından hazırlanan *Tesewira Estetîkê Li Nik Melayê Cizîrî* başlıklı bu çalışma, 01.08.2022 tarihinde yapılan tez savunma sınavı sonucunda oybirliği ile başarılı bulunarak jürimiz tarafından Kürt Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı'nda Doktora tezi olarak kabul edilmiştir.

TEZ JÜRİSİ ÜYELERİ (Unvanı, Adı ve Soyadı)

Başkan:	Prof. Dr. Abdurrahman ADAK	İmza:
Danışman:	Dr. Öğr. Üyesi Hemin OMAR AHMAD	İmza:
Üye	: Doç. Dr. Mehmet Zahir ERTEKİN	İmza:
Üye	: Doç. Dr. Hayrullah ACAR	İmza:
Üye	: Dr. Öğr. Üyesi Şeyhmus ORKİN	İmza:

ONAY

Bu Tez, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Yönetim Kurulunun/...../ 20..... tarih ve sayılı oturumunda belirlenen jüri tarafından kabul edilmiştir.

Dr. Öğr. Üyesi Abdullah BEDEVA
Enstitü Müdürü

KURTE

Estetîk pêşî di serdema antîk de wek qadeke felsefeyê derketiye holê û pêş ketiye. Her wiha bi dirêjahiya dem û dewranan re wek mijareke dînî û edebî kete nav xebat û berhemên zanyar û şairan jî. Di dirêjahiya serdema antîk û serdema navîn de nêrîn û nêzîktayiyên zanyar, edîb û şairan de dab û nêrîteke hevpar xwe dide der. Ev mîras bi saya hizra dînî, xasma bi nêrîna Îslamî û tecrubeya sofîgeriyê, tesîr li nêrîna hunerî ya şair û edîbên serdema klasîk jî kir.

Babeteke sereke ya ku di edebiyata Kurdî ya klasîk de şair û edebiyatnas li ser sekinîne, estetîk e. Her wisa şairan ev mijar bi temsîl, teşbîh û metaforên cuda, bi îfadeyên rengîn û alegoriyên zengîn sêwirandine, anîne ziman. Ev dab û nêrîta helbesta klasîk bi teşegirtin û terakuma sedsalan derketiye holê û di nav hevdeng û hevrengeyê domdar de ye.

Estetîk yanî ciwanî, çawa di şairên serdema klasîk de wek babeteke sereke tê bikaranîn, her wisa di vehonandina hunerî ya Melayê Cizîrî de jî cihekî taybet û girîng digre. Mela edebiyatnasekî sedsala XVIyan û şairê qesra mîr û hukumdarê hukumeta Cizîra Botan e. Ev serdem ji hêla dîrokî, sîyasî û edebî ve dewraneke zêrîn e ji bo Kurdan. Lewma Cizîrî nûnerê dewra muqtedîr û serdestiyê ye di dîroka edebiyata Kurdî de. Ji ber vê yekê ye ku di helbesta wî ya lîrîk de hêmanên ruh ên wek haşmet, şehamet, xwebawerî, îftixar û ciwanî derdikevin pêş.

Melayê Cizîrî wek zanyar û edîbên pêşiyên xwe yên serdema antîk û navîn, ciwanîyê wek tecelliyata îlahî ya li alemê, yanî wek îsandina Xweda ya li hebûn û gerdûnê şîrove kiriye. Cizîrî bi nêrîna xwe ya hunerî ciwanîyê di vê çarçoveya yekîyê de xwendîye. Wî ciwanî wek wesfekî îlahî dîtîye û Xweda ji bo xwedannasîna xwe, şewq û şemala ciwanîyê daye însan û ew li alemê îsandîye, reşandîye. Lewma li gor Cizîrî ciwanî ne wesfekî eslî yê alemê ye, ew ji derve hatiye, yanî ji Xweda ye, Xwedayî ye. Ciwanî xwedî hêleke ontolojîk û epistemolojîk e ku rê û rêbazeke gihîştina rastiyê ye û zanyariyê hedsî ye ji bo nasîna Xweda.

Ev xebata ku li ser nêrîna estetîkê ya Melayê Cizîrî disekine û qesta ravekirna têkiliya ciwanî û eşqê ya li gor Mela de ye, ji destpêkek û çar beşan pêk tê. Di destpêkê de çarçoveya teorîk a xebatê di bin sernavên “çarçoveya tezê”, “rêbaza teze”, “armanca tezê”, “giringiya mijarê” û “nirxandina çavkaniyên tezê” de tîne

ziman. Di beşa pêşîn de di bin sernava “Geşedana dîrokî ya nêrînên di derheq çavkaniya ciwaniyê de” li ser peydabûn û pêşketina nêrînên di derbarê ciwaniyê de disekine.

Di beşa duduyan de di bin sernavê “Estetîk û Edebiyat”ê de têkiliya estetîk û edebiyatê tîne rojevê. Di beşa sisêyan de di bin sernavê “Ciwan û Ciwanî di nêrîna Hunerî ya Melayê Cizîrî de” fikr û nêrînên Mela yê di derbarê mahiyet, çavkanî û curreyên ciwaniyê de mewzûbehs dibe. Di beşa çaran a dawî de jî di bin sernavê “Têkiliya Ciwan û Evinê” de li ser têkiliya cemal û eşqê hûr dibe.

Peyvên Sereke: Edebiyata Kurdî ya klasik, Helbest, Estetîk, Evîn, Melayê Cizîrî, ciwanî.

ÖZET

Estetik ilk olarak antik çağda felsefî bir alan olarak ortaya çıkmış ve gelişmiştir. Zamanla dinî ve edebî bir konu olarak âlim ve şairlerin çalışma ve eserlerinde de yer almıştır. Antik Çağ ve Orta Çağ boyunca bilgin, yazar ve şairlerin görüş ve yaklaşımları ortak bir anlayış doğurmuştur. Bu miras, dinî düşünce ve özellikle İslâmî görüş ve tasavvufî tecrübe sayesinde şairlerin ve klâsik edebiyatçıların sanatsal görüşlerini de etkilemiştir.

Klasik edebiyatta şair ve edebiyatçıların odaklandığı önemli bir konu da estetikdir. Estetiğin konusu olan güzelliği, çeşitli temsil, teşbih ve metaforlar, renkli anlatımlar ve zengin alegorilerle dile getirilmiştir. Güzelliği işleyen bu klasik şiir geleneği sürekli bir etkileşim içinde ve birikimli biçimde yüzyıllar boyunca gelişmeye devam etmiştir.

Estetik, klasik dönem şiirinde ana temalardan biri olarak işlendiği gibi Molla Ahmed-i Cezerî'nin sanatsal anlayışında da özel ve önemli bir yer tutar. Mela, 16. yüzyılda yaşamış bir edebiyatçı olup Cizîra Botan (Cizre) hükümeti mir/hükümdarının saray şairidir. Bu dönem Kürtler için tarihi, siyasi ve edebi açıdan altın bir çağdır. Dolayısıyla Cizîrî ve çağdaşları Kürt edebiyat tarihinin en verimli ve zirve dönemini temsil eder. Bu nedenle Cizîrî'nin lirik ve coşkun şiirinde ihtişam, yiğitlik, özgüven, iftihar ve güzellik gibi ruh unsurları ön plana çıkar.

Cizîrî kendinden önceki antik ve Orta Çağ filozof ve bilginleri gibi güzelliği kâinata yansıyan ilahî bir tecelli, yani Allah'ın varlıkta ve kâinattaki temsili olarak yorumlamıştır. Cizîrî güzelliği, sanatsal yaklaşımı çerçevesinde ilahî bir menşeye dayandıran bir okumayla yorumlamıştır. O, güzelliği ilahi bir sıfat olarak görmüştür. Ona göre Allah insana kendini tanıması için güzellik nurunu vermiş ve onu kâinata tecelli ettirmiştir. Dolayısıyla şaire göre güzellik alemden kaynaklı bir özellik değildir. Güzellik, hakikate ulaşmanın bir yolu olarak ontolojik bir boyuta da sahiptir ona göre. Aynı zamanda Allah'ı tanımaya götüren bir bilgi yöntemi olarak epistemolojik bir yönü de vardır.

Melayê Cizîrî'nin estetik anlayışına odaklanan ve güzellik- aşk ilişkisini ona göre değerlendirmeyi amaçlayan bu çalışma, bir giriş ve dört bölümden oluşmaktadır. Çalışmanın teorik çerçevesini içeren “Giriş” bölümü “tezin çerçevesi”, “yöntem”, “tezin amacı”, “konunun önemi” ve “kaynakların eleştirisi ve

değerlendirilmesi” başlıkları altında açıklanmıştır. "Güzelliğin kaynağına ilişkin fikirlerin tarihsel gelişimi" başlıklı ilk bölüm, güzellikle ilgili fikirlerin ortaya çıkışı ve gelişimine odaklanmaktadır. İkinci bölüm "Estetik ve Edebiyat" başlığı altında estetik ve edebiyat ilişkisini tartışmaktadır. " Melayê Cizîrî'nin sanatsal Perspektifinde Güzel ve Güzellik" başlıklı üçüncü bölümde şairin güzelliğin mahiyeti, kaynakları ve türleri hakkındaki görüş ve düşünceleri tartışılmaktadır. Dördüncü ve son bölümde de "Güzellik ve Aşk" başlığı altında Cizîrî'nin şiirlerinden hareketle güzellik ve aşk arasındaki ilişkiye odaklanılmaktadır.

Anahtar Kelimeler: Klasik Kürt edebiyatı, şiir, estetik, aşk, Mela-yi Cizîrî, güzellik.

ABSTRACT

Aesthetics first emerged and developed as a philosophical field in ancient times. Over time, it took place in the works and writings of scholars and poets as a religious and literary subject. The views and approaches of scholars, writers and poets throughout the Antiquity and the Middle Ages gave rise to a common understanding. This heritage also affected the artistic views of poets and classical writers thanks to religious thought and especially Islamic view and mystical experience.

Aesthetics is one of the most important subject that poets and writers focus on in classical literature. Beauty, which is the subject of aesthetics, is expressed with various representations, similes and metaphors, colorful expressions and rich allegories. This classical poetry tradition, which deals with beauty, continued to develop in a continuous interaction and cumulative way for centuries.

Aesthetics has a special and important place in Mela Ahmed-i Cizîrî's artistic conception as well as being one of the main themes in the poetry of the classical period. Mela is a man of letters who lived in the 16th century and was the court poet of the ruler of the Cizîra Botan (Cizre) government. This period is a historical, political and literary golden age for the Kurds. Therefore, Cizîrî and his contemporaries represent the most productive and peak period in the history of Kurdish literature. For this reason, spiritual elements such as magnificence, bravery, self-confidence, pride and beauty come to the fore in Cizîrî's lyrical and exuberant poetry.

Cizîrî, like the ancient and medieval philosophers and scholars before him, interpreted beauty as a divine manifestation reflected in the universe, that is, as the representation of Allah in existence and in the universe. Cizîrî interpreted beauty as a concept of divine origin within the framework of his artistic approach. He saw beauty as a divine attribute. According to him, God gave man the light of beauty so that he could know God and made it manifest in the universe. Therefore, according to Cizîrî, beauty is not a feature originating from the world. According to him, beauty

also has an ontological dimension as a way of reaching the truth. It also has an epistemological aspect as a method of knowledge that leads to knowing God.

This study, which focuses on Mela Ahmed-i Cizîrî's aesthetic understanding and aims to evaluate the beauty-love relationship according to Mela, consists of an introduction and four chapters. The "Introduction" section, which includes the theoretical framework of the study, is explained under the titles of "The Framework of The Thesis" "Method" "The Purpose of The Thesis" "The Importance of The Subject" and "Criticism and Evaluation of Sources". The first chapter titled "Historical Development of Ideas About The Origin of Beauty" focuses on the emergence and development of ideas about beauty. The second part discusses the relationship between aesthetics and literature under the title of "Aesthetics and Literature". In the third chapter, titled " The Beautiful and Beauty in Melayi Cizîrî's Artistic Perspective", Mela's views and thoughts on the nature, sources and types of beauty are discussed. The fourth and last chapter focuses on the relationship between beauty and love under the title of "Beauty and Love".

Keywords: Classical Kurdish literature, poetry, aesthetics, love, Mela-yi Cizîrî, aesthetics.

PÊŞGOTIN

*“Bismillahîrrehmanîrrehîm
Mebdeê her îlmekî navê Elîm
Hemd û sena û şukranî
Ji bo wî Xaliqê Rehmanî
Ku fesahet û beyan daye lisanî
Lisan daye însanî”
Ehmedê Xanî*

Edebiyata klasik û her wisa edebiyata Kurdî ya klasik bi awayekî nivîskî û li ser hêmanên bajarvanîyê ji çavkaniya saziyên perwedehiyê yên wek medreseyan derketiye holê. Her wisa li dor qesr û dîwanên mîr û hukumdaran şax vedaye û di dirêjahiya hemû serdema navîn de bi gelemperî xîtabî sinifa aristokrat kiriye. Ev sinifa civakî jî xwedî zewqeke estetîk e. Ev derdora civakî wek peywend û binaxeya vê edebiyatê, geriyaye zemînekî munbît ku edîb û şairên vê edebiyatê gîhandine.

Estetîk di zimanê rojane de tê maneya xweşîkbûn û ciwaniyê. Her wiha hestên ecibandin û qayîlbûnê tîne ziman. Ev mijar pêşî di serê serdema antîkîteyê de wek babeteke girîng a qada felsefeyê derketiye holê. Di vê dewrana dîrokî de estetîk wek mijareke lêkolîna ciwaniyê hatiye dîtin. Lê piştî wextan zanyarên dînî û her wiha edîb û şairan jî serê xwe bi vê mijarê re êşandine, li dor vê babetê fikr û nêrînên xwe derpêş kirine û di vî warî de berhem nivîsîne. Wihareng ev babet di dirêjahiya serdema klasîk de geriyaye meseleyek e girîng a edebiyatê jî.

Di vê xebatê de armanca me ya esasî ew e ku em li ser ciwaniya ku Melayê Cizîrî di helbestên xwe de aniye ziman bisekinin. Her wiha em dixwazin ew maneya ku Mela daye ciwaniyê lêbikolin û di ronahiya helbestên şair de çavkanî û cureyên ciwaniyê, têkiliya ciwanî û eşqê nîşan bidin. Lewma me xwest ku em pêşî geşedana nêrînên di derbarê ciwaniyê de li ber çavan raxin. Paşê me qesta fêmkirina têkiliya estetîk û edebiyatê kir. Îcar li ser vê bingehe me xwest em li ser fêmdariya estetîk a serdema klasik rawestîn û her wiha nêzîktahiya hunerî ya Mela ya li ciwaniyê fêm bikin. Lewra bêtî lêkolîn û fêmkirina fêmdariya serdema klasik, xasma bêtî têgihîştina binaxe û paşxaneyê hizrî û bawerî ya Melayê Cizîrî, nirxandinên li gor zewq û estetîkên roja me ya îroyîn, dibite sebebê xeta û xeletiyên mezin. Nêzîktayiyên bê bingehe yên bi vî rengî derî ji gelek nirxandin û nêrînên anakronîk re

vedike. Lewma me hêvî heye ku ev xebat bibe pêngaveke têgihîştina fêmdariya helbesta klasik. Her wisa bo naskirin û fêmkirina kesayetiya edebî ya Melayê Cizîrî.

Nêrîn û fêmdariya estetîk a ku Mela di helbestên xwe de terenum dike, ji filozofên serdema antîk ên wek Eflatun, Plotinos bigre heta zanyarên meşayî yên wek Îbn Sîna û Farabî, mutesewufên wek Îbnî Erebi û edîb û şairan, di hemû dirêjahiya serdemê de hevrenî û hevpariyekê nîşan dide. Lewma di perspektîfa hunerî ya Mela de ciwanî cewhereke îlahî ye ku bingeha hebûnê ye. Li gor şair hemû ciwanî, teceliyên cuda yên wê ciwaniya îlahî ne. Di nav van çend sedsalên dawî yên modern de di fêmdariya estetîk a qedîm de qutbûnek qewimî û gelek guherîn çêbûn. Ev yek jî bû sebebê fêmnekirin û têngihîştina fêmdariya ciwanî ya helbesta klasik û her wiha jêdûrbûn û bîyanîbûna li vê ciwaniyê.

Estetîk wek babeteke îrfanî û edebî di dîroka fîkra Kurdî de li gor hizr û nêrîna klasîk ji hêla zanyar û mutesewufên Kurd ve him bi hizra hîkemî û îrfanî him bi nêrîna edebî di berhemên wan de hatiye behs kirin. Navên wek Suhrewerdî, Aynul Qudatul Hemedanî, Baba Tahirê Uryan, Şêx Şemseddînê Exlatî, Eliyê Herîrî, Feqiyê Teyran, Mela Huseynê Bateyî, Ahmedê Xanî, Suwadî, Sîyahpoş, Pertew Begê Hekkarî, Mehî û hwd. şîrên xwe bi babeta estetîkê honandine. Van şairên Kurd ên berî û piştî Melayê Cizîrî di edebiyata Kurdî ya klasîk de dab û nêrîteke hizra estetîk saz kirine û li dû xwe hîştine.

Estetîk, di bêjara poetîk a Melayê Cizîrî de babeteke sereke ye. Cizîrî bi uslûba xwe ya lîrîk û coşîş, dîrok û çîroka estetîkê ji gelek hêlan ve terenum kiriye. Bi qewlê Mela “qiseya eşqa cemal û dasitana husnê” sermeşk û sertaca qelema wî ye. Wî ev mijar bi şêweyeke hêzdar û bi terzeke rewneqdar honandiye. Helbestên di dîwana wî ya mureteb de, çend hebên wan ne tê de, bi temaya estetîkê dagirtîne. Lewma meriv bi rihetî dikare Mela wek “Şairê eşq û estetîkê” bi nav bike. Digel vî aliyê wî yê bala û balkêş, rengîn û zengîn, heta niha di vî warî de xebat çênebûne li vî welatê me.

Estetîk di serdema modern de cara ewil li gor perspektîfa modern bi Kurdiya Soranî ketiye nav dîroka edebiyata Kurdî. Estetîk bi Kurdiya Soranî wek “Ciwani”, “Ciwannasî”, “Êstatîka” hatiye îfadekirin. Her wiha navê zanista estetîkê di zimanê Erebi de wek “ilmê cemal”, di Osmaniyan de wek “bedîîyat”, di Fransizan de wek

“esthétique”, di Almanî de wek “aesthetik”, di Îngilîzî de wek “aesthetics”, di Farisî de wek “cemaşînasî/zîbayî şînasî”, di Tirkîî de jî wek “estetik/güzellik bilimi” derbas dibe.

Di Kurdiya Kurmancî de qasî ku em dizanin ev xebata me ewilîn e ku li ser estetîka edebî hatiye çêkirin. Em hêvîdar in ku lêkolîn û xebatên bi vî rengî yên di vî warî de têgeh û lîteratûra Kurdiya Kurmancî dewlemend bikin û her wisa di tevaya Kurdî de yekahengî û standardizasyona têgehên ciwannasiyê/estetîkê pêk bîne.

Di dawî de spasîyên xwe yên ji dil ji şêwirmendê xwe yê hêja Dr. Hêmin Omer Ahmed Xoşnav re pêşkêş dikim ku pêşniyaza min a vê mijarê ya ji bo tezê, maqûl û munasib dît û bi xwendin, sererastkirin, rexne û pêşniyazên xwe ve serê xwe pê re êşand û rê nîşanî min da. Her wiha gelek çavkanî, xasma yên li başûr dane min. Mamosteyên xwe yên hêja Doç. Dr. M. Zahir Ertekin û Doç. Dr. Canser Kardaş re jî spasdar im ku ji destpêka dersên doktorayê bigre heta dawîya tezê di her astê de alîkariya xwe ji bo min texsîr nekirin. Her wisa mamosteyên hêja Prof. Dr. Abdurrahman Adak, Doç. Dr. Hayrullah Acar û Dr. Şehmus Orkin ra jî spasdar im ku bi xwendin, nîrxandin, rexne û pêşniyazên xwe yên qîmetdar xebata teza me kemilandin. Dost û hevalê xwe yê qedîm Doç. Dr. Sever Işık re jî malavaniyê dixwazim ku di derheq felsefeya estetîk de gelek çavkanî ji min re şandin. Hevalê xwe yê qedîm Aziz Adıgüzel re jî spasdar im ku ji bo serastkirina metnên werger alîkariya min kir. Her wiha malavaniyê ji malbata xwe, hevsera xwe Gülistan Çoban Eminoğlu û zarokên me Yûsuf û Zehra re jî dixwazim ku ji her alî ve alîkariya min kirin.

Nevzat EMİNOĞLU

MUŞ

2022

KURTEBÊJE

bnr.	: binêr
b.z.	: berî zayînê
c.	: cild
m.	: mirin
p.z.	: piştî zayînê
r.	: rûpel
t.ç.	: teza çapnebûyî

DESTPÊK

1. Çarçoveya Teorîk

1.1. Mijara Tezê

Mijara teza me estetîk e. Estetîk wek qadeke felsefî û edebî xwedî gelek hêlên ciyawaz e. Lê em di vê xebata xwe de mijara xwe bi hizr û tesewira estetîk ve bi sînor dikin. Yanî mahiyeta ciwaniyê, çavkanî û beşên wê, têkiliya ciwanî û evînê û rewşên evînê wek mijara bingehîn e ku em dê li gor nêrîna estetîk a Melayê Cizîrî binirxînin. Di vê çarçoveyê de wek bingehêke teorîk û binaxeyeke pêşamadehî em dê berî mijara esasî li ser geşedana dîrokî ya hizra estetîkê û têkiliya estetîk û edebiyatê jî bisekinin.

Di dirêjahiya sedsalên serdema edebiyata klasîk de yek ji wan mijarên bingehîn ku hema bigre pîraniya şairan li ser sekinîne, estetîzm e, yanî ciwanî ye. Estetîzm yan jî ciwanînasî di zimanê rojane de tê maneya “xweşikahî”, “bedewbûn”, “rindî”, “spehîtî”, “delalî” û hwd. Estetîzm di heman demê de mijareke herî kevn a lêkolîna felsefeyê ye. Şairên serdema klasîk diyardeya ciwaniyê bi xeyalên pîr dewlemend ve sêwirandine, di form û kirasên ciyawaz de ji nû ve saz kirine û bi temsîl, teşbîh û gotinên klîşe yên curbecur ên ciwannasiyê ve anîne ziman. Fêma feraseta helbesta klasîk bi teşegirtin û terakuma sedan salan pêk hatiye û di nav hevaheng û hevrengeyêke berdewam de ye.

Melayê Cizîrî wek şairekî Kurd ê çerxa navîn heman prototîp û termînolojî bi kar anîne. Heman zimanê mecaz û alegorîk emilandiye. Lêbelê Cizîrî wek yek ji wan nûnerê sedema rewnaq û kamil a edebiyata Kurdî ya klasîk, şêweyê xwe yê xas ava kiriye. Dîwana wî ya muretteb de meriv nimûneyên tîr û tijî yên hizra estetîkê dibîne. Nêrîna şair a li estetîkê, termînolojiya wî, prototîpên ku pê hizra xwe ya estetîkê îfade kiriye, anîna ziman a van babetan li nik Mela, reseniya helbesta wî nîşan didin. Di heman demê ev xalên navborî babetên xebata me ne.

Mela jî di nêrîna xwe ya hunerî de ciwanî di ronahiya hizr û tesewira dînî a serdema xwe de nirxandiye û ew wek sifatekî îlahî dîtiye. Li gor wî Xweda ji bo xwedanzanîn û xwedannasîn a xwe ew tecelliyê însan û alemê kiriye. Cizîrî ev tesewir çawa aniye ziman? Kîjan beyt û bendên wî yan qesîde û xezelên wî vê

tesewira estetîkê nîşan didin. Bersiv û nirxandinên van babetan û çîrok û dîroka estetîkê ya di helbestên Mela de mijara me pêk tîne. Lewma me di çarçoveya vê mijarê de navê teza xwe wek **“Tesewira Estetîkê Li Nik Melayê Cizîrî”** danî.

1.2. Çarçoveya Tezê

Têgeha ciwaniyê çawa wek babeteke girîng a şîr û edebiyata klasîk e, her wisa qadeke felsefeya lêgerîna ciwaniyê ye ku jê re tê gotin “estetîk”. Heçî ciwanî ye, ew têgehek e ku bedewbûn û xweşikahiyê îfade dike. Ev îfadekirin, ji bedewbûna terkîbên maddeyê bigre heta xweşikahiya raser, yanî Wacîb’ul-Wucûd diçe û beşeke kiriyara dîtîna ya însan e. Ciwanî ji hêla piraniya şairên serdema navîn ve li ser hêmanên hevpar û bi heman şeweyî hatiye teswîrkirin. Digel vê yekê ew ciwaniya ku bi uslûbeke standart ve dihate ziman, bi rêya vegotinên ciyawaz û alegorîk, girîft û pirmane yên her şairekî, rewş û rehendeke mukemel û xweser wergirtiye (Bozkurt, 2009: 20).

Ciwanî, çawa di şairên serdema klasîk de wek babeteke sereke tê bikaranîn, her wisa di vehonandina hunerî û estetîkî ya Melayê Cizîrî de jî cihekî taybet û girîng digre. Cizîrî wek edebiyatnasekî sedsala XVIan û şairê qesra mîr û hukumdarê hukumeta Cizîra Botanê, nûnerê dewra muqtedîr û serdestiyê ye di dîroka edebiyata Kurdî de. Di helbesta wî ya lîrîk û coşîş de hêmanên ruh ên wek îhtîşam, hessasiyet, xwebawerî, ciwanî û baldarî derdikevin pêş (Ragihandina ji Osman Tunç, 2008: 19: Hartman, 1904: 10).

Li ser vê bingehe çarçoveya xebata me hizir û tesewira estetîk e û geşedana vê nêrîna estetîkê û nirxandina wê ya li gor Melayê Cizîrî babeta me ya sereke pêk tîne. Di vê çarçoveyê de pêşî me xwest ku em bingeha teorîk a mijarê destnîşan bikin. Paşê jî em li ser geşedana dîrokî ya hizra estetîk sekinîn. Di ronahiya van nirxandinan de me xwest ku em ji helbestên Cizîrî nêrîna wî ya estetîk fêhm bikin. Di vê çarçoveyê de li gor şair çavkaniya ciwaniyê, cureyên wê û têkiliya evin û ciwanê mijara me ya esasî pêk tîne.

1.3. Armanca Tezê

Di vê xebatê de armanca me ya sereke ew e ku em mahiyeta ciwaniya ku Melayê Cizîrî li ser sekiniye bikolîn; buûdên vê ciwaniyê binirxînin û maneya ku şair daye ciwaniyê di ronahiya berhemên wî de û bi nêrîneke edebî û felsefî tedqîq bikin.

Di serdema navîn de di medreseyên Îslamî de û her wisa di medreseyên Kurdan de digel ilmê kelmê, felsefeya Grek jî dihate xwendin. Nirxandinên felsefî yên Eflatun, Aristo bigre hetta yên Îbnî Sîna, Farabî, Xezalî û hwd. wek ders dihatin şopandin. Li gor teoriya van navan estetîk şewq û şemalek e ji çavkaniya mutleq a îlahî. Lewma di vê xebata tezê de em dixwazin li ser bîr û nêrîna Mela ya ciwannasiyê bisekinin. Her wisa me qest û mebest ew e ku em di siya van teoriyan de fikr û ramana hunerî ya Mela, esasên estetîka wê hunerê û bingeha wê ya felsefîk destnîşan bikin. Di vê qadê de Mela xwedî hişmendiyeke hêzdar û binaxeyeke qewî ya hunerî ye. Lewma gava em li ser fikr û nêrîna hunerî û estetîk a vî şairî disekin, em dê fikra wî ya li ser ciwaniyê, uslûb û şeweyê anîna ziman a ciwaniyê ya bi rêya helbestê û maneya ku li ciwaniyê bar dike, lêkolîn bikin (Yıldırım, 2018: 140).

Mela retorîka xwe ya estetîk bi rêya berhemên xwe, yanî bi helbestên xwe derbiriye. Lewma em ê jî di rêberî û ronahiya hemû helbestên wî de, yanî bi rênîşandana dîwana wî ya muretteb û bi muhtewa, fikr û nêrîna wî ya ciwanî û paşxaneya fikrî ya vê nêrînê destnîşan bikin.

Di pêkhatina fikr û nêrîna estetîk a Îslamî de rol û bandoreke berbiçav a filozofên meşşayî yên wek Îbnî Sîna, Farabî û mutesewwufên wek Îbnî Erebi digel filozofên Yûnan ên serdema pêşîn hene. Lewma em dê metnên berhemên Mela di ronahiya nêrînên van navên girîng de jî binirxînin. Wihareng ew ciwaniya ku Melayê Cizîrî li ser sekiniye û aniye ziman, ew eşq û evîna ku dibe sebebê îdraka wê ciwaniyê, dê bê şîrovekirin û analîzkirin (Doru, 2012: 123).

Ew zimanê mecazî yê ku şair bikartîne, ji ber ku di anîna ziman a ciwaniyê de xwedî roleke bi bandor e, em dê ji îmkanên derbirîna vî zimanî, ji bunyeya wî ya mîstîk û sembolîk sûd werbigrin û di ronahiya vî zimanî de îzah bikin. Di vir de pîgar û pêgira me ya herî mezin ew e ku Mela her çiqas bi kesayetîya xwe ya sereke û domînant şair û edebiyatnas e, lê her wisa xwedî kesayetîyeke alim û arifiyê ye jî. Bi gotîneke din, çawa edîb û şair e, wisa jî zanyar û ehlê hal e. Lewma di ferisandin û tahlîla fikr û nêrîna şair a ciwaniyê de him hûkema û filozofên meşşayî him jî tesewuf du hêmanên diyarker û girîng in (Öz, 2013: 39).

1.4. Giringiya Mijarê

Bi qenaeta me ev babeta estetîkê nasnameyeke Mela ya sereke ye û ciyawaziyeke wî ya rewnaq e. Lewma lêkolîner Melayê Cizîrî wek “Şairê ciwanî û

eşqê” diwesifînin. Wihareng dê dîwana Mela di perspektîfa ciwaniyê de bi çavekî nû û ji nû ve bê xwendin û tahlîlîkirin. Em di wê baweriyê de ne ku dê çavkaniyeke nû di vê mijarê derkeve holê. Lewra xebat û çavkaniyên li ser vê hêla Mela pir hindik in.

Wisa tê hêvîkirin ku ev mijara balkêş û meraqawer dê bibe sedemê keşfa hêleke din a ciwaniya dîwana Mela. Her wisa dê ji bo çêbûna lîteratureke ciwanînasî û estetîka edebî û felsefî ya di Kurdiya Kurmanciya Bakûr de jî bibe pêngavek. Lewra xebat û lêkolînên di vî warî de li vî perçeyê welat hê pir kêr û sethî ne, hetta bigre tunene. Ev yek jî girîngî û pêwistiya xebata me zêdetir dike. Jixwe di vê mijara estetîkê de û her wisa li ser estetîka şîra Mela, qasî em dizanin, li Tirkîyê tu berhemeke bi Kurdî tune (Muhammed, 2008: 11).

Esas meriv dikare bibêje bêtalîhiyeke Melayê Cizîrî ev e ku li nav me Kurdên bakûr yên ku li ser Mela xebitîne, hema bigre kesekî edebiyatnas yanî yekî ku perwerdehiya edebiyatê dîtibe tune. Ev jî hêla edebî ya edîbekî bala û rewnaq ê wek Mela, di tarîtyê de dihêle. Ji ber ku piraniya van xebatên ku hatine kirin ji hêla kesên ne edebiyatnas ve hatine amadekirin. Bi qenaeta me ji ber ku motivasyona van xebatan ne profesyonelî yan pisporî ye, bilekis xîret û wefadarî û wek li xwe wezîfe dîtineke ji tunebûnê û mecbûrîyetê ye, lewma rewşeke awha derketiye holê. Heta niha bi mecbûrî awha bû. Lêbelê divê ji vir şûnda ne awha be. Divê xebatkar û lêkolînerên qada edebiyatê di vê mijarê de derkevin pêş. Lewra ev wezîfeya han, beriya her kesî deynê hustiyê edebiyatnasan e.

Baş e ku van salên dawî li Zanîngehên Tirkîyê bi awayekî fermî Beşên Ziman û Edebîyata Kurdî vebûn û bi qewlê Mela “*talihê fêrxunde û bextê seîd (bû)yarê*” me. Wihareng di van beşan de û her wiha di programên qadên akademîk ên wek mastir û doktorayê de, tez û xebatên xwendekarên edebiyatê yên li ser Mela û kesayetiya wî ya edebî hêdî hêdî derketin. Lewma ev xebat di wê îdia û hêviyê de ye ku bibe alîkariyeke mutewazî, bibe gaveke piçûk heta dereceyekê yan heta menzîlekê, ji bo bersivdana valahiya vê qada xebatên edebî ya di derheq Mela de.

1.5. Rêbaza Tezê

Ev teza me ya ku em dixwazin di derbarê tesewura ciwanî ya di helbestên Melayê Cizîrî de amade bikin, dê li ser bingeha têkiliya ciwanî û eşqê ava bibe. Em dê di beşa destpêkê de li ser çarçoveya teorîk ya tezê bisekinin. Di vê çarçoveyê de em ê pêşî tixûbên mijarê destnîşan bikin. Em dê hewl bidin ku armanca tezê bînin

ziman. Her wiha di vê beşa destpêkê de girîngiya mijarê jî dê bê nîqaşkirin. Em ê di vê beşê de li ser çavkaniyên tezê jî bisekinin. Her wisa jî nirxandin û rexneya çavkaniyan jî wek peywireke girîng dê di vê beşê de cih bigre. Rexneya çavkaniyan mijareke girîng e ji bo dîtina kêmasiyên di xebatên berê de. Her wisa ji bo dubarenekirina heman xeletiyên berê û mînîmîzekirina kêmasiyên xebata me jî girîng e.

Di beşa yekê de jî em dê di bin sernavê “Geşedana Dîrokî ya Nêrînên di Derheq Çavkaniya Ciwaniyê de” de li ser mane û şîroveyên ciwaniyê bisekinin ku ji pêvajoya dîrokê de hatine kirin. Em dê di bin sernavê “Ciwaniyê/Estetîk û Mahiyeta Wê” de şîrove û îzaha têgeha ciwaniyê bikin û li ser estetîka ku zanista vê têgehê ye bisekinin. Her wiha pêvajoya dîrokî ya geşedan, guherîn û pêşketina vê qada zanistî bişopînin.

Em dê hewl bidin û di nav lêgerînê de bin ji bo bersivdana di derheq mahiyeta ciwaniyê de. Her wisa estetîk bi tena serê xwe buye metoda lêkolînê jî. Her çiqas filozofên Yûnan wek rê û rêgeza lêkolîna heqîqetê zaf qîmet nedidan estetîkê û ew wek hesteke subjektîf destnîşan dikirin. Lê xasma di sedsalên 17. û 18. de filozofên Alman ên wek Baumgarten estetîk û mantiq wek du rêyên lêkolînê, di bin navên “zanyariya hîssî” û “zanyariya eqlî” de wek du metodên lêkolîna heqîqetê destnîşan kir.

Wihareng estetîk wek navê dîsîplîn û metodekê hate pejirandin ku mantiqa zanyariya hestiyarî/hîssî lêkolîn dike. Em ê jî di bin siya metodên estetîk de xebatên xwe yên di vê derbarê de dewam bikin. Em dê ji hukemayên dewra antîk ên Yunan destpê bikin heta yên serdema navîn ên Rojava û Rojhilatê û nêrînên wan ên di vê derbarê de bin ziman. Wihareng em dê esasên felsefî yên têgeha ciwaniyê vebikolîn. Di vê babetê de me xwest ku nêrîna ciwannasiya rojhilat jî bikeve nav mijara me. Xasma ciwannasiya ji referans û ekolên Îslamî li ser nêrîna Melayê Cizîrî bi bandor in bêguman. Lewma di vê mijara hizra ciwannasiyê de, me girîngî da ser agahiyên di derbarê hizra ciwan û ciwaniya di sofîgeriyê de, yanî fêmdariya ciwannasiya îrfanî. Lewma heta ji me hat, em li ser navên pêşeng ên vê qada sofîgeriyê yên wek Îbnî Erebi û ekola wî ya di vê qadê de ya bi navê wehdeta wucûdê, sekinîn.

Di beş û gava duduyan de û di bin sernavê “Estetîk û Edebiyat”ê de jî em dê li ser tîkiliya ciwanînasî û edebiyatê bisekinin. Her wiha li ser tesîra ciwannasiyê ya

li ser edebiyatê hûr bibin. Di vê babetê de mijarên wek zimanê edebî, zewqa edebî, têkiliya di navbera ciwan, ciwanî û ciwankariya edebî de, dê bibite qada lêgerîna me. Ev mijar dê di navbera ciwaniya felsefî û hizra ciwannasiya di helbestên Melayê Cizîrî de wek pireyekê, bibite rabite. Lewra piştî behsa geşedana dîrokî ya raman û nêrînên estetîk ên felsefî û sofîgeriyê, behs nehata li ser ciwannasiya edebî, elhaq dê mijar nîvcû û naqis bimaya. Me di mijara rexneyên çavkaniyan de jî îşaret kiriye ku di hin xebatên li ser vê mijara me de ku berî wextan hatine kirin, ev babeta têkiliya “ciwannaasî û edebiyat”ê hatiye îhmal kirin, yanî jê serfê nezer kirine. Bi qenaeta me ev jî kêmasiyeke girîng e ji bo wan xebatan.

Di gav û beşa sisêyan de û di bin sernavê “Ciwan û Ciwanî Di Nêrîna Hunerî ya Melayê Cizîrî de” jî em li ser ray û nêrînên Mela yê di derbarê huner û ciwaniyê de hûr dibin. Her wiha di nav vê beşê de em bi awayekî kurt û xulase li ser jiyana û kesayetiya edebî ya Melayê Cizîrî hûr bûn. Lewra me xwest ku ew paşxane û binaxeya dîrokî û edebî ya ku kesayetiya Mela ya îlmî û edebî li ser hêşîn bûye, bi qasekê derkeve holê û bê zanîn. Di vê babetê de bi kurtasî me behsa rewşa edebiyata klasîk a serdema navîn kir.

Di vê beşa sisêyan de em dê binêrin ka ciwanî di fêma û feraseta hunerî ya Mela de tê çi maneyê. Lewma di vê beşê de dê nêrîna Mela ya têgihîştina wî ya ciwanî, têgînên wî yê ku ciwaniyê tînin ziman, zimanê mecaz ku wesîleya îfadekirina ciwaniyê ye û ji hêla hemû şairên klasîk ve bi awayekî muşterek tê bikaranîn, prototîpên ciwaniyê dê bibite mewzûbehs. Her wiha cureyên ciwaniyên ku şair aniye ziman ên wek ciwaniya mutleq, ciwaniya muqeddes, ciwaniya kes û sirûşt, ziman, fikir û hwd., şêwe û uslûba wî ya emilandina ciwaniyê û taybendmendiya bîngehîna ciwannasiya wî bi mînakên ji şîrên wî dê bi awayekî hûrgilî bê ravekirin. Qasî ku tê xuyanê di dîwana Mela ya lîrîk de gelek nimûne hene ji bo ravekirina van sernavan û palpiştîkirina van mijaran.

Em dê di beşa dawî ya çaran de jî di bin sernavê “Eşq wek rêbera nasîn û gihîştina ciwaniyê yan jî mifteya deriyê ciwaniyê” de li ser eşqê ku ji bo îdraqa ciwaniyê ku di epistemolojiya sofîgeriyê de xwedî buûdeke raser e, bisekinin. Taybendmendî, rewş, cure û fonksiyonên eşqê, her wisa jî têkiliya “eşq û ciwaniyê” ya di şîrên Mela de bînin ziman û binirxînin.

1.6. Çavkanîyên Tezê

Di derheq mijara estetîkê de heta niha li Tirkîyê gelek xebat û lêkolîn hatine kirin, gelek tez li akademiya hatine amadekirin. Lêbelê li nav Kurdên Bakur de li vê herêmê xebatên berfireh û bi rêk û pêk ên li ser estetîkê û xasma li ser “Hizr û nêrîna ciwanî ya Melayê Cizîrî” nehatine kirin. Lewma çavkaniyên li Tirkîyê, çi yên di derheq dîrok û teoriya estetîkê de çi jî yên li ser estetîka edebî, hemû zimanên wan bi Tirkî ne. Di vê mijarê de xebat û berhemên bi zimanê Kurdî, ha bi Kurdiya Kurmancî ha bi Kurdiya Dimilkî/Zazakî tunene. Digel vê yekê jî gelek çavkanî hene ku meriv bi rihetî dikare ji bo lêkolîna li ser mijara estetîkê ji wan sûd werbigre.

Bi gelemperî di derbarê mijara estetîkê de û her wiha di derheq zanista estetîkê de ji serê avabûna Cumhuriyeta Tirkîyeyê heta niha gelek xebatên akademîk û xebatên dervayî akademiya derketine holê. Xasma di warê nêrîna felsefeyê ya li mijara estetîkê de meriv dikare bibêje ku lîteratureke berfireh çêbûye. Lê gava xebat û çavkaniyên li ser estetîka edebî bi xebatên qada estetîka felsefî re bê berawirdkirin, tê xuyanê ku xebatên di derbarê estetîka edebî kêmîtir in ji yên felsefî.

Bi qasî 9-10 çavkaniyên sereke hene ku me karî ji bo destpêkê di derheq mijarê de em bikarbînin. Ha ji bo lêkolîna dîrok û teoriya estetîkê ha ji bo fêmkirina hizra estetîk a Melayê Cizîrî. Me bi lêkolîneke di demeke kurt de nêzî sed (100) çavkaniyên curbecur yên gelemperî ku me karî ji bo vê babetê ji wan îstifade bikin, me peyda kirin. Di dirêjahiya xebata me ya li ser tezê de, ev hejmar zêdetir jî bûn. Paşê herî dawî hejmara çavkaniyên mijarê ku ketin destên me û me ji wan sûd wergirtin, gihîştin dora 200 î.

Çavkaniyên di derbarê teoriya estetîkê de yên li Tirkîyê hinekên wan telîf û hin ji wan jî tecume ne ji çavkaniyên Ewrûpa. Wek xebatên lêkolînê û bi awayê telîf du kitêbên girîng ên İsmail Tunalı yên bi navê “*Estetik*” û “*Grek Estetiği*” hene. Her wisa kitêba Necla Arat a bi navê “*Etik ve Estetik Değerlerimiz*” Ev berhem ji bo fêmkirina pêvajoya derketin û pêşketina fikr û nêrîna estetîkê û her wiha di derheq teoriya estetîkê de, xwedî agahiyên girîng in.

Kitêba Nusret Çam a bi navê “*İslam’da Sanat Sanat’ta İslam*” jî di derbarê teoriya Îslamî ya di derbarê estetîkê de çavkaniyên sereke ne. Her wisa kitêba Turan Koç jî ya di vê mijarê de çavkaniyeke girîng e. Koç di berhema xwe ya bi navê “*İslam Estetiği*” de bi kurtasî fikr û nêrîna Îslamî ya estetîk tîne ziman. Koç ji

referansa bingehîn a Îslamî ku Quran e, tesbît û çavkaniyên di derheq estetîkê de dinirxîne. Meriv dikare bibêje ku ev berhem di qada xwe de valahiyekê tijî dike.

Her wisa xebata Abdurrahim Alkış ya bi navê “*Mezmûnên Tesewwîfî Di Dîwana Melayê Cizîrî de*” jî dê ji hêla teoriya derbirîna estetîka Îslamî ya Mela de wek çavkanî alîkarî kir. Lêkolîna bi zimanê Erebi ya nivîskarê ji Suriyeyê Xalid Cemil Muhemmed ku ji hêla Ümit Demirhan ve hatiye wergerandin bo Tirkî ya bi navê *El- Cezerî Şair’ul Hubbî We’i-Cemal (Melayê Cizîrî Sevgi ve Güzelliğin Şairi)*. Ev kitêb her çiqas zaf berfireh nîne jî, lê wek çavkaniyeke ku rasterast li ser mijarê hatiye nivîsîn, faydemend e.

Du kitêbên Nesim Dorû yên bi navê “*Melayê Cizîrî Felsefî ve Tasavvufî Görüşleri,*” û “*Melayê Cizîrî Hakikat ve Mecaz Arasında Bir Sûfî’nin Portresi*” çavkaniyên kêrhatî ne di vê mijarê de. Her wisa heft heşt maqaleyên wî yên bi vî rengî her çiqas rasterast li ser vê mijarê nebin jî ji bo fêmkirina fikr û nêrînên Mela ên epîstemolojîk û ontolojîk kêr hatin.

Teza doktorayê ya Kenan Bozkurt çavkaniyeke girîng e ku li ser “*Tesewura Ciwanî Di Fuzûlî de (Fuzûlî’de Güzellik Tasavvuru)*” di sala 2016an de li Universiteya Malatyayê nivîsiye. Me ji hêla metod û hildana dest a hin mijara ve jê îstifade kir. Her wiha xebateke din heye ku li herêma Kurdistanê Federe ya Îraqê bi navê “*Ciwanînasîyê Îrfanî Le Şîrekanî Şêx Nûreddînê Birîfkanî da*” bi Kurdîya Soranî hatiye amade kirin. Ev xebat wek teza mastirê li Zankoya Soran, li Fakulteya Adab, ji teref Kazim Şêx Husên ve hatiye nivîsîn. Ev her du xebat jî, yek bi Tirkî û ya din jî bi Kurdîya Soranî, ji ber ku li ser heman mijara me ne, di derbarê metod, derdestiya babetan, lêhûrbûna li ser sernavan û hwd. de rê li pêşiya me vekir. Her wisa jî dê ji Kurdiya Kurmancî ya li vî parçeyî re jî bibîne model û mînaka xebata heman mijarê. Lewra qasî ku em dizanin heta niha li ser vê mijara estetîkê, xasma jî li ser mijara estetîka edebî li Bakûr xebateke bi Kurdiya Kurmancî nehatiye kirin.

Du maqaleyên akademîk ên girîng hene ku raste rast têkildarî bi mijara me ya eşq û estetîka helbestên Melayê Cizîrî ne. Yek ya bi Kurdî ya Soranî ve ku ji hêla Hêmin Omar Ahmed Xoşnav û Yadgar Resûl Balekî ve hatiye nivîsîn bi sernavê “*Nûr û Şêwekanî Le Şî’rî Cizîrî da/ Nûr û Şêweyên Wê Di Helbestên Melayê Cizîrî de*” (Balekî/Xoşnav, 2012: 47). Ya duduyan jî bi Kurdî ya Kurmancî hatiye nivîsîn ji hêla M. Zahir Ertekin ve bi sernavê “*Agirê ‘Eşqê di Perspektîfa Mela de*” (Ertekin, 2017: 79).

Xebatên çavkanî yê ji Herêma Kurdistanê Iraqê jî him ji hêla têgehên zimanî yê di derheq mijarê de him jî bi naveroka xwe giring in. Xasma xebata li ser felsefeya estetîk ya Xiyasêdîn Neqşebendî ya bi navê *Felsefa Ciwaniyê Estetîk Nihêlîzm Yan Enîgma, Hewalê Damezrandina Teoriyekê*. Ev xebat, li gor nivîskarê wê, xebata pêşîn e di derbarê felsefeya estetîkê de bi Kurdî ya Kurmancî. Ev xebat jî bo pêkhatin, geşedan û standardizasyona têgehên felsefî yê di Kurdî ya Kurmanciya Bakûr de jî gelek kêrhatî ye (Neqşebendî, 2022: 54).

1.6.1. Nirxandina Çavkaniyan

Bi giranî em dixwazin li ser wan çavkaniyan bisekinin û binirxînin ku bi mijara me ya estetîkê û estetîka şîra Mela û her wiha bi kesayetiya wî ya edebî re raste rast têkildar in. Me qest û mebest ew e ku em di vê xebata xwe ya di heman mijarê de ji encamên rast ên wan xebatên girîng sûd werbigrin. Her wiha ji kêmasiyên wan jî ders bigrin û wan kêmasiyan di xebata xwe de dubare nekin. Ji xwe zanist û xebatên îlmî bi vî rengî dikemilin, yanî digihên kemala xwe.

Lêkolîna bi zimanê Erebi ya nivîskarê ji Suriyeyê Xalid Cemil Muhemmed jî hêla Ümit Demirhan ve hatiye wergerandin bo Tirkî çavkaniyeke girîng û kêrhatî ye. Ev berhem bi navê xwe yê orjînal wek “El- Cezerî Şair’ul-Hubbî We’l-Cemal”e û jî bo Tirkî wiha hatiye wergerandin: “Melayê Cizîrî Sevgi ve Güzelliğin Şairi”. Ev kitêb her çiqas zaf berfireh nîne jî lê wek çavkaniyeke ku rasterast li ser mijarê hatiye nivîsîn, faydemend e (Muhammed, 2008: 46).

Naveroka kitêbê ji sê hêmanên esasî yê di helbestên Cizîrî de cih digrin pêk tê. Her wisa têkiliya van hêmanan jî wek mijara kitêbê cihekî giring digre. Ev hêmanên ku tên nirxandin hub, cemal û mestî ne. Nivîskar ev her sê hêmanên di berhema Cizîrî de nirxandine û bi nêrînên sûfîyên selefê Cizîrî re daniye ber hev. Nivîskar li gor pergaleke hevgerî mijar raxistiye ber çavan. Nivîskar qasî ku tê xuyan hakimê mijara xwe ya tesewwufî ye. Di xebatê de kêmasiyên wergernasî, vegotin, wate, rê û rêbazê jî bi ber çavan dikevin. Nivîskar mijar zêde kin birîne û zef neketiye nav teferuatan. Zimanekî pir gelemperî bikaraniye.

Di kitêbê de ji hêla rêbazê ve jî mijar ketine nav hevûdu û pergala mijaran qels hatiye sazkirin. Wek mînak jînenîgariya şair ne di serê pirtûkê de ye. Yanî kurtejiyana şair piştî tahlîla helbesta şair, hatiye bicihkirin. Pêşgotin jî piştî maqaleyê

hatiye. Lê pêşgotin weka navê xwe divê li pêşiya gotinê, beriya destpêka mijarê bihata, yanî di serê kitêbê de buya.

Pirtûk ji ber ku werger e hin kêmasiyên wergerê tê de tên xuyan. Mesela wergêr têgeha “eşq”ê ya di helbesta Cizîrî de wek “sevgi/hezî” wegerandiye. Aşk/eşq li ku “sevgi/hezî” li ku! Di karê wergerê de her têgeh şert nîne ku were tercumekirin. Eger têgeh di her du zimanan de, yanî di zimanê hedef û zimanê jêgir de hevpar bin, şert nîne ku were wergerandin. Îcar ma ku têgehên edebiyata klasîk, xasma yên tesewufî. Piraniya van têgehan ji xwe di Tirkî, Kurdî, Farisî û Erebi de muşterek in û ji Erebi derbasî van zimanan bûne. Yanî “eşq” di Tirkî de jî “aşk” e. Ne şert e ku wek “sevgi” bê wergerandin û ji tehm û giraniya “aşk”ê bê dûrxistin. Ev kitêba han a ji Erebi bo Tirkî hatiye wergerandin li vî welatê me xebateke ewilîn e di vê qadê de. Lewma valahiyekê tijî dike.

Wergera dîwana Melayê Cizîrî ya bi Tirkî çavkaniyeke girîng e. Ev çapa dîwanê ya bi Kurdî ya Latînî û wergera wê ya bi Tirkî ji bo vê xebata me jî çavkaniyeke kêrhatî ye. Ev wergera Tirkî û tevî Kudiya wê ya bi herfên Latînî bi qasî ku em dizanin werger û çapa herî pêşîn û herî bi rêk û pêk e li erdnigariya Tirkiyeyê.

Tercumeya bi Tirkî ya dîwana Mela ku wek jêdereke serlêdanê ye di sala 2008an de ji hêla lêkolînerê hêja û jêhatî Osman Tunç ve hatiye wergerandin bi bal Tirkî ve. Ev dîwan û wergera wê ya bi Tirkî pêşî di nav weşanên Nûbiharê de derket. Paşê bi heman mîzanpaj û awayê çapa Nûbiharê, ji hêla Wezareta Çandê ya Tirkiyeyê ve (Kültür Bakanlığı Yayınları), yanî ji hêla dewletê ve jî hate çapkirin. Piştî çapa Mesnewiya Mem û Zîn a Ehmedê Xanî, çapa dîwana Mela ya li Wezareta Çanda Tirkiyeyê, ev çapa wergera dîwana Mela, kitêba Kurdî ya duduyan bû ku dewlet çap dike. Ev çavkani li Tirkiye pir berbelav e. Bigre di hemû xebatên li ser Mela de atif lê tên kirin. Ji ber ku çapa wê him kevn e, lewra qasî ku tê zanîn beriya wê çapeke têkûz a dîwanê tunebû, him jî bi çapeke bi qalite ye. Her wisa jî bi mîzanpaj û herfên xwe pir xweş, bi hêsanî tê xwendin (Cizîrî, 2013: r. 314).

Xebateke girîng a di vê mijarê de ya Abdurrahim Alkış e. Alkış îlahyatnas e û qada wî ya lêkolîna akademîk jî tesewuf e. Xebata wî ya bi navê “Mezmûnên Tesewwîfî di Dîwana Melayê Cizîrî de” ji hêla teoriya derbirîna estetîka Îslamî ya Mela de wek çavkanî alîkarîya xebata me kir (Alkış, 2014: 45).

Di vê mijarê de tişt a bala meriv dikşîne ev e ku li Tirkiyeyê kesên ku li ser Mela xebitîne, piraniya wan ne edebiyatnas in. Ev yek jî dibe sebeb ku ev hêla Mela

ya edebî ku nasnameya wî ya rastîn û sereke ye, veşartî bimîne. Hal ew hal e ev şair wek elametê farîqe, bi estetîk û lîrîzma xwe ya edebî di nav şairên bijarte yên Rohjilat de ye.

Teza doktorayê ya Kenan Bozkurt a li ser “Tesewura Ciwanî Di Fuzûlî de (Fuzûlî’de Güzellik Tasavvuru) ku di sala 2016an de li Universiteya Malatyayê nivîsiye çavkaniyeke girîng e. Her çiqas rasterast têkiliya wê bi Mela re tune be jî ji ber ku li ser heman mijara me ye, di derbarê metod, derdestiya babetan, lêhûrbûna li ser sernavan û hwd. de rê li pêşiya me vekir (Bozkurt, 2016: 89).

Lêbelê di vê teza doktorayê de ku di Şaxezanista Ziman û edebiyata Tirkî de hatiye amadekirin, gelek kêmasî jî hene. Bi qenaeta me kêmasiya vê xebatê ya here mezin ev e ku mijara “Estetîka Edebî” tê de tune. Hal ew hal e ku tez li qad û beşeke edebiyatê tê amadekirin. Divê ji têkiliya felsefe û estetîkê zêdetir, têkiliya edebiyat û estetîkê derketa pêş. Heta lazim bû ku beşeke teze sîrf ji bo vê têkiliyê, vê babetê bihata veqetandin. Berevajê vê pêdiviyê ne ku beşek, sernaveke wek edebiyat û estetîk jî tune di nav beşa teorîk ya teze de. Nivîskar ji beşa teoriya estetîk a felsefî dîrekt derbasî pratîk û nimûneyên ji dîwanê buye. Hal ew hal e ku divê beriya ku derbasî nimûneyên estetîk ê ji dîwanê be, diviya bû ku piştî estetîka felsefî li ser estetîka edebî jî bisekîniya. Wihareng bi vê binaxeyê, bingeha teorîk a mijarê temam dibû.

Lewma ji bo em nekevin nav heman kêmasî û xeletiyê, me di xebata teza xwe de beşeke ku ji deh sernavan pêk tê tenê ji têkiliya “Edebîyat û estetîk”ê re terxand. Her wiha, heta ji me hat, me xwest ku bingeha teorîk a fikr û nêrîna estetîk him ji hêla felsefî ve him jî ji hêla edebî ve bê tehlîlîkirin. Wihareng merheleya peydabûn û geşedana hizra estetîk û her wiha dîroka pêşketina vê zanistê ya bi dîsîplînên têkildar yên nêzî xwe ve derkeve holê. Da ku qutbûn û jihevqetînek di navbera vê rêzezincîra geşedana dîrokî de çênebe.

Bozkurt di teza xwe de behsa êkolên felsefî û kesayetiyên ekolsaz yên rojava kiriye. Lê behsa êkolên rojhilatê nekiriye ku di tesewufa Îslamî de bi bandorkar û berbelav in. Behsa ji van êkolên wek Wehdetê Wucud, Meşşayî û Îşraqî nekiriye û wek sernav, babet û mijar li ser nasekîniye. Heta ji me hat me xwest ku em van kêmasiyên di xebatên berî xwe de yên di heman mijarê de, di xebata xwe de dubare nekin. Her wiha van kêmasiyan tekmîl bikin û xeletî û noqsaniyên xebata xwe mînimîze bikin.

Du kitêbên Nesim Dorû yên bi navê “*Melayê Cizîrî Felsefî ve Tasavvufî Görüşleri*,” û “*Melayê Cizîrî Hakikat ve Mecaz Arasında Bir Sûfî'nin Portresi*” hene wek çavkaniya hizr û nêrînên Mela yên felsefî. Her wisa heft-heşt maqaleyên wî yên bi vî rengî her çiqas rasterast li ser vê mijarê nebin jî ji bo fêmkirina fikr û nêrînên Mela yên epîstemolojîk û ontolojîk dê bi kêr bîn. Ev pirtûkên çavkanî ji maqaleyên nivîskar ên curbecur ên li ser fikr û nêrîna felsefî û tesewufî ya Melayê Cizîrî pêk hatine (Doru, 2016: 45).

Çavkaniyeke girîng a li ser Mela û Şîrên wî ku di vê dawiyê de derketiye, kitêba bi navê “*Cizîrînasî Meqaleyên Libarey Melayê Cizîrî û Şî'rên Wî*” ye. Bi qasî ku tê xuyanê li Tirkîyê cara ewil e ku edebiyatnasên di qada akademîyê de bi awayekî kolektîf û hevpar li ser hêlên edebî û ziman a Mela disekinin û lê hûr dibin. Ev çavkanî bi edîtorî û amadekariya M. Zahir Ertekin derketiye holê. Deh xwendekarên perwedehiya doktoraya edebiyata Kurdî û sê akademîsyenên doktor ên pisporê qada edebiyat klasîk bi duwanzdeh maqale û guftugoyekê ve ev xebat pêk anîne. Nivîsarên di kitêba “*Cizîrînasî*”yê de jê yek bi Kurdiya Soranî, yek bi Kurdiya Zazakî û yên mayî bi Kurdiya Kurmancî ne. Ev xebat û pirtûka li ser Cizîrî ji bo vê xebata me wek çavkaniyeke alîkar dê ji bo têgihîştina poetîkaya Mela kêr bê. Lewra di derbarê kesayetiya edebî ya Mela û şîrên wî de zanyariyên girîng tê de hene (Doskî, 2021: 25).

Di pirtûka “*Cizîrînasî*” de Maqaleya Nurettin Ertekin a bi navê “*Tesewuf Di Dîwana Melayê Cizîrî de*” jî girîng e. Maqaleya Nurettin Ertekin ji hêla fêmkirina nasnameya tesewufî ya Mela de hin daneyên girîng dide (Ertekin, 2021: 177).

Esas di derheq nasnameya edebî ya hin şairên bijarte yên Rojhilatî de problematîkek heye. Bi qasî ku tê xuyanê ev yek ji bo Mela jî carî ye. Ev pirsgrêka wesifandin û navlêkirina edebî ya li hin şairan ev e ku gelo şairên serdema klasîk bi kîjan nasnameya xwe ya edebî ve bêne danasîn. Lewra wek çand û baweriyeke gelemperî û berbelav ya wê serdemê, zanîna wan ya tesewufê û bikaranîna wan a têgehên tesewufî, wan dike “*Mutesewuf*”, “*Şêx*” yan “*Sofî*”. Di vê derheqê de ji bo ku meriv ji tevlihevkirina nasnameya edebî ya şairên wê serdemê xelas bibe, divê tesnîfeke kifşe bê kirin.

Bi qenaeta me meriv dikare şairên serdema klasîk yên ku bi eyan û beyan di nav pergala tesewufê de ne, wek mutesewuf bide nasîn. Şair bi eşkere eger wek şêx yan xelîfe, yan murîd yan postnişîn di nav sîstema tesewufê de be, yanî bi vî rengî

girêdaneke wî ya bi vê pergalê hebe, ew çax ew şairekî şêx e yan sofî ye yan murîd e. Wek mînak, Şairê Kurd ê serdema klasîk Şêx Şemseddînê Exlatî, Şêx Ahmedê Feqîr û hwd. Lewra ev şair hinekên wan xelîfe yanî nûnerên terîqetekî ne. Mesela Exlatî şêxê terîqa Suhrewerdî ye li Amêdiyê (Exlatî, 2015: 25). Ger meriv ji dervayî edebiyata Kurd mînak bide di vê derheqê de, mesela Mewlana Celaleddînê Rûmî. “Mewlana” ji xwe payeyekî tesewufê ye ku Rûmî postnişînê yan jî şêxê wê terîqê ye (Mevlana, 2006: 7).

Şairekî ku şairiya wî li pêş tesewuftiya wî be û kar, rol, wezîfe û fealiyeteke wî ya di nav pergala tesewufê(terîqet) de tunebe, ew şair ne “mutesewuf” e, yanî ne “sofî” ye. Ew şair şair e, edîb e û edebiyatnas e. Mesela di edebiyata Kurdî ya klasîk de Eliyê Herîrî, Ahmedê Xanî, Feqiyê Teyran û hwd. Di edebiyata Rojhlat de jî wek mînak: Hafîzê Şîrazî, Sadiyê Şîrazî, Fuzûlîyê Bexdadî, Baqî, û hwd. Ev şair belê hakimê lîteratura tesewufê ne, mezmûnên tesewufî bikaranîne, lê ne mutesewuf in. Ev şexsiyet şair in, bi nasnameya xw ya şairiyê tên zanîn. Yanî bikaranîna wan ya têgeh û mezmûnên tesewufî ne girîng e di vê mijarê de. Lewra bigre hemû şairên sedema klasîk hakimê lîteratûra tesewufê ne û têgehên tesewufî bikartînin. Va ye Mela yek ji van şairên şair e ku wek mexles jî “Mela” yan “Melê” bikartîne. Yanî Mela Mela ye, Mela şair e û hew (Dokî 2021: 25).

Mela di dîwana xwe de, gava behs tê ser behsê, di meqamê fexriyeyê de bi gotin û soxenê xwe yên sêhramîz, yanî bi şairiya xwe îftixar dike û xwe pê dide nasîn, ne bi şêxtî û sofîtiya xwe. Lewra şairiyê wek nasnameya xwe ya sereke û rastîn derdixe pêş. Hetta şairiya xwe ji ser şairiya şairên ji gelên cînar re digre. Yanî şairiya xwe jî ne wek şairiyeke ji rêzê û elelade, bîleks wek pîr û şah û sertacê şairan dibîne. Lewma dibêje ku:

Pîrê şe'ar e di şî'rê we Melê şalifroş

Tu nîşan min mede Ferxî ku li nik min buye ferx (Cizîrî, 2013: 276)

Yan jî

Di îqlîmê suxen xaqan rewanbêj û şekerrîz î

Nehin wek te di afaqan bi can ra emberamîz î (Cizîrî, 2013: 156)

Yan jî

Di î'caza beyanê da suxen ger bête însafê

Dizanit muxteser her kes Melê sihr e îbaret kir (Cizîrî, 2013: 290)

Îcar nivîskar û lêkolînerên ku haya wan ji vê nuans û pîvana girîng tunene yan jî ger ehlê tesewufê be û di alema xwe de şextiyê wek meqamê herî mezin dibîne, te hew dît ku Mela di qelema wî de bûye “Şêx” yan “Sûfî” û wek “Şêx Ahmedê Cezerî” yan jî Ehmedê Xanî di devê wî de buye “Şêx Ehmedê Xanî” û derketiye (Yiğit, 2021:80); (Geçit, 2019: 30); (Öz, 2019: 45). Her wiha yekî di qada felsefeyê de xebitîbe û haya wî ji qada edebiyatê yan teknîka edebiyatê tunebe, te hew dît ku Cezerî yan Xanî di dest û devê wî de buye “Filozofê Kurdistanê” yan jî “Muellimê Salis/Mamosteyê Sêyemîn” û hwd (Ayhan, 1996: 34); (Mem, 1997: 34); (Doru, 2016: 18).

Bi kurtasî derdikeve holê ku tesewuf di şîra klasîk de bi destê du cure şairên xwedî taybetiyên ciyawaz, bi awayên cuda tê ravekirin. Qismê ewil ew şair in ku tesewufê bîzzat dijîn yên wek Hellacê Mensûr (m. 922), Nesîmî (m. 1417), Exlatî (m. 1674) û her wekî din (hwd.) Şairên bi vî rengî, hêla wan ya mutesewuftiyê derdikeve pêş. Hêla wan a şairtiyê jî li paş dimîne, yanî di ber siya sofîgeriya wan de dimîne. Qismê duduyan jî ew şair in ku ji muktesebat û destkeftiyên alema term, mecaz, menzûm, alegorî yên dewlemend ên tesewufê sûd werdigrin. Ev cure şair, xwedî terz û şeweyekê ne di şairtî û hunera xwe de û her wiha nasnameya wan a şairtiyê daîm li pêş e. Melayê Cizîrî jî yek ji van şairan e wek Hafîzê Şîrazî (m.1390), wek Fuzûliyê Bexdadî (m.1556), wek Nîzamîyê Gencewî (m.1209) û hwd.

Di berhemên ev cure şairan de şîriyet û lîrîzm, yanî poetîka û coşîş, ciwankarî û huner wek wesfên edebî yê estetîk bi her awayî xwe didin der û her li ber çava ne. Tesewufê, gelek mecaz, îmaj û sembol bexşî berhemên van şairên grûba duduyan kirine. Van şairan ji term, biwêj û gotinên xwedî wateyên dewlemend û bi mecazê xemilandî yên tesewufê îstifade kirine. Jixwe şîra klasîk li ser wî zimanê tesewufî pêş ketiye û geş buye ku bi mecaz û îstiareyê ve honandî ye. Paşxane û binaxeya vê şîrê, xwe dispêre zewqeke estetîk a payebilind a çanda medreseyê û heyata qesrê ku ji anane û tradîsona rengîn û aristokratîk behremend dibîtin. Lewra ev cure şair jî di rehleyê tadrîsateke dirêj a medrseyê re derbas dibin ku ev tehsîl û îrfana tekyaya tesewufê pîrî caran tî rex hev, carcaran jî dikeve nav hevûdu. Lewma berhemên van cure şairan jî bi remz û hêmanên tesewufî dagirtî û xemilîne. Lêbelê ev yek, wan şairên payebilind nake mutesewuf (Erkal, 2009: 89).

Bi qenaeta me, bêtalihîyeke Mela ew e ku li vî welatê me piraniya kesên ku li ser Mela û dîwana wî dixebitin, ne edebiyatnas in. Lewma jî hêla kesayetiya Mela ya herî sereke û girîng ku hêla wî ya edebî ye, ew jî di taritiyê de dimîne. Em di wê qenaetê de ne ku ev xebatên me yên di vî warî de belkî çengek be û her wiha destpêkek be ji bo tijekirina valahiya vê qadê.

Di nav van çend sedsalên dawî yên modern de di fêmdariya estetîk a qedîm de qutbûnek qewimî û gelek guherîn çêbûn. Ev yek jî bû sebebê fêmnekirin û têngihîştina fêmdariya ciwanî ya helbesta klasik û her wiha jêdûrbûn û bîyanîbûna li vê ciwaniyê. Xebatên di vê mijarê de jî xwedî wê helwest û nêzîktayiyê ne ku bi rêbazên xwe yên modern û rasyonel dixwazin mane û mefhum û razên di helbest û berhemên wê sedemê fêm bikin. Her wisa di wê qest û mebestê de ne ku estetîka hizra îrfanî ya xwedî têngihîştina qelbî û rûhî vehisin û îdrak bikin. Şîroveyên li gor êkolên nû yên di derheq şairên me yên wek Melayê Cizîrî de, dibite perde û seddek di navbera me û şair de (Purcevadî, 1998: 218).

Çavkaniyên ji herêma Kurdistanê Iraqê ku bi Kurdiya Soranî û bi Kurdiya Kurmanciya Behdînî hatine nivîsîn jî ji bo bikaranîn û sûdwergirtina ji têgeh û termên Kurdiya Soranî û Kurmanciya Behdînî ya di qada estetîka felsefî û edebî de girîng in. Xebat û ceribînên di vê qadê de yên bi Kurdî yên li başûr, ji bo Kurdiya Kurmancî ya bakûr, îmkân û alternatîfeke girîng pêşkêş dike. Wihareng ev qad û mijara ku li vir hê nû dikeve lîteratura zanstî, dê bi wergirtina ceribînên erdnigariyên der û dor û cînar, zûtir bikemile.

Çavkaniya bi navê *“Felsefa Estetîkê Nihîlîzm Yan Enîgma”* ya Xiyaseddîn Neqşebendî li bajarê Dîhoka Herêma Kurdistanê Federe ya Îraqê çap bûye. Li gor nivîskarê wê, ev xebat li ser felsefeya estetîkê pirtûka pêşîn e di Kurdiya Kurmancî de. Li gor vê çavkaniyê di derbarê felsefeya estetîkê de di Kurdiya Soranî de jî tenê xebatek û dudu hene (Neqşebendî, 2021: 17). Ku wisa ne, ew çax ev xebata me ya han jî li Turkiyeyê xebata yekem e û di nav hemû Kurdan de jî divê xebata duduyan be di Kurdiya Kurmancî de. Her wisa xebata yekem e di estetîka edebî de bi Kurdî ya Kurmancî.

Di vê çavkaniya girîng de di mijarên qada tesewura estetîk a di dîroka edebiyata Kurdî de nîrxandinên xelet hene. Lewra nivîskar Nexşebendî îddia dike ku di dîrok û edebiyata Kurdî de hizra estetîk tune û huner tune. Tenê çend klamên

dengbêjî û hozanvaniyê û folklor û nimûneyên edebiyata devkî hene ku meriv nikare li ser van xebat û nirxandinekê bike. Lewma dibêje ku:

“Min ji dil hez dikir hunereka Kurdî di destan de heba. Ku ez şiyabam min ew jî kiriba pişkek di vê pertûkê da û min şîrove kirba. Lê ji bilî hozan û mûzîk û stranên folklorî ku em şiyane bi zardevkî biparêzin. Çi karekî wesa nîne mirov bişêt li ser binivîsit. Lewma jî tiyora/teoriya rexnê/rexneyê formûle nebûye û hizra estetîkê li nik me nehatiye nijandin/çênebuye. Çunkî me çiyê berdest nemaye, ji bêdewletiya Kurdan hemî hatiye pûçkirin û dizîn. Kurd li her çar parçan nebûne hawlatî, her dem takekê pile du bû û xwe bi cotyaryê û şivan û gavanyê ve mijûl kirye û eva me mayi jî bi xêra hindê maye. Her dem ji siyasetê reviyê ji ber kû her dem yê di qonaxa man û nemanê de bû. Û hemî gava mana wî di buyerekê metirsîdar da bû...” (Neqşebendî, 2022: 23).

Kifş e ku nivîskarê pirtûka “*Felsefa Ciwaniyê*” Xiyasedîn Neqşebendî, yan haya wî ji tarîxa Kurd û xasma jî ji tarîxa edebiyata Kurdî tune yan jî hizra ciwaniyê xasê bi serdema modern û têkildarê bi muzîk û folklorê tenê dizane. Hal ew hal e ji serê serdema klasik a Îslamî bigre di dirêjahiya hemû serdemê de Kurdan bi desthilatdarî û hukumdariya xwe ya xurt û berfireh dewlet, mîrektî û hukumetên bi navên wek Şeddadî, Hesenweyhî, Merwanî, Eyyûbî, Cizîra Botan, Amêdiye, Erdelan Bitlîs, Hekkarî, Bazîd, Miks û hwd. ava kirin. Çandeke bajarvaniyê û edebiyateke nivîskî ya xurt ji saziyên perwedehiyê yên bi navê medreseyên Kurd di nav Kurdan de peyda bû. Bi sedan zanyar, şair û edîb ji nav wan derketin. Bi sedan berhemên nivîskî derketin holê (Izady, 2006: 97).

Gelek zanyar, filozof, mutesewif, dîrokzan, edebiyatnas, şair û hwd. ji Kurdan derketin. Gelek zanyar, sofîger û şairên Kurd ha bi Kurdî ha bi zimanên di gelek berhemên ku bi hizra estetîk û fikra ciwaniyê honandî nivîsîn. Meriv bi rihetî dikare bibêje ku Kurdan di hemû dirêjahiya serdema navîn de bi dewletsazî, bajarvanî, hîkmetperwerî, îrfandarî û edebiyatnasiya xwe medeniyeteke estetîk û şarezatiyeke ciwankar saz kirin ku ne kêmkî ji mîletê din ên cînarên wan bû yên wek Tirk, Faris û Erebi û hwd. (Eminoğlu, 2021b: 57); (Secadî, 2016: 65).

Meriv dikare bi sedan nimûneyên berhemên edebî, mîmarî û îrfanî yên ayîdî hunera estetîk a Kurdan ku di serdema klasik de pêk anîne, nişan bide. Wek mînak di edebiyatê de berhemên ku Şêx Semsedînê Exlatî, Eliyê Herîrî, Feqiyê Teyran,

Melayê Cizîrî, Xanî, Birifkanî û hwd. bi Kurdî nivîsîne, hemû bi hizra estetîk dagirtîne (Şêx Husên, 2017: 72); (Doskî, 2020: 79). Nimûneya mîmariya Kurd ku bi hunera estetîk xemilîne û ihtîşama xwe heta roja îro jî parastine bi sedan in. Mînak Camiya Sultan Selaheddînê Eyyubî ya li Sîlwan /Meyafarqîn a Diyarbekirê ku di sedsala duwanzdehan de hatiye avakirin, şaheserek e mîmarî û medeniyeta estetîk a Kurdan e. Her wiha qesr û serayên mîr û hukumdarên Kurdan yên li Cizîr, Bazîd, Hekkarî, Amêdiye, Bedlîs, Hîzan, Muks û hwd. Medreseyên Mîran ku her yek xarîqeyeke hunerî û estetîkê ne yên li van bajaran hemû nimûne ne.

Gelo dîroka Kurdan tenê xasê bi van 150 salên dawî yê bêdewlet e ku Neqşebendî tarîxa Kurdan ya bi hezaran salan, wek miletekî her bêdewlet û jiyana civakî ya Kurdan jî her îbareti bi şivan û gavantiyê pênase dike? Hal ew hal e 150 sal di dîroka miletan de demeke pir kurt e. Ev dem ji bo Kurdan dewraneke fetretê ya demî ye. Jixwe dem û dewran jî nişan dide ku her tişt vedigere ser eslê xwe. Bi qenaeta me, ev nirxandinên bi vî rengî yên bêbingeh ên nivîskar Neqşebendî yan ji nezanîna dîroka edebiyata xwe tê yan jî telkînat û propagandayên dij Kurdayetî yên wek ku Kurd ne xwedî berhem, nivîs, dîrok, edebiyat, medeniyet in ên xêrnexwazên Kurdan e li binhişa wî tesîr kiriye. Ev nêrîn bûye sebeb ku Neqşebendî li dîrok û dîroka edebiyata xwe û li hizra ciwaniya klasîk bîyanî bibe û bikeve nav anakronîzmê.

1.7. Termînolojiya Estetîkê

Zanista estetîkê pêşî wek disîplîneke xweser di nav beşên felsefeyê de cih girtiye û geriyaye qadeke lêkolînê. Babeta wê ya sereke ciwanî ye û lewma gelek caran ji hêla pisporên qadê ve wek zanista ciwaniyê yan jî felsefeya ciwaniyê hatiye binavkirin. Piştî wextan di navbera estetîk û hunerê de û her wisa di navbera estetîk û edebiyatê de têkilî û hevbandoriyên xurt pêk hatine.

Bêguman her zanistek xwedî têgeh û termolojîyeke xasê bi qada xwe ye. Estetîk jî wek zanista ciwaniyê xwedî gelek term û têgehan e. Di têgihîştina mijara estetîkê de fêmkirina van term û têgehan pir girîng e. Lewma em dê li vir term û têgehên sereke yên qada estetîkê bi awayekî kurt pênase bikin. Da ku ji bo fêmkirina babetê bibe binaxe û pêşamadehiyekê.

1.7.1. Term û têgehên Sereke yên Estetîkê

Estetîk / Ciwanînasî: Ew şaxa felsefeyê ye ku wek mijara lêkolînê li ser ciwanî, huner û zewqê hûr dibe. Ev qad her wiha wek “zanista ciwaniyê” yan jî “felsefeya ciwaniyê” jî tê pênasekirin. Di dîroka felsefeyê de her dem nirxandinên li ser “ciwan” û “ciwanî”yê ya jî “nirxa ciwaniyê” û “daraza ciwaqniyê” pêk hatine. Piştî wextan mijara estetîkê xasma di çerxên navîn de di qada hizra dînî û nêrîna îrfanî û edebî de geriyaye babetekê ji babetên sereke yên van qadan (Cevizci, 2014: 37).

Navê zanista estetîkê di zimanê Erebi de wek “ilmê cemal”, di Osmaniyan de wek “bedîîyat” / “ilmê husn”, di Fransizan de wek “esthétique”, di Almanî de wek “aesthetik”, di Îngilîzî de wek “aesthetics”, di Farisî de wek “cemaşînasî/zîbayî şînasî”, di Tirkîti de jî wek “estetik/güzellik bilimi” derbas dibe (Hançerlioğlu, 2011: 93); (Secadî, 2022: 31).

Estetîk di sedema modern de pêşî di Kurdî ya Soranî de ku wek Kurmancî ya naverast jî tê binavkirin, wek navê vê zanistê bi têgeha “ciwanînasî”yê hatiye emilandin. Em bi xwe jî êdî vê peyvê wek têgeh di Kurdîya Kurmancî de ji bo estetîkê bikartînin. Ev peyva Kurdî ya wek “ciwan” ku bedewbûn, spehîtî, cindîtî û rindiyê îfade dike, bi sedsalan berê, yanî ji serdema navîn de di heman wateyê de di berhemên edebî de hatiye bikaranîn û yekî mîna Mela ew bi heman wateyê di helbestên xwe de emilandiye (Cizîrî, 2013: 374).

Ciwanî: Ciwanî wek qada sereke ya zanista estetîkê ye. Lewma estetîk ji hêla piraniya zanyaran ve wek “felsefeya hunerê” yan jî “zanista ciwaniyê” hatiye pênasekirin. Lê hin filozofan jî ew wek “felsefeya ciwaniyê” binav kirine. Lewma di roja me ya îroyîn de têgeha herî bingeîn a estetîkê têgeha ciwaniyê ye. Ciwanî nirxek e ku li gor serdem, civat, însan, heta di însan de jî li gor dem, sal, mesleg/pîşe, rewşa sosyal û psikolojîk diguhêre. Ji xwe însan di dunyayeke rastîn de bi nirxên xwe yên ku bi xwe daniye û bi yên mezherê qebûla ammayê yanî bi nirxên li civatê berbelav û pejirandî ve dijî. Di heyata me ya rojane û civakî de nirxên me yên rastiye/heqîqetê hene ku zanîn û zanyariya me têkûz dikin. Nirxên me yên exlaqî/etîk hene ku tevger û kirinên/emelên me tenzîm dikin. Nirxên me yên qenciye hene ku ekonomî û muameleyên me sererast dikin.

Nirxên me yên menfîet û kêrhatîbûnê hene ku heyata me ya pratîk û rojane didin meşandinê. Her wiha nirxên me yên xweşikayî û ciwanîyê hene ku jiyana me

ya estetîk têt û tetmîn dikin. Yê ku van nirxan derdixê holê û tiştêkî wek “qenc/baş/çê/çak/rind” yan “ciwan/xweşik/delal/spehî/cindî” diwesifîne, însan e. Madem di navenda zanista estetîk de “ciwanî” heye. Ew çax em ciwaniyê hinekî din ji nêz ve bişopînin û li ser vê têgehê hûr bibin û bipirsin. Gava em li dîroka felsefeyê dimeyînin, têt xuyan ku zanyarê ku di vê dîrokê de di wateya felsefî de li ser “ciwaniyê” sekiniye Eflatun/Platon e (Kavuran-Dedeler, 2013: 50). Li gor fikr û nêrîna wî ciwan, (tokalon) bi awayekî mitleq û heqîqî li alema îdeayan ne, li ba Xweda ye. Ew ciwanî her dem û dewran û li her derê carî ye, muteber e. Ciwaniyeke mitleq e, hudûdê zeman û mekan jê re tunîne (Taşkent, 2013: 25).

Ev ciwaniyên eslî û bêguherîn şêkil didin maddeyên li dunyayê. Lê ji ber ku madde zêf û bêqerar e, ew îdeyên ciwaniyê ku esl û esasê her tiştî ne, nikarin wek îlah eks û tecelliyê mawcudat bikin. Her wiha gava ew maddeyê ku neynika wê ciwaniyê xerab bibe, ew ciwanî jî namîne, her wekî difire, diçe. Lewra ciwanî, ne ji wan hebûn û hedîseyan e. Ciwanî ji alema îdeayan e ku li wan tecelli kiriye, yanî eksa wê ciwaniyê daye wan. Heçî Plotinos e, ciwaniyê vediqetîne du beşan. Yek, ya objeyan e. Ev obje bi qasî midet û para ku ji ideaya ciwaniyê werdigrin, ciwan in. Yên din jî bi eslê xwe, yanî jixwe berê ciwan in. Herwekî fezîletê/ciwanmêraniyê. Plotinos ji bo ciwaniya bedenî û rûhî, paqijbûna ji bedenê destpê dike û heta bi tasafîya ruhî, nexşerêya rêyeke mîstîk a ku digihêje ciwaniya/cemala îlahî nîşan dide.

Li gor Aristoteles ciwanî aheng e, lihevkerin/tenasub e. Ger hêmanên tiştêkî yekpare hevaheng bin, xwedî tenasub bin, ew tişt ciwan e. Her wiha di vir de faktorên wek simetrî, hevgirî/nîspet, hevahengî (precision), bihidûdbûn carî ne. Aristoteles ciwaniyê adeta wek matamatîkê/bîrkariyê dinirxîne. Filozofê Alman Kant ciwan û ciwaniyê wek nirxekî estetîk ji “xweş”, “qenc” û “rast”ê veqetandiye û cudahiya wê ya ji ciwaniya hunerî û ciwaniya tebîetê destnîşan kiriye. Ciwaniya tebîetê ew e ku tebîet di maddeyekî de bighihêje armanca xwe. Her wiha qaîdeyên kifşe yê wê yekê hene. Heçî ciwaniya hunerî ye, pirî caran ji bonê armanc yan qaîde tune. Di ciwaniya hunerî de “lê xweş hatin”, “hesta estetîk ya di rûh de” esas e (Kurtoglu, 2000: 75).

Fr. Shiller wek zanyarekî serdema modern du hêlên ciwaniyê derpêş dike. Li gor wî aliyekî ciwaniyê, aliyê “hestiyarî/hîssî” ye. Aliyê wê yê din jî “eqlî” ye. Ciwanî teşegirtin û şekilgirtina eql û hestan e. Saîqeya lîstîkê ya di ruh de, saîqeya şêwekariyê ya di eql de û saîqeya şewq û jiyanê ya di hestên însan de wek “ciwanî”

hevdikelijîn û derdikevin holê. Li gor nêrîna îdealistê Alman Shelling jî gava di berhemekê de nakokî/tezadên subjektîf û objektîf ji holê rabin, tiştê ku eksî berhemê dike û lê tê xuyanê hew ciwanî ye (Yavuz, 2021: 135).

Di fikr û nêrîna Hegel de jî ciwanî wek îde'yekê derdikeve pêş. Îde him rast him jî ciwan e. Îdeya ciwanîyê xwe di berhemên hunerî dide nişandan. Zanyarekî din ê bi navê Th. Vischer estetîkê wek “zanista ciwanê” pênase dike. Ew ciwanê jî wek “qesta xwenîşandana îdeyê”, îdrak û têgihîştina ciwanîyê ya ji hêla sehkeran ve” tesbît û terîf dike. Ahenga di navbera îde û xuyanga wê, ciwan û ciwanî ye. Bêahengî û nelihevkirina di navbera îde û xuyanga wê jî dij û dijberê ciwanê ye, kirêt e, kirêtî ye. Her wiha derketina holê ya zîşt û qebîhê ye (Bal, 2008: 83).

Di hin teorî û nêzîktayîyan de ku di derheq vê mijarê de ne, ciwanîya tebîetê jî wek ciwanîyekê tê pejirandinê. Her wiha ew teorî, hunerê wek hevkarî û hevkelijîna ciwanîya tebîetê ya objektîf û ciwanîya subjektîf a hêza xeyalê ya însan pênase dikin.

Li gor fikr û nêrîna Fîlozofê existansiyalîst Martin Heidegger ciwanî “rohnîdariya mewcûdat e, rastî ye” lê rastî, ne rastiya mantiqî ye. Rastiya reel e, tebîetê eşya bi xwe ye; yanî rastiya di nav mewcûdat e. Bi awayekî eyan û beyan, derxistina holê ya mahiyet û bunyeya eşya ya veşartî, eşkerînin û ravekirina ciwanê ye. Digel nêrîn û nêzîktayîyên ku ciwanê wek “îde” wek îdealeke metafîzîk dinirxînin, zanyarên ku ciwanê wek rewşeke psikolojîk pênase dikin û wisa dipejirînin jî hene. Li gor fikra Th. Lipps, ciwan ew e ku awa û şeklekî ku însan jê hez bigre û xwe pê azad hîs bike. Hal ew hal e zanyarên fenomenîst vê yekê napejirînin (Günay, 2010: 206).

Di fikr û nêrîna zanyarên fenomenîst de, bêyî ku bi girêdayî kesê temaşevan be, ciwan û ciwanî ew wesf û taybetî ye ku di bunyeya muwçûdê ciwan de bi cih buye. Tişteyê ciwan, gava wek ciwan neyê dîtin jî ciwan e. Ciwanî îde jî nîne. Ciwanî ne rastî ye jî. Ciwanî xwe dispêre rastîyê lê ji wê wêdetir e. Yanî ciwanî rastîyê digre nav xwe lê ne ew tenê ye. Li gor hin zanyarên qadê di dewsa ku ciwanî ji texmîneke gelemperî û kullî ya metafîzîk bê derxistin, divê ji mewcûdatê ciwan û wucûdî/ontolojiyê bê derxistin.

Sûjeya Estetîk: Di estetîkê de ew hişmendiya ku tiştê estetîk pêk tîne, sujeya estetîk e. Yanî kirdeyê hunermend û failê hişmend sûjeya estetîk e. Sujeya estetîk aliyê aktif ê têkiliya estetîk e (Duymaz, 2014: 28).

Nûnerê esasî yê sûjeya estetîk bi gelemperî însan e. Lê di fêmdariya serdema klasik de û her wiha di nêzîktayiya estetîka îdeal de ev sûjeya estetîk heta bi zatê Wacîbul Wucûd ku wek çavkaniya estetîkê tê nirxandin, yanî heta bi Xweda, xwedî wateyeke berfireh e.

Objeya Estetîk: Bi awayekî gelemperî ji tiştê xwedî wesfên estetîk re tê gotin objeya estetîk. Objeya estetîk ew tişt e ku dibe sebebê eleqedariya însan a bi ciwaniya li ser wê. Objeya estetîk bi wesfên xwe yê estetîk temsîla ciwaniyê dike û her wiha dibe mijara helwesta estetîk a însan (Cevizci: 2011: 57).

Nirxa Estetîk: Nirxa estetîk wek termekî zanista estetîkê hêmanekî ji hêmanên bingehîn ê estetîkê ye. Nirxa esasî a qada estetîkê “ciwan” e. Lewma gelek lêkolînerên qadê estetîk wek “zanista ciwaniyê” binav kirine. Nirxa estetîk ew e ku hest û hisiyata însan ji xweşikayî, lihevhatin, simetri û ahenga tiştêkî biecibîne, pê qayîl be û bêyî menfîet jê hez bike (Ziss, 1984: 168).

Kategoriyên Estetîk: Zanyarên li ser estetîkê xebitîne nirxên estetîk tesnîf kirine. Wan ev nirx di bin çendîn sernavan de kategorize kirine. Wan digel ciwaniyê ku nirxa estetîk a bingehîn e, nirxên hemnirxên ciwaniyê yên wek xweş, baş, rast, kêrhatî, letîf, berz/muteal hetta kirêtî/zişt jî di nav kategoriyên estetîk de nişan dane (Timuçin, 2009: 20).

Ceribîna Estetîk: Di jiyanê de ji bo însan hewcedariyên subjektîf û ceribînên cuda hene ku li ser rastiya objektîf teşe digrin. Helwestkariya însanê xwedî fikr a li hember objeyê, meriv dikare di bin helwestên teorîk, pratîk û estetîk de tesnîf bike. Her wiha helwest û ceribîna teorîk wek ceribîna epîstemolojîk/zanyarî yan jî mantiq, helwest û ceribîna pratîk wek ceribîna etîk/reftarî yanî exlaq û helwest û ceribîna hestpêkirin û hissî jî wek ceribîn û helwesta estetîk/ hestîyarî tê binavkirin. Ceribîna estetîk li ser bingeha hest û hîsiyatê însan derdikeve holê. Her wiha girêdayî bi helwestên însan ên ecibandî û hezzê ne (Arat, 2006: 15).

“Rast”, “Baş”, “Ciwan”: Di qada pergala fikirîna felsefî de sê dîsîplînên bingehîn hene ku girêdayî bi sê pirsên bingehîn in. Ev her sê pirsên wek “Rast, qenc û ciwan çiyê” ji bo fikirîna felsefî sê pirsên esasî ne. Sê heb dîsîplînên bingehîn ên felsefî ku di çarçoveya van her sê pirsan de teşe girtine, ev in: Epîstemolojî, Etîk û Estetîk. Epîstemolojî di çarçoveya pirsgerêka zanîne de pirsê “Rast çiyê?” esas digre. Etîk di nêrîna pirsgerêka kirînen/tevgera exlaqî de pirsê “qenc çiyê?” esas digre. Estetîk jî ku

mijara me ye, di peywenda hebûna suruştî û afirîneriya hunerî de pîrsa “ciwan çîye” esas digre (Orman, 2010: 23).

Bûn/Hebûn: Ew tiştê ku dijî neyînê ye. Di zanista felsefeyê de her tiştê ku heye bi “hebûn”ê tê binavkirin (Bayar, 2019: 81).

Bûnnasî/Ontolojî: Ew şaxa felsefeyê ye ku bi awayekî giştî li ser pîrsgirikên hebûnê divekole (Bayar, 2019: 82).

Merîfe/Epîsteme: Zanyariya rast e. Yek ji sê şaxên bingeînê ên qada lêkolîna felsefeyê ye (Bayar, 2019: 57).

Merîfenasî/Epîstemolojî: Zanista felsefeyê ya ku li ser lêkolîna zanyariyê disekine. Ji hêla zanîna û fikirîna însan ve lêkolîna zanîna “rast”ê dike (Bayar, 2019: 57).

Etîk/ Exlaq: Felsefeya exlaqê e. Yek ji sê şaxên bingeînê ên qada lêkolîna felsefeyê ye. Ji hêla reftarê însan ve bi pîrsa “tiştê qenc çîye” lêgerîna “qenc”ê dike (Bayar, 2019: 59).

BEŞA I

SEYRA TARÎXÎ YA HIZRA ESTETÎKÊ

1.1. Nêrîneke Gelemperî Li Dîroka Geşedana Estetîkê

Wek problemeke felsefî, cara pêşîn di serdema Yûnana antîk de li ser estetîkê hatiye qisekirin û bûye mijara nirxandinan. Di dîrokê de yê ku cara ewil di maneya felsefî de û bi awayekî sistematîk pîrsa “ciwan/ aesthetics/ cemaal çiyê” kiriye û ev mijar wek meseleyeke felsefî destnîşan kiriye Eflatun (Platon) e. Eflatun ji hêla gelek filozofan ve wek fîlozefê “bavê estetîkê” hatîye binavkirin. Ev nasnav wek leqeb lê hatiye dayîn. Fîkr û nêrînên wî yên di vê derheqê de di diyalogên wî yên bi navê “Phedre”, “Hippiasê Mezin”, “Ziyafet”, “Qanûn”î û di beşên II. û X. ên pirtûka wî yên bi navê “Dewlet”ê de derbas dibin. Ev mijar di van xebatên wî de bi awayekî perekende û berbelav cih digîrin (Tunalı, 2011: 25).

Li gor Eflatun “tiştên ciwan” ciwaniya xwe ji çavkaniyeke hevpar yanî ji “îdeaya ciwaniyê” werdigrin. Eflatun fîkra ciwaniyê ji têgehên din ên hisî veqetandiye û ciwanî digel hestiyariyê derxistiye ser fikirîna eqlî. Her wisa li çavkaniya ciwaniyê ya ewilîn geriyaye. Jêderka estetîkê û her wisa qereker û taybetiya ciwaniyê spartiyê çavkaniya îlahî yan jî wek îdeyeye metafîzîk/manewî destnîşan kiriye. Têkiliya wê ya bi fîkr û îdeya “rast” û “qenc”ê re nîşan daye.

Eflatun li ser meseleyên eşq û coşê (enthousiasme) û îlhamên şaîrane (poetique) hûr bûye; ciwan û ciwaniyê di nav qadên ruhê însan ê herî razdar/esrarengîz, zirav û kûr de dahûrandiye, analîz kiriye. Li gor wî ev ciwanî mutleq e û ji ser hemû tiştên ciwan re ye. Meriv ji bo gihastina wê ciwaniyê, divê derkeve ser ciwaniyên dunyewî. Însan ha bi xwe ha bi rêberiya beled û delîlekî ve (duayen/murşîd/pîr) û bi mîqyas, danasîn û ravekirina ciwaniya dunyewî, gav bi gav dikare bigihêje ciwaniya payebilind/muteal. Ciwaniya payebilind ciwaniya rast û mutleq e. Ew kesê ku bigihêje wê astê qîmeta heyatê tehm dike û jiyanê hêjayî jiyînê dibîne (Taşkent, 2013: 24).

Li gor Eflatun wek “mutleq” û “îzafî” du cure telaqiyên ciwaniyê hene. Nêrîn û telaqiya Eflatun a wek ciwaniya mutleq piştî wî, di alema mensûbê dînên semawî

yên wek Yahûdî û Xirîstîyaniyê de, xasma di alema îslamê de bi awayê “cemalullah/ ciwaniya îlahî” hatiye şîrovekirin. Wihareng meriv dikare bibêje ku Eflatun xîm û bingeha nêrîn û ramana estetîkeke îdealîst/metafizik daniye û binaxeya wê çêkiriye. Di Yûnana berê de filozofekî din ê ku bi qasî Eflatun li ser vê mijara ciwaniyê hûr buye û sere xwe pê re êşandiye tune. Lêbelê wî tiştê rast (reel) û tiştê mutleq (îdeal) zêde zêde ji hev dûr xistiye, ciwan û qenc wek hev qebûl kiriye. Her wiha armanca xweser a hunerê paşguh kiriye.

Aristo wek armanca hunerê, teoriya katarsîsê/ tasaffiyê rave dike û li gor vê nêrîna xwe şîrove anîne ziman. Li gor wî senet/huner ji bo weşîn/paqijbûn/tasaffiyeya (catarsis) ji ihtîrasan/azwerîyan re xizmet dike. Bi gotîneke din huner weşîna ji exlaqên xirab pêk tîne. Lê belê ev fikra wî ya weşînê/catarsis) paşê marûzê gelek şîroveyan buye, yanî gelek şîroveyên cihêreng lê hatine kirin. Aristo armanca rastîn a hunerê neaniye ziman. Wî huner wek alîkarê berpirsiyarî û wezîfeyên exlaqî û dînî dîtîye (Ayvazoğlu, 1989: 26).

Îfadeyên tûj ên Eflatun ên di derbarê şair, huner û hunermendan de yên di berhemên wî yên bi navê *Qanûn* û *Dewletê* de gelek balkêş in. Gilî û gotinên wî yên di vê derbarê de ji ber tesewîra wî ya exlaqî û manewî ne. Her wisa Eflatun teoriya teqlîdê/ mîmesîs (imitation) jî aniye xistiye nav estetîkê.

Îro bi piranî ciwanî û estetîk di eynî maneyê de tê bikaranîn. Lêbelê ji filozofên Yûnan ên qirnên pêşîn bigre heta filzofên serdema Navîn ên Ewropa û alema Îslamê, exlebê wan ciwanî ji felsefeya hunerê cudatir dîtine û ew wek teceliyeke îlahî ya li ser mewcudat û wek wesîleyeke wusûla wî pejirandine (Koç, 2012: 16).

Nêrînên Eflatun û peyrewên wî yên serdema dêrîn wek ekoleke estetîkê di hemû dirêjahiya serdema navîn a Xirîstîyanî û Îslamî de wek tecrûbe, terakum û muktesebateke ciwanînasiyê di qadên hizir, bawerî, sofîgerî û edebî de tesir û tezahurên wê pêk hatine.

1.1.1. Ciwan û Ciwanî di Serdema Yûnana Dêrîn de

Agahiyên herî kevn ên di derbarê mijara ciwan û ciwaniyê de yên bi nivîskî yên wek metin ji dewra antîkîteyê mane. Di serdema Yûnana antîk de îlaheyeke bi navê Afrodit heye ku temsîla ciwaniyê dike. Lêbelê di serê wê serdema tarîxî de û di dewrana ewil a felsefeya Yûnan de ciwanî wek qadeke serbixwe û xas, nehatiye dîtin

û lêkolînkirin. Zanyar û filosofên wek Eflatun, Aristo û Plotinos li ser vê babetê sekinîne û mijara estetîkê nirxandine. Ev tahlîl û lêkolîn, wek destpêk û bingeha qada estetîkê, bûne xwedî bandoreke berdewam (Dedeler, 2012: 5).

Piştî nêrîn û nirxandinên Eflatun yê di vê qadê de filozofên dewra dêrîn yê wek Aristo, Plotinos, zanyarên çerxa navîn ên Ewrûpayê yê wek Augustinus, Aziz Thomasê Aquinoyî jî li ser vê mijarê hûr bûne. Her wiha nîqaşên estetîk li gor nêrîna filozofan ya ontolojîk û metafîzîk bûne du qisim. Yek, estetîka alemê dispêre maddeye û wek wesfekî zatî dibine di maddeyê de. Di derveyî eşyayan de li çavkaniya ciwaniyê nagere û girîngiyê nade ciwaniyeke îdeal. Ya din ciwaniyê wek îdeayeke xarîcî, teceliyeke dervayî û şewq û şemaldaneke li ser objeyê dibine. Her wiha li çavkaniyeke raser û idea û membayeke mutleq digere (Bozkurt, 2016: 95)

Nêrîn û nêzîkatiyên li hizra estetîk a dewra antîk bandor li alema Ewrûpaya Xirîstîyaniyê û her wisa li alema Îslamê jî kiriye. Her wisa hûkema û ehlê îrfanê yê serdema klasik a Îslamî yê wek Farabî, Îbnî Sîna, Eynu'l-Qudatê Hemedanî, Îbnî Erebi jî li ser vê babetê sekinîne. Di derbarê çavkaniya ciwaniyê, cureyên ciwanî û eşqa li hemberî ciwaniyê de nêrînên xwe anîne ziman.

1.1.1.1.Eflatun (B.Z. 427- 347)

Meriv dikare dîroka estetîkê bibe hê beriya dewranên gelek berê. Lêbelê estetîka Eflatun di bingeha dîrokî ya estetîkê de cih digre. Lewra Eflatun/Platon teorîsyenê pêşîn ê ciwaniyê ye. Her wisa nêrîna wî ya estetîk hema bigre li fêmdariyên hemû şaxên hunerî yê hemû hunermendan ha direkt ha endirekt bandor kiriye. Li ser girîngiya rola hunerê ya di derbarê perwerdehî û erkên hemwelatîyê de disekine. Parêzvaniya hunerekî wisa dike ku di civatê de xwedî rol û bandor be û bi saya wê hunerê civat bi awayekî real û îdeal bê rêvebirin (Îlboğa, 2007: 16).

Eflatun hebûna ciwaneke xwedayî/xweberê, ciwaniyeke mutleq û nemir qebûl dike. Eşya û mewcudatê jîndar ji ber di wan de şewq û şemala “îdea”yeke ciwan, yanî tecelliyeke ciwaniya mitleq heye, lewma “ciwan” in. Armanca hunerê jî ew e ku wê ciwaniyê ji nû ve biafirîne ku bes bi awayekî xeyal meyal li alemê tê xuyan (Timuçin, 2009: 12).

Di nêrîna Eflatun de sê têgehên bingeîn hene: Ciwan, Heqîqî/rast û Qenc/Baş. Li gor wî “ciwan” ji bo ketin û gihaştina “qenc”, derwazeyek e. Yani ciwan şemîka qencê/derwazeya başê ye. Bi rêya tesewir û tefekura estetîk meriv

dikare bigihêje “qenc”ê ku distûra muteal/Bala/Pîroz û îlahî ye. “Evîn” rêber û delil e di bilindbûn û perwaziya bi bal fikr û hizra vê “ciwanê” de. Eşq û evin jî ew tişte ku hê beriya ku bê avêtin bi bal bedenekê ve, şeyda û bengiyê vegera bi hesretkêş û cezbedar e ya bi bal vê heqîqeta îdeal ve (Doğan, 1975: 67).

Bi kurtasî esl û esasê estetîka Eflatunî ew e ku heqîqeta em bi hestên xwe ve têdighên, îsandin û tecelliya dunyayeke din e. Yanî ji alema îdeayan e, ji derveyî vê alemê ye. Dunyayeke bi şewq û şemal e, bi kemal e. Her wisa tenê eşq û evin dikare me bibe wê dunyayê ku ruh ji berê de hevnasê wê ye.

1.1.1.2. Aristo (B.Z. 384- 322)

Aristo bi gelemperî li ser ciwan û hunerê nesekiniye. Di berhema xwe ya navdar a bi navê “*Poetika*”yê de hin fikr û nêrînên xwe yên di derbarê hunerê “dram”ê de tîne ziman. Her wisa behsa hin rê û rêbaz û qaîdeyên trajedîyê dike. Aristo ji teorîsyentiyê zêdetir xwedî nêrîn û nêziktayîyeke amprîk e, ceribînhez e. Metod û rêbazên ku derpêş kirine, ji şaheserên tiyatroya Yûnan bi dest xistine. Ev tesbîtên wî her çiqas jî bo tiyatroya klasîk guncav bin jî ji bo tiyatroya modern wek nêrînên teng tînin hesabandin. Aristo li ser çavkanî û armanca hunerê nesekiniye, serê xwe bi vê yekê re neêşandiye.

Şiîr wek teqlîdkarî yan jî karê teqlîdê şîrovekiriye û çavkaniya wê wek daxwaza hînbûnê destnîşan kiriye. Lê ji bo hunerê resmê dibêje ku ev huner ne ji bo nîşandana tiştên mewcût lê ji bo tiştê îdeal e. Wihareng tê xuyan ku Aristo bi vê nêrîna xwe ya di derbarê hunerê resmê /wêne/ nîgarkêşî de prensibên xwe yên di vê derbarê de hinekî nerm kiriye. Li gor wî trajedî teqlîda tiştê herî qenc/baş e. Şiîr jî ji tarîxê rasttir û maqûltir e (Ziss, 2011: 155).

Aristo nêrîn û nirxandinên Eflatun ên di derbarê estetîkê de bi şîroveyên xwe rexne kiriye û ew jî nû ve pênas kirine. Aristo nêrînên Eflatun ku estetîka îdael û reel pir jî hev dûr xistiye, nêzî hev kiriye, hetta anîye ba hev. Li hemberî hizra estetîkeke îdeal, fikra estetîkeke realist derxistiye pêş.

1.1.1.3. Plotinos (P.Z. 205-270)

Piştî van her du filozofên Yûnan yên ku li ser babatên ciwan û ciwaniyê sekinîne Plotinos û Saint Augustin in. Ji van herdu Filozofan Plotinos xwedî berhemeke girîng e ku tê de behsa ciwanê dike. Lewra di vê berhemê de fikr û

nêrînên kûr û orjînal hene. Plotinos cureyên ciwaniyê û dereceyên wê ji hev cuda kirine. Ciwaniya exlaqî ji ser ciwaniya sehkerî/hestiyarî (sensible) re girtiye.

Huner wek teqlîda tebîetê wesifandiye. Armanca hunerê wek teqlîda fikr û fealiyetên îlahî destnîşan kiriye. Bi şopandina fikr û nêrînên wî mekteba Îskenderiyeyê ber bi mîstîsîzmê çûye. Berê her tiştî bi awayekî mufrîtane/zêdegavî vegerandine tewhîd û yekbûnê û her wiha qedr û pryrewên wî li ser şopa wî qîmeta waqîyê (realîte) kêr kirine û heta di dawî de hema bêje nehîştine. Ciwaniya rastîn a li alemê û di tebîet û senetê de wek hin sî û xeyalên vala û bêwate û derew hesibandine (Kılıç, 2009: 39).

Li gor Plotinos esl û esasê ciwaniya maddî her ji ciwaniya ruhî derdikeve û îfadeya ciwaniya ruhî ye. Ciwanî serfirazî û serkeftina ruh e li hemberî maddeyê. Bes ruh ciwan e. Eşq û evîna ciwaniyê eşqa ruh a bi xwe ye. Yanî vegera ruh a bi bal xwe ye. Ji bo hîskirin û pêhisîna ciwaniyê, divê ruh xwe ciwan bike.

1.1.2. Ciwan û Ciwanî di Serdema Navîn a Alema Rojava de

1.1.2.1. Augustinus (P.Z. 354-430)

Zanyarê ji serdema navîn a Ewrûpa Saint-Augustin her çiqas di derbarê ciwan û ciwaniyê de berhemek nivîsîbe jî, ev behrem winda buye. Fikr û nêrînên wî di berhemeke ku bi navê “Traite sur la Musique” li Fransîzî hatiye wergerandin de cih digrin. Di berhema xwe ya bi navê Di derbarê Payebilind /Muteal (Longin de, Du Sublime) de qesta şîroveya belaxatê (retorîk) dike (Hançerlioğlu, 2011: 261).

Li gor wî karakter û wesfê eslî yê ciwaniyê yekbûn û lihevhatin/tenasuba beşan e. Ew vî prensêbê tetbîqê mûsîkiyê dike. Ew hizra estetîk a serdema dêrîn bi nêrîna xwe ya dînî ve mezc kiriye. Li qada Ewrûpayê wek ekoleke ciwannasiyê hatiye şopandin.

1.1.2.2. Aziz Thomasê Aquînoyî (P.Z. 1225-1274)

Aziz Thomasê Aquînoyî zanyarekî bi bandor e di nêrîna estetîk a Xiristiyanîya di sedsala XIII. de. Aquino fikr û nêrînên xwe di berhema xwe ya bi navê “Summa Theologica” de aniye ziman. Ev zanyarê han, fêmdariyeke ciwaniya objektîf diparêze. Aquino jî wek wan filozofên din ên serdema navîn ên Ewrûpa ku

girêdayî felsefeya skolastîk in, ciwaniyê wek teceliyeke li hiş difikire. (Yetkin, 2007: 35).

Li gor wî, sê şertên ciwaniyê hene. tenasub, mukemmelî û têkûziya rewneq. Têkûzî, nîzam û întizamek li tiştêkî yan li cihekî tunebe, ciwanî pêk nayê. Di estetîka Aquino de Xweda wek çavkaniya ciwaniyê ye. Her wiha Xweda bi ronahiyê re hevdeng tê mulehezekirin.

1.1.3. Ciwan û Ciwanî di Serdema Modern a Rojavayê de

Fîlozofên sedsala XVII. bi awayekî jidil bi mijara ciwan û hunerê re mijûl bûn û li ser sekinîne. Bacon hunerên ciwan daxîlî nav wan zanstan kiriye ku armanc û xayeya wan listik û bezm (agrement) e. Di tesnîfata wî ya di derbarê zanistan de mîmarî (architecture) ji matamatîk û mekanîkê veneqetiyaye. Şiîr jî li gor wî yek ji sê zanyariyên beşerî ye û di nav sê fakuleyan/qismê esasî de muqabilî hêza xeyalê ye. Bacon wê wek dîroka haz û zewqê pênase dike. Lê di dawî de wê wek meçhûlekê diwesifîne (Işık, 2013: 27).

Descartes eleqe bi ciwan û hunerê nake. Sê zanyarên ku ji ekola wî yên bi navê Crouzaz, P. Andre, P. J. Bartz di kitêba ku bi hev re nivîsîne de ya bi navê “Traite sur le Beau” girêdayî bi kevneşopiya/tradisyona fikrî ya Eflatun û Saint-Augustin in. Mekteba Leibniz û Wolf her çiqas şerefa veqetandina estetîkê ya ji zanistên felsefî bi dest xistibe jî, wan ev zanist ava nekirine, lê navê vê zanistê danîne. Telebeyê Wolf ê bi navê Baumgarten, fikrê zanista “ciwanê” aniye rojevê û her wiha navê “estetîk”ê lê kiriye. Vî zanyarî ciwanê wek îdrak û hesteke şêlû (confus) hesibandîye. Li gor wî zelalî û eyanî (clarte) tenê di nav fikrên mantiqî de heye. Baumgarten estetîk wek zanistêke serbixwe qebûl kiriye û her wiha ew wek peykeke tarî ya mantiqê dîtiye (Acar, 2012: 21).

Paşê piştî wextan li Almanyayê Mendelssohn, Sulzer, Eberbard ev nêrîn berdewam kirine û tê de hin guherîn pêk anîne. Van zanyaran, ciwan û ciwanî wek fikreke razber/mucerrred hesibandine. Her wiha ew bi têgeha “qenc” re “hevrenge” dîtine. Li Îngiltereyê sehkerparêz (sansualîst) ên sedsala XVIII. di derbarê teorîya ciwanê de kitêbên rohnîker nivîsîn: Shaftesbury, Hogard, Hutcheson, Burke ji van zanyaran in. Ji vanan Shaftesbury û Hogard ciwan û qenc hevrenge hesibandine û ew wek “yekîtiya di nav cihêrengiyê (variete) de” formule kirine. Hutcheson her wiha

îddia kiriye ku sehkereke însan a xasê bi îdraka ciwanê heye û xizmeta wê de ye (Yetkin, 2007: 71)

Van filozofan li ser cihêrengiyê li hev kirine, di derbarê cihêrengiya yek awatîyê (uniformite combinee) de pratîkeke orijinal vê formulê jî pêk anîne. Burke sehkerparêziyê li vê mijarê tetbîq kiriye û fikrê “payebilindî/muteal” bi fikrê tirsnaq/xof/saw (terrible) ve mezc kiriye û kelijandiye. Li gor wî çavkaniya ciwaniyê sehker e ku di jêdera wê de saîqe/meyelana perhîz/xweparastin (conservation) û sosyalbûnê (sociabilite) heye (Burke, 2008: 97).

Li Fransayê gelek zanyarên felsefeyê û bi gelemperî ansiklopedîstan kêr zêde eynî fikir derpêş kirine û girîngî dane ser armancên hunerê yên exlaqî. Hin edebiyatnasan piyesên xwe li gor vê nêrînê nivîsîne. Hin zanyaran jî Aristo bi awayekî naqis şîrove kirine û di ciwanê de prensîba teqlîda tebîetê parastine. Sedasala XVIII. li Almanyayê ji bo estetîkê dewr û dewraneke nû tê hesibandin. Di vê dewranê de mijarên estetîk bi awayekî zanyarî û bi lêkolînên ciddî tîrîn şîrovekirin, li ser ciwaniyê şerh û beyanên berfireh tîrîn kirin.

Winckelmann teoriyên teng û kewneşop ên dêrîndem (antikite) qedandin û ji wan derbas bû û îdeala rastîn a hunera Yûnan têgihîşt. Vî zanyarî nêrînên teorîk şemirand û hunerên plastîk şîrove kir. Her wiha rexne li wateya ciwanê anî. Li gor wî fikra ciwan li ba Xweda ye û ji wî tê hîskirin û li eşya direşe û parve dibe. Yanî ciwan ew e ku eyanbûn û tecelliya Xweda ya li eşya ye. Wihareng wî hêla huner a îlahî destnîşan kir. Hemçaxê wî ew fêrî nekirin. Lê ew zanyarên piştî ku li ser vê meseleyê hûr bûn, bi awayekî berfireh ji fikr û nêrînên wî sûd wergirtin. Hinek ji wan jî tezên bi vî rengî parastin ku wek armanc ji bo hunera modern, parastina teqlîda hunera antîk kirin (Doğan, 1975: 212).

Zanyarên ku piştî van navan hatin, mijara qada estetîk di hunerê de, xasma di hunerên dîtbarî de ceribandin. Her wiha tixûbê hêkel/peyker û şîrê xêz kirin. Lêbelê zêdetir li ser şîrê sekinîn. Di hunerê de aliyê hunerê takekesî û zindî, yanî di hunerê de parastina ya karakterîstîk kirin. Zêde cih dan waqîê (reel)ê. Bi gelemperî girîngî dan ser “poetîka” ya Aristo û ew di nêzîktaya xwe ya hunerî de şopandin. Lê paşê bi saya rexneyên ku lê kirin, teorîyên xwe yên ciyawaz ên pratîk ên hunerî derxistin holê.

Navê avakarê felsefeya Alman Immanuel Kant, (1724 –1804) di vê mijarê de girîng e. Lewra destnîşan kiriye ku qabiliyeta hukumdayîna/ daraza “ciwan”

cîhanşimûl e. Yanî ya cîhanşimûl ew îmkân e ku meriv bikaribe ji tiştêkî re bibêje “ciwan”. Lê ji bo hukumdayînê divê objeyeke wî hukmî hebe. Ev gotin, analîza Kant a di derbarê pêvajoya pêkhatina zanînê tîne ziman. Nexwe bihevrebûna hişyarkeriya objeyê û hukmê estetîk zerûrî ye. Yanî ji bo hukmê estetîkê, hebûna objeya wê, mecbûriyetî ye. Ger ne awha buya, Kant dê di problema hukmê estetîk de biketa metafîzîkê (Towensend, 2002: 39).

Analîzeke bi awayê ku pejirandina hebûna kategoriyeke ciwaniyê ya wek a priori (rewşa beriya ceribînê) û ciwanbûna wê objeya ku ew kategori wê digre nav xwe, xwendinek e ku Kant wê wek xwendineke metafîzîkî dibîne. Hal ew hal e Kant hukm/darazên bêsuje wek metafîzîkeke vala bi nav dike. Ji ber vê qasê hukumdayîna bi ciwaniyê wek zerûriyeteke a priori di her kesî de heye. Di heman demê de hebûna objeyeke estetîk zerûrî ye ku vî hukmî îfade bike û bîne hereketê, yanî bide kirinê. Ger hukumdayîna di derheq ciwaniyê de bi awayekî şematîze bê nîşandan, dê di destpêkê de subjektîvîteya hukumdayîna estetîk were serî.

Bûyera estetîk, ji haz û zewq girtina ji objeya estetîk, ji haz û zewq girtinê heta ber bi ecibandinê/qayîlbûn/begemgirinê, ji ecibandinê heta bal bi hukumdayîna estetîk/ daraza estetîk, rê û pêvajoyekê dişopîne. Ev pêvajo lîstikeke azadane ye di navbera melekeya îdrak û hêza xeyalê de. Hukumdayîna ciwan jî di encama vê lîstîkê de hukumdayîneke estetîk e. Îcar aniha em dê piştî van tespîtên bingeîn, bikaribin di çar gavên kategorîk de li pêvajoya pêkhatina hukumdayîna estetîk binhêrin.

Fîlozofê ku cara pêşîn têgeha “estetîk” wek mijara dîsîplînekê aniye maderê, yanî xistiye rojevê û her wiha tixûbên wê destnîşan kiriye Kant e. Fîlozof Kant peyva “estetîk” wek têgeheke gelemper ji bo lêkolîna “hestiyariyê/bihîstinê(sensibilite)” û “hest/sehker(sens)” di berhema xwe ya bi navê Rexneya Eqlê Xwerû (Critique de la Raison Pure) de emilandiye. Paşê jî zanyarê heman qadê yê Alman, Alexander G. Baumgarten (1714-1762) têgeha estetîk bikaraniye û ew daxilî qada zanistî ya sedema modern kiriye. Wihareng Baumgarten ev têgeh wek navê zanisteke taybet kiriye malê felsefeyê ku lêkolîna mijarên huner û ciwanê dike. Di roja me ya îroyîn de jî ev peyv maneya xwe ya wek “zanista ciwaniyê” yan jî “felsefeya hunerên ciwan” berdewam dike, diparêze (Acar, 2012: 21)

Estetîk heta demekê di nav zanistên felsefî de wek cureyekî zanînê beşeke girêdayî bi felsefeyê berdewam kiriye. Paşê jî xweseriya xwe bidest xistiye lê di bin

desthilatdarî û tehekuma zanistên sosyolojî û psîkolojiyê de maye. Yûnanên berê estetîk wek zanistêke serbixwe nefikirîne. Di eserên wan de têgeha “ciwan” di nav qadên exlaq/etîk û polîtîkayê de bi awayekî muxtelîf/têkel hatiye îfadekirin.

1.1.4. Ciwan û Ciwanî di Serdema Klasîk a Îslamî de

Estetîk di çerxa navîn a Îslamî de bi awayekî gelemperî di perspektîfa du mektebên hizrî de hatiye nirxandin. Evana yeke wî ekola hîkemî ya felsefî ku wek Meşşayî, Îşraqî, Dehrî, Tabîî û hwd. dihatin binavkirin ku digel hizra Îslamî, ji felsefe, fikr û baweriyên antîk û Îranî û Hind jî tesir wergirtibûn. Nûnerên vê ekolê yên wek Îbnî Sîna, Farabî, Îbnî Ruşd, Suhrewerdî û hwd. derdiketin pêş. Ekola duduyan ekola estetîka îrfanî bû ku bi piranî rê û rêbazên sofîgeriyê dişopandin. Nûnerên wê yên pêştatir, navên wek Muhyeddînê Îbnî Erebi, Hellacê Mensûr, Aynul Qudatul Hemedanî û hwd. nin (Seyqelanî, 1492H: 28).

Aniha em dê bi awayekî kurte û wek nimûne, di derbarê van her du ekol û temsîlkarên wan de, yanî di derbarê ekol û kesayetiyên estetîka hîkemî û ciwannasiya îrfanî de agahî bidin.

1.1.4.1 Estetîka Hikemî û Kesayet û Ekolên Wê

Ekolên hîkemî yên Îslamî ku di çerxa navîn de derketine holê û bandor li hûkema, zanyar, alim, edîb û şairan kirine gelek in. Ekolên wek meşşayî, îşraqî, dehriyye, tabîyye û hwd. hene. Gelek jî kesayetiyên wan ên nûner hene. Yên wek Îbnî Sîna, Farabî, Îbnî Ruşd, îbnî Safa, Suhrewerdî û hwd. Em dê ji van ekol û navan li ser çend heban wek nimûne bisekinin.

1.1.4.1.1 Îbnî Sîna (980-1037)

Felsefeya klasîk a Îslamî, digel nas û esasên Îslamî û referansên xwe yên otantîk, nêrînên Aristoteles û Platonistên Nu jî yên muwafîqî bunyeya xwe girtine nav xwe. Îbnî Sîna di nav vê mîras û paşxaneyê zanyarî de xwedî rol û bandorek e girîng e. Îbnî Sîna digel zanyarekî din ê alema Îslamî yê bi navê Farabî, bîngeh û prensîbên vê ekola felsefî di berhemên xwe de destnîşan kirine. Meriv dikare bibêje felsefeya Îslamî di dewra Sîna de pêşketîneke rewneqdar bi dest xistiye (Cihan, 2009: 34).

Di felsefeya Îbnî Sîna de têgehên bingehîn ên wek “Wacîb, Wacîbul Wucûd” û “îmkan” di helbestên Mela de jî cihekî girîng digrin. Îbnî Sîna wek zanyarekî ekola meşşayî zêde rol daye aqil û redda tiştên der-aqil kiriye. Lê Mela her çiqas fikr û nêrînên wî yên di vî warî de nepejirandibin jî, navê wî wek pêşeng û pîrê felsefeyê di helbestên xwe de zikir kiriye (Doru, 2016. 36). Wek mînak:

Ez dibêim Îsa ye ew ya Ebû Elî Sîna ye ew

Lew bi remz û îşwe yan pur mucîzat û şêwe ye (Cizîrî, 2013: 105)

Wek rastiyeke dîrokî tê xuyan ku Cizîrî wek şair û edebiyatnasekî serdema navîn di nav konteksa dem û dewrana xwe de di serî de ji baweriya dînî, hizra hîkemî, tesewira sofigerî û nêrîna edebî ya serdema xwe tesir girtiye. Her wiha li ser wê paşxaneyê gihîştiye. Ew hêman di kesayetîya xwe ya edebî de mezc kirine û di ronahiya nêrîna xwe ya hunerî de berhemne resen hildane qelemê.

1.1.4.1.2. Mekteba Meşşayî

Mekteba meşşayî ew êkol e ku di nav felsefeya îslamî de bi mêldariya rasyonalist pergala xwe ya hizrî ava kiriye. Di Taybetîya vê êkolê ya here girîng ew e ku li wucûdê di pencereya aqil û fêkirîna de mêze dîkin. His, heds û hestiyariyê wek metodeke epîstemolojîk a keşfa heqîqetê nabînin. Di vê babetê de emelî pê nakin û qîmet nadin. Eql û metodên analîtîk ji bo wan esas e. Her wiha bi vê pîvanê dinirxînin (Ülgen, 1998.156).

Bingeha vê nêrînê ji Aristoteles û hizr û ramanên zanyar û filozofên ên klasîk ên îslamî yên wek Îbnî Sîna, Îbnî Ruşd û Farabî tê. Nêrîna felsefî ya van zanyaran, bi giranî zanyarên xelef jî di bin bandora xwe de hiştine.

1.1.4.1.1. Mekteba Îşraqî

Şîhabuddîn Suhrewerdî felsefeya Îbnî Sîna zêde dogmatîk û analîtîk dîtiye. Wihareng ew ekola felsefî rexne kiriye û ekoleke mektebeke alternatîf damezrandiye. Felsefeya wî ji aliyekî de wek ekoleke hikmeta rojhilat e. Ev êkol, digel hêmanên felsefî yên Hind, Îran, Misir, Yûnan, ûnsûrên Îslamî jî di xwe de dihevine. Peyrewên vê êkolê di wê îdiayê de ne ku ne zanyariya mantiqî, ceribîna mîstîk meriv digihîne

rastî û heqîqetê. Yanî his, heds û hestiyariyê wek metodeke epîstemolojîk a keşfa heqîqetê dibînin (Yıldırım, 2002: 34).

Ev fikr û nêrîna felsefî di wê îddayê de ye ku ekola meşşayî xwedî kêmasî ye, naqis e. Suhrewerdî qet tu car redda epistemolojiya meşşayî nekiriye. Lêbelê îddia kiriye ku ev ekola navborî têrê nake ku bersivê bide pirsên ontolojîk û warên dîtir ên felsefî.

1.1.5.1. Estetîka Îrfanî û Kesayat û Ekolên Wê

Di dîroka fikrîyata Îslamî de dab û nêrîta îrfanê bingeheke teorik û qadeke termînolojîk û têgehî ya bi xasê xwe pêk aniye. Ev qada han bi hêlekî ve bi tesîra ekola wehdetê wucûdê û ji hêleke din ve jî bi tekildariya felsefeya îşrâqî teşe girtiye (Gündüzöz, 2018: 34).

Ciwan û ciwanî di civatên alema Îslamî ya çerxa navîn de bi awayekî yekpare nehatiye nirxandin û lêkolînkirin. Nêrîn û nêzîktayiyên di vê derbarê de li gor hîzr û fêmdariya mekteb û ekolên muxtelîf, rengên cuda û ciyawaz nîşan didan. Her wisa li gor nêrîn û mesleg û mezhebên îlmî, hîkemî û sofîgerî yên kesayetan rewşeke guherbar rave kirine. Lewma bi gelemperî du ekolên sereke û zanyarên peyrewên van ekolan di alema Îslamî ya wî çaxî de derdikevin pêş (Coşkun, 2010: 561).

Yek ekola estetîk a hîkemî bû ku me li jor behs kir. Ya duduyan jî ekola estetîka îrfanî bû ku li gor rê û rêbazên sofîgeriyê ciwan û ciwanî nirxandine û nêzîk bûnê. Ev ekol wek metoda lêgerîna heqîqetê û rastiya ciwaniyê, ji eql zêdetir qelb, hest û eşqê derdixe pêş. Her wiha peyrewên vê ekolê di vî warî de roleke bûnwerî yanî ontolojîk û epistemolojîk didin eşqê. Meriv dikare cihê ciwannasiya îrfanî, yanî estetîka îrfanî di navbera felsefeya ciwanî û hunerê de destnîşan bike. Lewra ev cure hîzr û nêrîna ciwanînasî, xwedî babeteke xas e. Lê bi her du qadan re xalên wê yên hevpar hene (Şêx Husên, 2017: 31).

Estetîka Melayê Cizîrî wek şairekî serdema navîn ku di nav çand û bawerîya klasîk de gihîştîye, meriv dikare bêhtir di nav ekola estetîka îrfanî de muleheze bike. Her çend Mela jî ekolên din ên hîkemî jî behremed bûye lê mîna piraniya şairên serdemê rengê estetîka îrfanî di helbestên wî de derdikevin pêş.

1.1.5.2.1. Îbnî Erebi (1165-1240)

Îbnî Erebi di rêza pêşîn a wan zanyar û mutesewufan de tê ku di mijara estetîk û nêrîna ciwanî de bandoreke domdar li şair, sofî û arifên serdema klasîk a Îslamî

kiriye. Fikr û nêrîna wî ya estetîk li ser hizra “wehdeta wucûd” ê ava buye (Bozkurt, 2016: 47).

Mela di beyteke helbesteke xwe da di meqamê fexriye û îftixarê de bi awayê telmîheke ser girtî, îşaret dike ku ew bi xwe şopînerekî sadîq û pîspor yê Îbnî Erebi ye. Ji hêla yê eleqemend ve tê zanîn ku Erebi di alema Îslamê de û her wiha di nav ehlê tesewufê de wek “Şêxê Ekber” yanî “Pîrê herî Mezin” tê binav kirin. Ev yek rastiyeke eyan û eşkere ye ku di fikra Mela ya estetîk de û her wiha di nêrîna gelek edîb û sofî û hukemayên di Alema Îslamê de bandora Erebi heye (Palacios, 1979: 274).

Lewma Mela bi xwe jî behsa vê yekê dike. Mela di vê beyta xwe de bi genaeta me îşaretî bi vî leqebê wî yê bi terkîba “Şêx” dike û dibêje ku:

Di îşqê Şêxê Sanî me bi dil behra meanî me

Lî zî hîcrîn we zî qelbîn şifaûn fî îşaratî (Cizîrî, 2013: r. 144).

Tê xuyan ku Îbnî Erebi digel gelek hêlên ciwaniyê, xasma di hêlên wek cureyên eşq û ciwaniyê, sirra eqşê û hwd. de bandor li ser Cizîrî jî kiriye. Lewma Mela di helbestên xwe de behsa “şextiya wî ya di eşqê” de dike.

Xeynî Îbnî Erebi kesayetên nûner ên hizra estîka îrfanî yê wek Beyazîdê Bistamî, Aynul Qudatul Hemedanî, Hellacê Mansûr, Ferîdudîn Ettar, Xezzalî, Mewlana, Merûfê Kerxî, û hwd. jî hene.

1.1.5.2.2. Mekteba Wehdet’ul-Wucûdê

Di nav çavkaniyên felsefeya tesewufê ya Îslamî de, jêder û nasên herî sereke bêguman Quran û hedîsên pêxember in. Her wiha Quran û hedîs referansên bingehîn ên dînê Îslamê ne. Di Quran û hedîsê de peyva “eşq”ê derbas nabe. Lêbelê digel vê yekê maneya ku eşq îfade dike yan jî ew maneyên ku mutesewuf qesta wan dikin jî di van her du çavkaniyên sereke de hene. Di Quranê de behsa têkilî û muhebbeta di navbera Xweda û ebdan de heye. (Sûretê Beqere: 2/65; Yûsuf: 12/20)

Di dîroka fikriyata Îslamî de têkiliya di navbera Xweda û ebd de, nêzîktayiyên hişk û jihevduker /tebîdkar jî dem bi dem derketine holê. Wihareng di vî warî de mesafeyên dûr û dirêj wek asteng derketine pêş ebdê. Xasma filozofên Îslamî yê wek Îbnî Sîna ku şîroveyên wan ên bo Xweda li ser esasê “tenzîh”ê, her

wiha nêrînên wan ên ku hebûnê wek mumkun û wacib dibînin, buye sebebê vê yekê. Hin nêrînên ku Xweda û însan yek dibînin ên wek “nêrîna îttihad”ê û yên wek “Hulûl” ku îdiaya ketina Xweda nav qelbê însan dîkin jî hene. Her wiha nêrîna “Îşraqî” ku têkiliya Xweda û hebûnê wek roj û tavê zerûrî û bi hev ve şîrove dîkin jî hene.

Di ekola tesewufî ya Îslamî de nêrîna “Wehdeta Wucûdê” gelek berbelav e û pir hatiye şopandin. Wesf û ciyawziya sereke ya vê fikr û nêrînê ew e ku mesafeya di navbera însan û Xweda de rakiriye. Her wiha têkiliya di navbera ebd û Xweda de gerandiye têkiliyeke estetîk a aşîq û maşûqiyê (Şêx Husên, 2017: 45).

Di dîroka felsefeya Îslamî de, ew teqşîma ku ji hêla Farabî û Îbnî Sîna ve wek Wacîbu’l-Wucûd û mumkînu’l-wucûd ku ji bo şerh û şîroveya wucûdê derpêş kirin, ji aliyê piraniya ehlê tesewufê ve zef nehate pejirandin. Lewra li gor sofîyan alem yek e û ew alema ku ji hêla filozofan ve wek mumkun tê wesifandin, ne li derveyî wucûda Xweda ye. Bi vê nêrîna xwe mutesewuf ne ku înkara alema hestan dîkin. Lê li gor wan wucûd ne navekî îştiraqî yê wek mewcûdê ye. Lewma bi wucûdê qesta yekûnekê tê kirin. Xeynî vê ekola wehdetul wucûdê, êkolên cuda jî hene.

Ew kesret û pirrengî ya ku li alemê tê xuyan jî nayê wê maneyê ku wucûd tiştêkî perçebûn û jihevqetîna wî mumkun e. Lewra kesret û pirhejmarî, nisbî û îzafî ye, ne heqîqî ye. Alem wek neynikekê ye ku Xweda dixwaze ku teceliya wan nav û sîfetên xwe tê de bibîne û temaşe bike.

Fikra wehdetê wucûd, her çiqas nêzî fikra “hulûl” û “îttihad”ê be jî di navbera wan de cudahiyên girîng hene. Lewra xulûl ew fikr e ku zatê îlahî di nav zatê insanî de qebûl dike. Ev nêrîn xasma di nav baweriya Xristiyanî de her wekî ku Xweda ketiye hundurê Hz. Îsa û buye însan. Yan jî li gor hin mezhebên Xulata Şîa ku Xweda xulûlî zatê Hz. Elî kiriye û hwd. Heçî Îttihad e, ew nêrîna ku tevlêbûna Xaliq a bi mexlûq diparêze. Wihareng ev fikir, her tiştî wek yek hebûnekê dibîne (Arabî, 2017: 85).

Hal ew hal e ku tu têkilya fikra wehdetê wucûdê bi xulûl û îttihadê tune. Lewra gava wucûd ku yek be, ew çax ne mumkun e ku behsa duxûl û tevlêbûnê çêbe. Hal ew hal e ku di fikra duxûl û îttihadê de jî du mewcûd hene.

1.2.Nêrîneke Gelemperî li Problema Ciwaniyê

Peyva “estetîk”ê bi formên xwe yên hevwater/sînonîm ên wek “ciwan”, “delal”, “sipehî”, “xweşik”, “cindî”, “husn” û “cemal” hwd. di nav heyata me ya rojane de pir berbelav û muste’mel e. Her wisa “estetîk” wek têgeheke ilmî qadeke taybet a zanistî ya ilmê felsefeyê ye jî (Tunalı, 2011a: 31). Peyva “estetîk” ji kelîmeyên bi zimanê Yûnanî yên wek “aîsthesîs” yan jî “aîsthanesthaî” tê û tê maneya “bihîstin”, “bihîstok”, “sehek”, “seh”, “hes” “têgihan/îdrak”, “hest”, “dilîn” û hwd. Lewm ji maneya van peyvan derdikeve holê “estetîk” ew zanist e ku ji zanînen bi rêya hestiyarî û hissiyatê pêk tê (Erkal, 2009: 2).

Ew filozofê ku “Estetîkê” bêyî ji peywenda wê ya epistemolojîk biqetîne û di maneya “zanîna hestiyarîyê” de bi kar anîye zanyarê sedsala XVIIIan ê Alman Alexander G.Baumgarten (1714-1762) e. Baumgarten mijara “estetîkê” wek qadeke taybet a lêkolînê destnîşan kir û bi kitêba xwe ya bi navê “Aesthe-tica” ve estetîk wek şaxeke zanistî gerande babeteke ji babetên lêkolînê. Wî, peyva estetîkê xasma di qadên zanistên hunerê de di maneya “îdrak û hestpêkirina ciwanê ya bi rêya hest û hissiyatê” de emiland. Bi gotîneke din, estetîk geriya qadeke ji wê qadê ku kemilîna hestiyarî yanî gihaştina hîssî û her wisa ciwaniyê tetqîq bike, lêbikole. Di vê babetê de zanista estetîkê wek zanîna hestiyarî, ne ku xîtabî hemû qada hestiyariyê dike, bes aresteyî fenomena ciwanê, zanîna têkildarê bi ciwanê bû. Wihareng estetîk geriya qadeke felsefeyê ku wek bin beşekê û “lêkolîna ciwanê” dike (Bozkurt, 2016: 9).

Li gor Baumgarten di nav felsefeyê de sê zanistên normatîf hene. Ji van zanistan yek: Mentiq e ku li ser bingeha rastiye avakirin. Ya duduyan: Etîk/exlaq e ku liser esasê qencî/başıyê derketiye holê. Ya sisêyan: Estetîk e ku li ser xîmê ciwan û ciwaniyê saz buye. Ji ber vê qasê mijara estetîkê ne hemû qada berfireh a hestiyariyê ye. Xasma li ser qada têkildarê bi ciwaniyê û têgeha ciwan disekine. Lewma demekê ji bo navê zanista estetîkê navên wek “Zanista Ciwaniyê”, “Felsefeya Ciwaniyê” jî hatibûn pêşniyazkirin ji hêla zanyarên vê qadê yên Alman yên wek J.G. Herder û G.W.F. Hegel (Orman, 2010: 23).

Li gor hin filozofên ku di fikra lêkolîna li ser fenomena ciwaniyê ya estetîkê da ne, esas ji ber van sedemên navborî têgeha “estetîk”ê ji bo vê qada lêkolînê guncav e. Madem ya ku mewzûbehs lêkolîna “ciwan”ê ye, ew çax diviyabû ku navê vê disîplînê jî li gor vê rewşê wek “zanista ciwaniyê” yan jî wek “teoriya ciwaniyê” bihata binavkirin. Jixwe filozofê Alman Herder ji ber vê qasê ji bo navê vê zanistê

têgeha “calligone” ku ji peyva “kallos”a ku di Yûnanî de tê maneya “ciwaniyê” hatiye dariştin, bikaranîbû. Fîlozofê Alman ê sed sala XIXan Hegel jî ev zanista han wek felsefeya hunerê ciwan didît û bi têgeha “kalliologie” bi nav dikir (Husên, 2008: 17).

Ev destnîşanên ku me ji dîroka felsefeyê neqil kirin dibe ku qada zanista estetîkê di dema îroyîn de wek ku tenê bi “ciwanê” ve mehdûd û tixûbkirî be rave bike. Lê bila bê zanîn ku mesele ne wiha ye, yanî ev texmîn ne rast e. Zanista estetîkê tenê ne ciwaniyê, digel vê yeke gelek têgeh û nirxên din jî lêkolîn dike. Mesela wek mînakeke nêzî dema me ya îroyîn em dikarin lîsteya Frank Sibley (1959) a “taybetiyên estetîkê” nîşan bidin û parve bikin. Di vê lîsteya han de taybetiyên wek “bi aheng/mutedil/îstiqamet/qiwan”, “sakîn/aram”, “qewî/xurt/hêzdar”, “narîn”, hestiyar/hîssî”, “zarîf”, “bi heybet/muhteşem” hene. Term bi gelemperî di qadên cihêreng û konteksên cuda de tên bikaranîn. Ji vê yeke jî tê fêmkirin ku -qet nebe li gor mutefekkîr û zanyarên wek Sibley - gelek termên xwedî buûd û rehendên estetîk hene ku em wan di heyata xwe ya rojane de diemilînin û xwe pê îfade dikin (Günay, 2010: 206).

Fîlozofê Alman Kant çawa ku li ser “ciwan”ê xebitiye, “muteal/payebilind” jî tevî qada estetîkê kiriye. Schiller, “xweş”, “cazîb/balkêş”, “esîl/xwedî esalet”, “hestiyar/hîssî” û “saf/paqîş//naîf” jî wek nirxên estetîk dinirxîne û destnîşan dike. Telebeyê Hegelê Alman Rosenkranz jî “ziştî/qebîh/xirab”ê jî di nav qada estetîk de dibîne. Her wisa hin zanyaran digel van hest û terman tiştê “trajîk”, “komîk” û “mubhem” ê jî di rêza “nirxa estetîk” de hesibandine. Ji van hemû agahiyan tê xuyan ku qada estetîkê tenê bi “ciwan” û “tiştê ciwan” re nayê sînorkirin. Ev tengkirina qadê yan jî nêzîktayîyeke bi vî rengî wek mudaxeleyeke niheq û ne li cih tê xuyanê. Ji xwe ev hemû kategoriyên dervayî “ciwan”ê yê navborî her wekî kategoriya “ciwaniyê” xwe di huneran de didine der/ nîşan (Bal, 2008: 83).

Li gor nêrînên zanyarên wek Charles Lalo (1927) huner/senet wek qada tetbîqata estetîkê ye û divê ku wisa bê zanîn. Obje û melzemeyê rastîn ê estetîkê huner e. Bi gotîneke din kategoriyên estetîk xasma dê xwe di huner de yan jî di qada hunerî de nîşan bidin û bi awayekî şênber rava bikin û bidin hîskirin. Estetîk xwe bêtê qadeke wek hunerê nikare îfade bike. Ew çax estetîk tenê wek mijar û qadeke mucerred yanî razber dimîne. Gava em behsa ciwaniyê dikin, li ser difikirin û di derheqê de hukmekî didin, çar û neçar bi wasîteya hunerekî ve têdighêjin û

dinirxînin. Lewma li gor hin ciwannasan estetîk di çarçoveya vê maneya xwe de divê wek felsefeya hunerê bê nirxandin û wisa bê pejirandin (Li gor ragihandina Hünler, 2011: 329).

Pirsên di derbarê nirxa estetîk de ku heta niha bêcewab mane her hebûn. Yên wek gelo ciwanî, ha ya li tebîetê ha ya di huner de, xwedî kîjan kriter û pîvanan e? “Gelo têgeheke ciwaniyê ya objektîf a ku li gor her kesî carî û muteber heye?” Yan jî ciwanî gelo subjektîf e? Tiştek ji ber ku ciwan e em jê re dibêjin “ciwan” yan jî ew tiştê ku em jê re dibêjin “ciwan” dibe/digere “ciwan”? Bersiva van pirsan di encama tecrubekariya têkiliya însan a bi objeyê re zelal dibin. Ev jî bi saya nêzîkîtiya însan a teorîk, pratîk û estetîk a li eşya/tiştan derdikeve holê.

Me gotibû di nav felsefeyê de sê qadên normatîf hene ku têkiliya însan a bi hebûnê re dinirxînin û lêkolîn dikin: Mentiq, etîk û estetîk. Ev qadên felsefî her wekî têkiliya însan a bi objeyê şîrove dikin. Yek qada epistemolojîk e ku çavkaniya fêmkirin û zanîna însan a ji objeyê yanî kaînate ye. Ev aliyê însan têkildarî bi hiş û ramanê wî ye. Qada duduyan têkildarê bi kirin û emelê wî ye ku aliyê însan ê etîk û exlaqî nîşan dide û tevgera însan dinirxîne. Qada sisêyan jî hêla însan a estetîk e ku bi hestpêkirin û hissiyata wî re eleqedar e.

Estetîk ne ku bi hemû qada hestiyarî û hissiyata însan re eleqedar e, bes li ser qismê wê yê “ciwan” disekine. Ev têgeha ku ji hêla wateya peyvî ve wek “hestpêkirin/hîskirin/bihîstin” ji bo wan tiştan tê bikaranînê ku li me “xweş” û “xweşik” tînin. Lewma di zimanê me de ew objeyên li xweşa me diçin, li me xweş tînin, em ji wan re dibêjin “ciwan”, “delal”, “xweşik” (Orman, 2010: 56).

Mijara estetîkê bi gelemperî “ciwanî” ye. Awayên pêkhatina ciwaniyê bi xwe, di qadên cuda yê huner de tê xuyanê. Her wiha hêman û hestên bingeîn ên ciwaniyê jî dikevin nav tixûbên vê qadê. Pirsên wek çavkaniya ciwaniyê çiye. Ciwan û ciwanî gelo wek zanist yan jî dsîplînekê tê pejirandin yan na. Geşedana dîrokê ya vê mijarê bi kîjan merhele û qonaxan re derbas bûn û hat heta roja me ya îroyîn û hwd. hemû têkildarî bi vê babet û meseleyê ne.

Têgeha “ciwan” digel têgehên “qenc” û “rast”ê, yek ji babet û pirsgrêkên bingeîn ê felsefeyê ye jî. Digel vê yekê bêtir ku kirdeyeke ku wê tê bighê, meriv nikare nêzîkî vê pirsgrêkê bibe. Kirde yanî sêje, hiş e. Di vir de zerûrî ye ku hiş yanî bîrewerî, digel problema pêkanîna xwe û xwe gerîna xwe ya wek obje bê nirxandin. Estetîk her çiqas di maneya xwe ya felsefîk de bi gelemperî wek doktrin

yan jî zanista ciwannasiyê hatibe pênasekirin jî, bi bandora kevneşopiya romnatîk û îdealizma Alman, wek “felsefeya hunerê” hatiye fêmkirin. Di felsefeya piştî Hegel de jî têgehên estetîk û felsefeya hunerê bi piranî di dewsa hev da hatine bikaranîn (Cevizci, 2014: 37).

Ji bo însan hewcedariyên subjektîf û ceribînên cuda hene ku li ser rastiya objektîf teşe digrin. Helwestkariya însanê xwedî fikr a li hember objeyê, meriv dikare di bin helwestên teorîk, pratîk û estetîk de tesnîf bike. Helwest û ceribîna teorîk wek ceribîna epîstemolojîk/zanyarî yan jî mantiq, helwest û ceribîna pratîk wek ceribîna etîk/reftarî yanî exlaq û helwest û ceribîna hestpêkirin û hissî jî wek ceribîn û helwesta estetîk/ hestîyarî tê binavkirin (Arat, 2006: 15).

Ji hêla fikirîna felsefî ve sê dîsîplînên bingeîn hene ku girêdayî sê pîrsên bingeîn in. Ev her sê pîrsên wek “Rast, qenc û ciwan çiyê” ji bo fikirîna felsefî sê pîrsên esasî ne. Sê heb dîsîplînên bingeîn ên felsefî ku di çarçoveya van her sê pîrsan de teşe girtine, ev in: Epîstemolojî, Etîk û Estetîk. Epîstemolojî di çarçoveya pîrsgirêka zanîne de pîrsa “Rast çiyê?” esas digre. Etîk di nêrîna pîrsgirêka kirînen/tevgera exlaqî de pîrsa “qenc çiyê?” esas digre. Estetîk jî ku mijara me ye, di peywenda hebûna suruştî û afirîneriya hunerî de pîrsa “ciwan çiyê” esas digre (Orman, 2010: 23).

Ciwanî ew heyranî, ecibandin û kêfxweşiyê ye ku daneyên hestên meriv ên wek dîtin, bihîstin û pelandinê, ji ber şêkil, şemal, pîvan, nîzam, aheng, mukemelî, tenasub, yekawatî û zelaliyê, hîs dîkin. Bi gotineke din estetîk ew ecibandin û heza însan e ku bi balkêşîya deng, reng û ahenga di tiştêkî de tê hestpêkirin. Derdikeve holê ku ciwanî nirxdaraziyeke takekesî ye, pêvajoyeke peyitîna şexsî ye. Ciwanî şewq û şemaleke di tiştan/objeyan de ku di hiş de întibah çêdike, hiş hişyar dike. (Afşar, 2004: 244).

Ji bo fêmkirina naveroka pênaseya estetîkê divê ceribîna estetîk bê zanîn. Naveroka ceribîna estetîk dibe ku objeyên siruştî bin dibe ku berhemên hunerî bin. Ji bo fêmkirina ceribîna estetîk, divê ev ceribîn bi ceribînên teorîk û pratîk ve bê berawirdkirin. Ev cure awayên ceribînan, di encama helwestên di çarçoveya pîrsgirêk û hewcedariyên insanî de derdikevin holê. Însan li hemberî tiştan(objeyan) bi helwest û nêzîktayiyên cuda ku ji ceribînên cuda peyda dibin, tevdigere.

1.3.Zanista Ciwaniyê: Estetîk Yan jî Ciwanînasî

Têgeha estetîkê di zimanê Grekî de ji peyva “aisthesis” hatiye dariştin ku di maneya hestpê kirin, hisîn, bihîstin û hestîyarîyê de ye.* Ev têgeh di hizr û nêrîna Yunanîyên berê de estetîk û tesewira ciwaniyê tîne ziman. Ev peyv, wek bingeha têgeha estetîk û sêwirîna ciwaniyê ketiye lîteratûrê. Zanyarên Yûnana antîk ev têgeh di maneya epîstemolojîk de bikaranîne. Li gor wan ew zanîna ku meriv bi aqilê xwe digihêjê û ya ku meriv bi hestên xwe bi dest dixê, ji hev cuda ne. Ji ber vê qasê di nêrîna van filozofan de têgeha “estetîk” ew zanîn e ku bi rêya hestên mirov pêk hatiye. Lewma “estetîk” di vê hêlê de xwedî maneyeke epistemolojîk e jî (Taşdelen, 2012: 3).

Pêşî divê em vegerin pênaseyên ku ji bo têngîna (ciwaniyê) hatine kirin. Ka em li razên têngînê û awayê pêşxistina wê binêrin. Ji bo ciwaniyê pênaseyên cihêreng hatine kirin. Ji ber cudahiyan di rêbaz û perspektîfên filozof û pisporên di wî warî de û têngîhiştina wan a jiyan û helwestên di derbarê metafîzîkê û mirov de, xwediyên perspektîfên cihêreng in. Zanyarên civata Grekan, yanî filozofên Yûnan ên serdema antîk çawa li ser gelek hêlên felsefî û nirxên mirovî yên cuda sekinîne, ciwan/bedew/xweşikî jî wek mijareke felsefî û hêjayî lêkolînê dîtine.

Di bingeha têgeh û zanista ciwan û ciwaniyê de ev nêzîktayî û nirxandinên serdema dêrîn hene. Wan zanyaran, ciwanî ne wek mijar û nirxekî serbixwe lêkolîn dikirin. Bileks di nav îdeayên “rast” û “qenc” de dihesibandin. Lê zanyarê Alman A. Baumgarten di sedsala VIII. de ev mijar cara ewil wek qadeke zanistê ya serbixwe û bi navê “Estetîk” anî rojevê. Wihareng estetîk wek zanista ciwaniyê, bû navê dsîplînekê. Kategoriyên estetîk cihêreng in. Lê ya sereke û ya bi maneya estetîkê re buye yek, ciwanî ye. Estetîk ne tenê ciwaniya sirûştî yan estetîka edebî tîne ziman. Estetîk her wisa di hemû huneran de bi awa û ramanên ciyawaz xwe dide der. (Xoşnav, 2012: 4).

* Tiştêkî balkêş e ku peyva “aisthesis” a ku bingeha “estetîkê” ye, him bi şiklê xwe him jî bi maneya xwe pir nêzî peyva “hest/hestpêkirin, bihîstin, hisîn” a di zimanê Kurdî de ye (Farqînî, 2012: 279). Dibe ku ev hevengî ji mensûbiyeta Kurdî û Grekî ya heman malbata zimanî derketibe holê ku ew jî malbata zimanên Hînd-Ewropî ye. Her wisa peyvên “hes” yan “hesasiyet” ên zimanê Erebi ku bi şikl û şêwe û bi mane heman nêzîkbûnê nişan didin jî bala meriv dîkşînin (El-Muncîd, 1986: 132).. Mumkun e ku di nav dirêjahiya tarîxî de ji ber cinartiyê, dan û standineke di nav zimanên Hînd-Ewropî û Erebi ya girêdayî malbata zimanî ya Hamî-Samî de pêk hatibe.

Kêm dîrokên qadên zanînê bi qasî dîroka estetîkê qutbir bûne, yanî dîroka estetîkê zêde marûzê qutbûnê buye. Ev qad, di nav dem û dewranên dîr û dirêj de tenê wek mijareke metafîzîk hatiye lêkolînkirin û her tim di nav felsefeyê de wek şaxeke wê maye. Ev qada zanînê di dawîya sedsala 18an de veguherîneke mezin jiya. Wuhareng kete rêyeke bûyîna zanistê. Ew zanistên din jî bi dirêjahiya demê re ji felsefeyê cuda bûn. Helbet ev veguherîn di carekê de pêk nehatine (Timuçin, 2009: 9).

Di serdema modern a Rojavayê de Baumgarten (m.1762) û şopînerên wî ev qada mijara ciwan û ciwaniyê bi navê estetîk gerandine wek zanistekê. Di vê qada zanistê de problema ciwaniyê di bin têgeheke taybet de hatiye lêkolînkirin. Her wiha wek dsîplîneke îlmî derketiye holê û li ser têgehên têkildarî bi hest û hestiyariyan hûr dibe. Hasil, estetîk êdî wek navê zanista ciwaniyê kete nav lîteratûra zanistî.

Ev qada zanistî di dîroka fikrîyata Kurdî de li gor hizr û tesewwura klasîk ji hêla zanyar û mutesewwufên Kurd ve him bi nêrîna hikemî him jî bi nezera îrfanî di berhemên wan de hatiye behs kirin. Her wiha estetîk di zimanê Kurdî de jî di nêrîn û perspektîfa klasîk de ji hêla şair û edebiyatnasên Kurd ve bi rêya helbest û dîwanan mewzûbehs buye (Izady, 2005: 97) .

Navê zanista estetîk di zimanê Erebi de wek “îlmê cemaal”, di Osmaniyan de wek “bedîyat”, di Fransîzan de wek “esthétique”, di Almanî de wek “aesthetik”, di Îngilîzî de wek “aesthetics”, di Farisî de wek “cemaşînasî/zîbayî şînasî”, di Tirkîî de jî wek “estetik/güzellik bilimi” derbas dibe (Hançerlioğlu, 2011: 93).

Di serdema modern de jî cara ewil bi perspektîfa modern bi Kurdiya Soranî ketiye nav dîroka edebiyat û fikrîyata Kurdî û di lîteratûrê de cih girtiye. Estetîk di xebatên bi Kurdiya Soranî de wek “Ciwanî”, “Ciwanînasî”, “Êstatîka” hatiye îfadekirin.

1.4. Mijara Estetîkê

Estetîk wek qadeke zanista ciwaniyê, di bin gelek şax û celeban de tê tehqîqkirin. Lêbelê ji hêla gelek zanyar û pisporên qadê ve bi giranî û bi awayekî gelemperî di bin sê cureyan de tê mulehezekirin û bi vî rengî tê lêkolînkirin. Yek, estetîka gelemperî ye. Ya duduyan, estetîka taybet e, ya sisêyan jî, dîroka hunerê ye.(Doğan, 1975: 191)

Em dê li gor vê tesnîfê bi awayekî gelemperî li ser van mijaran bisekinin û di derheqê de agahî bidin.

1.4.1 Estetîka Gelemperî

Mijara vî cureyê estetîkê, tahlîla fikra ciwan û ciwaniyê ye. Tesbîta qereker û taybetiyên ciwanê û destnîşankirina hedîseyên hevalbendê wê û kifşkirina fakulteyên/sernavên têkildar in. Li ser meseleyê, lêkolîna têkiliya ciwanê ya daxîlî ya bi têgeh û kategoriyan wek payebilind/muteal (sublime) ê re.

Her wiha şopandina manzaraya pêşketina fikra ciwanê ya li nav rûpelên alema tebîet û beşeriyetê û pêkhatina wê ya di eserên hunerî de; diyarkirina tebîet, armanc û têkiliyên ciwaniyê yên bi alemên fikrî yên din re. Lêkolîna pêkhatina prensîp û şertên sêwirandina/dîzayna hunerî/artistik (representation) û hînbûna qabiliyetên hunermend. Her wiha lêkolîna wêfên lazîm ku hunermend xwediyê wan be yên wek deha, huner (talent), hêza xeyalê û zewq û hwd. (Orman, 2010: 27).

Estetîka gelemperî bi kurtasî qada mahiyet û pênasîya babetê ji xwe re wek mijar destnîşan kiriye. Her wiha li ser nêrîn û nêzîktayiyên di vê derbarê de disekine û analîza wan dike, wan destnîşan dike.

1.4.2. Estetîka Taybet

Ev jî teoriyên ji bo her hunerekî hatine derpêşkirin û bi gelemperî prensîbên hunerî yên li ser qerekerên ciwanê diyar dike. Yanî nezeriyatên ji bo her hunereke qada estetîkê îfade dike. Her şaxeke vê qadê, wek cureyekî taybet ê estetîkê ye (Doğan, 1975: 114).

Dixwaze ku tebîet û rolên mexsûs ên hemû cureyên huneran digel xalên wan ên hevpar û cuda bidest bixe. Di heman demê de tesbîta wan şert û qaîdeyan dike ku ev huner tabiyê wan in. Dixwaze ku cihê wan huneran ên rastîn ê di nav tesnîfateke sirûştî de nîşan bide û her wiha têkiliyên herî rast ên di navbera wan de destnîşan bike.

1.4.3. Dîroka Hunerê

Ev kategoriyan estetîk û teoriyan ku me behsa wan kirin, xwedî pêvajoyeke geşedana dîrokî ne. Bi gotineke dî, ji bo bidestxistina qîmetê zanistî, divê dîrokeke gelemperî ya van kategoriyan û teoriyan hebe. Estetîk jî, huner jî wek dîrok, ziman,

felsefe, tib, dîn, huqûq, siyaset, exlaq û hwd. marûzê guherîn û qulibînan dibe. Hizra ciwan û ciwaniyê jî li gor dem û dewranên beşeriyetê, ketiye nav dilq û dirûvên ciyawaz. Ev guherîn û veguherîn bes bi saya dîroka hunerê ve tê şopandin. Heta ku ev demajoya dîrokî û geşedana bi merhele û qonax, li pêş çav neyête girtin û neyête şopandin, teoriyên estetîk û hunerî, wek fikr û nêrînên teng, bêwate, bêencam û bêbingeh dimînin. Bêguman her zanist û hunerek di dîrokê de xwedî cihekî ye.

Ji bo ku ev teoriyên di derheq van mijarên mewzûbehs de qîmeteke zanistî bidest bixin, lazim e ku nirxandineke wan ya kronolojîk û muqayesekirina wan a li gor metodekê pêk hatibe. Her hunerek di tarîxê de xwedî tradisyon û paşxaneyekê ye. Li ser meseleyê, ji bo fêmkirina hunerê, divê ku Yûnana dêrîn, hunerê Romayê, hunerê klasik û hunerê romantik, lazime ku hunerê berê û modern, hunerên pîrlahî (paien) û hunerê Xristiyanî, senetê Îslamî bê zanîn (Orman, 2010: 32).

Dîroka hunerê xizmet dike ji bo hukumdayîna me ya di derheq sîberoja huner û qedera wê de. Em dikarin bibêjin ku însan çawa ji bo eynî Xwedayî, li gor dem û dewranên ku tê de dijîn, asta xwe ya çandî, nav û sîfetên cuda dixemlîne û diwesiîfîne, her wisa jî li hemberî mexlûqat/hebûnê û eşya, hereket, reng, xêz, deng û hwd. jî dikevin nav hest û hîsiyatên cihêreng û dijber. Ciyawazîyên hestiyarî û hisî ya li ser heman mijarê, li gor haletê ruhîyeya wan a di nav de cihêrengîyê pêk tîne (Timuroğlu, 2013: 38).

Lewma heman mijara ku di îdraka hunermendên muxtelîf de dibe sebebê îlham û çavdêriyên/întibayên cihêreng. Her wiha ev îlham û întibaya rengîn, wek berhemên ne wek hev dirûv digre û tê îfadekirin. Meriv dikare bibêje ku hemû pergalên hunerî, felsefeya hestiyarî/teheşşusa me ne ku bi saya îdealên ku bi hiş/zîhin, heyat û bi şertên civakî îcad bûne. Va ye ev cudahî, ciyawaziya zewqên estetîk, cihêrengiya hez û heyecanan, guherbariya nirxdaraziya me diwelidîne, pêk tîne.

1.5. Estetîk û Berhema Hunerî

Tiştê ku berhema hunerî derdixîne holê sisê ne. Bi gotineke din ve, waqîeya huner, li ser sê hêman û esasan rû dide. Ev her sê hêman jî bêtî hevûdu nabin. Yek hunermend e, ya duduyan, berhema hunerî ye û ya sisêyan, kesên temaşeger ên teqdîrkar û qedirzan in ku ji hunerê fêm dikin. Ew kesên ku berhema hunerî çêdike û wî karî pêk tîne, ji wan re tê gotin “hunermend”. Ji bo berhema hunerî jî tê gotin “obje yan jî tiştê estetîk”. Her wiha ji wan kesên ku bi berhema hunerî re têkildar re

jî tê gotin ku “tiştê estetîk”. Wihareng berhema hunerî li ser van her sê xîm û daneyan pêk tê. Ev diyarde, huner dike huner.

Hin taybendmendî hene ku hunermend ji însanên din cuda dide nîşandan. Ew tiştê ku hunermend ji însanên din vediqetîne kesayetiya wî ye û fêhm û feraseta wî ye. Xusûsiyetên wî yê wek hêza xeyalsazî, hestiyarî/hesasî, diltênîkî/dilzîzî, dewlemendiya tedayî, berdewamiya hêzdarî, sebr û berxwedariya ne. Hunermend ne ew kes e ku teqlîda wan tiştan bike ku li tebîetê dîtine, çi şêkil, çi reng, çi deng, çi vegêran. Nêrîna wî cuda ye. Xwedî çavdêriyeke xas e. Hilbijartin û fêmdariya wî cihê ye. Hunermend ne wek neynik e ku tiştan eynen nîşan bide yan jî eksa wan rave bike. Bîlakîs ew pêk tîne, ji nû ve saz dike, ava dike, çêdike. Di vê hêlê de sazkar e, avakar e (Timuroğlu, 2013: 25).

Jixwe etîmolojiya peyva “huner”ê jî van wesf û taybetiyên huner û hunermend tîne ziman. Bi qenaeta me têgeha “huner”ê ku di Kurdî û Farisî de hevpar e, li ser reha peyva Kurdî ya “hîn”bûn yan jî “hinartin”ê derketiye holê. “Hînbûn” bi maneya xwe ya têgihiştin û fêrbûneke xurt, “huner” û “hunermend” tîne ziman. Ger “huner” ji reha peyva “hinartin”ê be, ev peyv jî bi maneya xwe ya wek “hilbijartin, wergirtin”ê, hêzdarî û qabiliyeta cuda ya “hunermend” tîne bîra meriv ku ji sirûştê tiştan hildijbêre, werdigre û dihesilîne, dikelijîne û wihareng “huner” pêk tîne.

Têgeha “senet” jî ya bi zimanê Erebi ku hevwatera ya “huner”ê ye, bi etîmolojiya xwe ji “sun” tê, îşaretî heman wesfê “huner” û “hunermend” dike. Lewra peyva bi Erebi ya “sun” bi maneya xwe “kirin, pêkanîn, çêkirin”ê îfade dike. Ev wate jî wesf û taybetiyên sereke yê “hunermend” û “senetkar” in (El-Muncîd, 1986: 437).

Hin kesan girîngî dane ser takekesî, taybetî û hêza psîkolojîk a hunermend, hunermend wek şexsiyetên fewqelade, awarte, hetta wek kesayetên fewqelbeşer û dahî dîtine û nîşan dane. Lêbelê hinan jî balê kişandine ser bandora derdorê, civat û perwedehiyê û hunermend wek mehsûl û fêkiyê derdorê nirxandine. Berhema hunerî, objeyên estetîk in ku hunermend ew pêk aniye. Peykerek, tabloyek, besteyek, avahiyek, şîrek, romanek û hwd. berhema hunerî ye. Di berhemên hunerî de hin taybendmendî hene ku ew wan digerin objeya estetîk. Em ji vê ya re dibêjin “nirxa estetîk”. Yanî ger nirx û qîmetêke estetîk a berhemekê hebe, ew çax ew berhem dikare bibe berhema hunerî.

Gava em dibêjin “berhema hunerî”, lazime ku hemû berhemên xwedî nirxê estetîk ku ji hemû qadên hunerî pêk hatine, bêne ber çav, bên hesibandin. Ev qadên han, hinên wan li ser hêmanên dîtbarî, hinên wan li ser unsûrên bihîstinê, hinên wan li ser hêmanên xêzkirinê, hinên wan li ser qabiliyeta xeyalsazî û çîroksaziye, hinên wan li ser îstidada teqlîdê, hinên wan li ser ravekirina reftarên bi rîtm û aheng û hwd. derdikevin holê. Meriv dikare qadên hunerî yên sereke awha destnîşan bike: Resim, grafîk û senetên plastîk, muzîk, mîmarî, ciwankarî/hunerên edebî, roman, hîkaye, şîr /helbest, sînema, berhemên tiyatroyê û dans (Orman, 2010: 27).

Her tiştê ku tê çêkirin û lêkirin, ne huner e. Lewma divê ku senet yanî huner û senet yanî zenaat ji hêla berhemên xwe ve ji hevûdu bên veqetandin. Seneetkarî/Zenaat, çêkirin û sazkirina wan tiştan e ku ji bo faydeyê ne. Yanî mesleg û pîşe ye ku navê hostatiya alavên kêrhatî yên bo însan e. Lêbelê di senet/huner de faydeyê zêdetir û wêdatir endîşe û qesta hunerê esas e, armanc e. Lê ew eserên/berhemên ji bo menfîetekê tên çêkirin û tên îmalkirin, berhem û mehsûlên seneetkariyê/zenaatkariyê ne (Timuçin, 2009. 13).

Hin wesif lazim in ji berhema estetîk re. Da ku wek esera hunerî bê pênasekirin. Berhemeke hunerî ji bo ku nirxekî estetîk bi dest bixe, lazime ku sujeyên wê hebin ku bêtir qest û niyeta menfîetê ji wê objeyê hez bigrin, tehmeke estetîk jê werbigrin û wê teqdîr bikin. Ji bo wî kesê ku li pêşberî tabloyeke ciwan, dilşoşî/mutehassîs nebe, bi konser yan tiyatroyeke pir xweş hestên wî germ nebe, di bandora şîreke xweş de nemine û ruhê wî nepirpîte, kelecane nebe, qîmet û nirxekî wê berhema hunerî tune. Ji bo wî însanî tu maneyekî îfade nake (Orman, 2010: 76).

Bûyera estetîk bi nêzîktayiyên cuda tê şîrovekirin. Hin estetîknas/ciwannas dibêjin ku bûyera estetîk a heqîqî ew hestiyari û hîs in ku di ruhê însan de derdikevin holê. Her wekî bersiva Mecnûn ku daye pîrsa wan kesên ku ciwaniya Leylayê ne hêjayî eşqê dîtine: “Divê ku hûn bi çavê min li Leylayê binerin”. Ev rastiyeke e ku ji bo ku berhema hunerî û hunermend qîymet û nirxê xwe yî rastîn bibîne, lazime ku însan di derheq hunerên ciwan ên esasî de bên agahdarkirin û perwerdekirin. Ev yek dê pir kêrhatî be û ji bo fêmkirina ji hunerê bîngeh û asteke fikrî û çandî bide peydakirin.

1.5.1. Huner Ji Hêla Felsefî ve

Gava meriv li ser beşên felsefeyê hûr dibe, tê xuyanê ku sê heb zanistên bingehîn ên normatif hene di nav felsefeyê de. Ev zanistên han yeke wê mantiq e ku li ser xîmê lêkolîna “rastiyê” ava bûye. Ya duduyan exlaq e ku li ser esasê tetqîqa “qencîyê/başıyê” saz buye. Yê sisêyan estetîk ku li ser bingeha nirxandina “ciwaniyê” derketiye holê. Ji ber vê qasê mijara estetîkê ne hemû qada berfireh a hestiyariyê ye. Xasma li ser qada têkildarê bi ciwaniyê û têgeha ciwan disekine. Lê paşê fikr û nêrîna ku ciwaniyê ji bo estetîkê, wek nirxa esasî destnîşan dike hatiye rexnekirin, marûzê îtirazê buye.

Di derbarê destnîşankirina qada estetîkê de hin fikr û nêrînên cihêreng derketine holê. Li hemberî nêrîna kevneşop ku qada estetîkê bi ciwaniyê re mehdûd dibîne, hin zanyaran teklîfa îfadekirina sehek/feraset/hedsê (intuition) kirine. Lêbelê ev pêşniyaz zêde maqûl û meqbûl nehatine dîtinê. Zanista estetîkê dîsa jî bi gelemperî wek felsefeya hunerê tê pejirandin. Di derheq çavkaniya estetîkê de jî nêrînên ciyawaz derketine holê. Li gor hin estetîknasên qada psikolojîk, tiştê estetîk ne obje (berhema hunerî) ne, bileks hestiyarî û hîsiyatên çêker û temeşevanê berhemê ne. Lê li hemberî vê nêrîna subjektîf a di derbarê çavkaniya estetîkê de, estetîknasên fenomenolojîk hene ku xwedî nêrîna objektîf in, ya esas estetîk wek objeyê dibînin û berhema hunerî wek navend û çavkaniya estetîkê nîşan didin (Timuçin, 2009: 20).

Fikr û nêrîna gelemperî, yanî esas estetîka felsefî, van hemû nêrînan tîne ba hev û dike yek. Estetîka psikolojîk (suje), estetîka fenomenolojîk (obje), felsefeya hunerî û mantiq, digel nirxên estetîk (daraza/hukmê estetîk) bi awayekî tevahî tê tahlîlkirin. Huner qada mezin a fealiyetên civakî ye ku gelek beşên wê, êkolên wê, xebatkar û mijûlkerên wê, muze, pêşangeh û salonên wê yên pêşandeyê hene. Huner xwedî şaxên wek resim, heykel, mîmarî, muzik, edebiyat, tiyatro, sînema, fotograf û hwd. ne ku ev şaxên han çawa ji hêla gelek zanistan ve tên lêkolînkirin, her wisa ji hêla felsefeyê ve jî tên lêkolînkirin.

Ev lêkolîn pirî caran bi lêkolînen huner ên sosyal, psikolojîk û teknîk ve li hev diqelibin, tên hemberî hev. Mijara mahiyeta huner yan jî çibûna senet, li gor dem û dewranan, cîvatan, qadên hunerî yên mewzubehs cihêreng in. Huner fealiyeteke însanî ye. Her tiştê ku tesir li însan dike, tesir li senet jî dike. Senet wek ber û hilberînekî girêdayî însan e û ji kesayetiya hunermend, menşe û orijînalîteya wî zêde

zêde tesir digre. Lê hemû berhemên hunerî di însan de zewq û heyecaneke estetîk hişyar dikan. Berhema hunerê tê ecibandin, tê teqdîrkirin (Doğan, 1975: 142).

Gelek wesfên esera hunerî hene. Lê hin taybetîyên wê hene ku wê ji tiştên din cuda dike. Unsûrên ku esera hunerî ji eserên ji rêzê yê din vediqetînin çine? Di serê serî de ciwanî, yanî xweşikbûn û delalbûn, wesfê sereke ye ku esera hunerî ji eserên elelade / ji rêzê vediqetîne. Lêbelê terîf û pênasîya ciwan û ciwanîyê bi qasî tê xuyanê, ne hêsan e.

Di eserekî hunerî de digel ciwanîyê, wesfên wek payebilindî/muteal, hez/xweşî, rastî, qencî, faydedarî, xwedî armanc, nêzîkbûn û hevahengiya bi ruh û heyecanên însan û hwd. jî tên payîn. Yanî lazim e ku ev cure taybetîyên estetîk jî di eserê hunerî de peyda bibin. Fêmkirina ji senet, girêdayî wan nîrxandinên filozofan e ku di derbarê fealiyetên senet de dikan. Divê li analîz û tahlîlê wan bê nîhêrîn. Di derbarê mijara çavkanî û jêdera hunerê de nêrînên cuda cuda hene. Anîha em dê li ser hin ji wan nêrînan bisekinin.

1.5.2. Teoriya Çavkaniya Hunerê: Mimesîs

Zanyarê ku cara ewil bingeha hunerê wek teqlîd destnîşan kiriye, Aristo/Aristoteles e (M.Ö. 384-322). Her wiha di felsefê û eserên Eflatun/Platon (M.Ö. 427-347) de jî heye ku esl û esasê her tiştî ji alema ideayan e. Tiştên ku li vê dunyayê ne, teqlîd û sihên wan îdeayên li wir in. Lê heçî Aristoteles e, li gor wî di însan de qabiliyeteke teqlîd (mimesis) û hezza wê heye. Hunermend îdeal û fikra di nav esl û esasê hedîse û mewcûdat de teqlîd dike. Hunermend her wekî tiştê ku tebîet kêr û noqsan hiştiye, temam û tekmîl dike.

Li gor filozofê Alman Alexandre Gottlie Baumgarten di kaînatê de madde û ruh bi awayekî ewqas bi aheng lihev kirine û hev kelijîne ku divê armanca huner û hunermend teqlîda tebîetê be. Li gor hin estetîknasên maddeperest jî senet, awa û dirûvê eksa heqîqeteke taybet e. Lê şêl û şeweyê vê eks û ayîneyê, nîrx û qîymetên civakî destnîşan dikan. Lêbelê hin cihêrengiyên awha hene: Mesela di hin şaxên hunerê de, yê wek resim, heykel, tiyatroyê de teqlîd bêhtir cih digre. Lê di qadên wek mîmarî, ciwankarî, şîr, roman û hwd. de hêza xeyalê dikeve pêşîya teqlîdê. Ji xwe zanyarê Yunana berê Philostratos teqlîdê avêtiye dereceya paş û hêza xeyalê û prensîba afirandinê/pêkanîne parastîye. Hêza xeyalê jî teqlîdê qewîtir e.

Hunermendên ku peykerên îlaheyên Yunana berê çêkiribûn, bêyî ku wan îlahan bibînin, ew çêkiribûn (Orman, 2010. 45).

Fîlozofê Alman G.W.Fr. Hegel (1770-1831) jî redda ciwaniya tebîetê dike û ciwaniya hunerî jî ser ciwaniya tebîetê re digre. Fr.W.J. Shelling (1775-1854) jî dijbêrê wan zanyaran e ku senet wek teqlîda tebîetê dihesibînin. Li gor wî hunermend bêhemdê xwe ruhê Xwedayê Xaliq dişopîne. Teqlîda mexlûqê wî nake. Hunermend wek ruhê îlahî ku tebîetê sax dike, ew jî ji nû ve çêdike, ruh dide eşyayê ku bikartîne (Doğan, 1975: 126).

Teqlîd bi wasiteya hin hunerên wek resim, peyker pêk tê. Lê di pirî huneran de teqlîd nabe wasite. Ya rast jî hin eserên ku wek fotoxraf û ji plastîk û şimayê çêbûne û motomot teqlîda tiştan e, tu heyecaneke estetîk nadin meriv. Berhema hunerî jî teqlîda rasteras a rasyiyê pir cudatir û wêdatir e.

1.5.3. Afirandin, Pêkanîna Hunerî û Estetîk

Huner xwedî taybetiyên xweser e. Bi gotineke din, ji bo ku huner bibe huner jê re hn şert divên. Buyer û mewcûd bi xwe, yên li tebîetê wek berhema hunerî nayên hesibandin. Tiştên li tebîetê gava ji hêla hunermendekî ve bê şixulandin, honandin û têkûzîkirin, ew çax berhema hunerî derdikeve holê. Senet, ne eksa tebîetê ya rasterast e. Her wekî ku zanist, hebûn û buyeran analiz û formule dike, her wisa jî senet jî dixwaze ku mewcudat û hedîsat fêhm bike û bi awayekî cudatirê jî zanistê, vebêje, rave bike û bide hîskirinê.

Her hunermendek li gor xwe hunerekî dike qada berhemdariya xwe. Bi gelemperî di vê qad û mijarê de qismek hunermend resimê, qismek heykelê, qismek muzîkê, qismek ciwankariyê bikartînin. Bes her hunermend gava rastiye vedibêje yan jî çîroka rastiye neqil dike û wek vegêran disêwirîne, ruhê xwe tevlî berhemê dike, teknîk, terz û ruhê xwe di sûretê hunerê de dide der. Kifşe dibe ku hunermend gava qesta pêkanîna tişteki dike, îdeala ciwaniyê ya di kûrahiya rihê wî de wek delîl û rêber rê nişan didê (Timuçin, 2009: 20).

Hin saîq û qabiliyet hene ku hunermend sewqî bi bal pêkanîna hunerî dikin. Ew tişt ku hunermend sewqî bi bal afirandinan yan jî kirin û pêkanîna dike, quweta xeyalê wî ye. Hebûn û mewcudên rastîn (reel) û rûdan (hedîsat) bi hêza xeyala wî ve dibin yek û dikelijin. Wihareng ew hebûn û rûdanên rastîn vedigerin berhemên hunerî yên mayînde û balkêş. Di vê sêwirandin û nûvejandinê de hin hêlên hebûn û

hedîsatên heqîqî tîn rendekirin, teraşkirin. Hin hêl bi sêwirandin û pêkanîna orjînal a hunermend ve vedijîn. Berhema hunerî bi mijara berdest, him bi keresteyê emilandî, him bi terza honandin û karînanê ve uslûb û şêweyê xas ê bi xwe derdixe holê.

Hunerê pêkhatî dibe sedem ku di civatê de hunermend bi çavekî din bê dîtin û nirxandin. Hunermendên heqîqî ji hêla pispor û zanyarên qadê ve bi gelemperî wek deha tîn wesifandin û pejirandin. Berhemên hunerî jî ew tişte ku hebûn û herdîsatên li derdor bi destê dehayê hunerî tê honandin û hasilkirin. Bi hêza xeyalê di hiş û ruhê wî de tê sêwirandin û neqîşandin. Piştî van bikaranîn û şixulandinan berhema hunerî dedikeve holê. Huner berhema deruniyeta însan e, yanî eserê ruh û hişê însan e, ji hundirê însan e û bi awayekî gelemperî tişteki ferdî ye. Lêbelê ji ber ku xîtabî derûna însanên din jî dike, tavlê dibe malê civatê û dikeve nav pêlên sosyalityê. Li gor Hegel huner ruhê hunermend e ku dikeve nav maddeyê û madde dişibihîne/dimîne xwe (Hemesalih, 2010: 71) .

Têkiliya hunermend û madde yan obje, li gor qadên hunerî yên cuda diguhere. Ruhê hunermend ê afirîner di qadên peykerteraşî û mîmarîyê de zêde girêdayî maddeyê ye. Di qadên hunerî yên resimê/wênexêzî de ji her alî ve hakim û desthilatdarê maddeyê ye. Heçî edebiyat û muzîk e, her wekî ku ji maddeyê filitiye, rizgar bûye. Huner tevger û demajoya pêkanîn û tehequqa fikr û xeyalan e di awa û buûdên ciyawaz de. Lêbelê keşfên zanistî û teknolojîk wek berhema hunerî nayên pejirandin. Yanî ev qad, ne wek hev in. Lewra pirî caran ev faaliyet û keşfiyat û îcad mehrûmê ji ciwanî û ecibandinê ne. Lewra ciwanî û ecibandin rê û ronahîya hunerê ye. Her wisa ciyawazî û taybetiyên wî yên sereke ne.

Zanyarên şopînerê ekola îdealîst, senet wek îdealizmeke şênber wesifandine. Her wiha ideaya ciwan wek xîm û binaxeya hunerê destnîşan kirine. Li gor filozofên xwedî vê nêrînê, afirîneriya hunerî ji tesir û mutesîrî û têkildariyan derdikeve holê. Ew şexsiyeta hunermend, hêza xeyala wî, zanîn û tecrubeyên wî, digel melzeme, deng, reng, rûdan û hwd. ên li derdor hevkarî dikin û berhema hunerî dihûnin û dimeyînin. Wihareng derdor hunermend xweyî dike, têr dike, hunermend jî derdorê diguherîne (Timuroğlu, 2013: 185).

Di qada hunerên resim û heykelteraşîyê de hunermendên Yunana antîk, Roma û her wiha Ronasans di nav teqlîda klasîk de tîn xuyanê. Di berhemên hunermendên girêdayî ekola Romantîzm ve Realîzmê de hebûn û bûyerên li sirûştê bi awayekî nêzî rastiya wan dihatin teqlîdkirin. Lêbelê şopînerparêz (empresyonist) ên ku ji şekil

zêdedir li dû reng dimeşin, (ekspresyonist) ên ku dixwazin binhişa însan derxin der, surrealîstên ku qest û mebesta wan reva ji rastiyê (reel) û gihaştina bi bal wêdetirê rastiyê ye, sembolîstên ku di qada edebiyatê de jî gelek nûnerên wan hene, kubîzm û kubîzma geometrik a ku bi Picasso ve derketiye tewrê jorîn/lûtkeyê û hwd. hemû di hunerê de ji teqlîdê zêdetir afirandin, honandin û pêkanîna derxistina pêş.

Xasma bi pêşketinên teknolojiyên fotoxraf û flman ve û her wiha derketin holê û berbelavbûna deng û vexuyan/nimûd ên kompîtoran, hunereke montajê derkete pêşberî me. Aniha pêşketinên teknolojik ji aliyekî ve bi kompîtor û teknîkên taybet ên flman ve li ser xuyang û dûmenên bi hereket gelek guherîn û pevxistinên nû pêk tên. “Opart”ên ku di dûmen û xuyangan de guherinan pêk tînin û “popart”ên ku bi pevxistina objeyên cuda kompozisyonên nû dide bidestxistinê, hunermendê hevdem/muasir, mecbûrî pêşxistina buûden nû dike (Doğan, 1975: 279).

Di fikr û nêrîna hin zanyaran de çavkaniya huner zewq û lîstik e, yanî kêf û şahî ye. Însan piştî ku hewcedariyên xwe yên zerûrî pêk tînin, bi awayekî bêhemdê xwe û bêarmanc qesta hin kêf û şahî û lîstikan dikin ku li însan xweş tê. Her wekî Ahmedê Xanî di Nûbihara xwe de dibêje:

Di fesla new biharê de digel dilber biçin geştê

Ji wê xweştir umir nabit ew hal qewî li min xweş tê (Xanî, 1992: 32)

Ev cure tevger û hestiyarî him westa bedena meriv datîne, yanî ji bedenê re dibe wek îstihetekê him jî li meriv xweş tê. Gav û pêngaveke din a van cure fealiyet û hestiyariyan xwe xemilandin, xwe xweşikkirin e û paşê jî ciwankirin, estetîzekirina derdora xwe ye ku sebebê ecibandîna ye, yanî qayîlbûnê pêk tîne. Li gor fikr û nêrîna Charles Bordele senet bi vî awayî derketiye holê. Çawa ku zanist bi aqil û ceribînan derketiye holê, huner jî bi hêza xeyal û hewesa lîstikê yanî bi kêf û şahiyê pêk hatiye (Orman, 2010: 47).

Qismek zanyarên qada estetîk jî dibêjin ku huner fealiyeteke wisa ne ku bi saîqeke xweberê û bi armanceke xweber derketiye holê. Huner wek lîstikekê ye ku hemû hêz û bala însan dikşîne ser xwe û bikartîne. Êdî ku wisa ne, lîstik ne ku çavkaniya huner, lê dişibihe fealiyeteke hunerî ku însan bi awayekî azadane tevdigere û jê hez digre.

Shiller jî ne ku dibêje “lîstik çavkaniya hunerê ye” lê li gor wî cihana rastîn a estetîk, cîhana lîstîkê ye, însan bes tenê di lîstîkê de wek însanê rastîn tevdigere. Lebt û libatên azadane, qesta pêkanîna hêza xeyalê, bes di lîstîkê de mumkun e. Lewma ev tevger û fealiyet nêzî hunerê ye. Encax tevgera lîstîkê di serî de bi awayekî bi xweber û bêhemdî bû, bi temamî azadane bû. Lê bi dirêjahiya demê re bi hin qaîde û usûlan ve hatiye girêdan û bi têra xwe hatiye sembolîze kirin. Lîstîk di demeke kin de, ha bi hereketên rîtmîk yanî bi teql û ahengê ha bi muzîk û kostuman/kinc û cil û berg, dikeve bin bandora teqlîdê. Saîqa lîstîkê ji hêla teqlîdê ve tê kontrolkirinê. Lê fealiyeta lîstîkê çawa her wekî ku piştî wextan ha di dans û muzîkê de ha di hunerên plastîk û resimê de tê dîtinê, çavkaniya fealiyetên din ên hunerî pêk tîne (Timuçin, 2009: 72).

Di fikr û nêrîna wan zanyaran de ku dibêjin saîq û bingeha huner hest û hewesa lîstîk û kêfê ye, huner her çiqas ne lîstîk be jî fealiyeteke ji wê cureyê ye. Lerwra esl û armanca huner ji lîstîkê gelek cudatir e. Huner ne ku tenê teqlîdkarî ye, her wiha diguherîne û diafirîne. Di piştî vê guherkarî û pêkarîyê de azadiya hunermend heye ku pir bi qedr û qîmet e. Teoriya kêf û şahiyê ku wek lîstîk jî tê zanîn ji hêla zanyarên wek Kant, Shiller, Grant Allen, Spencer û hwd. ve tê parastin.

Teoriya kêf û şahiyê ji hêla hin filozofên din ve jî hatiye rexnekirin. Li gor van zanyarên rexnegîr kêf û şahî yan jî lîstîk ekseke fîzyolojîk û sosyolojîk e. Mumkun e ku bêtir ku tu rêçekê bihêle, windabe. Hal ew hal e bi hunerê ve hiş û hêza xeyalî û teknîk a hunermend li ser maddeyê hunerî tê honandin û neqîşandin. Ew huner bi sedsalan berdewam dike. Civat û edet her diguherin, kêf û şahî, yanî leb û lîstîk jî diguherin û berze dibin, diçin. Lê berhemên hunerî berdewam in û dijîn, yanî hêleke wan a mayînde û baqî heye. Heta di hin rewşên civakî de pêkariya hunermend didome û domdar e (Timuroğlu, 2013: 15).

Teoriya kêf û şahiyê, di qadên eleqedarên bi hunerên ciwan zêdetir, di qadên têkildarê bi lîstîk, tevger û çîroksaziyê ên wek şano/teyatroyê, hunerên pêşandeyî (Spor jî di tev da) de bê nîrxandin, bê mutalaekirin, bi qenaeta me dê bêtir guncav be, li cih û kêrhatîtir be. Hin zanyar û teorisyan hest û hestiyariya hez û lîstîkê wek çavkaniya huner û hunermendiyê destnîşan dikin û vê nêrînê diparêzin. Lêbelê hin filozof jî hestên însan ên kêf û şahiyê ku leb û lîstîkê encam didin, wek armançekê derpêş kirine.

1.5.4 Ji Ciwaniya Sirûştê Ber Bi Ciwaniya Hunerî

Di fikr û nêrîna Naturalistan de ciwaniyeke tebîetê heye. Ev ciwanî divê ji bo huner bibe mînak û model. Huner bes teqlîda tebîetê (mimesis) ye. Ciwanî encax bi vî awayî dikare xwe pêk bîne û îfade bike. Lewma divê ku ciwaniya tebîetê beriya ciwaniya hunerî be. Ev ciwaniya tebîî lazime ku ji bo ciwaniya hunerî bibite rêber, beled û delil. Li gor Aristoteles jî objeye huner tebîet e. Lê tebîet her dem ciwan nîne. Hin dîmen û bûyerên fecî û kirêt ên tebîetê gava li hunerê bê neqîlkin û bibe malê hunerê, mumkun e ku li wir ciwan be yan jî ciwan were xuyan. Hunermendên Impressionist ji bo ku bêqîmetiya ciwaniya tebîetê ya ji bo hunerê nîşan bidin, wêneyên kirêtiyê û resmê tiştên zîst jî çêkirine (Timuroğlu, 2013: 109/110).

Zanyarên wek Kant, Hegel, Croce, Lukacs ciwaniya sirûştî û ciwaniya hunerî ji hev veqetandine. Di fikra Hegel de ciwaniya hunerî ji ser ciwaniya tebîetê re ye. Lê zanyarêkî wek B.Croce mijarê ji hêla nêrîna estetik ve dinirxîne. Bi gelemperî ciwaniya sirûştî dervayî ciwaniya estetik e. Lê gava hin hêlên tebîetê li meriv xweş bînin, hez û zewqê bidin meriv û wihareng meriv vê yekê wek objeyeke estetik bînin, ew çax ew perçeyê tebîetê ciwan e. Yanî çavkaniya ciwaniyê, ne tebîet û alema madeyê ye. Çavkaniya ciwaniyê alema derûnî ya însan e. Ciwanî ne li dervayî însan, bîleks di hundirê însan de ye. Lewra însan gava li derdor dimeyize, dinhêre, ne bi çavê heywanekî dinhêre. Rewşa wî ya psikolojîk, salên wî, meslegê wî, hêvîyên wî, xeyalên wî û hwd. bandor li nêrîna wî dikin, li ciwandîtin û kirêdîtinê wî tesîr dikin (Ezîz, 2021: 94).

Berhema hunerî divê xwe bispêre tebîetê. Lê ciwanî nirxek e ku di nav têkiliyên civakî de pêk tê. Hostayê mezin ê ekola romantizm a di resimê de E. Delacroix (1798-1863) dibêje ku “Piştî ku em bûne romantik, çil û çiya ciwan bûn, gerî ciwan. Her wiha Kant jî dibêje ku “Tebîet gava wek berhemeke hunerî lê bê nihêrîn, ciwan e” (Orman, 2010: 10).

Li gor estetîka îdealist ciwaniya hunerî ji ser ciwaniya xweezayî re ye û gava wê wek mijar bikarbîne, payebilind dike. Zanyarên li hemberî vê fikrê yê naturalist û materyalist li gor nêrîna xwe ya estetik ciwanî beriya her tiştî di tebîetê de ye, di nav heyata organîk de ye.

1.5.5. Wesfên Ciwaniyê

Wesfên ciwaniyê yên objektîf û subjektîf hene. Wesfên subjektîf li gor ferd, civat û sedsalan diguherin. Li vir em dê bi awayekî kurte li ser wesfên ciwaniyê yên objektîf bisekinin. Wesfên objektîf jî wek derûnî û dervayî vediqetin du beşan. Wesfên derûnî jî di bin sê beşan de kom dibin:

Yek, ciwanî û ciwanbûna berhemekê, bi qasî dereceya ravekirina temsîlkariya îdeyê zêde dibe. Ew tiştê ku jê re tê gotin ciwan, yan jî ciwan ew e ku munasibê bi bingeş, orijîn, îde, esl, û têgeha xwe be. Ya duduyan, berhema ku wek ciwan tê zanîn, divê bi temamî li tîpa ew ê tiştê bê, ku temsila wê dike. Wek mînak, şêr divê ku pencên wî hebin. Yanî şêr bê penc û diran û qîl nabe. Çivîk bê bask nabe. Hesp nabe ku bi qopik yan milik be. Sêv, sêv e; ne porteşal e. Dara çamê, pelên dara çinarê nade. Ew tiştên ku ne kamil û tam, yanî tiştên nîvcû, naqis, kêmkirî û kas, ne ciwan in. Ya sisêyan jî ew e ku ciwanbûna tiştê girêdayî bi zindîbûna wî û bi zêdebûn û pîrbûna hêza vegotina wî, yanî îfadekariya wî ye (Timuroğlu, 2013: 120).

Wesfên derveyî yên formel jî di bin du sernavan de meriv dikare kom bike. Yek, hevgerî/tenasub û simetrî ye. Xasma di wî esnayî de ku ciwanî wek matematîk hate destnîşan kirin, ev wesif cara ewil derkete pêş. Ciwan ew tişt e ku unsûrên wê bi awayekî mutenasib û muadil lihev bikin û hevgerîyekê pêk bînin. Tiştê bê tenasub ne ciwan e. Li gor Eflatun ciwanî, her tenasuba rast e û xeynî vê tiştê din nîne. Li gor Aristo jî bingeş ciwanê û binaxeya ciwaniyê têkûzî û mezinahî ye. Ji berê de hunermend û filozofan formuleke efsunkâr û muşkilkuşa ya matematîk geriyane û herî dawî ew yek di “pîvana zêrîn” de peyda kirine (Doğan, 1975: 22).

Wesfê din ê ciwaniyê ku bi girêdayî tenasubê ye, simetrî ye. Di navbera beş û cûzên yekûneke ciwan de têkûzîyeke tam, nîzam û întizameke bi pîvan heye. Binaxeya ciwaniya li sirûştê bi gelemperî simetrî ye, yanî li ser simetrîyê derketiye holê. Bedena jîndaran wek çep û rast simetrik e. Di berhemên hunerî de jî îdrak û têgihîştina ciwaniyê bi saya simetrîyê pêk tê. Lewma simetrî ji bo berhemên hunerî pir girîng e.

Ciwanî hevahengîyek e di eşya de ku bi hevkeşîya dijberan/ezdad pêk hatiye. Ev ahenga di kaînatê de ji hêla hunermend ve ger bê qefilandin û neqlî berhemê be, eksa wê di berhema hunerî de jî bê nîşandan, ew behemên hunerî jî ciwan dibin. Di bingeşê harmoniyê de yekîtiya pirhejmar heye, bi gotineke din, binaxeya hevahengîyê, li ser kesret a di wehdetê de ava buye. Her tiştê li kaînatê pir û tevlihev

tên xuyanê. Lê gava di pirhejmariyê de yekîti pêk bê, ew çax hevahengiyek, hêzek, ciwaniyek derdikeve holê (Bodei, 2008: 14).

Wesfên derveyî yên formel ê duduyan jî aheng /harmonî ye. Ji bo hemû ciwaniyan, hevahengiya perçeyan girîng e. Him di yekunên bi hereket de him di yekunên bêhereket de hevahengî muhim e. Jixwe gava aheng tunebe, ciwanî jî di tevahîyê / kullê de namîne. Hunermend di wê qest û daxwazê de ye ku hevdengî, hevengî û hevahengiya veşartî ya di kaînatê û mewcûdat de bibîne, bigre û di berhemên xwe de rave bike.

1.6. Têkiliya Ciwanîyê Bi Hest û Kategoriyên Din ên Estetîkê re

Filozof û estetîknas gava terîfa ciwan û ciwaniyê dikin, wesf û kategoriyên wek heqîqî, kêrhatî, qenc/baş, xweş, kamil, letîf, payebilnd bikartînin. Ciwanî carna bi van wesf û hestan ve tê tevlihevkirin. Carna jî bi van têgehan ve bi awayekî hişke hişk tê girêdanê. Di navbera ciwan û van têgeh û kategoriyan de hêlên cuda û wekhev çine? Em bi kurtasî li ser wan bisekinin.

1.6.1 Ciwanî û Heqîqet /Rastî

Berhem ger li gor fikr û eslê xwe bin, ew çax derdikeve holê ku ew berhem rast e, heqîqî ye. Lewma di vê hêlê de rast û ciwan zanav in, eynî ne. Boilau dibêje ku “Qet tu tiştê ji rastiyê ciwantir nîne”. Îdealistên mîstîk, ciwaniyê wek eksa rastî/heqîqeta îlahî dibînin. Li gor Eflatun û Hegel jî tebîet û berhemên hunerî bi mîqyasa ku îdeyê nîşan bidin û bibin tecellîgaha wê, ciwan in. Zanyarên realist jî dibêjin ku berhema hunerî gava heqîqetê bi awayekî rast rave bike, ciwan e, dibe ciwan (Güney, 2010: 205).

Di navbera gelek rastiyên di matematik, fîzîk û kimyayê û ciwanê de ka çi têkilî û hevparî heye? Carna hin berhemên bi quweta xeyal tên çêkirin û qet tu eleqeyeke wan bi rastiyê tune, ciwan in. Rastî hukmekî mantiqî ye, heçî ciwanî ye hukmekî nîrxî ye. Însan ji bo ku rastiyên zanistî û ciwaniyên hunerî fêm bike, divê ji b ovan her du qadên cuda perwerdehiyên cuda bibîne (Tunalı, 2011b: 137).

Hal ew hal e rast û ciwan, ne eynî tişt in. Yanî ev yek nayê wê maneyê ku rast û ciwan wek hev in. Rast, xizmeta aqil dike, gelemper û razber/mucered e. Hal ew hal e ciwan xîtabî hestên me, xeyalên me dike û şênber e. Hin rastî ciwan in. Lê hin

rastî jî ji ber ku hewes û heyranî, hîs û heyecan, coş û xuroş pêk naynin, wek ciwan naynê dîtinê, ne ciwan in.

1.6.2. Ciwan û Qenc

Fîlozofên wek Sokrates, Platon, Aristoteles, her wiha zanyarên Descartesîst ve Kantîst exlaqparêz in. Ev zanyar di navbera “ciwan” û “qenc”ê de têkiliyeke rasterast datînin. Ciwanî, rastî, qencî, durustî û qencî ye. Ciwan qenc e û qenc ciwan e (Kalokagathia). Di fikr û nêrîna H. Pierren “ciwan, navekî din ê qencyê ye”. Zanyarên exlaqparêz huner û exlaqê dîkin yek û ciwan û qencyê eynî hev dibinin.

Zanyarê estetîknas J. M. Guyau dibêje ku qenc daima faydedar e. Faydedar jî her tim ciwan e. Lewma qenc jî ciwan e. Di fikr û nêrîna Shaftesbury de ciyê ku lê tenasub û têkûzî hebe, ciwanî heye. Her wisa cihê ku ciwanî lê be, qencî û ciwanmêranî/fezîlet heye. Hal ew hale gava ji nêzîk ve lê bê nihêrîn, tê xuyanê ku ciwan û qenc, awha ne hevkelijî û yekpare ne. Belê ciwanî û qencî ew nirx in ku li gor civat û ferdan diguhere, lê qencî guherbartir e, bêhtir diguhere. Tevgerêk yanî lebt û libateke ku ji bo yekî qencî ye, ji bo rakîb, dijber yan neyarê wî xerabî ye. Hereketeke ku di rewş û demeke kifşe de ku wek qencî tê xuyan, eynî hereket di hal û weziyeteke din de dibe ku wek xerabî bê dîtin (Arat, 2006: 21).

Heçî ciwan e, însan dikşîne, cezb dike û tîne heyecanê, balkêş e. Pozekî/wêneyekî çîplax/tezî ê berhemeke hunerî de ji exlaqî ve dibe ku xirab û nerind be, lê mumkun e ku ciwan be. Ciwan ya her kesî ye û her kes li ser ciwaniyê li hev dike. Lê qencî bi gelemperî li gor rewş û menfîetan diguhere (Bal, 2008: 83).

Armancên qenc faydedar in. Heçî ciwan e, ne mumkun e ku her dem bi armanc û faydedar be. Qencî bi rêya aqil tê fêmkirin. Lê ciwanî bi piranî bi heds û hest tê fêmkirin û îdrakkirin. Di qencyê de qaîde û qanûnên muayen hene, merbutiyetên wê hene. Lê ciwanî azadî, serbestî ye. qenciya exlaqî her dem ne sempatik û cazîb e.

1.6.3. Ciwan û Xweş

Em wisa difikirin ku ciwan ji ber ku li me xweş tê lewma em dibêjin ev tişt ciwan e. Di xweşbûnê de ne ku aqlê me, bîleks hestên me feal in. Her wekî ciwaniyê xweşî jî têkildarê bi hestên me ne, ne bi eqlê me. Ew tişt li me xweş tê, ew tişt e ku

em jê hez dikin, hezê dide me. Kesên ku li dû hez û xweşiyê bikevin, dibe ku bikevin rewşeke rezil jî. Hal ew hal e bengîniya ciwanîyê însan mezin dike, ezîz dike, esîl dike, e'îl dike. Ciwanî hêzeke wisa ye ku her daîm me kaşî bal xwe dike, quweteke cazibedar e. Lê mudetê cazibeya hez û xweşiyê zêde nîne, dema wê kurt e (Özden, 2002: 66).

Hez û xweşî bi ciwanîyê re hişke hişk girêdayîye. Lê ciwanî gelo tenê hez û û xweşbûn e? Berhemên ciwan xweş in, hez û kêfê didin meriv. Lê her car ev ne wisa ne. Lewra berhemeke hez û xweşî bide meriv her dem ne ciwan e. Tişteki di rewş û demekê de li me xweş bê, dibe ku piştî wexta yan jî rewş ku biguhere, li meriv xweş neyê.

1.6.4. Ciwan û Faydedar

Fîlozofên serdema Yunana antîk li ser problema ciwan û faydedar sekinîne û ev mijar nîqaş kirine. Ciwan wek faydedar û kêrhatî pênase kirine. Faydedar di heman deme de ciwan e û tiştê ciwan jî her wisa qenc û di eynê wextê de faydedar e. Hal ew hal e Kant piştî ku ciwan û qenc ji hevûdu veqetand, pevgirêdana di navbera ciwan û faydedar jî qut bû. Belê av faydedar e, lê faydedarî û ciwanîya avê her ne eynî ye. Zarokeke ciwan dibe ku faydeyeke wî ji me re tunebe. Bexçeyekî tijî fêzî û sebze faydedar e. Lê parqeke bê meywe û sebze, ciwantir e. Ciwan her dem ciwan e. Lê faydedarî demî ye, muweqet e (Şimşek, 2014: 336).

Ev jî rastiyeke ku însan hey ku diçe mecbur dimîne di derdoreke teknik de bijî. Însan madem ku bi awayekî dûrî ji ciwanîyên tebîetê, bi amûr û haletên însanên tekniker û li hawirdorek ku bi destê wan avabuyî dijî, nexwe divê ev derdor him faydedar him jî ciwan be. Jixwe di jiyana modern de ji aliyekî ve desinatorî/pêşnumakerî û tenzîmkariya derdor, ji hêla din ve qadên zanyariyên hevahengiya însan û teknolojiyê yên wek ergonomi di wê qest û armancê de ne ku hacetên teknîk û dorhêla însan him faydedar him jî ciwan bin (Eco, 2006: 39).

Derman û hin metodên tedawiyê yên ku di tibê de tên bikaranîn, faydedar in. Lê wek ciwan nayên wesifandin. Hin zanyaran gotine ku di navbera ciwan û faydedariyê de qet tu têkilî û pevgirêdanek tune. Her wiha îdia kirine ku fayde û menfîet hunerê xirab dike. Hetta zanyarên wek Schiller û Spencer ev fikr û nêrîna han parastine ku ciwan û faydedarî dijberê hev in.

1.6.5. Ciwan û Berz/ /Muteal

Zanyarên estetîknas berzê/mutealê (transcendental) jî wek ciwanîyê di rêza nirxeke estetik de analiz dikin. Gelo di berhemên hunerî de îdeyên ciwan û berz her dem li ba hev û bi hev re ne? Her dem ne wisa ne. Hin berhemên hunerî yên ku him ciwan him jî payebilind hene. Lêbelê di realiteyê de, her dem ciwan ne payebilind e û payebilind jî her dem ne ciwan e. Payebilind bi gelemperî ew mewcûdat û hedîsatên mezin û bêhudûd in ku însan diperçiqîn in û hukumranî lê dikin.

Însan gava li çoleke xik û xalî bi tena serê bimîne yan jî di bagerekê de ma, wextê ku şevê stêrkên li asîman temaşe dike, çaxê rastî eserekî mîmarî yê muhteşem tê, hesta “payebilindî/muteal” meriv radipêçe. Hin însanên mezin wek payebilind tîr qebûlî kirin. Ew mezinahî û quwetên ku aqilê meriv hilnade û em bi hewes û heyran wan temaşe dikin, wek “payebilindî/muteal” tê îfadekirin. Ev tişt ji ciwan û ciwanîyê cudatir e û wêdetir e (Tunalı, 2011: 226).

Payebilind ji ciwanê qewîtir, bi xoftir û bi sawtir e. Hin tiştên payebilind, ciwan in. Lê hinên wan jî ne ciwan in. Zanyarên vê qadê her wiha hin caran nêrînên bi vî rengî jî nîqaş dikin, derdixin pêş û dibêjin ku dubendiyên wek ciwan û aheng, ciwan û luks, ciwan û letîf jî wek hev in yan jî nêzî hev in. Lê ev wesf û hêmanên han jî her dem ne bi ciwanê re ne.

1.7. Binyad û Taybetiyên Darazên Estetîk

Daraz/hukum, ew îfadeyên fikrî ne ku di derheq tişteki de bi awayekî erênî yan jî neyênî tîr derpêşkirin. Di dîroka felsefeyê de Aristoteles û Kant du zanyar in ku li ser darazê herî zêde sekinîne. Mumkun e ku daraz bi çendîn awa bîne dabeşkirin. Lê ji hêla mijara me ya berdest ve em dikarin darazan wek darazên zanyarî (cognitive) û estetik veqetînin du qisman.

Darazên zanyarî ew darazên objektîv in ku li gor mantiqa rast û xelet tîr analîzkirin. Hal ew hal e darazên estetîk darazên subjektîv in. Ev daraz li gor mantiqa rast û xelet nayê nirxandin. Di dîroka felsefeyê de cara pêşîn I. Kant û L. Wittgenstein li ser sazkirina mantiqê estetik xebitîne. Her wiha zanista estetîk wek mantiqeke darazên estetîk pêş xistine. Darazên estetîk ne girdayî tîgehên wek zanyarî ne, bîleks tabiyê hestên însan in. Lewma bi qaîdeyên mantiqî ve nayê girêdanê. Daraza estetîk di nav lîstikeke hevaheng û azad a hestiyarî, hiş û hêza xeyal a însan de derdkeve holê (Bal, 2008: 83).

Daraza estetîk, ne darazeke exlaq û zanyarê ye û wek wan objektîf nîne. Ev daraz ji ber ku girêdayî bi hez û zewq girtin û negirtinê ye, subjektîf e. Daraza estetîk ne bi armanca bidestxistina menfîetê ye, bes tabiyê seyr û temaşeyê ye û têkildarê bi ecibandinê ye. Darazên estetîk ji bo ku bi awayekî rind bîn fêrî kirin û têgihîştin, divê ku bi kurtasî li taybetiyên wan bê nihêrîn. Di serê serî da divê bê zanîn ku darazên estetîk, ferdî ne, yanî takekesî ne. Her kes bi qayîlbûn û ecibandina xwe bi awayekî azadane dinirxîne û tîne ziman. Ec ecibandin bi temamî girêdayî bi hestên meriv in û bi her awayî taybet in, xasê bi takekes in.

Darazên estetîk subjektîf in. Reng, deng, şekil ji hêla şexsan ve bi awayên cîyawaz hatine nirxandin. Bûyerên xweşhatina li meriv û ciwandîtîna wek darazên mantiqî nayêne analîzkirin. Qet tu kes nikare tiştê ku ciwan dibîne, ji însanên din jî hêvî bike, bixwaze. Lewra subjektîfbûna van cure darazan ji serî de tê qebûlkirin. Lê divê di vir de meriv nekeve nav anarşîzma darazan.

Darazên estetîk hevpar in. Zerûriyeteke bêşert a darazên estetîk tune. Lê ev daraz divê ji darazên keyfî yê ku tenê girêdayî lê xweş hatinê, bê prensîb ê bê esas jî bîn veqetandin. Di nirxandina berhemên hunerî de zerûriyeteke pratîk jî heye. Însanên bi awayekî azad hukûm didin, yanî didarizînin, li gor wê hesta hevpar a estetîk a wê dewranê ya di wê civatê de carî (sensus communis aestheticus) hereket dikin. Her çqas ev hest subjektîf be jî, di hemû însanan de hevpar e, muşterek e. Lewra heman hest li her derê û her dem heye di her însanî de (Delice, 2007: 6).

Darazên estetîk zerûrî ne. Ev zerûriyet ji hesta hevpar a estetîk tê. Cihana ciwanê ew qad e ku em jê re dibêjin “xweş”. Her çiqas ew hez û zewqa ku ji xweşbûnê tê, bi temamî keyfî û şexsî be jî, ew hez û zewqa ku ji ciwanê tê, di herkesî de heye, gelemperî ye. Lewma lêxweşhatineke zerûrî ye. Ev hez, “hez”ek e ne ferdî ye û divê di hemû însanan de hebe.

Darazên estetîk gelemperî ne. Ger çi gava me taybetiyên darazên estetîk jîmatin, me qala ferdîbûna wan kir. Lêbelê gava meriv bi awayekî gelemperî binirxîne, derdikeve holê ku daraza estetîk ji wan darazan e ku ji ferdîbûnê wêdetir e, yanî fewqeferdiyet e, tabiyê hesta hevpar a estetîk e, zerûrî û xwedî umuûmiyetê ye. Ev rewş, rewşeke îdeal e. Însan tiştê ku ciwan dibîne, dixwaze ku însanê din jî wê ciwan bibînin, biecibînin. Lê gava em însanên ji çandên cuda, ji dewrên cuda, ji astên perwedehiyên cuda tînin ber çavên xwe û dinirxînin, em dibînin ku ew darazên estetîk ku ew kes gihîştinê, wan bi dest xistine, zêdetir ferdî ne, yanî takekesî ne.

Gelemperîbûna darazên estetîk, gelemperiyeke subjektîf e. Ew tiştên di dunyayê de hene wek berhemên ku bûne klasîk ên dîroka hunerê û li hemû alemê hêja û qiymetdar hatine dîtin, elamet e û nîşan didin ku darazên gelemperî ên estetîk hene. Ev darazên gelemperî realîteyek e. Wek mînak, ji qadên wek mîmarî, resim, peyker, bîna, edebiyat, muzîk û hwd. gelek berhemên hunerî ku bûne malê mîrasa zewqa estetîk û hunerî ya cîhanşimûl hene (Timuçin, 2004: 245).

Darazên estetîk relatîf in. Me ji aliyekî de got darazên estetîk darazên ferdî û keyfî ne, ji aliyekî din ve jî ew wek zerûrî, gelemperî û fewqeferd yanî ji takekesî wêdetir nîşan da. Li vir du fikrên her wekî dijber û nelihevkirî tên xuyan. (antonimia). Hal ew hal e ger em dîqet bikin ku di alema darazên estetîk de ji ber ku muteberiyeta relatîf heye, ew çax ew fikrên wek nakok/tezaad dixuyên ên li jor bi xwe berê her yek li cihê xwe bi maqûlî diedile.

Darazên estetîk fikrî ne. Ev nêrîn û ramana dijberî wesfên jimarî yên daraza estetîk, ya L. Wittgenstein e. li gor vî zanyarî di bingeha daraza estetîk de hestiyarî, hîssiyat tune. Bîleks zanyarî û fikriyat heye. Yên ku daraza estetîk didin, pisporên mijarê ne. Însanên din jî dibin tabiyê wan, yanî li dû wan diçin (Burke, 2008: 96).

Çanda însaniyetê ya îroyîn ji ber ku bingeha xwe ji çanda dîrokî ya ji navendên cuda û cihêreng wergirtiye, li herêmên cuda yên li dunyayê, çandên ciyawaz dijîn. Berhemên hunerî di nav avaniya xwe de derdikevin holê. Ew ecibîn û qayîlbûnên estetîk ku van berheman dinirxînin jî li gor her çandekê guherbar e, ciyawaz e, relatîf in. Her wiha di nav çandekê de perwerdehî jî li ecibîn û qayîliyên însan bi tesîr in. Lewma darazên estetîk ên însanên xwedî perwerdehiyên cuda jî ji hev cudatir in. Digel vê însanên di nav heman çand û asta perwerdehî de jî ji ber ku xwedî binyadên cihêreng ên psîkolojîk in, dîsa dê relativîya darazên estetîk derkeve holê.

1.7.1. Darazên Hevpar ên Estetîk

Berhemeke hunerî bi cehda hevpar a hunermend û xwendekar/temaşevan/guhdarê xwedî zewq û ecibîna estetîk derdikeve holê ku wan hêja dibînin. Di qada estetîkê de mijareke ku herî zêde nîqaş li ser hene, jê yek jî ev e ku gelo di navbera însanan de darazên hevpar ên estetîk hene yan na? Fikr û nêrînên di vê qadê de jî vediqetin du beşên dijberî hev:

1) Yên îddia dikin ku darazên hevpar ên estetîk tune:

Gotina di zimanê Latinî de ya wek “De gustibus non est disputandum” ku maneya wê ya bi Kurdî wek “Reng û zewq nayêne nîqaşkirin” ji berê de wek delîl e di destê dijberên darazên hevpar ên estetîk de. Li gor parastvanên vê fikrê ji bo her kesî zewqek, ecibandinek heye. Hin ji sosinê hez dikin hin ji beybûnê; hin ji tetîla li ber peravê behrê hin ji tetîla li serê çîyan; hin ji şîrê hin ji muzîkê; hin ji reş hez dikin hin ji sipî; hin ji muzîka arebesk, hin ji klamên dengbêjiyê hin ji yên gelêrê... yanî her kes zewq û ecibandineke wî heye û rastbûn û xeletbûna wî nayête munaqesekirin. Zewq û qayîlbûna her kesî li gor xwe rast e, heqdar e. Hûn dikarin bibêjin “ka gelo ji çikê wî hez dike” lêbelê hûn nikarin sedemê hezkirina wî bipirsn, muaxeze bikin, yanî nabe ku bê pirsîn ku “çima hez dike?”

Di dîroka felsefeyê de yên ku gotine darazên hevpar ên estetîk, hetta darazên exlaqî û mantqî yên hevpar jî tunene û bi nîqaş in, zanyarên sofist/sofestayî ne, piştî wextan jî zanyarên sansualîzm ev nêrîn û fikr dane dewamkirin. Li gor wan madem ku zanyariyên me girêdayî bi hestiyariyên me ne, ew çax ji bo her kesî darazên wî û zanyariyên mehsûlê hestiyariyên wî, rast in. Qet tu kes nikare îddia bike ku dê zanyariyên ji hestiyariyên xwe rasttir bi dest bixe. Ev tişt di darazên estetîk ên tabiyê zewq û ecibînan de hiç nayê gotin, yanî qet ne mumkun e (Orman, 2010: 61).

Kant vê rewşa han awha şîrove dike: Hin xweşlêhatin û ecibandinên takekesî, girêdayî meylên şexsî û taybetiyên kesayetîya wî ne; lewma nayêne nîqaşkirin. Lê ew ciwana ku bingeha darazên estetîk e, ewqas jî ne şexsî ye. Lewma ev darazên estetîk ku di her kesî de li gor zewqên hevpar ên estetîk tên dayîn, tên nîqaşkirin.

Lêbelê dîsa jî di sedemên cuda yên tarîxî de di civatên cuda û hetta di nav grûbên cuda yên eynî civatê de tên xuyan ku darazên estetîk ên dijber hene. Sedemê vê yekê ew e ku darazên estetîk çandî û şexsî ne. Ew faktorên kesayet û çandê tesîr dike, di heman demê de daraza estetîk jî tesîr dike.

Di serdemên cuda yên tarîxî yên civatekê de darazên cuda yên estetîk mumkûn in. Her wiha di heman dewranê de civakên cuda yên dinî, millî, mihellî û sinifî mimkun e ku xwedî nirx û darazên cîyawaz ên estetîk bin. Di civatekê de ciwan, extiyar, xwenda, nexwenda hemû xwedî zewqên cuda ne. Her wiha her cure faktorên bi bandor ên wek taybetiyên bingeîn ên psîkolojîk her wekî qereker, mîzaç jî tesîr li darazên estetîk dikin.

2) Yên ku darazên hevpar ên estetîk dipejirînin:

Gava me li jor behsa taybetiyên darazên estetîk kirin, hate me îşaret kirin ku her çiqas ev daraz subjektîf bin jî, gelemperitiyekê û zerûrbûnekê rave dikin. Hin hunermend û berhemên wan ên ku pêk anîne, pir tîn xwendin, temaşekirin, guhdarîkirin, hezkirin. Lewma derdikeve holê ku di van de nirx û qîmetên bilind ên estetîk hene ku ji hêla piraniya xelqê ve tîn qebûlîkirin, ecibandin.

Kant dibêje ku hin darazên li ser bingeha ecibandina hestiyarî bi temamî darazên şexsî yên mehdûd û muweqet in/ demî ne. Lêbelê darazên rastîn ên estetîk ew daraz in ku ji hestiyariyê derdikevin, derbas dibin û digihêjn asta fikrî, her wiha ji takekesiyê derdikevin, dikevin rewşa zerûrî û gelemperî. Baumgarten jî ciwaniyê wek kategoriyeke mantiqî ya “ heval cewiyê heqîqetê” dipejirand. Her wiha li ser hin darazên estetîk darazên mantiqî saz dikir û darazên gelemperî yên objektîf ên wek “hemû kulîlk ciwan in”, “hemû berhemên Betofîn ciwan in” bi dest dixist (Bal, 2008: 83).

Her wiha Kant darazên ecibandinê wek wan darazan dinirxîne ku bingeha wan hestên estetîk ên hevpar ên însan in. Di wê fikrê de ye ku darazên hevpar ên estetîk ji bo însan hene.

Zanyarên wek L.Wittgenstein darazên estetîk ji zewq û kêfxweşiyên şexsî derdixe û bi temamî bi pisporyê ve gire dide, her wiha wan wek darazên hevpar û daîmî destnîşan dike. Yanî hest û hestiyariyê ji bingeha darazên estetîk derdixe. Di dewsa wê de fikriyat û zanyariyê bi cih dike.

Di derheq daraza estetîk de estetîknasê Îtalyan Benedetto Croce jî darazên hevpar ên estetîk dipejirîne. Benedetto Croce fikrên di vê derbarê de vediqetîne bi sê beşan.

1. Mitleqparêzên ku dibêjin daraza estetîk zerûrî û xwedî muteberiyeteke gelemperî ye.
2. Şikparêzên (septîk, relativist û psikologîst) ku dibêjin ku darazên estetîk ên wek hez û êş subjektîf in; ev hukum nayêne nîqaşkirin.
3. Relativistên ku dibêjin darazên zanist û exlaq, ne xwedî muteberiyetên gelemperî û mutlaq in, her wiha darazên estetîk jî wisa.

Croce tevlî van hemû fikran jî nabe. Li gor fikra wî, berhema hunerî bi pîvanên mantiqî, li gor hêzên metafîzîk nayête darizîn. Nirxeke estetîk heye û ev nirxdaraz, wek darazên zanist û exlaq xwedî muteberiyeta gelemperî û mutlaq in. Lê

pîvana vê ecibandinê ya di bingeha wê de heds e, his e, hestpêkirin e (Uyanîk, 2012: 257).

Ew çax wek rastiya mantiqî ya wan darazên li ser bingeha zanyariyê, rastiya mantiqî û muteberiyeta gelemperî ya darazên estetîk derdikeve holê ku li ser bingeha hevahengî û girêdana bi qaîdeyan e.

1.8. Çavkaniya Fıkra Estetîkê Rojava ye yan Rojhilat

Estetîk mijareke qedîm e. Çavkanî û jêdera estetîkê heta bi serdema antikiteyê dirêj dibe. Piştî wexta her cure pêşketin û nîqaşên bi eleqedarê vê qadê li erdnîgariya Ewrûpayê hatin xuyanê. Lewma ev yek bû sebeb her wekî ku ev têgeh tenê xasê bi Ewrûpayê ye. Hal ew hal e di serî de di medeniyeta Îslamê de, di medeniyetên qedîm ên wek Hînd, Misir, Mezopotamyayê de fêmdariyeke estetîk heye. Her wiha di vê dawiyê de di vê hêlê de gelek xebat hatine kirin û hê jî berdewam in.

Di dîroka me ya rojhilatê de xasma di sedema edebiyata klasîk de, estetîk di zimanên me yên rojhilatî de bi terkîbên wek “îlmê bedayî, îlmê hîs û îlmê husn, îlmê cemal, îlmê cemaşînasî” dihate îfadekirin. Her wisa, estetîk di serî de di şîrên Melayê Cizîrî de, di berhemên edîb û şairên me yên Kurdînûs de jî bi têgeha “ciwan”, “husn û cemal” cih digre. Lewma estetîk ji hêla mijarê ve di medeniyeta me de xwedî paşerojeke qedîm e (Turan, 2018: 78).

Beriya ku em li ser nêrîna estetîk a çand û medeniyeta Îslamî bisekinin, divê meriv behsa fêmdariya estetîk a Rojava jî bike ku gelek zanyaran li vê erdnîgariyê di peywenda metafîzîk de ev têgeh çawa nirxandine. Di vê babetê de nêrîna esasî ev e ku nirxandina ciwanê ya wek cewher û eslekê ye li dervayî xuyaneh û tecellîgahên xwe yên wek tebîet û senetê. Gava em dibêjin ku “rûyê ciwan, gula ciwan, hespê ciwan, dara ciwan, bajarê ciwan û hwd.” ev ne ciwan bi xwe ye; bîleks xuyan û eksên ciwanê yên ferdî ne. Têgihîştina ciwaniya van, girêdayî bi nasîna ciwanê bi xwe ye. Ew jî bes bi awayekî fikrî tê naskirin.

Fîlozofê Yunan Eflatun (Platon) têgeha estetîk di mane û bingeha metafîzîk de dinirxîne. Li gor Eflatun du telaqiyên ciwanyê hene ku ew jî ciwanya “mutleq” û ciwaniya “îzafî”. Fêmdariya wî ya ciwaniya mutleq, piştî wî xasma di alema Îslamê de wek “ciwaniya îlahî” hatiye şîrovekirin. Wihareng Eflatun xîm û binaxeya estetîkeke îdealîst-metafîzîk daniye. Li gor fîlozofê Îngilîz Shaftesbury (1671-1713) rastî û heqîqet divê di du maneyan de bê fêmkirin 1) Ontolojîk, 2) Exlaqî. Di maneya

ontolojik de heqîqet, fêmkirina avahîsaziya mewcûdat yan kaînâtê ye, têgihîştina aheng û qanûna îdareya wê, esl û nîzama wê ye (Cevizci, 2015: 186).

Di maneya exlaqî de heqîqet yan jî rastî bi “fezilet (ciwanmêranî)” û “qenc”ê ve tê fêmkirin. Li gor Shaftes-bury ciwaniya herî tabîî, rastî ya bi durustî û exlaqî ye. Ciwanî, ew tiştê bi fezilet û qenc e. Li gor vê, li ku derê hevgerî (nisbet) û têkûzî (tertîb) hebe, li wir ciwanî heye. Li gor Leibniz ew tiştê hevaheng û ciwan, di heman demê de tişteke qenc e. Ev tişt, ne tenê tişteke xarîcî ya tabîî ye, her wiha tişteke ruhî ye. Lewra di tiştê ruhî de jî pîvan/nisbet û aheng heye; ew jî tişteke qenc û exlaqî ye.

Li gor filozofên wek Shaftesbury û Eflâtun xweditiya ruhekî qenc û ciwan, çavkaniya dilşadî û seadeta însan e. Lewra “ciwan”, tîmsala qenc û exlaqî ye. Di navbera ciwan û heqîqetê da munasebet heye. Heqîqet yan jî rastî, ne mantqî ye, di maneya metafizik de ye. Li ser meselê li gor M. Heidegger di navbera ciwanî û rastîyê de pevgirêdaneke şidyayî heye. Li gor wî, ciwan cureyekî ronahî û rewşenîya mewcûdat e. Heqîqet, heqîqeta eşya ye (Eco, 2006: 39).

Lewma li gor gelek zanyarên serdema nûjen jî “ciwan”, heyat e, şeklê jîndaran e, şewq û şemala alemê ye. Her wiha ciwana li kaînâtê û di hunerê de, fealiyeteke yekane ye ku dibite wesîleya îdraka Saniê Mutlaq.

Li gor zanyarên qadê yê afîrînpîrêz cewherê eslî yê her tiştî Xweda ye. Heçî Xweda ye, tam e. Tiştê ku tam e, ciwan e. Lewma ji xeynî Xweda senetkar û ji xeynî senetê wî, senet tune. Ciwaniya bêdawî Ûlûhiyet e. Her wiha li gor zanyarên xwedî vê fikr û nêrînê di heman demê de ciwanî, ji suflî ber bi ûlwî ve di dereceyên cuda de xwedî qîmetêke bi esrar û nihênî ye. Her wekî van zanyaran hin ciwannas jî ciwanê wek elametê “xêr”ê, kirêtiyê jî wek elametê “şer”ê dihesibînin. Li gor wan di xêrê de sê wesfên wek quwet, hikmet û eşq hene.

Hin zanyarên ciwannas di derbarê ciwanê de wek kurtiya nêzîktayîya xwe bi awayekî gelemperî dibêjin ku ciwan ahenga kainatê ye. Ciwan ne eleqedarê bi fealiyetên teorîk û pratîk e, ayîdî alemeke ûlwî û aram, yanî ji alema mutleq a ruh e ku ev alem jî bi dîn û felsefeyê ve hevkelijîye û hevrenge buye. Ev qismê ji wan nêrînan in ku di zemînên metafizîk de ji zanyarên rojavayî yê di derbarê têgeha “ciwan”ê de hatine derpêşkirin (Timuroğlu, 2013: 419).

Qurana Kerîm jî gelek caran behsa “ciwan” û “ciwaniyê” dike ku referansa bîngehîn a Îslâmê ye. Her wiha têgehên wek “qenc”, “xweş”, “xêr”, “rast”, “heqîqet”, “faydedar” ku tezahur û xuyangên cihêreng ên “ciwan”ê ne, di ayetên

kerîme da pir derbas dibin. Quran pêşî bala beşeriyetê dikşîne ser ciwaniya eşya û hêla wê ya hissî; paşê hêla wê ya fikrî li ber çav û hişê însan radixe. Ayatên Quranê tîne ziman ku kaînat bi her hêlê ve bi ciwaniyê tije ye û Xweda wek Xaliq “Afîrînerê herî ciwan / Ehsenul Xaliqîn” e (Mumînûn: 14). Li ser Meseleyê, ayeta heştan a Suretê Secdeyê awha ye: “Xweda her tişt bi awayekî herî ciwan çêkiriye/afirandiye”. Ev ayeta kerîme tîne ziman ku çavkaniya ciwaniya di senetê de, ji Senetkar e. Xaliqê hemû ciwanan ji ber ku bêqusûr e, helbet dê ji hemû mexlûqat ciwantir be.

Her tişt a ciwan û ciwaniya di wî tiştî de, temaşevanê wê ciwaniyê, sewqî bi bal xaliq, senetkar û afîrînerê wê ciwaniyê dike, wî nîşan dide. Lêbelê “însan bi nîşanê malûl e”, yanî muptelayê bi nexwaşiya jibîrkirinê, xefletê ye. Lewma pirî caran jibîr dike, nikare ji eser derbasî muessîr be, yanî tînegihêjê ku li senet binêre û senetkar bibîne û nas bike. Bes di senetê ciwan de asê dimîne. Hal ew hal e ew ciwanî ne ya wî senetî ye, ne ji wî senetî ye. Ew çax meqsed û matlûb jî hasil nabe (Koç, 2018: 67).

Va ye Quran lewma pirî caran bibîr dixê ku “Xaliq û Afîrînerê herî ciwan Xweda çi Ezîz e” (Muminun 23/15; Saffat 37/125). Heman ayet di cihên din de jî bi awayekî eşkeretir ciwanê bi ciwanê terîf dike û tekraren vedibêje. “Ew Xweda ye ku çêkiriye, bi ciwan/xweşik afirandiye, şekl û şemal daye mexlûqatê xwe, navên herî xweşik û ciwan yên Wî ne” (Heşr: 24, 59). Di ronayiya vê ayetê de meriv dikare bibêje ku Ciwanê heqîqîyê ye ku ciwan/xweşik afirandiye û bibê nebê xwediyê navên ciwan e. Tiştêkî ji vê yekê tabîtir û maqûltir heye gelo? Di gelek ayetan de ev xusûs awha tê teyîdkirin: “Navên herî xweşik û ciwan, yên Xweda ne” (Taha: 20).

Quran ji bo ku ciwaniya di kaînatê de bi însan bide temaşekirin, ji tişt a herî nêzî wî destpê dike. Li însan tê tewsiyekirin ku însan ji xwe destpê bike û tîkiliya eser û muessîr derdixe pêş: “Xweda we sêwirandiye/ şekil daye we û şeklê we jî ciwan çêkiriye” (Texabun: 3)

Wihareng bi wê tenasub (hevgirî), nîzam, ciwaniya şeklî ku wek wesfên ciwanê ne, tê xwesitin ku xwedî û xaliqê vê ciwaniyê bê nîşandan. Her wiha ciwaniya di afirandina Xaliqê ciwan de, bi ûlwiyetê (muteal) bêhtir tê ciwan kirin. Li însan tê bibîrxistin ku ciwaniyê terkîb bike û bibîne, paşê jî ji ciwaniyên demî qelbê xwe rizgar bike û ber bi ciwana rastîn û eslî bimeşe. Lewma dibêje: “Yê ku her tişt bi awayekî herî ciwan çêkiriye, yê ku însan sifte ji heriyê xuliqandiye, paşê esl û neslê

wî ji avmeniyêke besît afirandiye, paşê jî ew sêwirand, şêkil dayê û ji ruhê xwe pîf kirê Xweda ye” (Secde: 9).

Însanê ku ji ruhê Xaliq tiştêk wergirtiye, bi vê ya ve ûlwiyet peyda kiriye û ciwan buye. Êlwiyet ciwanî ye. Êdî ku wisa ne, însan du qat/car ciwan e: Ya ewil, bi wê îtibarê ku eserê Xaliqê Ciwantir (Ehsen) e, lewma ciwan e. Ya din jî ji ber ku Xweda ji ruhê xwe pufî wî kiriye û wihareng pê serfînyaz buye û ûlwiyet qezenc kiriye, lewma ciwan e.

Bêguman tiştê ku ciwaniya şêkil derdixê holê, di tiştê ciwan de ciwaniya şêkil pêk tîne, xusûsên wek nîzam, simetri, tenasub (hevgirî) û hudûdê kifşe (muayyen) nîşan dide, pîvan e. Gava şêkil di nav pîvanên kifşe de pêk bîn, ciwan derdikeve holê. Ew eşyayê ku tê de pîvan/nîsbet hebe, ciwan e (Koç, 2018: 34).

Xwedayê ku Ciwantirîn ê afirîneran e, hemû mewcûdatê di kaînatê di nav pîvaneke wisa ecêb de çêkiriye ku çavên ku dibînin, aqilên ku têdighêjin, di nav heyretê de dimînin. Li hemberî vê tenzîma ciwan a Xaliq bi xuşû serfurû dîkin û diçin secdeyê. Heta niha qet kesekî qet tu kêmasî û bêahengiyekê nedîtiye, tesbît nekiriye. Ya rast, hebûna kesekî xwedî îdiayeke bi vî rengî jî ne mumkun e. Lewra Qurana Ezîmuşşan, di vê derheqê de, yanî di derheqê dîtina qusûrê de ji însan re meydan xwendiyê. Her wiha beyan kiriye ku însan eslen û qeten nikare wê qusûra li dûye, bibîne. Lewra “Her tişt li gor pîvanekê hatiye çêkirin û têkûz kirin” (Qemer: 49).

Nêrîna li ciwan û ciwaniyê ya serdema klasîk her çiqas bi gelemperî li ser hizra dînê Îslamê geş bûbe jî, ji nêrîn û nêzîktahiyên felsefî yên dêrîn/antîk û ceribîn û pratîkên mîstîzma sofîgeriyê jî bêpar nîne. Ev paşxaneyê dêrîn bi hêl, nêrîn û tesewirên xwe yên ontolojîk ên nêzî nêrînên Îslamî, tevî muktesebata dînî ya serdemê bûne.

BEŞA II

ESTETÎK Û EDEBIYAT

2.1. Ciwan, Ciwanî û Edebiyat

2.1.1. Edebiyat û Girîngiya Ziman Di Edebiyatê de

Însan ji bo derbirîna hest û ramanên xwe gelek rê û rêbazên hunerî yên wek peykersazî, muzîk, resim û hwd. bidest xistine. Edebiyat jî yek ji van huneran e. Edebiyat wek gotin û nivîsa bi bandor û estetîk, nirxekî xasê bi însan e û di neynika dîl û hişê mirov de diîse û diçûrise. Her wisa bi rêya xeberdan, bi saya xame û xetê, bi gotineke din, bi rêya destedewra bi vegotin û nivîsê mayinde dibe û wek cewherekî dibe mîras û dikeve destê nîfşên nû. Edebiyat ji ber ku fêkî û berhemê ruh û eqlê însan e, wek hunerekî di qada zanistî de cih digre (Eagleton, 2011: 15).

Her şaxeke hunerê li gor binyad û armanca xwe amûreke vegêranê bi kar tîne. Amûr û wasiteya xweîfadekirin û vegotinê ya edebiyatê jî ziman e. Lêbelê rewş û çawaniya zimanê hevpar ê di eserên edebî da ciyawaz ye. Her wisa ji vê ciyawaziyê re jî tê gotin zimanê edebî. Ev zimanê edebî dewlemendiya ziman û edebiyata wî mîletî pêk tîne û nîşaneyê wê ye.

Edebiyat peyveke ji Erebî ye û di zimanê Erebî de forma pirjimar a peyva “edebiyye”yê ye. Peyva “edebiyat”ê wek têgeh di Kurdî de di serê serdema modern da hatiye bikaranîn. Beriya wexta di dewsa vê têgehê da termên wek nezm, şîr, edeb, kelmê mewzûn û hwd. hatine emilandin. Edeb bêhtir di maneya gotinên xweş û zerîf û rê û rêbazên vegotina wan da hatiye bikaranîn. Heçî nezm û kelmê mewzûn e ji bo vegotinên bi wezn û kafiye yên wek helbest û şîr hatine gotin. Peyva edebiyatê di maneya wê ya îroyîn de cara ewil di nivîsên kesayetiyên Kurdînûs û edebiyatnasên me yên pêşîn ê serdema modern ên êwra Stenbola Osmanî yên wek Mîqdad Bedirxan, Xelîl Xeyalî (1864-1946), Hemzeyê Miksî (1892- 1958), Bediuzeman Seîdê Kurdî (1878-1960) û hwd. de derbas dibe (Adak, 2015: 27).

Têgeha edebiyatê di dewsa peyva “Lîteratur”ê ya Fransîzî da hatiye emilandin. Bingeha vê peyvê ji zimanê Latînî ye û ji “littera” ya ku di maneya “herf”ê de ye hatiye dariştin. Lîteratura di Latînî de ji bo alfabe, nivîs, gramer, filolojî û zanistê tê gotin. Heçî littérature di Fransîzî de xeynî maneya xwe ya

edebiyatê, ji bo îfadekirina berhemên edebî, çavkaniyên nivîskî, lêkolînên edebiyatê û her wisa di maneya çand û nivîskariyê de jî tê bikaranîn.

Her wekî bikaranîna peyva *littératureyê* ya li Ewrûpa, li qadên heyata çand, huner a Kurdan û milletên cinar de jî terme edebiyatê li dervayî maneya xwe ya berbelav tê emilandin. Ev peyv gava bi têgehên wek tip, muzîk, huqûq hwd bê bikaranîn, nivîs û berhemên ku li ser mijarên huner yan jî şaxezanistekê tîne ziman. Di pêvajoya xweserî û serxwebûna zanistên curbecur de, demeke dirêj metnên edebî û ne edebî ji hev nehatine veqetandin, di nav hev de hatine tomarkirin. Lewma di kitêbên tarîxa edebiyata Yûnanan de kesayetiyên matamatîk û digel şair û edeban cih girtine. Heta sedsalên XVIII. û XIXan ev erewş tiştekî ne xerîb bû (Jusdanis, 1998: 79)

Carinan jî ji bo îfadekirina tevahiya berhemên hizrî yên miletekî tê gotin ku ji hêla wî miletî ve bi tesîra edebiyat û cereyanên edebî yên di serdemekê de pêk hatiye. Ser meseleyê; wek Edebiyata Kurdî ya Klasîk, edebiyata Kurdî ya sedsala XVII., Edebiyata Tirkî ya sedsala XVIII. û hwd. Peyva edeb a ku çavkaniya edebiyatê ye di serdema berî Îslamê de di maneya “vexwendin, “dawet”, “daweta ji bo xwarinê” de bû. Ji ber ku di civata Ereban de destfirehtî û comerdî wek fezîleteke mezin dihate dîtin, ev peyv bi dirêjahiya demê re maneyeke wek “daweta ji bo fezîletê” jî wergirtiye. Maneyên wek baş/başî, terbiye, nezaket, bi aqiltî/hişmendî, zerafet di çarçoveya vê peyvê de û di perspektîfa exlaqî de hatine lêkirin û lê hatine barkirin (Doğan, 2000: 443).

Piştî bikaranîna peyva edebiyatê, ev têgeh wek amûr û wesîleyeke guherîn û veguherîna civakî, wek rêyeke perwedekirin û hişyarkirina ferd û millet hatiye dîtin. Her wisa bo însa û avakirina neteweyekî hevgirtî û hevaheng roleke berbiçav û sereke lê hatiye barkirin. Edebiyatnas û rewşenbîrên Kurd ên serdema modern ên sedsalên XIX. û XXan ên li Stenbolê û yên şopînerên ekola Hawarê li Şamê di vê çarçoveyê de li edebiyatê nihêrîne (Bozarslan, 2005: 90).

Hasil edebiyat wek gotin û nivîsa bi bandor û estetîk, hunereke vegotinê ye. Her wisa nirxekî xasê bi însan e û di neynika dil û hişê mirov de diîse û diçûrise. Sermayeya fikrî û hîssî ya milletekî ye ku di însaya nasnameya netewî de jî xwedî roleke sereke ye.

Ziman keresteyê eslî yê edebiyatê ye. Ziman edebiyatê ji qadên din vediqetîne û jê re dibe hêmaneke bingeîn û ciyawaz. Lewma ji bo fêmkirina rola

ziman a di edebiyatê de divê di navbera edebiyatê û zanistên din de berawirdiyeke piçûk bê kirin. Zanist li dû rastiyan şênber in, li realiteyan muşexxes digerin û digel ku xwedî zimanên sembolik in, lê dîsa jî zimanekî ne sembol/bêalegorî bikartînin. Lewma encam û daneyên zanistî yên bi vî zimanî jî hêla zanyar û pisporên heman qadê ve bi heman awayî tê fêmkirin. Lêbelê armanca wî zimanê ku di metnên edebî de tê emilandin ew e ku di însan de kelecana û coşekê pêk bîne û hez, zewq û lezzetêke estetîk bide. Wuhareng tê xuyanê ku qest û mebest ji eserên edebî ne peyrewî û şopîneriya rastiye ye; bereks hilberandina ji nû ve ya rastiye ye, yanî nûvejandineke rastiye ye di form û qalibekî nû de.

Berhemên edebiyatê yên rastîn, yanî eserên heqîqî jî di merheleya “jinûve sazî”yê de derdikevin holê. Êdî di vê xalê de ne ku behsa “rastiya objektîv” bê kirin, berkesk behs behsa “rastiya edebî” ye. Ev rastî jî xasê bi edebiyatê ye û subjektîv e. Ji ber vê qasê di zanistê de zimanekî girêdayî rastiye, qîmet û hêjayiya ked û xebata zanistî nîşan dide. Lê di edebiyatê de ew ziman hêja û meqbûl e ku rastiye li gor îdrak û hestpêkirina hunermend destedewr û neql bike, yanî veguhêze. Ev ziman wesfê bingeîn ê edebiyatê pêk tîne. Lewma ne bes e û têrê nake ku mijarek tenê wek problemekê di metnê edebî de cih bigre. Kifş e ku ziman di edebiyatê de unsûrekî navendî ye. Lewma jî di pênasîya edebiyatê de jî pîvaneke bingeîn e (Eminoğlu, 2021a: 23).

Edebiyat têgeheke pir alî û pir mane ye. Her çiqas li ser terîfa wê konsensus û lihevkirineke eyan û beyan tunebe jî di ronahiya dane û diyardeyan ku li jor hatine derpêşkirin de meriv dikare ji bo edebiyatê terîfekê bike. Edebiyat vegotina hest û ramanekê ya bi alikariya zimanekî wisa ne ku di ruhê meriv de kelecana û kêfxweşî û hesteke estetîk hişyar bike, derxîne holê. Edebiyat navê berhema edebî ye ku bûye objeyeke estetîk û neynikeke wê. Bi gotîneke din a berfirehtir edebiyat navê aktîvîte û çalakîyekê ye ku ahenga naverok û dirûvê li dora tahmeke estetîk ava dike (Alan, 2015: 82).

Ew çax ziman ne ku tenê melzeme û keresteyekî edebiyatê ye, bes amûrekî bi bandor ê vegêran û vegotinê ye ku ji bo bikêrînan û bikaranîna herî payebilind a hemû cure behs û babetên ku melzeme ne ji bo edebiyatê. Ew tiştên ku bibin babet ji zanistê re mehdûd in. Hal ew hal e mijarên edebiyatê bêsînor in. Nivîskar yan şairek çî tiştê ku hêjayî vegotinê bibîne, mijar e ji bo edebiyatê. Digel vê yekê jiber ku edebiyat di heman demê de hêmanek ji hêmanên çandî ye di hemû civatan de lazim

hatiye ku mijarên edebiyatê jî hevrenge û hevdengê wê civatê bin. Lêpîrsîna fonksiyona edebiyatê îcab dike ku meriv miqateyî naveroka wê be û wê paşguh neke.

Ji Aristo (Aristoteles, B.Z.384-332) vir de newekhevî, hevnegirtin û nakokiya di navbera mijarên edebiyatê û hêvî-daxwazên însan de her berdewam e. Aristo di berhema xwe ya bi navê Poetikayê de ji ber ku li ser mijarên esîlzade û payebilind sekinîne pesnê nivîskarên trajediyê dide. Lê nivîskarên komediyê rexne dike û wan piçûk dibîne. Gava meriv metnê edebiyatê wek “pêkanîneke estetîk” bifikire tê hêvîkirin ku berhemêke edebiyatê bi babet û honandina babeta xwe ve “bandoreke estetîk” li ser xwîner çêbike. Lêbelê ev yek nayê wê maneyê ku babetên edebiyatê mehdûd in yan jî divê ku mijarên wê bêne sînorkirin. Edîbekî hosta û şareza di dema vegotina rewş, hest û ramanên herî xirab û neyênî de jî dikare çîroksaziyeke estetîk, vegotineke ciwan pêk bîne (Demir-Yılmaz, 2009: 27).

Eyan û eşkere ye ku em metnekî edebî bi armanca hînbûna tiştêkî yan bo bidestxistina zanîne naxwînin. Lewma divê ku fonksiyoneke edebiyatê ya ji rola zanistan cudatir hebe. Ber û berhemên edebî ji hêlekî ve xîtabî hiş û aqilê însan dike, ji hêleke din ve jî bangî ruhê wî dike. Wihareng dibe sebeb ku însan ji aliyê fikr û ruh ve pêş bikeve û geş bibe.

Her wekî mirin, çavnebarî, çikûsî, eşq û evîn, cesaret, egîdî, ciwanmêranî, sebir, hîcran, wefa û hwd. Ew berhemên ku ev taybetiyên ku di hemû civatên însanî de hevpar in bi awayekî serkeftî di çarçoveya mîheng û pîvana jiyana wan a civakî de honandine, geriyane/bûne berhemên bijarte û eserên berguzîde yên edebiyata dunyayê. Jixwe “edebiyata cîhanê” ji edebiyatnasê navdar Goetheyê Alman (1723-18.?) vir ve wek têgeheke edebî ketiye nav lîteraturê. Edebiyata cîhanê jî bes bi nîrx û tevkeriyên di asta cîhanşumûl de yên edebiyatên miletan ve dikare bijî û bikemile (Aytaç, 2015: 78).

Naveroka edebiyata her miletî bêguman bi çand, kevneşopî, bawerî û pergala nîrxên wî miletî re têkildar e. Lewma edebiyatên miletan ji ber vê têkiliya xurt û nêz, qereker û dirûvekî “millî/ netewî” werdigre. Lêbelê hin mijarên hatine bikaranîn hene ku di nav cure babetên li hemû edebiyatên dunyayê de hevpar in, muştêrek in.

2.1.2. Zimanê Edebî û Zewqa Edebî

Her huner yan jî şaxezanistek li gor awa û armanca xwe xwedî zimanekî xas e. Zimanê huqûqê, zimanê tibê, zimanê mûzîkê, zimanê edebiyatê, zimanê îqtîsadê û

hwd. Di zanistan da armanca esasî ew e ku zanîn bi awayekî rast bê neqilkirin. Lewma divê zimanekî bi vî rengî bê bikaranîn. Heçî huner e, di kîjan qada hunerî de dibe bila bibe, tiştê girîng ew e ku mijar li gor pêdiviyên senetê bê honandin yan jî bikaranîn. Di vir de armanca ne ew e ku mijar bê neqilkirin yan veguhestin bi bal yekî din ve. Hunera edebiyatê vê rol û fonksiyona xwe bi sûdwerigirtina ji adan û îmkanên zimanê xasê bi xwe ku em jê re dibêjin “zimanê edebî” pêk tîne.

Zimanê edebî qasî ku ji zimanê qisedanê cudatir e, ji zimanê fikirîna hevpar a nivîskî jî cudatir e. Di zimanê rojane yê qisedanê de jî hin peyv û gotinên mecazî hene ku dûrî maneya xwe ya rastî ne, reng û dirûvekî hunerperwerane pê dikevin. Lêbelê ev cure gotin ji berê de yan jî bi dirêjahiya demê re wek gotinên bi qalib û îfadeyên bi form dirûv werigirtine û ji hêla her kesî ve bi gelemperî bi eynî awayî tên fêmkirin. Hal ew hal e zimanê edebî li gor zeman û mekan yan li gor cureyên edebî hin raz û mesajan dihevin û têgihîştina wan girêdayî bi ked û xebateke taybet e. Bikaranîna tîkel û girêbendane û pir taybet ên zimanê edebî di şîrê de pir tên xuyanê (Cengiz, 2016: 53).

Zimanekî edebî yê xasê bi şîrê heye ku şair ew bi saya îmaj, sembol û keşfa awa û formên vegotinên xwe yên şexşî pêk aniye. Zimanê şîrê her wekî ku di nav ziman de zimanekî nû derxistiye holê. Lewma gelek xeyal, tesewir û fikir di zimanê şîrê de hene ku bi fêhm û mentiqê zimanê mişterek ê rojane tiştê îfade nake. Lewra zimanê şîrê cure û awayekî payebilind ê zimanê edebî ye. Peyv bi wergirîna xuyang û vexuyanên nû yên ji derî maneya xwe di zimanê şîrê de cih digre. Heçî cureyên nivîsên nesir/pexşan in, zimanekî edebî yê di form û kirasê zimanê rojane yê qisedanê de ye. Digel vê yekê di metnên pexşane de jî zimanekî edebî her dem xwe nişan dide ku sedemê pêjn û pêhesîneke nû ye.

Fêmkirina rast yan jî nêzî rastiye ya ji eserê edebî, girêdayî bi têgihîştina zimanê edebî ye. Zimanê edebî, dûrî zimanê hevpar e û nîşaneyên dorhêla çandêke payebilind a pêşketî ye. Berhema edebî ew eser e ku hest, fikr û diyardeyekî li gor taybetiya cureyê xwe yê edebiyatê di nav formên cuda û dirûvên cihêreng de bi awayekî estetîk neql û destedewr dike. Li ser meseleyê şîr, roman, çîrok, ceribîn û hwd. Gelek zanyarên zanista edebiyatê her wisa jî dîroknas, rexnegîr/neqqad ji bo berhema edebî pênaseyên cuda kirine ku her yek îşaretî bi bal hêleke wê ya ciyawaz dike. Di encamê de ev terîf di derbarê wesfên esasî yên berhema edebî de gelek xalên hevpar anîne ziman (Eminoğlu, 2020: 296).

Taybetmendiyeke eserên edebî jî ev e ku bi kîjan cureyî hatibin nivîsîn bila bê nivîsîn bi piranî ew metn in ku bi “çîroksazî” hatine nivîsîn, yanî mehsûlên xeyalê ne û bi ciwankariyê hatine honandin. Lêbelê eserekî mehsûlê xeyalê nayê wê maneyê ku tu eleqeyeke wê bi rastiye re tune û îşaretî bi bal rastiyeke nake. Lê têkiliya vegotinên berhemekî ya bi rastiye re li gor cureyên edebî cihêreng e. Wek mînak di romanekê de ku xayet zêde teknîkên modern bikaraniye, meriv dîsa bi awayekî eks û nimûneyên heyatê jê dipê û dixwaze. Hal ew hal e di xeberoşkekê de meriv hêviya tişteki wiha nake. Lewra meriv vegotinên çîrokê bi têgihîştin û hestiyariyeke din guhdarî dike û dipejirîne (Parsa, (2014: 45).

Eyan û eşkere ye ku ziman amûr û wasîteya vegotinê ye. Awayê bikaranîna ziman şertê bingehîn ê edebîbûna berhemê ye. Lêbelê berhemeke xwedî naverokeke bêqîmet û dûrî nîrxên însanî û digel vegotin û encamên bi destxistî wisa bi rihetî wesfê edebîbûnê wernagre. Bi rastî berhemên edebî ew berhem in ku bes bi mijarên xwe ve bi zimanekî mukemmel hatine honandin û xwedî serkeftineke estetîk in û wihareng bi awayekî heqîqî dikarin alema hest û hişmendiya însan dewlemend bikin.

Bi saya van cure berheman însan û alema însaniyetê bi hest û ramanên xwe ve îmkana pêşkeftin û kemilînê bi dest dixe. Ew eserên ku dikarin vê yekê bi awayekî serkeftî pêk bînin, wek şaheser têne binavkirin.

Zewqa edebî- xeynî wan şert û qeydên ku îcaba edebiyatê ne- kemilîn û têrdariya ji bo nîrxandin û pîvandina eserên edebî û kesayetiyên e û her wisa nîşandana qabiliyeta hîlbijartin û derecebendîya di navbera wan de ye. Lewma zewqa edebî bes bi terakûm û tecrubeyeke çandî û edebî bi dest dikeve. Meriv dikare bibêje ku zewqa edebî li gor civatan, derdorên cihêreng ên çandî û pîvanên nîrxê yê ferdan diguhere (Jusdanis, 1998: 229). Ev beyta Melayê Cizîrî jî bi qenaeta me bi qasî ku zewqa estetîk a lahûtî nîşan dide, ji hêlekî ve jî vê zewqa edebî ya mewzubehs rava dike û xwebaweriya xwe ya di vî warî de jî wek ya di warê eşqê de, nîşan dide:

Me ji serçeşmeyê heywan qedehek safî vexwar

Nagihê lezzet û zewqa me bi sed cildê kitab (Cizîrî, 2013: 228)

Bawerî û pejirandina gelemperî ew e ku zewqa edebî bînîqas e. Lewra ev têgihîştin û hestiyarî, wek hest û hesasiyeteke cîhanşumûl a însanî rengêkî kullî nîşan dide.

2.1.3. Ciwankarî yan jî Hunerên Edebî

Ciwankarî ew huner e ku dirûvwergirtineke nû ya fikr û ramanê ye bi sayeya bikaranîna hêmanên ziman a ji hêla edîb ve. Her wisa ew rê ne ku di emilandina ziman da ji hêla hunermend ve tîn bikaranîn ji bo qîymetdarkirina eserê edebî. Ciwankarî di maneya xwe ya teng da jî ew hunerên edebî ne ku bêhtir di şîrê de derdikevin pêşberî me. Wek hunerên peyvî û wateyî vediqetin du beşan ku ji van yê sereke ev in: Teşbîh, îstiare, kinaye, tewriye, tenasub, tecahulê arîf, husnê telîl, mubalaxa, tekrîr û telmih (Külekçi, 1995: 45).

Ji bo ku meriv metnên edebî bi awayekî baş fêhm bike, şerh û şîroveya wan pêk bîne, lazime ku ew hemû cure cehd û qesta di bin sîwana ciwankariyê de li pêş çav bê girtin. Lewra maneya rastîn a metnên edebî yê xwedî tedayîyên dewlemend di pişt dîmen û xuyanga zahir in, yanî wate ne li rû ne di kûr de ne (Akın, 2017: 78).

Cehd û xeyreta ji bo veguherandin û dirûvdayîneke nû ya li objektîfan, bingeş û hêmanê hunerê ye. Ev yek ji bo eseren edebî jî carî ye. Lê bes hemû edîb di vê babetê de xwedî heman helwestê nînin. Hin ji wan xwedî wê nêzîktayîyê ne ku bêtir ku xwe hewcedarê bi xemilandinê bibînin peyvê di berhema edebî de bi cih dikin. Qismek ji wan jî di wê bîr û baweriyê de ne û diwxazin ku ji derfetên ziman ê wateyî sûd werbigrin û ji hêza ziman a tedayî û bibîrxistanê /association bikarbînin. Va ye ji ber vê yekê ye ku ciwankarî di encama vê nêzîktayîya duyemîn di eseren edebiyatê de cih digrin.

2.1.4. Şêwaz Di Edebiyatê de

Peyva “şêwaz”ê tê maneya terz, rê, awa, sebk, uslûbê. Di edebiyatê de wek termekî edebî rê û rêbaza edîb tîne ziman, awayê vegotina wî nîşan dide. Her wisa şêwaz wek awayê nivîsîna berhemekê yan jî kesayetîyekî edebî jî dikare bê terîfkirin. Melûm e ku berhemên edebiyatê ew eser in ku li ser esasê vegotinê derdikevin holê û wasiteya wê vegotinê jî ziman e bêguman. Nexwe şêwe termekî edebî yê wisa ne ku di navbera wê û bikaranîna awayên taybet a ziman de têkildariyeke xurt heye. Edîbek bi awayê nivîsîna xwe ya ciyawaz ve qîmet û xusûsiyet bi dest dixe. Ev xasiyeta uslûbî edîb ji şair û nivîskarên dîtir vediqetîne. Ev rastî ji hêla nivîskarê Frsansîz Buffon (1707-1788) ve beriya salan wiha hatiye îfadekirin: “uslûb însan bi xwe ye” (Çoban, 2014: 55).

Şêweya edebî ne ku tenê bi peyv û mane û ziman ve têkildar e. Bi berfirehbûna çarçoveya wê ya wateyî ve di heman demê de her cure cehda ji bo ciyawazîya ji yên dinan jî tîne ziman. Digel vê yekê di navenda van hemûyan de tiştek cih digre. Ew jî têkiliya kesayetiyê edebî ya bi ziman re ye. Her şexsiyetê edebî ji hilbijartina kelîmeyan bigre heta sentaksa ku bi wan gotinan ve pêk tîne, rêyeke bi xasê xwe dişopîne. Hin edîb peyvên xwedî hêza tedaî ya dewlemend diemilînin, qismekî wan jî pir hindik cih didin van cure peyvan.

Bikaranîna ziman ne tenê xasê bi hilbijartina peyvan e. Helwest û nêzîktayîya edîb ya li ser vegotinê jî girêdayî bi taybetiyên wî yên şexsî ne. Bêalîfî, rexnekarî, sohbetwarî, îqnakarî, qirfekmendî, hicîwkarîya di vegotinê de, têkildarê bi vî aliyên kesayetiyên edebî ne. Gelek faktorên cihêreng hene ku li ser uslûba kesayetiyê edebî xwedî bandor in. Ji wê derdora ku eserê edebî jê derketî bigre, heta ew çavkaniyên çandî ku şexsiyetê edebî li wir gihîştîye û jê faydemend bûye, ev diyarde hemî bi awayekî berhema edebî dixin şêweyekê û dirûvekî pê didin wergirtin (Cengiz, 2016: 63).

Di vê peywendê de meriv dikare bibêje ku terakum û tecrubeyeke dewlemend a çandî û dorhêl, wek bingeş û binaxeya şêweyên kemilî ne. Lewra derdorên xurt û xwedî çanda dewlemend him ruhê hunermend têr dike him jî di dirûvgirtina berhemên hunerî de îmkânên bêhesab pêşkêş dikin.

Ekol û cureyên edebî yên di hin serdeman de xwedî hin usûbên xasê bi xwe bûne. Ev hêman di hin dem û dewranan de dibin sebeb ku şêweyên li ser hesasiyet û tesewirên hevpar derkevin holê. Lê di vir de xala herî diyarker a di derbarê şêweyê de kesayetiyên edebî ne. Di edebiyatê de her çiqas edîb ji hêla tesewira pêşedemê yan nêrîna edebî de di nav derdor û mektebekê de cih bigre jî ev yek şexsîbûna usûbê ji holê ranake. Şexsîbûn û jidilbûna uslûbê wê esera edebî hêja û hezkirî digerrîne. Uslûb ji bo hin edîbên navdar wek problemeke mezin derdikeve pêşîya wan. Lewra hesasiyeta li ser uslûbê carna wan ji nivîsînê men' û berbend dike. Yanî ji nivîsînê vediciniqîne û lê sar dike.

Tê gotin ku romanûsên nivîskarê romana bi navê Atala (1802) Chateaubriand (1768-1848) û nivîskarê romana bi navê Madam Bovary Gustave Flaubert (1821-1880) li ser her beşên romanên xwe çendik û çend caran xebitîne. Tê gotin ku Flaubert kitêba ku herî zû qedandiye di pênc salan de xelas kiriye. Berê behsa sê uslûbên bi navên “xwerû”, “bi xemil” û “payebilind” dihate kirin. Lê ji hêla uslûbê

va ji bo roja me ya îroyîn tu maneyeke vê dabeşê yanî kategorîzasyonê nemaye. Uslûb her çiqas termekî şaxên hunerê be jî her qad û hêlêke jiyanê xwedî uslûbeke xasê bi xwe ye. Uslûba qisedanê, uslûba fikirînê, uslûba jiyanê, uslûba fermî, uslûba rabûn û rûniştinê, uslûba xwarin û vexwarinê û hwd. (Macit, 2010: 9).

Xwejêgirtin û perhîza ji gotinên elelade, tekrar û xeml û xêzên nelazim, paşguhkirina latafet û ziravbihîstiyariyên wateyî û fikrî yên ji ber endîşeya zelaliya nivîsînê, miqatebûn û dîqeta ji bo teql û ahengê, pêkanîna hevrenge û hevdengiya di navbera fikr û uslûbê û hwd. meriv van xalên girîng ên ji bo berhema edebî wek taybetiyên uslûbeke rind dikare destnîşan bike.

2.1.5. Estetîk û Poetîka

Di babeta têkiliya estetîk û edebiyatê de mijareke din a girîn heye ku di navbera van her du qadan de wek pire û navgînekê ye. Her wisa reng, mahiyet û keyfiyeta van her du qadan destnîşan dike. Ew babet jî poetîka ye ku wek ilmê şîrê yan jî felsefeya helbestê tê zanîn.

Poetîka têgeheke ji zimanê Yunanî ye ku têkildarî bi qada edebiyat û, estetîk û felsefeyê ye. Ev têgeh ji lêkera ‘poiein’ ê hatiye dariştin ku di maneya “pêkanîn”, “kirin”, “çêkirin”, “serastkirin”ê de ye.* ‘Poietika’ ‘tiştê ku hatiye çêkirin, eser e. ‘Poietes’ di maneya ‘senetkar’ de ye. Wihareng ‘poetika’ jî tenzîm û rêk û pêkkirina wan melzemeyan e ku bi qesta pêkanîna hunerê tê çêkirin. Destpêka bikaranîna ‘poiesis’ê ya tenê ji bo nezm û gotina şîrê, piştî Homeros e (Özgül, 2001: 223).

Poetîka wek têgeheke edebiyatê qadeke zînistî ye ku bi her meseleyên şîrê re mijûl dibe. Peyva poetîkayê cara ewil Aristo bikaraniye û wek navê berhema xwe daniye û fikr û nêrînên xwe yî di derbarê şîrê de aniye ziman (Okay 2005, 19)

Zanista ciwaniyê ku wek estetîk tê zanîn digel poetîkayê bi awayekî giştî peywendiya wê bi edebiyatê heye. Lewra rehendên ciyawaz ên ciwaniyê, ne tenê di nav metn û vegotinên edebî de derdikevin holê, bileks di nav hemû qadên hunerî de bi awayên cuda û bi reng û şewazên cihê xwe didin der. Bi heman şeweyî poetîka jî di wê peywenda dahênanê de resenîbûna metnê edebî û hunerîbûnê destnîşan dike (Xoşnav, 2009: 24).

* Bala meriv dikşîne ku ev têgeha “poetîka” ya ku ji Yûnaniya antîk derbasî lîteratura cîhanê buye, maneya wê ya ferhengî ku wek “pêkanîn”, “kirin”, “çêkirin”, “serastkirin” e, bi lêkera Kurdî ya wek “pêkanîn”ê ve xwedî heman wateyê ye. Herwisa wek “poetîk” û “pêkanîn” şêl û dirûvê wan û telfuza wan jî nêzî hev e. Ji bo maneya lêkera Kurdî ya wek “pêkanîn” bnr: (Farqînî, 2012: 481-482).

Poetika eqîdeya estetîk e û tevaya prensîban e di derbarê şîr û edebiyatê de. Her wisa jî nav û nîşan e ji bo wan berhemên ku ziman di pêkanîn û sazîkirina wan de cewher û bîngeh e. Poetîka bêyî ku yek bi yek li ser berheman hûr bibe, wan zagonên gelemperî yên ku di pêkhatina wan de xwedî rol in, destnîşan dike. Poetîka di wê armancê de ye ku vê yeke jî di nav tixûbê edebiyatê de pêk bîne (Todorov, 2001: 19-38).

Objeya poetîkayê ku hildide bin lêpîrsînê, berhema edebî bi xwe nîne. Ew tiştê ku poetîka lêpîrsîna wê dike, wêfên edebiyatê ye ku bêjar û belaxatê pêk tîne. Lewma her berhem wek derbirîna avadaniya razber û gelemperî tê qebûlîkirin. Berhem bes yek ji wan fêkiyan e di nav wan îmkân û ihtîmalan de. Ji ber vê qasê, poetîka ne ku bi edebiyata heyî, bileks bi edebiyata mumkûn re mijûl dibe. Bi gotîneke din, bi edebîbûnê ve eleqedar dibe. Di vê hêlê de şîrîyet û edebîbûn heman tiştî tînin ziman. Lewra poetîkaya ku wek zanist û felsefeya şîrê kete nav lîterarûra cîhanî, cureyekî zanista gotîne ye (Yalçın, 2001: 18).

Ew zanista ku li ser hîzr, armanc û mahiyeta şîrê hûr dibe, edebîbûna metn û vegotînen edebiyatê analîz dike û şair û edîban li gor van diyardeyan dipîve û dinirxîne, poetîka ye. Poetîka ji ber têkilî û mijûlîya wê ya zêde ya bi şîrê re, wek şîrîyet jî hatiye binavkirin. Yanî zanista şîrê.

2.1.6. Estetîk Wek Wesfê Sereke yê Edebîyatê

Esas ev sernavên borî yên di vê beşê de, çi zimanê edebî, çi zewqa edebî, çi şêwe, çi huner û edebiyat, hemû bîngeh û binaxeya têkiliya edebiyat û estetîkê pêk tînin. Ev bîngeh bi awayekî nerasterast amaje bi vê têkilî û hevborîyê dike. Lêbelê me qest ew e ku di bin vê sernavê de em li ser têkiliya rasterast a di navbera estetîk û edebiyatê bisekinin û ji çend hêlan ve binirxînin.

Di navbera edebiyat û hesta ecibandîne û hestiyariya kelecane de têkilîyeke eşkere heye. Ev yek bîngeha hevbandoriya edebiyat û estetîkê pêk tîne. Pênaseyên edebiyatê li ser esas û nêrînen ciyawaz derketine holê. Wesfê edebiyatê yê wek estetîkê xala hevpar a van terîfên ji hev cuda ne. Ango estetîk di nav van cure pênaseyan de noqteya muşterek e. Lewma fikirîna edebiyatê ya bêyî estetîkê zaf mumkîn nayê xuyan (Par, 1984: 82).

Ew rewşa ku ecibandîna estetîk pêk tîne, têkiliya di navbera berhema hunerî û însan e. Ev rewş bi heman awayî di navbera berhema edebî û sujeyê xwedî zewqa

edebî de jî carî ye. Lewra lazime ku di navbera berhem û sujeye temaşevan, xwendevan, guhdar de têkiliyeke watedar pêk bê. Wihareng di însan de ecibandin û heyecaneke ruhî derdikeve holê. Ev yek jî bingeha hez û zewqa estetîk e ku edebîbûna berhemê nîşan dide.

Berhemên edebî babeta hunerê pêk tîne û her wiha nirxandin û lêkolîna berhemên edebî jî mijara zanista edebiyatê ye. Edebiyat şaxeke hunerên estetîk e. Huner ew şeweyê vegotin û vehisînê ye ku li ser bingeheke estetîk û reseniyê derdikeve holê.

Berhema hunerî jî li ser vê fêhm û ferasetê pêk tê. Lewma berhema edebî di esasê xwe de berhema hunerî ye. Edebiyatnas gava berhema xwe pêk tîne, yanî dema ku dibêje yan jî dinivîse, xwe dispêre hin prensîban. Di vê noqteya nezerê de prensîbên sereke endîşeya estetîkê, resenî, bijartebûn, subjektîvîte ne (Okay, 1990: 17-33).

Gotin û metnên berhemên edebîyatê her çiqas peyv û qisedanên rojane bin jî bi tedarî û wateyên cuda yên ji pratîka rojane dagirtîne. Berhemên edebî ji germahiya xebardanên rojane sûd werdigrin. Lêbelê hêman û biwêjên di nav qisedanên rojane de jî ne wek qalib û formên camid û bêruh in; bileks bi wan nirxên estetîk dagirtîne ku kelecânî, dilûcanî tevî dikin (Macit, 2010: 9).

Nirxên estetîk ên wek “ciwan” û “ciwaniyê” di encama têkiliya huner û edebiyatê de derketine holê. Lewra binaxeya vê hesta ecibîn û xweşdîtinê, zewqa însan a hunerî û edebî ye. Ev rewş û hestên însanî jî xwedî gelek hêlên ciyawaz in. Lewma ev mijar û nîqaşên li ser mijarê qasî ku eleqedarê bi qada edebiyat û dîroka edebiyatê ne, her wisa jî wek mijar û meseleyên têkildarî bi dîrok, sosyolojî, psîkolojî û felsefeyê ne.

Di serê sedema modern de edebiyat wek qadeke binbeş a huner û estetîkê hatiye dîtin û di vê çarçoveyê de lêkolîn û nirxandin li ser hatine kirin. Di nîveka sedsala XIXan de bi bandora pêşketinên di psîkolojî, sosyolojî û felsefeyê de edebiyat wek zanistekê hatiye mulehezekirin. Mudaxele û bandora zanistên civakî yên li ser retorîkê ev encam derxistiye holê.

Paşxaneya hevkarîya helbest û felsefeyê, bi gotineke din têkiliya estetîk û edebiyatê heta bi beriya Sokratê Yûnana antîk diçe. Ev têkildarî di serdema Ronenansê de di dewra şair û filozofê Alman Goethe de jî berdewam e û rengêkî nûjen werdigre. Li gor nêrîna vê serdemê edebiyat ne ew felsefe ye ku hatiye

welgerandin bi bal îmaj û nezmê ve. Şairên ku helwesteke gelemperî li pêşberî jiyane nîşan didin, hin pirsên qada felsefeyê jî li gor nêrîna xwe ya edebî dibersivînin (Wellek, 1993: 3).

Estetîk ji ber ku ne li dervayê qada felsefeya hunerê ye û ne dûrî wê ye, lewma ev sernavên ku li jorê mewbehs bivê nevê dê wek babeta estetîka edebiyatê derkevin pêşberî hunerê. Edebiyat û ciwanî dê bi van kategoriyan ve pratîze bibin. Ka gelo meriv dikare bêyî ku van kategoriyan biemilîne, behsa fikirîna li ser edebiyatê pêk bîne. Ji xwe estetîk qadeke lêkolînê ya hê berfirehtir e ku felsefeya hunerê jî digre nav xwe û “rengê edebîbûnê” dide edebiyatê.

Hasil estetîk wek wesfê edebiyatê yê sereke derdikeve pêş. Lewra her gotin, her nivîs di wateya xwe ya teknîk de wek edebiyat nayê hesêb. Ji bo ku gotin bibe edebiyat lazim û şert e ku bandoreke wê ya estetîk ya li ser ruh û hestên însan hebe. Bi awayekî bixweberê û bêyî menfîet hesta ecibandin û kelecane di însan da hişyar bike. Di vê noqtaya nezerê de edebiyat bê estetîk nayê hizirîn.

BEŞA III

HIZRA ESTETÎKÊ DI NÊRÎNA MELAYÊ CIZÎRÎ DE

3.1. Nêrîneke Gelemperî li Fêmdariya Estetîk a Şîra Kurdî ya Klasîk

Yek ji mijarên sereke ku şairan her dem li ser terenum kirine, hest û nêrînên xwe anîne ziman, bêguman meseleya husn û cemalê ye, yanî ciwan û ciwanî ye. Ji serê serdema Îslamî bigire, heta hemû demajoya serdema navîn, ev babet bûye mewzûbehs di navbera şairên vê serdemê de û bala wan kêşaye.

Di dîroka me ya rojhilatê de xasma di sedema edebiyata klasîk de, estetîk di zimanên me yê rojhilatî de bi terkîbên wek “îlmê bedayî, îlmê hîs û îlmê husn, îlmê cemal, îlmê cemaşînasî” dihate îfadekirin. Lewma estetîk ji hêla mijarê ve di medeniyeta me de xwedî paşerojeke qedîm e (Koç, 2018: 32).

Meriv dibîne ku şairên Kurd jî wek wan hemû şairên serdema klasîk ciwanî bi xeyalên gelek rewnaq, rengîn û zengîn sêwirandine û saz kirine. Her wisa bi vegotinên klîşe, bi temsîl û teşbîhên balkêş anîne ziman. Digel vê uslûb û nêrîna hevpar, her şairekî bi vegotinên girîft, bi destnîşankirina têkiliyên balkêş a di navbera tiştan de, li ser ciwaniyê kûr û hûr bûne. Ciwanî di dev û dezgehê her şairekî de geraye tabloyeke nûwaze û xweser (Cengiz, 2016: 78).

Edebiyatnasên serdema klasîk, ne ku bi awayekî tevahî/ kull, bilakis wek bi awayekî parî / cuz li ser ciwaniyê sekinîne û ev mijar tesewir kirine. Ev jî dide nişandan ku şairan ne ku husn û cemaleke rojane, bilekis husn û cemalê bi xwe, ideaya ciwaniyê ji xwe re kirine mijar (Altıntaş, 2002: 12-13). Nêzikatiya bi vî rengî ya şairan a bi bal ciwaniyê, yanî ne li ciwanan, bilakis lêhûrbûna şairan a li ciwaniyê û li cuz û parîyên ku bi awayekî mukemmel ciwaniyê rave dikin, ji ber nemumkunbûna teswîra rasterast a tiştê îlahî ye. Lewra bi fermana Hedîsa “Ew kesên ku dê rastî ezabê herî dijwar bîn, ehlê teswîrê ne” teswîr, wek îddiya xulqiyetê, bi kufrê re yek hatiye dîtin (Grabar, 2010: 76).

Di helbesta klasîk de helbest ne tenê pesnê ciwaniyê û lava û dextaleta ji bo dildar û dîlbera xwedî husn e. Bilekis anîna ziman a hebûn û yekbûna Xweda ye û keşfa heqîqeta wî ya veşartî ye ya di eşya de pînhan e. Lewma di vê helbestê de her çiqas tema û mijûlayî li ser ciwanî û evînê be jî, armanca esasî ya şair ew e ku ji heqîqeta ku hîkmeta îlahî rave dike, xeber bide û qasidiya wê bike. Lewma şairên

Kurd ên vê serdemê wek şairên hemçaxên xwe yên ji milletên din, eşqa ciwaniya surî bêqîmet dîtine û li hemberî cemala heqîqî wek qaçilekî vala û qalibekî bêwate yê betal wesifandine. Her wekî ku Ehmedê Xanî di vê beyta mesnewiya xwe de tîne ziman:

Kes nîne ne talibê cemalê

Kes nîne ne raxibê wîsalê

Hin raxibê husnê layezal in

Hin talibê qalibê betal in (Xanî, 2015: 61).

Felsefeya klasîk a Îslamî, digel nêss û esasên Îslamî û referansên xwe yên otantîk, nêrînên Aristoteles û Platonistên Nû ên nêzî tewhîdê jî wergirtiye. Îbnî Sîna di nav vê mîras û paşxaneyê zanyarî de xwedî rol û bandoreke girîng e. Têgehên wî yên bingeîn ên wek “Wacîb, Wacîbul Wucûd” û “îmkan” di helbestên Mela de jî cihekî girîng digrin. Muhyeddînê Îbnî Erebi ku bi leqeba Şêxê Ekber tê nasîn di rêza pêşîn a wan zanyar û mutesewwufan de tê ku di mijara estetîk û nêrîna ciwanî de bandoreke domdar li şair, sofî û arifên serdema klasîk a Îslamî kiriye. Fîkr û nêrîna wî ya estetîk li ser hizra “wehdeta wucûdê” ava buye (Bozkurt, 2016: 47). Digel gelek hêlên ciwanîyê, xasma di hêlên wek çavkaniya ciwanîyê, cureyên eşq û ciwanîyê, sirra iqşê û hwd. de bandor li ser Cizîrî û şopînerên wî jî kiriye. Lewma Mela di meqamê fexriyeyê ya eşqê de amaje bi şêxê ekber dike û xwe jî wek şêxê sanî diwesifîne (Cizîrî, 2012: 144).

Di kevneşopiya şîra klasîk de her tiştên li alemê sembola heqîqetêke raser e. Lewma şairên klasîk her wiha şairên Kurd ên girêdayî bi vê tradîsyonê daîma zimanekî alegorîk bikaranîne. Di berhemên van şairan de her wesfekî bala yê heqîqetê di şikl û dirûvê mezmûnekî de tê ziman. Ev mezmûn geh wek hêmanên ciwanîyê yên dîlberê yên wek xemze, çene, zulf, rû, bisk, birû, bejn, bal, enî, çav, lêv, ken, suret, meş û hwd. geh jî hêmanên rindiya sirûştî yên wek çemen, gul, nêrgiz, sosin, simbil, reyhan, sî, qaz, şebaz û hwd. derdikevin pêşberî xwîner. Ev hemû mezmûn ên di dev û dezgehê edîb û şairên vê serdemê de nîşaneyên ciwaniya serdest a îlahî ye. Zimanê alegorîk di şairên wek Hafîz, Mewlana û Cizîrî de derdikeve sewiyeya herî bala (Okuyucu, 2010: 69).

Şair û edebiyatnasên Kurd ên serdema klasik jî digel hempîşeyên xwe yên ji miletên erdnîgariya Rojhilata navîn, ciwan û ciwanî bi heman nêrîn û nêzîkatîyê şîrove kirine. Lewra bi bandora hizra dînê Îslamê di nav edîb, şair û arifên ji her miletî yên alema Îslamê de fêmdariyeke estetîk a hevpar derkete holê. Edîb û şairên Kurd ên vê serdemê ev nêrîn di zimanê xwe yê Kurdî de û di berhemên xwe yên bijarte de bi awayên herî rewnaq û herî xweser de anîne ziman. Li ser meselê: Şairekî Kurd ê vê serdemê Sîyahpoş vê meqseda eslî ya ji ciwaniyê awha tîne ziman:

Şeb ta seher dinêrim husn û cemalê kewkeb

Feqet nabînim husnekê ehzen ji Bedra kemal (Siyahpoş, 2011:176).

Anegorî şair, ew hemû husn û cemalên li kesreta alemê wek cuz û cuziyatên mewcûdat tên binavkirin, şewq û şemal in ji Bedra kemal ra. Yanî tav û şewq û şemala heyva çardeh şevî ye ku rewşa hîvê ya ku here rewnaq e. Ev nimandin îşaret e ji bo heqîqeta cemala Mutleq. Ev nîşaneyên husnê yên li ser cuzîyan ji heqîqeta cemala mutleq xeber dide û wê rave dike. Ew çax ew tiştên li alemê yên herî xweşik û ciwan ku şev û roj li ber çavên me ne jî ji ber ku wê delalî û spehîtiya xwe ji wê Bedra kemal digrin, ne mumkun e ku derceya husna wan bigihêje wê rindî û rewnaqiya heqîqî. Lewma şair dibêje ez ji husneke ehzen yanî ciwaniyeke ciwantir nabînim ji ya heqîqî.

Li gor referansa bingehîn a Îslamî ku Quran e û digel sunetê pêxemberê Îslamê wek “kitêb û sunet” tên binavkirin, “Her tiştê di alemê de bi awayekî herî ciwan (xweşik, delal) hatiye afirandin” (Secde: 7). Di nav yên afirandî de jî însan di şeweyî herî ciwan de hatiye xulq kirin (Tîn: 4). Ev esasên kitêbî ji bo mufesîr, muçtehid, mutekelîm û hemû cure zanyarên dewra klasik a Îslamî çawa ku referans in, her wisa ji bo mutesewif û şair û edebiyatnasên dewrê jî çavkaniyên pêşîn in. Li gor vê nêrîn û xwendinê, hemû alem bi her tiştê xwe ve bi awayekî xweşik û ciwan hatiye xulqkirin. Bi hemû cuz û pariyên xwe ve eynikên cemala Barî ye û eqs û tecellaya wê bedra kemal e.

Di xulqiyeta îlahî de tiştêkî xirab û dijî ciwaniyê tune. Tiştên ku zahiren xirab tîne xuyan, ew jî ji bêqabiliyeta madde û sebebên çêdibe. Di encamê de ew jî diqulibin husn û ciwaniyê. Yanî bi encama xwe ciwan in. Herwekî di ayeta Quranê

de derbas dibe: “Xwedê Teala her tişt bi awayekî herî xweşik û ciwan xuliqandiye” (Secde: 7).

Di nav mewcûdatê alemê de û di nav hemû mexlûqên jîndar û rihber de xal û noqteya mîhraq ya vê ciwaniyê jî însan e. Însan wek eşrefe mexlûqat fêkiyê alemê ye. Ciwaniya alemê li wî fêkiyê temerkuz buye.

Lewma şairan di şî'rê xwe de ev nêrîna estetîk a bingeîn a Îslamî ya serdema klasîk ji xwe re kirine esasekî sereke. Di berhemên şairên me yên wek Elî Herîrî, Şeyx Şemsedînê Exlatî, Xanî, Siwadî, Feqiyê Teyran û hwd. de babeteke sereke ye (Orkin, 2015: 56). Ji ber vê qasê ye ku Feqiyê Teyran di şî'ra xwe de dibêje:

*Secdeya şukrê carek me ferz e di wîsalê
Ne perde bêstarek li ber wechê hîlalê
Ehsenellahû tebarek ji sirra vê cemalê* (Teyran, 2021: 74).

Li gor fêmdariya estetîka sedema klasîk a dînî ciwaniya alemê ne bi xwe ye. Yanî ne nefsi ye, bilakis derveyî ye. Lewma Muhyeddîn Îbnî Erebi ku mutesewufê nêrîna wî ya dînî-tesewufî bandor li gelek şair û zanyarên serdemê kiriye, dibêje:

“Xwedê Teala kâinat di sûretê xwe de afrandiye. Ew (Xweda) bi xwe ciwan e, delal e. Lewma hemû kâinat jî ciwan e. Ciwaniya li kâinatê lutuf, rehmet, şefqet, îhsan, bereket, keremê îfade dike” (Bi ragihandina Muhammed, 2008: 89).

Di dab û nêrîta helbesta klasîk a Kurdî de heman awayê nêrîna estetîk di şîrên gelek şairên Kurd de tê xuyan. Şairê Kurd ê sedsala XVIIan Ehmedê Xanî di serê mesnewiya xwe ya meşhûr a bi navê *Mem û Zînê* de di beşa *Tewhîdê* de nêrîna xwe ya ku li ser paşxaneyê hevpar a fikra estetîk a serdema klasîk ava bûye tîne ziman. Wiha dibêje:

*Ey metleê husnê îşqebazî
Mehbûbê heqîqî û mecazî* (Cîhanî, 2000: 90).

Xanî di vir de çavkaniya estetîka alemê di tewhîdê de dibîne. Lewma di serê beşa tewhîdê de gava hebûn û yekbûna Xwedê Teala û tecelliyên esma û sîfatên wî tîne ziman, wek wesfêkî îlahî yê sereke “menba û metleiyeta Xweda ya husnê” zikir dike. Li gor Xanî hemû husna di alemê ji Xweda ye û her wisa ev husn, husneke wisa ye ku hêjayî eşqê ye. Yanî eşqebazî ye. Her wisa hemû husna li alemê ku dibe sedemê eşqa heqîqî û mecazî jî dîsa ji wê metleê ye. Dîsa Xanî di beytên berdewama mijarê de awha bangî Xweda Teala dike:

Nûr î tu di husnê rûyê dildar

Nar î tu di qelbê aşiqê zar (Xanî, 2015: 16).

Di vê beytê de jî Xanî heman nêrînê teqwiye dike û ciwaniya ku li ser rûyê mehbûb û meşûqana ku wan xweşik û sîpêhî nîşan dide, dispêre wê Nûra Ezel ku Xweda ye. Ew agirê eşqê ku lazîmê wê husnê ye jî dîsa ji heman çavkaniyê ye ku aşiqan dikêşe, dişewitîne û dide ah û zarê. Li gor Xanî çavkaniya husna mutleq nebe, tu wucûdek, hebûnek peyda nabe. Lewma husun sedemê hebûn û xuyabûna alemê ye. Ji ber vê qasê dîsa dibêje:

Bê husna te nîne wan wucûdek

Bê husna te nîne wan nimûdek (Xanî, 2015: 21).

Dîsa di qelema şairekî edebiyata Kurdî ya klasîk de ku wek şopînerêkî Melayê Cizîrî ye û wek Mela xwedî dîwaneka muretteb e jî, heman heqîqet bi metafor û alegoriyên cuda tîne ziman. Husna li alemê teqşîm bûye û xasma ew husna ku li rûyê însanê ku zubdeye alem e û ji hêla tecelliya cemala îlahî ve noqteya mîhraqê ye, ji wan cildên cemala heqîqî ne.

Li gor vî şairê bi navê Pertew Begê Hekarî ku him şair him jî mîr û hukumdarekî Kurd e li mîrekiya Hekariyê, ew ciwanî û husna li rûyê yar û dilbera wî, ji xezîne û metleya cemalê hatine wergirtin û întixabkirin. Lewma di dîwana xwe de vê yekê awha tîne ziman û dibêje ku:

Atêşê şewqa dîsa wê ji nû

Sîne û ehşa û dil kirne kibab

Bo gulistanek kitêba husn e rû

Lê ji wan cildê cemal te întixab (Hekarî, 2014: 115).

Buûda ezelî ya eşqê û temaşeya ciwaniyê ya pêşîn ji ber ku di bezma elestê de diqemime, piraniya şairên serdema navîn rehendên ciyawaz ên vê ciwaniyê di berhemên xwe de terennum kirine. Şairan tezahurên vê ciwaniyê yên maddî di cureyên jinê, zarok, sirûşt û hwd. de anîne ziman. Di vir de meqsed û mebesta rastîn a şairan, ciwanî û cemala mutleq a îlahî ye. Ciwaniya wan hêmanên din, bes tecelliyên cuda yên wê ciwaniyê ne ku ji bo vegotina vêciwaniya rasteqîn, navgîn in (Bozkurt, 2016: 56). Mesela Feqiyê Teyan di vê beyta xwe li jêr de her çiqas wesfên însaneke dilber dide jî di dawî de armanca xwe ya esasî ya wek nûra cemala îlahî eşkere dike:

Zulfên siyah xalên di weş têt da wekî hatine pêş

Heyrana wan çahvên di geş dixwazim nûra limhetê (Teyran, 2014: 470).

Li hizra dînî ya Îslamî armanca bingeîn a însan ne ew e ku vê dunyayê îstîhlak bike, temelluk bike û bike milk ji xwe ra û wek heybereke xwarin û xerckirinê biqedîne. Lewma ji bo ku poetîkaya şîra klasîk û her wiha fêmdariya hunerî ya şîra Kurdî ya klasîk bê têgihîştin, divê ew hizra dînî ya ku ev çand û îrfana edebî li ser geş buye, li pêş çav bê girtin. Lewra bingeha helbesta klasîk li ser nêrîn û hizra Îslamî ava buye. Derbirîna estetîkê ya şîra klasîk jî bivê nevê tezahura fêmdariya Îslamî ye (Nasr, 1992: 12).

Şairên serdema klasîk ên Kurd tezahurên ciwaniyê yên li alemê û her wiha dunya bi xwe wek armanca esasî nedîtine. Şîr û terennuma cureyên ciwaniya li alemê wek amûr û pire dîtine ji bo xwegîhana cemala heqîqî û evîna ji bo wê. Lewma Melayê Cizîrî ji Xwedayê xwe re şukur dike ku hub û mijûlîya bi dunyayê re nexistiye para wî û pêş wê ve raza eşqa ji bo ciwaniya rasteqîn xistiye dilê wî. Ew vê yekê di beyteke qesideya xwe de awha tîne ziman:

Minnet ji Xudayî ku bi ebdê xwe Melayî

Îksîra xemê işqê ne bi dînar û dirhem da (Cizîrî, 2013: 50).

Şair û edebiyatnasên sedema klasîk helbestên xwe û her wiha her cure berhemên xwe wek cureyên derbirîna hizra dînî ya civata xwe bi kar anîne. Şiîra Kurdî ya klasîk jî bêguman li ser çand û binaxeya baweriya berbelav a dînî zîl daye. Lewma şairên Kurd ên vê serdemê nêrîna xwe ya bûnewerî/ontolojîk û her wisa hizra xwe ya estetîk li ser vê çanda dînî ava kirine. Şairan di vê çarçoveyê de hemû hebûn, çi kull çi cuz, wek tecellî û eksa cemala îlahî dîtine û di berhemên xwe de bi şêwe û wateyên herî estetîk de nîşan dane. Vê rewş û rastiye ku çavkaniya her tiştî ciwanî cemala mutleq e, şairê Kurd ê serdema IVIÎan Selîmiyê Hîzanî di mesnewiya xwe de awha tîne ziman:

Çîçek bi mîsalê camê Cemşîd

Fehrûste bi namê namê Xurşîd

Çêkir te ji neynika cemalê

Qet laîq e ez bikim sualê (Hîzanî, 2013: 201).

3.2. Jiyan û Kesayetiya Edebî ya Melayê Cizîrî

3.2.1. Jiyana Melayê Cizîrî

Melayê Cizîrî şairekî Kurd ê sedsala 16an e. Navê Melayê Cizîrî yê rastîn Mela Ehmedê kurê Mela Muhemed e. Binyada malbata wî digihêje eşîra Botî ku eşîreke Kurdan a mezin û qedîm e. Li paytexta hukumeta Kurd a Cizîra Botan jiyaye û wek Cizîrî hatiye naskirin. Têkiliya wî bi mîrên Mîrektiya Cizîrê re heye. Ji medhiyeyên wî yên ji bo mîrê Cizîrê, tê fêmkirin ku ew şaire qesr û serayê ye (Resûl, 1990: 07).

Di serdema Melayê Cizîrî de hukûmet û mîrektiye Kurd xwedî desthiladariyeke xurt bûn. Lewma Cizîrî şairekî sedema muqtedîriya mîrên Kurdan e. Ev muqtedîrî wek xwebawerî, îftixar û pesindan di helbestên wî de jî xwe dide der. Cizîrî di helbestên xwe de bi gelemperî sê mexlesan bikartîne: “Mela/Melê”, “Ehmed” û “Nîşanî”.

Di derbarê jiyana Melayê Cizîrî de ji bo agahiyên berfirehtir em dê bîblîyografiyekê bidin û yê ku dixwazin dikarin li wan çavkaniyan binihêrin:

- Cîhanî, Perwîz, (1367). “Şa’iranî Kurd: Melayî Cizîrî”, Sirwe, , hej. 21, r. 66-67.
- Resul, Îzedîn Mustefa, (1990). *Melayê Ciziri, Ştêk Derbarey Jiyan û Berhemî*, Weşanên Zankoy Selaheddîn, Hewlêr.
- Borekeyî, Sedîq, (1998). “Şêx Ehmedê Cizîrî”, (Ji Soranî Azad Şatehî), Nûbihar, j. 62, , r. 27-29.
- Soylu, Kerem, (1998). “Melayê Cizîrî”, Nûbihar, , Gulan, jimar: 62, r. 25.
- Yıldırım, Kadri, (2004). “Werger û Şîrovekirina Dîwana Melayê Cizîrî”, War, Bihar, Jimar: 15, r. 112.
- Özervarlı, M. Sait, (2005). “Molla Cezerî”, DİA, İstanbul berg: 30, r. 241-3.
- Septioğlu, Abdulmukit, (2005). *Melayê Cizîrî Divanî’nın Şerhi*, Nûbihar, İstanbul.
- MacKenzie, D. N.,(2006). “Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran”, wer. Samî Berbang, Zend, jimar: 9, r. 88.
- Yöyler, Celaledin, (2006). “Li Ser Dem û Jiyana Melayê Cizîrî”, Zend, jimar: 9, r. 82.
- Turgay, Nurettin, (2011). “Ahmed el-Botî el-Cizîrî ve Divanında Kur’an’a Yaklaşımı”, Mukaddime, cîld: 4, jimar: 4, r. 139-157.
- Bozkurt, Ömer, (2012). “Dinî Çoğulculuk ve Hoşgörü Arasında Molla Ahmed Cezîrî”, Bilim Düşünce ve Sanatta Cizre Uluslararası Sempozyumu (Ed. M. Nesim Doru), Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları, İstanbul, r. 367-384.
- Martin Hartman, (2012). “Li ser Melayê Cizîrî”, wer. İncekan, Abdullah, Nûbihar, Zivistan, jimar: 122, r. 85.
- Arslan, Ahmet, (2013). *Melayê Cizîrî, Yüksek Lisans Tezi*, Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Diyarbakır.
- Tayfur, Mehmet, (2013). *Melayê Cizîrî Hayatı Divanı ve Tasavvufi Görüşleri*, Yüksek Lisans Tezi, Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Diyarbakır.
- Reşîd, Mes’ûd Cemîl, (2014). *Rolê Tewerên Helbijartin û Rêzkirinê di Çêkirina Rîtma Hozana Klasîkî ya Kurdî da: Dîwana Melayê Cizîrî weku Nimûne*, Ekdîmyay Kurdî, Erbil.

- Çetinkaya, Bayram Ali, (2015). “Molla Ahmed el-Cezerî/Melayê Cizîrî”, (Doğudan Batıya Düşüncenin Serüveni-Osmanlı’da Felsefe ve Aklî Düşünce-, ed: İnsan Yay., İst., içinde), s.797-822.
- Sönmez, Nesim, (2015). “Hâfız-ı Şîrâzî - Melayê Cizîrî Karşılaştırması (Aşk, Gül, Bülbül, Rinde, Züht Ve Dini Semboller Açısından)”, Journal of International Social Research . Oct, Vol. 8 Issue 40, p. 137-149.
- Kavak, Abdulcabbar, (2015). “Melayê Cizîrî ve Tasavvufî Kürt Edebiyatının Gelişim Dönemi”, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, sal:1, cild: 1, jimar: 2, Kasım, r. 48-66.
- Doru, M. Nesim, (2016). “Berawerdkirina Dîwana Melayê Cizîrî û Dîwana Seyîd Qedrî Haşimî ji Aliyê Hizra Tesewufî ve”, Nûbihar Akademi, 5/3, r. 66-81
- Tek, A. (2019). *Melayê Cizîrî Jiyan û Tesîra Edebî Şerha Xezelên Bijartî, Weşanên Nûbiharê*, Stenbol.
- Öz, Ruhullah, (2019). *Sufnin Akidesi Molla Ahmed el Cizîrî Örneği*, Şırnak Üniversitesi Yayınları, Mardin.
- Doskî, Tehsin İbrahîm, (2021). “Melayê Cizîrî û Dîwana Wî”, Cizîrînasî Maqaleyên Li Barey Melayê Cizîrî de, W Editor: M. Zahir Ertekin, Weşanên Dara, Diyarbekir, r. 25-33.
- Joyce Blau, “Jaziri,” Encyclopædia Iranica, XIV/6, pp. 615-616.

3.2.2. Kesayetiya Edebî ya Melayê Cizîrî

Melayê Cizîrî wek edebiyatnasekî Kurd ê sedema klasîk li ser bingeh û binaxeya şair û edîbên Kurd ên beriya xwe derketiye holê. Şairên Kurd ên wek Baba Tahirê Uryan (m. 1010), Eliyê Herîrî (m. 1540), Şêx Şemseddînê Exlatî (m. 1615) û hwd. ku beriya Mela wek bingehê edebî roleke zemînekî munbît pêk anîne. Her çiqas qeyd û wesîqeyên di derheq tşkiliya Mela ya bi van şairan re vê gavê di dest me de tunebin jî, bi qenaeta me meriv dikare bibêje ku ev zemîn peywenda gihîştina şairên wek Cizîrî teşkîl dike.

Mela gava li gor realiteya intertekstualîteyê yanî di çarçoveya navbermetnanîyê de bê nîrxandin, tê dîtin ku wek şopînerekî Hafîzê Şîrîzî ye. Lewra di dîwana xwe de behsa wî dike û terbî li ser şîrîzî wî çekiriye. Beşek ji wê terbîyê:

Newaya mitrib û çengê fixan avête xerçengê
Were saqî heta kengê neşoyî dil ji vê jengê
Heyta dil meya baqî binoşîn da bi muştaqî
Ela ya eyyûhe's-saqî edir ke'sen we nawilha (Cizîrî, 2013: 18).

Jixwe di sedema klasîk de şairên ne Faris - çî Kurd û çî jî Tirk – ji bo xwe wek hedef û armanc, derketina asta şairên Îranî destnîşan kirine (Macit, 2012: 11). Lewra şairên wan ên wek Hafîz, Sedî û hwd. di vê hêlê de duayen in, pîr in. Lê di serdema zêrîn a edebiyata Kurdî de şair û edîbên wek Cizîrî, Feqî û Xanî şêweyên xwe yên resen pêk tînin û bi şairên Îranî re dikevin nav pêşbaziyeke serkeftî. Lewma Cizîrî awha dibêje:

Ger lu'lûyê mensûrî ji nezmê tu dixwazî
Wer şî'rê Melê bîn te ji Şîrazî çî hacet (Cizîrî, 2013: 340).

Cizîrî di hêla dîwannûsiya muretteb û bikaranîna hunerên edebî û sazkirina weznên erûzê de ji bo Kurdiya Kurmancî kanon e di qada xwe de. Melayê Cizîrî wek şairekî edebiyata Kurdiya Kurmancî, temsîla dewrana zêrîn dike di serdema klasîk de. Ew li ser bingeha edebiyatnasên Kurdiya Kurmancî yên berî xwe, yên wek Eliyê Herîrî, Şukriyê Bidlîsî, Emîr Yaqûbê Zirkî û hw. derketiye holê û şopgerê wan e. Vê gavê tu qeydeke ku rasterast vê yekê destnîşan bike tune. Bes hevrengeya zimanî, erdnîgarî, çandî û bawerî ya Mela û van şairên navborî îhtimal û encamên bi vî rengî tînin bîra meriv (Ertekîn/Doskî, 2019: 43-61). Lêbelê ji şîrên wî diyar dibe ku pêşbaziya wî bi şairên Îranî yên sereke re ye. Wan wek reqîb dibîne. Lewra asta edebî ya ku tê de ye xwebaweriyekê didiyê û xwe kêmtî şair û edîbên Faris û yên milletên din nabîne.

Edebiyata Kurdî ya Klasîk edebiyateke bajarî ye. Jixwe edebiyata klasîk bi gelemperî jî edebiyateke bajarî ye. Lewra ev edebiyat li bajaran peyda bûye û reng vedaye (Saraç, 2012: 31). Li dor medreseyan bajarên paytext, li hawirdora qesr û serayan mîr û hukumdarên Kurd derketiye holê û belav bûye. Mela li bajarê Cizîrê di nav sîstema patronajê de wek şairekî qesra mîrê Cizîrê derdikeve pêş. Di dewra Mela de mîrekiya Cizîra Botan hukumeteke hêzdar û serbixwe ye. Refaha aborî û aramiya

sîyasî heye. Lewma Mela şairê dewra muktedîr e. Ev rewş, wek xwebawerî û îftixar, di helbestên wî de jî xwe dide der.

3.3.Ciwan û Ciwanî di Helbestên Melayê Cizîrî de

Di vê beşê de em ê di ronahiya helbestên Melayê Cizîrî de nêrîna wî ya li hizra estetîkê binirxînin. Sekna wî û nêzîktayîya wî ya li hember ciwan û ciwaniyê analiz bikin. Binaxeya ku Melayê Cizîrî huwîyeta şîra xwe li ser ava kiriye, xwe dispêre paşxaneyê hizra dînî, edebî û tesewufî ya hevpar a serdema klasîk.

Mela jî wek şairekî Kurd ê vê serdemê ku ji vê çavkaniyê behremend bûye, ciwan û ciwaniyê di tesewira vê muktesebatê de dinirxîne û di helbestên xwe de terenum dike. Lê li gor hêza xwe ya îfadeyê û qabiliyeta ziman û qariheya xwe bi form û awayekî xweser dirêse (Hartman, 2012: 45). Di şairên edebiyata klasîk de tiştê giring a ku divê em jibîr nekin ew e ku helwesta şair ya li hember ciwan û ciwaniyê ye. Di vê tradîsyonê de şair yan jî hunermend ne afirînerê ciwaniyê ye, keşşafê wê ye, raveker e (Ayvazoğlu, 2016: 79).

Mela gava ciwaniya ku bi têgehên husn û cemalê îfade dike, pênase dike, digihêje terîfeke ji terîfên herî kûr a hizra sofîgeriyê û husn û cemalê wek sifetek ji sifetê Xwedê Teala diwesifîne. Li gor wî husn sifetek e ku di zatê Xwedê Teala de bi muşahedeya bi awayekî îlmî tê dîtin. Lewra Xwedê Teala xwestiye ku cemala xwe bi muşahedeyeke eynî bibîne. Lewma alem wek eynik afirandiye û cemala xwe temaşe kiriye. Noqteya hereketa Cizîrî li ser vê fikra sofîgeriyê peyda bûye. Ew têkiliya rastiya husnê ya bi celal, lezet û seadetê re, li ser vê xalê vedihûne (Muhammed, 2008: 157). Lewma Mela dibêje:

Di istîwayê ku ji husna te veda lamiekê

Nezeru 'ş-şemsî mine 'ş-şerqî île 'l-xerbî delek

Afîtabê ku ne teswîrê ji husna te bitin

Nûruha fî nezerî zulmetu dacin we helek (Cizîrî, 2013: 352).

Kifşe Melayê Cizîrî ciwaniyê ne ku di huwîyeteke erzî û maddî de bilakis wek teceliyeke îlahî dibîne ku husn û cemala li alemê jî wek şewq û şemaleke piçûk a ji wê pertewê diwesifîne. Lewma dibêje ku çirûskeke wê husna îlahî roj û ronahiya

alemê digêrîne tarîfî û şevreşiyê. Yanî roj û ronahiya alemê li hember wê cemala sermedi wek çirûsk û taritiyekê ye.

Li gor Mela ciwaniya ku li alemê hatiye parvekirin û li ser wan ciwanên alemê ye ku hûr û perî û îns û wildan in û bûne tîmsala husnê, hemû cîlweya wê cemala mutleq in. Lewma dibêje:

Ew latê husn û eynê nûr suret bi suret tîn zuhûr

Îns û perî wildan û hûr cî cî di wan da cîlwe da (Cizirî, 2012: 132).

Di nêrîna Mela de ji ber ku hemû hebûn, mukewenat û mewcûdat ji Xweda ne, eserê senetê wî ne, teceliya îsmê wî ne, ciwanî bi tena serê xwe hebûn û qîmeteke wê tune. Lewma Mela wek ehlê hîkmet û tesewufê yên beriya xwe ciwaniyê wek diyarde û mefhûmeke ser bixwe nabîne û wek zuhura sifet û esmayê îlahî û nişane û îcaba kemala îlahî dinirxîne. Lewma dibêje:

Her heyet û her cîsmekî her ferd û new û qîsmekî

Ruh wî di destê îsmekî mayî di qebze û pençe da (Cizirî, 2012: 102).

Di tesewira ontolojîk a Mela de ciwanî û eşqa ciwaniyê ku wek lazîmê ciwaniyê dibîne, wek sifetekî ezêlî yê îlahî di destpêka her tiştî de ye. Lewma dibêje:

Husn û mehebbet her hebû Heq aşîqê zatê xwe bû

Muhtacê husnek dî nebû neql û rîwayet pê we da (Cizirî, 2012: 26).

Li gor hizra estetîk a Mela armanca şair ew e ku ji husna li alemê binhêre, temaşe bike û ji wê sûretê derbas bibe û li husna heqîqî û mutleq bigere, keşf bike. Sebebê lêbarkirina mane û wezîfeyeke bi vî rengî ya li ciwaniyê ev e ku ciwanî ne xwedî wesfê objektîf e. Husna di alemê de tê xuyan bi tena serê xwe tiştêkî îfade nake, yan jî dîtîna û teswîra wê, meriv nagihîne husnê. Şair bes dikare bi îşareta husna vê alema zahir xwe bighîne çavkaniya husna heqîqî. Li gor Mela însan ger bixwaze bigihêje heqîqetê, divê meriv ji husna mecazî destpê bike:

*Ev hûr û perîçehre bût û latê cemalê
Der sûretê tehqîqî Mela eynê mecaz in*

*Lamia husn û cemale dê ji îlmê bête eyn
Îşqi da jê hilbitin kî di heqîqet bêmecaz*

*Salik kî ye hatî ji mecazê bi heqîqet
Sûretneşûnasî û bi mena ne fena girt (Cizîrî, 2012: 142).*

Li gor Mela ji hêla dîtbariyê ve hemû ciwaniyên li alemê mecazî ne. Lê di heqîqetê de her ciwanî cemala îlahî bi xwe ye. Yanî ev alema ku bi hemû ciwaniya xwe li ber çavan e, neynika cemala Mutleq e. Cizîrî di vê mijarê de metoda Muhyedînê Îbnî Erebi şopandiye. Lewra Îbnî Erebi dibêje ku:

“Xeynî alemê ciyekî dinê ku Xwedê Teala lê tecelli kiriye tune. Yê ku alem li ser sûretê xwe afirandiye, yanî di sûretê xwe de xuliqandiye, Ew e. Hemû ciwaniya alemê ji zatê îlahî ye û ciwaniya alemê ciwaniya Xwedê Teala bi xwe ye. Di encamê de yê ku ev alem xuliqandiye, di sûretê xwe de xuliqandiye” (Ragihandina ji Doru, 2012: 99)

Di beyteke xwe da Mela di meqamê fexriye û îftixarê de bi awayê telmîheke ser girtî îşaret dike ku ew bi xwe şopînerêkî sadiq û pîspor yê Îbnî Erebi ye. Melûm e ku Erebi di alema Îslamê de û her wiha di nav ehlê tesewufê de wek “Şêxê Ekber” yanî “Pîrê herî Mezin” tê binav kirin. Di fikra Mela ya estetîk de û her wiha di nêrîna gelek edîb û sofî û hukemayên di Alema Îslamê de bandora Erebi tê xuyanê. Mela di vê beyta xwe de bi qenaeta me îşaretî bi vî leqebê wî yê bi terkîba “Şêx” dike û dibêje ku:

*Di îşqê Şêxê Sanî me bi dil behra meanî me
Lî zî hîcrîn we zî qelbîn şîfaûn fî îşaratî (Cizîrî, 2012: 144).*

Di vê beyta xwe de Mela bi awayekî eyan û eşkere nabêje ku qesta min bi îşareta “Şêxê ewil” Îbnî Erebi ye. Lê gelo wisa ne? Lewra li gor hin şarih û

şîrovekerên dîwanê ew kesê ku Mela wek “Şêxê Ewel” di meqamê ustadê xwe de îşaret kiriye, ne Îbnî Erebi ye, li gor wan ew kes Şêxê Senan e (Zivingî, 2013: 706). Li gor hin ji wan lêkolîneran jî ew kes Îbnî Sîna ye (Yöyler, 2006: 836). Belê Îbnî Sîna di alema Îslamê de ji wan hûkema ne ku cara ewil li ser ciwaniyê û her wiha li ser eşqê fikr û nêrînên xwe aniye ziman. Lê wek “Şêx” yan “Şêxê eşqê” nayê zanîn.

Her wiha Şêxê Senan wek qehremanekî di *Mantiqû t-Teyr* a Ferîduddîn Ettar de derbas dibe û wesfekî wî yê wek “Şêxê Ewil, Şêxê Mezin” tune. Lewma bi qenaeta me qesta Mela ne Îbnî Sîna ye û ne jî Şêxê Senan e. Li gor me qesta wî Îbnî Erebi’ye ku leqeba wî “Şêxê Ekber” e. Lewra Erebi di tesewufa Îslamî de û di warê “eşq”ê de wek “Şêxê Ekber” wek “pîrê eşq”ê tê zanîn. Her wiha mesleg û meşrebê Mela yê eşqê pir dişibihe yê Erebi. Ji xwe di vê hêlê de Mela şopînerê Îbnî Erebi yê serkftî ye. Xwendin û nirxandina fikr û nêrîna Mela, bêtî li ber çav girtina Erebi, zaf ne pêkan e (Doru, 2015: 212).

Melayê Cizîrî di helbestên xwe yê tesewufî de ku tê de bi giranî hizra xwe ya estetîk aniye ziman, bangî wehdeta mutleq dike û dixwaze wê heqîqetê bi awayekî şênber rave bike. Ciwan û ciwaniya ku dixwe mijar û mijûlayiya berhemên xwe jî wek eynik û wesîle, wek amûr û lebateke wê meqsedê ye di destê wî de. Ev ciwanî hezkî bila ciwaniya şexsî be hezkî ciwaniya mekanî yan jî ya tebiî be firq nake. Lewra dibêje:

Muhbeta mehbûb û latan pur vekir zîver sifatan

Daye qelb û ruh û zatan roj li miratê xuya ye (Cizîrî, 2012: 118).

Yanî hub û hezî ya wan yarên tîmsala ciwaniyê ne yê wek lat û seneman, gelek wesf û îşaretên rewnaq û hêja dan qelb û ruh û eqlê însan. Wihareng fikr û dilê însan wê tecellaya cemala mutleq, ciwaniya îlahî di neynika dile xwe de dît, nas kir, hez kir. Şair bi vî awayî husn û cemala mutleq û ciwanî û sipehîtiya li alemê dike yek, yanî wek yekê dibîne (Cizîrî, 2019: 551).

Di nêrîna estetîk a Cizîrî de ciwanî ya ku cemala mutleq e hê di beriya afirandina kaînatê de hebû. Neynika ku ji mexlûqatê alemê pêk tê, hê tunebu, ew gencîneya cemalê veşartî bû. Yanî wek kenza mexfî hebû. Zatê îlahî ji cemala xwe hez kir. Zat xwest ku ji bo zatê xwe temaşeya cemala zatê xwe bike. Nêrîna li

ciwaniyê ya Mela ya di vê babetê de hevahengê fikr û nêrîna hin filozof û sûfîyên Musulman e (Muhammed, 2008: 162). Lewma Mela dibêje ku:

Ellah sehergeha ezel yelmûmê işqê şu'le da
Nura cemala lemyezel zatê tecellaya xwe da

Zatê tecella bû li zat bê ism û asar û sîfat
Sirra hurûfên aliyat xef bû di sitr û perde da

Zatê muqeddes bû wucûd coşîş nedabû behra cûd
Wesf û îzafat û quyûd yek jî tecellayê neda (Cizîrî, 2012: 26).

Li gor Melayê Cizîrî husn û ciwaniya li alemê û li rû erdê, xasma ya jîndaran ên wek gul, sunbul, çemen, dar, sî û qazan ji wê cemala mutleq a îlahî teisîne û şewq û şemal dane. Her yek ji wan wek nîgar, dilber, delalekê bo sêyr û temaşeya wê cemala sermedi, wê husna ezel û wê rindiya rewnaq ji her derê derketine û reviyane hatine pêşberî ciwaniya îlahî. Yanî ew ciwan him ji cemala îlahî ne him jî temaşevan û heyranên nazdar û nazenîn ên wê cemaletê ne (Turan, 2010: 198).

Her zîheyat û jîndarek ji cemala neqşa îlahî kêfxweş û şad dibe û direqise, ji kemala seneta wî mest û sergerdan dibe, sewt û seda dide. Ew ji jêr û jor wek tellalan derdikevin û diqîrin. Her wekî ku şêrînaya wî dengî, wan jî tîne coş û xuroşê û dilgeş dike, dinazîne. Lewma ev dar û nebat, ev giha û kulîlk hatine reqs û semayê, ketine cezbeye. Bi tesîra vê rehmeta îlahî ye ku her jîndar dersa tesbîh û nimêja xasê bi xwe digre (Nursî, 2009: 273). Mela vî deng û ahenga han a li dinê, vî reng û rewneqdariya alemê ku wek orkestrayeke îlahî kaînatê dilezîne, dibezîne û dilerizîne, awha tîne ziman:

Sunbul bi sema tîne û gulan perde dirandin
Bişkiftine al al û hişî bûne terazin

Cobar di rewan in çemenan terhî ciwan in
Mestane bi ref ref li kinaran sî û qaz in

*Her yek bi temaşagehê husna te ji her ca
Teşbihê nîgaran bi cemala te dinazin (Cizîrî, 2012: 374).*

Dîsa Mela di heman babetê de ferd bi ferd mînakên cemalê rêz dike û ew nimûneyên ciwaniyê ku li rû zemîn û her yek ji wan di kesayetî û çarçoveya neynika xweşikayiya xwe de temsîla wê roja ciwaniya sermedî dikin û bi ciwaniyê re dibin yek. Mela seyr û temaşeya wan ciwanan wek şahî û dîlxweşiya dil dibîne, bo kemala ruh jî wek pêplûk û derence dike wesîleya wusûlê. Her wisa dibêje ku gelo ez dilê xwe bidim kîjanê ji van yarên ku dilan bendeyî xwe dikin û direvînin, rihan vedijînin û aşiqan mest û sergerdan dikin.

Şair wihareng bi rêya ciwankarî/hunerê edebî yê ku jê re tê gotin tecahulê arîf, heyreta xwe û heyranmayîna xwe ya li hemberî ciwanan tîne ziman û rêya keşfa ciwaniyê ku li gor şair maden û medarê teskîna ruh e, rave dike (Cizîrî, 2018: 339). Balkêş e ku Mela van ferdên ku wek nimûneyên sîfatên cemalê ne, ew bi xwe, bizzat wek “ciwananên çimen” binav dike û dibêje:

*Wer dilo da çîn temaşeya ciwananên çimen
Wê hîlanî ser bi naz û sayeban dayê niyaz*

*Zulf û simbil muşkîboy û bisk û sosin sirşirîn
Serwî bala sebzî poş û kil nişan û xunçebaz*

*Nêrfîgîzên qamet zumerred sergiran hatin xîram
Çarî etrafan bi ref ref lê bi meş tîn sî û qaz*

*Dil bi kê dim ez ji wan her yek bi xencan dil dibin
Dilrûbayên canfezayên dilberên aşîqgudaz*

*Eqdê îhramê dema dilber xuyabî ferzî'eyn
Secdeyek ber wan du birhan nagirit cih sed nimaz (Cizîrî, 2012: 304).*

Yanî ciwan û delalên li alemê her yek bi hezar xeml û xweşikahî û reng û dengên xwe ve, qelb û ruhan dikin aşîqên xwe. Lêbelê gava çavkaniya wan ciwan û

ciwaniyan bê keşîfîn, yanî ew cemala mutleq bê nasîn, ew îman û baweriya bi wê yekê, bi wê yek membayê, hêjayî hezar emel û îbadetî ye. Ev ciwaniya ku şair behs jê dike û dike neynik ji cemala heqîqî re, wesf û dirûvên ciwaniyeke sirûştî didin. Lewra ev wesf û tabloyên ciwaniyê ku şair xêz dike û li ber çavan wek dûmenên here zindî û rewnaq û rengîn radixe ber çavan, rasterast ji tebîet û alema şehadetê ne.

Çawa ku dê di mijara cureyên ciwaniyê de jî bê behskirin ku ciwaniya sirûştî di hizra estetîk a Cizîrî de nimûne û neynikên ciwaniya li alemê pêplûk û pêlekan in di nezera şair de wî digihîn çavkaniya raser a cemalê. Lewma di nezera Mela de ciwaniyên li ber çavan û di jiyana mirov a rojane de em bi wan re rûbirû ne, çî çîmenên ter û ciwan ên fesla biharê, çî sosin û simbil, gul û nêrgizên bejn zumrûd, çî sî û qazên li dor çeman ku ref bi ref in, çî cobarên di rewan û rezinên hêşîn û hwd. hemû yek bi yek mektûbeke merîfetê ne ku neqqaşê xwe, meşşateyê xwe, hunermendê xwe yê xwedî husna ezel didin nasîn û hezkirin.

3. 4. Çavkaniya Ciwaniyê li gor Melayê Cizîrî

Pênasekirin û nîşandana ciwaniya li alemê her çiqas hêsan be jî, destnîşankirin û fêmkirina heqîqeta ciwaniyê, yanî tesbîta çavkaniya ciwaniyê ewqas ne hêsan e. Îdraka bi awayekî objektîf a ciwaniyê ya ji teref herkesî ve, zehmet e. Lewra ciwanî li gor nêrîn û hestpêkirina her kesekî diguhere. Lewma ji serdema Antîk vir ve fîlozof çawa li ser terîfa ciwaniyê ketine îxtîlafê, her wisa van zanyaran di derbarê çavkanî û esl û esasê ciwaniyê de jî li hev nekirine.

Fikra çavkaniya ciwaniyê cara ewil di felsefeya Yûnan de hatiye nîqaşkirin. Xasma fîlozof û zanyarên Yûnan ê navdar Eflatun bi awayekî berfîreh li ser vê mijarê hûr buye. Wî ciwanî veqetandiye bi du qisman. Yek, ciwaniya ku wek wesfêkî li ser mexlûqat tê temaşekirin. Ya din jî ya heqîqî û eslî ye. Ew tiştê ku ji serdema antîk vir ve di derheq çavkaniya ciwaniyê de dihate nîqaşkirin ew bû ku gelo ciwanî ji maddeyê bi xwe ye yan ji dervayê maddeye ye.

Eflatun ciwaniyê wek îdea ji derve dibîne û estetîka vê alemê jî wek sih û ekseke zeîf ya wê ideaya estetîkê dinirxîne. Plotinius wek şagirt û peyrewê Eflatun ekola ideaya estetîkê berdewam kiriye û teoriya sudûrê derpêş kiriye. Li gor wî estetîka alemê ya di eşya de estetîkeke xaricî ya ji îdeayê ye ku kelijiyê û daye der. Yanî herwekî ji ser re avêtiye, rijiyaye. Ev estetîka li dunyayê ya li eşya, ev dayîna wê ya der û kelçûna wê estetîka îdeayî ye.

Aristo çavkaniya estetîkê wek maddeyê û yanî ji zatê madedeyê dibine. Li gor wî ciwaniya eşya ji wesfên eşya bixwe ye. Îcab nake ku meriv ji alema xarîcî çavkaniya estetîkê bigere. Çi heye li ber çavan e û tiştê li ber çavan jî çavkanî ye. Ew li hemberî ciwaniyeke îdeal, ciwaniyeke realist girîng dibine. Di vê hêlê de ew ji Eflatun vediqete û nêrîneke cuda tîne holê (Bozkurt, 2016: 156).

Melayê Cizîrî nêrîna Aristo ya ku ciwaniyê bi maddeyê re zatî dibine red dike û ciwaniyê wek şewq û şemaldaneke ji cemaleke mutleq dibine. Lewma dibêje:

Me ji bil husn û cemalê çi xerez

Bê cemalê ji pîyalê çi xerez

Ne cemala te tecelli bikirit

Me bi xoban bi cemalê çi xerez

Di şebê Qedrê tecella tu bikî

Me li pê mûm û şemalê çi xerez (Cizîrî, 2012: 328)

Yanî ew cemala zatî îlahî ye ku hemû mexlûqat xemilandiye û bi awayekî xûb û xweşik çêkiriye û sêwirandiye. Serçeşmeya van ciwanên dunyewî û husna li mehbûb, dilber, maşûq, dêmzerî, esmer, yar û dilrûbayên alemê cemala heqîqî ye. Ew cemalet e ku van tiştan li meriv şirîn û ciwan dike. Însan dike aşîq, bengî, muhîb, evîndar, dildar û sevdaserî ji wan re. Lewma Mela di beyteke xwe ya din de bi heman menayê dibêje ku:

Husna munezzeh bînîşan wê lê nivîsî zerkeşan

Xal û xetên emberfeşan her kes bi wan dil yaxme da

Lefz û îbaret came ye mehbûbê mena bi xwe ye

Lê xemlê husnek zêde ye lewra bi husnê zîbe da (Cizîrî, 2013: 32).

Yanî hemû delal û ciwanên alemê ku bi husn û xweşikayiya xwe dilan talan dikin, ji kanî û jêdera husn û cemaleke raser a eyan û eşkere ne. Ew mehbûb û ciwanên li alemê bi xal û xetên xwe bi reng û sûretên xwe lefz û îbare ne. Mena û

membaya wan, ew husna munezzeh e ku ew sêwirandine, neqîşandine û xemilandine.

Di nêrîna şair de husn û cemala zat, bi tecellaya xwe, ayatê husn û sûretê neynika husnê anî wucûdê. Yanî hemû kâinat wek ayîne û însan jî wek ayatê husn, yanî wek husn û cemaleke tekwinî (ciwaniya maddî) ji tezahura wê husna serkanî peyda bûye. Lewma Mela vê yekê awha tîne ziman:

Ew sûretê mîratê husn jê bû zuhûr ayatê husn

Lê bû tecella zatê husn vê husnê ew serçeşme da (Cizîrî, 2013: 34).

Di hizra estetîk a Melayê Cizîrî de eleqemendiya bi xûban yanî ciwanên di alemê ku bûne mezher û mîr'ata cemala baqî, ji ber wê cemala sermedi ye. Lewra ew e çavkaniya husn û cemala van xûb û xwoşevîstên li dunyayê. Mijûlayiya wî ya bi van ciwanên dunyawî û bikaranîna wan wek mijar û mazmûnên edebî ya di helbestê de, hemû li ser navê wê cemala serçeşm e. Ger ne, mijûlaya bi husn û cemala li dunyayê, qal û behskirina rind, bedew û ciwanên dunyawî beyxûde û beredayî ye.

Mela wek pêşiyên xwe yên ji hûkema û ûdebayên serdema navîn ên alema Îslamê serçeşme û menbea husn û cemalê, ne ji eşya û mexlûq, bileks wek wesfekî ji xaliq û senetkarê alemê dibîne. Ew husna di dîlberan de ku dibe sebebê eşq û evînê, ew estetîka alemê ku şair û temaşevanan bi hewes û heyran dide gotin û dike bengîn, hemû ji wî Xaliqî ne. Lewma di vê derheqê de dibêje:

Rohniya çehvên Mela yî Xaliq e husna te dayî

Hub tenê da min gedayî husn û hub yek çeşme ye (Cizîrî, 2015: 134).

Li gor Mela, Xweda bi înayet û cemala di zatê xwe de mewcûdekî kamilê mutleq e. Yanî çavkaniya cemalê ew e. Cemala wî ji zatê wî sudur kiriye û ji ser ra avêtiye, daye der û tecelliyê alema mewcûd kiriye. Husn û ciwaniya vê alema afirandî ji wir tê. Hemû mexlûqatên di alema mewcûd de di hukmê neynikên cemala wî de ne

Mela ser re avêtin û kelçûna cemala îlahî, bi gihîştina mîqtara nîsabê ya malê zekatê sembolize dike. Ev beyta ku yek nimûneyeke ji wuqûfîyet û pisporiya Mela ya di çanda tesewuf û şîrê de, vê rewşê şîrove dike û tîne ziman:

Ji wisala xwe zekatê bide miskin û feqîran

Ku cemala te ye kamil di kemala xwe nîsabê (Cizîrî, 2013: 426).

Li hemberî cemala ku gihîştiya mîqtara nîsabê, ew zekata ku sûfî teleb dike, wusleta bi zatê îlahî ye. Yanî di nêrîna Mela de zekat, daketin û tenezula zatê Îlahî ye ya li alema şehadetê (Doru, 2012: 79).

Bi gotineke din, muxatabiyeta aşîq û evêndarên cemala îlahî ya li cemala wî ya li rû dunyayê ye. Lewra qest û mebesta aşîqê sadiq her ew cemel e. Têrbûn û tetmîna wî her bi wê ye. Şair heman menayê bi heman metafora mîqdara “nîsabê” di beyteke şîfreke xwe ya din de awaha tîne ziman:

Mihnet ku ji bextê xwe û tali bi nesîb im

Husna te ye îro ji me ra çûye nîsabê (Cizîrî, 2013: 426).

Yanî şair dibêje ku hemd û sena ji Xweda re ku ez îro xwedî pişk û pareke mezin im ji bext û siûda xwe ya zêde, ciwanî û delaliya te gihîştiye nîsabê. Yanî ew husn û cemala te ye ku gihîştiye kemala xwe û ji wê mîqdara kemalê em aşîq û muhtaç û feqîrên wê cemala mutleq, behremend û sûdewer dibin. Lewra çavkaniya cemel û ciwaniya ku hemû mexlûqat bengî û evîndarê wê ye, ji wê çavkaniya kemala cemelê derdikeve û tê.

3.5. Termînolojiya Ciwanînasiyê di Helbestên Melayê Cizîrî

Melayê Cizîrî ciwan û ciwanîyê bi yek peyvekê tenê neaniye ziman. Wî digel peyvên Kurdî, ji gelek peyvên Erebi û Farisî ku “ciwan” û “ciwanîyê” raste rast îfade dikin, sûd wergirtiye û di helbestên xwe de bikaraniye. Yê wêk cemel, rana, xeml, xêz, pakî, melahet, ciwan, xûb, behçet, delal, şemal, qenc, şox, şeng, husn, ehse, tehsîn, rind/rende, teyîb, zibe/zîba, bedî’, îhsan, zînet, letif, baha, û hwd...

Ev peyv carna bi maneya xwe ya term û têgehî û carna jî bi maneya xwe ya rojane hatine bikaranîn. Di van peyvên de ji hêla wateyî ve nuans, yanî ciyawaziyên piçûk hene bêguman. Lê kifşe ku Mela hay ji van heye û her yek ji van peyvên li gor peywenda mijar û maneyê bikaraniye. Ji xwe her maneyeke felsefî yan tesewufî di qelem û devê her pisporekî de xwe bi awa û rengêkî têgehî dide der, bi rengdêrekî ve tê îfadekirin (Cevizci, 1999: 450).

Kelîmeyên ku Mela rasterast ji bo ciwaniyê bikaranîne, dibin mijara lêkolîna zanista estetîkê. Her yek ji van peyvên maneyê de derbarê estetîkê de tîne ziman. Hinekên wan estetîka dîtbarî ya objeyê îfade dikin. Hinekên wan jî digel estetîka dîtbarî, ciwaniya manewî ya wek xuy, exlaq û tevgerê tînin ziman. Pîrî caran ev peyv di dewsa hev de hatine bikaranîn û di eynî maneyê de hatine emilandin. Lê şair gava peyvê diemilîne, konteksa gelemperî ya kompozîsyona helbestê jî digre ber çav.

Hemû peyv heman maneyê îfade nakin û di navbera wan de cudahiyên piçûk ên wateyî hene. Haya şair ji van nuansan heye û di bikaranîna wan a bi cih û war a di konteksa wateyî de pîspor e. Şair gava peyvên ku ciwan û ciwaniyê di hewînîna bikartîne, jiber ku waqîfê termînolojî û têgehên sofîgeriyê ye, ciwaniyê him di maneya rojane de him jî di maneya tesewîfî de bi awayekî hunermendane emilandiye. Ev yek jî gelek caran dibe muşkîleyekê û pêşî li wê têgihîştinê digre ku ka gelo Mela peyv di maneya kîjan ciwaniyê de bikaraniye.

Ji bo fêmkirin û têgihîştina estetîka şî'ra Mela, lazime ku ew peyvên ku Mela ji bo ciwan û ciwaniyê diemilîne bêne zanîn û maneya wan bê zelalkirin.

3.6. Têgehên ku Rasterast Ciwaniyê Tînin Ziman di Şiûrên Cizîrî de

Hin têgeh hene ku bi sembol û mezmûnan yan jî bi rêya hunerên edebî yanî bi rêya ciwankariyê estetîkê îfade dikin. Ev îfadekirin, bi awayekî endîrekt yanî bilwesîle ye. Lê di edebiyata klasîk de û xasma di kevneşopîya sofîgeriyê de peyv û têgeh hene ku rasterast ciwaniyê tînin ziman. Her wiha ev termînolojî jî hêla şair û edîbên serdema navîn ve jî hatiye emilandin di berheman de.

Melayê Cizîrî jî wek şairekî hakimê lîteratûr û termînolojiya serdemê ya edebî û îrfanî, van peyv û têgehên têkildar û îfadeker ên estetîkê bi awayekî berfireh bikaraniye. Aniha em dê li ser peyv û têgehên sereke ku rasterast ciwaniyê îfade dikin bisekinin. Ev peyv yê wek, cemal, husn, ciwan, xûb, zîba û hwd. in. Şair ev peyv ji bo anîna ziman a rasterast a ciwaniyê bikaraniye. Em dê maneya wan a ferhengî û terminolojîk bikolîn. Her wiha awa û peywenda bikaranîna van têgehên a Mela binirxînin.

3.6.1. Cemal

Peyva “cemal”ê di zimanê Erebi de tê maneya “ciwanî”, “sipehî”, “xweşikî”yê. Her wiha mesder e ji sifetê “cemîl”. Di Kurdî de jî bi heman maneyê tê emilandin. Ev peyv di dirêjahiya dîrokê de him ji bo ciwaniya exlaqî, yanî di maneya “qenc” de him jî ji bo ciwaniya şeklî hatiye bikaranîn (El-Muncîd, 1986: 102). Wihareng digel qencyê, başbûn, delalbûn, espehî, rindî, bedewbûn, qeşengî, cindîtî, lehevhatin, xweşikbûnê jî tîne ziman.

Peyva cemalê navek ji navên Xweda ye ku wek esmaul husna têne îfadekirin. Her wisa ji bo anîna ziman a ciwaniya zatê îlahî tê emilandin. Bi awayekî herî berfireh û di maneya mutleq de ciwaniya Xweda îfade dike. Lewma ew ciwaniya ku bi peyva “cemal”ê tê pênasekirin, cudatir e ji hemû ciwaniyên din. Ev ciwanî zatî ye, yanî ji zatê muqeddes e û ji cihekî din nehatiye, bi xwe ye, ji xwe ye. Ev ciwanî cewher e ne araz e, yanî ne arizî ye. Ji ber vê qasê ew ciwaniya ku bi cemalê tê îfadekirin, naşibihe ciwaniyên din. Cemala ku ciwaniya Xweda îfade dike, çavkaniya hemû ciwaniyan e û sedestî hemû ciwaniyan e, ji tevan pêştatir û balatir e. Cemal nasnavê ciwaniya kamil a ontolojîk a Xweda ye. Her wiha ev sifet mifteyê deriyê lutf û îhsana îlahî ya bê dawî ye (Tarlan, 1998: 21).

Ciwan û ciwaniya ku bi cemalê tê îfadekirin, esas qadeke lêkolînê ya felsefeyê ye. Zanyarên vê qadê di derheq mane û mahiyeta cemalê de, di derbarê çavkanî û cureyên ciwaniyê de gelek nêrîn û nêzîktahiyên ji hev cuda derpêş kirine. Her wisa cemal babeteke girîng a tesewufî ye ku wek ekoleke îrfanî şax vedaye. Wihareng ev têgeh buye mijara gelek berhemên îrfanî û wek unwan û rê û rêbaza anîna ziman a ciwaniya mutleq hatiye emilandin. Her wisa ciwaniya ku bi cemalê tê nîşandan baeteke sereke ye ji bo edebiyatê. Edîb û şairan cemal bi tesewir, teşbih, temsîl û metaforên cuda anîne ziman û sêwirandine. Melayê Cizîrî jî bi sûdwergirtina ji van hemû qadên cuda û xasma bi kariheya xwe ya bala ya edebî, bi tabloyên herî rewnaq û herî nuwaze cemalê û nimûneyên nîşaneyên wê di riste û beytên xwe de dirêse û disêwirîne.

Mutesewufan ew sifaten ku lutf û riza Xwedê Teala nîşan didin bi tabîra “cemal”ê anîne ziman. Hin ehlê sofîgeriyê cemalê wek tecelliya zatê Heq û îsandina

wechê muqeddes ya bi zatê xwe pê nase kirine. Lewma cemaî wek navekî Xweda ye ku ciwaniya xasê bi wî tîne ziman. Ev cemaî cemaîke mutleq û çavkaniya hemû ciwaniyên di alemê ye. Lewma ziddê cemaî tune. Peyv û têgeheke ku ziddê cemaî bîne ziman tune. Mesela têgeha husnê jî di edebiyata klasîk de pîrî caran di maneya cemaî de tê bikaranîn. Lê zidda wê heye. Ew jî “qubh” e (Koç, 2012: 57).

Alema şehadetê ya li ber çavan li gor zahidan bi gelemperî kirêt û xerab hatiye hesibandin û wek objeya nefretê tê xuyan. Lê arîf û xasma yên şopînerê ekola sofîgeriyê ya wehdeta wucûdê ev alema zahir a li ber çavan wek ciwan û espehî hesibandine û delal û xweşik dîtine. Li gor nêrîna wan ew tiştên xirab, yanî şer û nerindiyên li alemê ji ber ku mezherê cemala îlahî ne, binnetîce, bilwesîle husn û ciwaniyê rave dikin. Lewra di nezera vê nêrînê de her tiştên li kaînatê li alema şehadet û mulk, yan bizzat ciwan e yan jî bi encama xwe ciwan e. Ew tiştên ku em wek xirab û kirêt dibinin ji ber ku perde û sebebê xweşîkî û qenciyeke din e, ew çax ew tiştên xirab jî baş e, ciwan e. Li alemê her ciwanî hakim û serdest e, eslî ye. Tiştên şer û xirab ên li alemê arizî û demî ne.

Di hizra estetîk a Melayê Cizîrî de “cemaî” peyva sereke ye ku bi awayekî rasterast ciwaniyê tîne ziman. Di termînolojiya Mela de ev peyv bi awayekî herî xweşik estetîkê tîne ziman. Gelek caran jî vê peyvê bi peyva “husnê” ve wek “husn û cemaî” bikartîne. Şair jî bo ku mezinahiya ciwaniyê û bandor û hêza wê bêhtir bide nîşandan “cemaî”ê bi “husn”ê re wek dupeyv bikartîne. Wek mînak:

Wesfên evîn û îşqê husn û cemala wê şehê

Nayêne şerh û medehê ehîsen ji neqşê beşerê (Cizîrî, 2013: 1436)

Lêbelê ji ber ku “husn” wek “zişt” û “kirêt” zidda wê heye, “cemaî” wek peyveke bêyî ku zidda wê hebe, di destê Mela de bi awayekî herî berfireh û herî kurtebir rola unwanê ciwaniyê werdigre. Di vê babetê de peyv û têgeha herî karîger û herî kêrhatî cemaî e bêguman. Wihareng têgeha cemaî di bikaranîna şair de nîrxekî estetîk îfade dike û dîrekt mane û mefhumê ciwaniyê dihizirîne, nîşan dide.

Mela peyva cemaî bi maneyeke berfireh de ku hemû cureyên ciwaniyê hildide nav xwe diemilîne. Yanî vê peyvê him jî bo ciwaniya ku bi rêya hest, heds û ruh ve tê hîskirin bikartîne him jî ji bo ya bi rêya çavan tê dîtin û temaşekirin. Lewma Mela dibêje:

Her yek bi temaşagehê husna te ji her ca

Teşbihê nîgaran bi cemala te dinazin (Cizîrî, 2013: 374)

Nazîkek min seherê dî bi cemala xwe ne wek

Hûr û wildan û perî bû ne beşer bû ne melek (Cizîrî, 2013: 350)

Cemal di nêrîna arifan de wek wasîteya nêzîkbûna Xweda ya bi însan jî hatiye pênasekirin. Ev wek zuhura îlahî ya di hemû eşya tê xwendin. Ev zuhur jî hêla ehlê îrfanê ve bi du awayî hatiye terîfkirin. Yek cemala manewî ye ku wek navên şîrîn ên Xweda, yanî esmayê husna û sîfatên wî tê îfadekirin. Ev cemal tenê xasê bi temaşeya îlahî ye. Ya duduyan jî cemala sûrî ye ku xweşikahî û ciwaniya li alemê ye. Lê ev hemû cemal digel cure û celebên xwe jî wê cemala manewî dizê û diîse (Üzgür, 1990: 177).

Lewma li gor Mela Cemîlê Mutleq jî ber ku kaînatê li ser sûretê xwe xuliqandiye û ew sûret jî bi cemal e, ew çax hemû mewcûdat ciwan e, sipehî ye. Ji ber vê qasê alem hêjayî hub û hezkirinê ye. Lewra kaînat, çi candar çi camid, çi nebat çi mewad, çi ins û cin çi heywanat, yanî hemû mewcûdat û mexlûqat şewq û şemala tecellaya zat, sîfat, îsm û fîlên wî zatê cemîlê mutleq in, eksa cemala wî ne.

Mela gava behs û babetê tîne ser cemala manewî her têgeha “cemalê” di mane û asta wê mutleqiyet û ceberûtyiyeta zatê îlahî de bikartîne. Her wiha bi sîfet û îzafeyan ku haşmet û tesîra cemalê zêde dike û maneyê teqwiye dike, wek terkîb di nav beytên xwe de bi cih dike. Her wekî ku di vê beyta xwe de tîne ziman:

Destê qudret ku hilavêtî ji bejna te nîqab

Bi cemala ceberûtî me nema perde û hîcab (Cizîrî, 2013: 228)

Mela peyva “cemal”ê bi piranî jî bo ciwaniya mutleq a îlahî diemilîne. Her wisa cemalê têkildarê bi sîfat û zatê îlahî dibine. Ev tabîr û têgeh wek mifte û mîhengeke di destê wî de jî bo danasîn û amajepêkirina wê ciwaniya serdest û sermedî. Gava behs û beyan tê ser ciwaniya îlahî ya bê ser û ber ku nayête şerh û şîroveyan, hilnayê li nivîs û reqeman, têgeha “cemal”ê wek anîna ziman a wê

ciwaniya bêhed û bêhesab, bêtixûb û bêsînor bikartîne. Lewma Melayê Cizîrî di vî babetî de dibêje ku:

*Ji gulistanê cemala te gulek bête zuhûrê
Ji dinê dê biçitin navê bihişta Îremê
Şerhê halê xemê îşqa te kû tête nivîsîn
Medhê ewsafê cemala te kuca tê reqemê (Cizîrî, 2013: 430)*

Yanî eger ji gulistana cemala îlahî ya li alema melekût, yanî ji daîreya cemala zatê wî, tenê gulek bê alema han a mulk, dê ev alem ev dunya bibite bihuşt û her wekî dê însan li vir xwe di nav bihuştê îremê de bibîne. Mela di vir de bi têgeha “cemalê” xurtbûn, hêzdarbûn, balabûn, berzbûn, berfirehbûn û bêhidûdbûna wê ciwaniya mutleq tîne ziman û wê uwiyet û ezameta husnê îfade dike.

Di estetîka şîra Mela de cemaletêgeheke edebî û îrfanî ye ku temsîla ciwaniya muteq dike û nasnav û navnîşana wê tecelliyatê ye. Lewra ciwaniyek e ji ser wê re tune. Ew serdest û serekê hemî ciwaniyên din ên li alemê ye. Kan û membaya wan e. Lewma têgeha ku vê kûrahî û berfirehiyê herî rind tîne ziman “cemal” e.

3.6.2. Husn

Peyveke din ku Mela pirî caran ji bo anîna ziman a ciwaniyê bikartîne “husn” e. Ev peyva bi Erebi ye û di termînolojiya ciwaniyê de tê emilandin. Li gor maneya xwe ya ferhengî xwedî menayên wek “ciwan, ciwanbûn, qencî, başî, xweş, xwedî ciwaniya kamil, bedewbûna rû, qenciya exlaq û hwd.” e. “Husn” dijberê “qubh/zişt/kirêt/xirab”ê ye. Di nav xelqê de jî ji bo bedewbûna rû û bedenê tê gotin. Gelek caran ji bo însanan awha tê gotin ku “filan kes bi husnê dinê ve bedew e” (El-Muncîd, 1986: 134).

Meriv di bikaranîna peyva “husnê” ya Mela de van hemû maneyan dibîne. Di vê hêlê de “husn” di termînolojiya estetîk a Mela xwedî qadeke emilandinê ya berfireh e. “Husn” di metnên klasîk de pirî caran di maneya cemaletê de wek “husn û cemaletê” ji bo ciwaniya Xweda jî tê bikaranîn. Bikaranîna “husnê” ya bi “cemaletê” re heman maneyê tîne ziman. Meriv dikare bibêje ku bi vî awayî roleke wek hevmane digre ser xwe (Koç, 2012: 422).

Mela gava peyva “husn”ê bi peyva “cemal”ê ve wek “husn û cemal” bikartîne, di rola teqwiye, hêzdarkirin û nîşandana haşmeta cemalê de diemilîne. Ew çax him bandor û dereceya ciwaniyê zêde dibe him jî ciwanî renekî bala û balkêş werdigre. Wek mînak:

Mishefa husn û cemalê sureta xal û xetan

Ma telewna xeyre herfî La we Quranin Mecîd (Cizîrî, 2013: 284)

Her wiha Mela “husnê” çawa ji bo ciwaniya îlahî diemilîne, her wisa ji bo ciwaniya beşerî, exlaqî û sirûştî diemilîne. Di vê hêlê de jî peyv û têgeha “husn”ê xwedî qadeke berfireh e di estetîka şîra Mela de. Lewma “husn” çawa ji bo anîna ziman a ciwaniya yarê tê bikaranîn her wisa ji bo xeml û xêza sirûştê, ji bo letafet û zerafeta gul û çîçek û kulîlkan, ji bo rewnaqiya zuhre û hîv û rojên li asîman, ji bo sî û qaz û baz û perendeyên curbecur û hwd. jî tê emilandin. Lewma meriv dikare bibêje ku Mela gelek caran li gor maneya wê ya ferhengî û urfî cih dide peyva “husn”ê. Wek mînak:

Rohniya çahvên Mela yî Xaliq e husna te dayî

Hub tine da min gedayî husn û hub yek çeşme ye (Cizîrî, 2013: 134)

Reng rengi husnê sûretan neqş û nîgarên destxetan

Bala û bejn û qametan şîrînleban pur xende da (Cizîrî, 2013: 30)

Di van beytên Mela de jî tê xuyan ku têgeha “husnê” carna di maneya “cemal”ê de ku wek teqwiye û teyîda ulwiyeta “cemala mutleq” a îlahî tê bikaranîn. Hin caran jî ji bo ciwaniya sirûştî û beşerî bi awayekî aktif tê emilandin. Lewma têgeha “husnê” peyveke xayet fonksiyonel e û di destê Mela de wek amûrekî sûdewer di naverok û avahisaziya helbesta wî ya estetîk de karîger e.

3.6.3. Ciwan

“Ciwan”, “cuwan” yan jî “cewan” peyveke bi Kurdî ye ku Mela rasterast di helbestên xwe de di maneya hest û hizra estetîk de bikartîne. Wateya ferhengî ya vê

peyvê “xweşikbûn”, “cindîtî”, “spehî”, “delalbûn”, “rindî”, “husn” û hwd. yê îfade dike (Farqînî, 2012: 115).

Her çiqas Mela gava têgeha “ciwan”ê bikartîne van hemû wateyan jî tîne ziman, lê bi taybetî ji bo husn û spehîtiyê li alemê diemilîne. Yanî şair gava behs û beyana xweşikahiyên sirûştê yê wek gul û kulîlk û çîçek, deşt û çemen û gulzar, av û kanî û cobar û hwd. dike, xasma vê peyva “ciwan” derdixe pêş û husnê bi wê ve temsil dike. Wek mînak:

Cobar di rewan in çemenan terhi cuwan in

Mestane bi ref ref li kinaran sî û qaz in (Cizîrî, 2013: 374).

Ev peyv di sedema modern de jî di Kurdî de, xasma pêşî di Kurdî ya Soranî de ku wek Kurmancî ya naverast jî tê binavkirin, di maneya “estetîkê” de û ji bo derbirîna zanista “estetîk/ciwanînasî” hatiye emilandin. Em bi xwe jî êdî vê peyvê di Kurdîya Kurmancî de ji bo estetîkê bikartînin. Madem ev peyva Kurdî (ciwan) bi sedsalan berê, yanî ji serdema navîn de di heman wateyê de di berhemên edebî de hatiye bikaranîn û yekî mîna Mela ew di helbestên xwe de emilandiye. Her wiha di Kurdî ya navîn de jî ji bo estetîkê hatiye bikaranîn. Nexwe di cih de ye û me jî qebûl e.

3.6.4. Zîba

“Zîba” yan jî “zîbe”, peyveke bi Farisî ye ku di maneya “ciwan” û “xweşik”, “delal”, “husn”ê de ye (Devellioğlu, 2013: 1427). Mela vê peyva ku ciwaniyê îfade dike, di gelek ciyan de di maneya “ciwan”ê de bikartîne. Her wiha Mela carna jî ji bo anîna ziman a ciwaniya cîsmanî û sirûştî diemilîne. Wek mînak:

Lefz û îbaret came ye mehbûbê mena bi xwe ye

Lê xemlê husnek zêde ye lewra bi husnê zîbe da (Cizîrî, 2013: 32).

Her wiha Mela gelek peyvên ku ciwaniyê îfade dikin bikaranîne. Ev peyv carna wek muradîfê hev, yanî wek hevmane li şûna hev hatine bikaranîn. Carna jî maneyên wan ên nuansî li ber çav hatine girtin û li gor maneyên wan ên ferhengî û xas hatine emilandin. Her wiha carna jî li gor peywenda wateyê yan jî li gor konteksta weznê peyvek ji van hatiye tercîhkirin di honak û tewna helbestê de.

3.6.5. Xûb

“Xub” yan jî “xob” peyveke bi Farisî ye ku di maneya “rind”, “ciwan”, “xweşik” û “spehî” de ye (Kanar, 1998: 266). Mela vê peyvê pirî caran ji bo anîna ziman a ciwaniyê û ciwaniya rûyê însan, ha jin ha mêr, bikartîne. Her wiha ev peyva “xûb” wek sîfatê kesên ciwan jî di helbestên şair de derbas dibe. Wek mînak:

Xeber bit bal şekerxayê şepal û xûb û zîbayê

Ku mîr e belkî bîr nayê esîrik wê di zindanê (Cizîrî, 2013: 136).

Ne cemala te tecellî bikirî

Me bi xoban bi cemalê çî xered (Cizîrî, 2013: 328).

Bi awayekî eşkere tê xuyan ku şair ji bo anîna ziman a ciwaniya beşerî ya rû û sûretê peyva “xûb” bikaraniye. Her wisa li gor vê mane û meqsedê ew peyv wek sembola îfadeya vê ciwaniyê bi piranî di beytên xezel û qesideyên xwe de edîlandiye.

3.7. Têgehên ku Ciwaniyê bi Rêya Teşbîhê Tînin Ziman Li Nik Cizîrî

Mela xeynî van têgehên ciwaniyê, ji bo anîna ziman a ciwaniyê, ji metafor û îmajan jî sîd werdigre. Şair wan objeyên bi ciwaniya xwe navdar û ciwaniyê tîne ba hev û dikelijîne. Wihareng maneyên hêzdar ên pir awa derdixe holê û îmajeke rewnaq a ciwaniyê pêk tîne. Şair xasma bi saya hêmanên ciwankariyê yên wek tenasub, telmîh, îstîare, teşbîh û hwd. tebeqeyên bi bandor ên watedariyê saz dike. Her wiha deriyên maneyên zengîn û rengîntir vedike.

Şair ciwan û ciwaniyê bi saya tîkiliya hevşîbiya di navberê, dişîbihîne roj, hîv, gul, perî, hûrî, wîldan û hwd. Ciwan û ciwaniyê carna jî dişîbihîne lehengên bi ciwaniya xwe meşhûr ên qisse û çîrokan ên wek Yûsuf, Leyla, Şîrîn, Ferhad û hwd. wek mînak:

Dest nehêlim ez ji dînê şubhê Ferhad û Şîrînê

Wer ji ber îşq û evînê min di rê çit ev kilox (Cizîrî, 2013: 274).

Mela bi gelemperî ji bo vegotina ciwaniya rû, bi saya hêmanên şênber/razber ji kome-mazmûnan û hevşibînan sûd werdigre. Wihareng şaîr bi gotinên wek “perî-rû, sur-piling, gulçehre û hwd. ve dixwaze ciwaniyê bi awayekî mubalaxa zêde nîşan bide. Şaîr carna jî van mazmûnan, mesela hem perî hem hûrî, bi hevra ji bo yek maşûqekî bikartîne. Her wiha şaîr van unsûran bi hevra bikartîne û ciwaniyê zêdetir dike û dereceya wê derdixe jor. Wek mînak:

Ev hûr û perî-çehre bût û latê cemalê

Der sûretê tehqîqî Mela eynê mecaz in (Cizîrî, 2013: 375).

Yanî ev horî û perî, pût û senemên ciwaniyê ku ji ber hub û hurmeta zêde tên hebandin û perestîşkirin, ne çavkanî ne ji ciwanî û cemalê re. Hemû cureyên wan di heqîqeta hal û rastiya rewşê de wesîle û neynik in. Yanî mezher in, ne memba in. Ev têgehên metaforîk û mezmûnên hunerên edebî yên bi rêya teşbîhê ji bo anîna ziman a ciwaniyê gelek fonksiyonel in.

3.8. Prototîpên Ciwaniyê di Estetîka Şîra Melayê Cizîrî de

Di estetîka Melayê Cizîrî de ciwanî bi xwe nayê vegotin. Her wiha wesfên ciwaniyê jî rasterast nabe mijara gotinê. Edebiyatnas ciwaniyê bi gelemperî li ser prototîpên wê yên herî têkûz vedibêjin. Ev tîmsal jî tiştên dîtbarî yan jî takekesên xwedî ciwaniya destanwarî ne. Wihareng ew objeya ku tîmsala ciwaniyê dike, dibite hêmanekî herî girîng di navbera hiş û ziman de. Her wiha objeya di rola tîmsalê de, dikeve dewsa ciwaniyê. Yanî dibite ciwanî bi xwe. Bi vî awayî şaîr bi saya taybetiya prototîpê, ciwaniyê bi tehrêkî şênber li ber çavan radixe û nîşanî hişmendiya însan dide (Coşkun, 2004: 26).

Prototîpên ku şaîr emilandine, di encama bikaranînên hevpar ên helbesta klasîk de derketine holê ku temsîla ciwaniyê dikin. Bi dirêjahiya demê re ev tradîsyona berfireh li gor xwe zimanekî alegorîk pêk aniye. Her wiha ev tîp û tîmsal, beş û cûzên terakum û tecrubeyên teamulek e edebî ne. Taybetiyên hevpar ên unsûran hatiye mulehezekirin û li ser tesnîf û kategorizasyonên kifşe derketine holê (Bozkurt, 2016: 120).

Prototîpên estetîka helbesta Mela hebûnên şênber ên li sirûştê yê wek roj, hîv, gul, xunçe, lale, simbil, sosin, serwî, kulîlk û hwd. nin. Her wiha însan û uzvên însan jî di vê hêlê de wek tîmsalên ciwaniyê xwedî rol in. Cizîrî wek şairekî pisporê estetîk û ciwaniyê, van prototîpên han bikartîne ji bo ciwaniya razber bîne ziman. Xasma ji bo îfadekirina ciwaniya mutleq a îlahî van mazmûnan wek unwan diemilîne. Lewra di hizr û ramana sofigeriyê de hemû mewcûd, çi jîndar û camid çi şênber û razber, sûretên Xweda nîşan didin, tecelliya cemala wî ne. Ev sûret, xuyang û eksa cemala mutleq in. Lewma mane, mesaj û îmajê heqîqî ya van prototîpan, di esasê xwe de îşaretî yek wucûdeke mutleq dike; yek cemal û ciwaneke mutleq nîşan dide (Erebî, 1975: 71).

Di şîra klasîk de prototîp, ji bo şerh û şîroveya ciwaniya raser û serdest, xwedî roleke sereke ne. Li gor Mela ev hemû ciwaniyên ku li alemê belavbûne, şewq û şemala ji wê ciwaniya mutleq in. Lewma esas prototîpa eslî Xweda ye. Lêbelê ji ber ku temaşe û dîtna bi çavan a ciwaniya îlahî ne mumkun e, lewma teswîra wê jî ne mumkun e. Lewma ev ciwaniya bê hudûd û mutleq, bes tenê bi wan obje û ferdên mezherî wê ciwaniyê ve, tê îfadekirin. Wihareng ew hebûnên mezherî tecelliya wê ciwaniya mutleq, digerin prototîpên wê ciwaniyê. Lewra Xweda ciwaniya herî bala ye. Lewma ciwaniyeke herî mukemmel dikare bibe tîmsala wê mukemmeliyeta wê.

Di fikr û nêrîna estetîk a Cizîrî de hemû ciwanî ji Xweda ne. Heçî Xweda ye jî cism û maddeyê berî û munezzeh e. Her wiha di baweriya Îslamî de tecsîm û tersîma Xweda heram e, gunahekî mezin e. Yanî xêzkirina resmê Xweda, yan jî nîşandan Xweda ya bi awayekî şeklî, guneh e, şîrk e. Lewma ev yek bûye asteng ku Xweda wek prototîpeke ciwaniyê bê vegotinê di berhemên edebî de.

Ciwaniya mutleq a îlahî xwe di sûretên mukemmel de dide ravekirin, tezahurkirinê. Lewma prototîpên kamil ên ciwaniya îlahî, wucûdên bi awayekî ciwan hatine afirandin ên wek nûra muhemmedî, milyaket, roj, hîv, însan in. Lewra ev cure prototîpên ciwaniyê di hîyerarşiya hebûnê ya Xweda de herî berbiçav in.

3.8.1. Lehengên Efsanewî yê Eşqê

Kesayetiyan efsanewî, ji ber ku di dirêjayîya dirokê de bûne sembola û di derheq wan de di hişmendiya însan a subjektîf û objektîf de hudûdekî kifşe nemane, bi xweberê bûne malê sembolîzmê. Bi gotineke din, tarîxê ew leheng, bi saya tesewura mîtolojîk gerandine tîmsal. Melayê Cizîrî di estetîka şîra xwe de kesên

efsanewî yên wek Şîrîn, Azra, Zîn, Zuleyxa, Leyla, Yûsuf, Memê, Ferhad û hwd. bi pîranî wek tîmsala ciwaniyê û eşqê bikaraniye. Ev nav bi gelemperî wek abîdeya ciwaniyê têne pejirandin. Lewma Mela ji vê îmkânê sûd wergirtiye (Çelîktaş, 2021: 263). Wek mînak meriv vê beyta Mela ya li jêr dikare nîşan bide:

*Bi Şîrînê negihit destê eger Rustemî bit
Dê bi baz û milan şubhetê Ferhadî çî kit*

*Lew herîftim ez ji meylê şubhetê sehlê we seylê
Muhbet û îşqa di Leylê ez kirim yekser pilox* (Cizîrî, 2013: 274).

Şair ji bo ku hêz û heşmeta eşqa xwe û bandor û texrîbata zêde ya evîna xwe bîne ziman, prototîpên eşq û ciwaniyê yên wek “Leyla” bikaraniye. Wihareng çawa îşqa Leylayê Mecnûn har û dîn kiriye û bi çolan xistiye, eşq û evîna şair, muhbeta di dilê wî de jî ew gerandiye wek kozekî agir. Ew kiriye agir û pêt.

3.8.2. Hêmanên Razber

Di dab û nêrîta fikriyata Îslamî de û her wiha di baweriya gel de lehengên tîmsala ciwanî û bedewbûnê yên wek perî, hûrî, milyaket, wildan û hwd. hene. Ev hebûnên razber xwedî taybetiyên ciwan û payebilind in. Ev cure mewcûd di fikriyata estetîk a Îbnî Sîna de jî wek hebûnên herî bêqusûr in. Lewma ev hebûn, bi wucûda xwe, bi navên xwe û bi îmajên xwe hizra ciwaniyê di hiş û xeyalan de disêwirînin.

Li gor Îbnî Sîna ev hebûnên razber mewcûdên ji alema fewqeqemer yanî ehlê alema li jor hîvê ne. Wihareng di hîyerarşîya mewcûdat de ev hebûnên navborî, ciwaniya mutleq herî zêde di xwe de didin nişandan û temsîla wê dikin. Lewra di vê hîyerarşîya hebûnan de ji hîvê berjortir ciwanî zêde dibe. Hey ku ji hîvê berjêrtir dibe ciwanî kêma dibe û kêmasî zêdetir dibin (Taşkent, 2013: 137).

Melayê Cizîrî jî lehengên tîmsala ciwanî û bedewbûnê yên wek perî, hûrî, milyaket, wildan û hwd. di helbestên xwe de diemilîne. Li gor peywenda naverok û weznê di honaka helbestên xwe de bi cih dike. Wek mînak:

*Hin esmer in hin dêmzerî mehpeyker in surmuşterî
Wildan û hûr û ew perî hatin lîbas û came da* (Cizîrî, 2013: 30).

Wildan û hûr û ger perî şîrîn û mehbûbên berî
Hemyan ji husna Xawerî nûrê di wan yek zerre da (Cizîrî, 2013: 36).

Prototîpên ku şairên serdemê bi gelemperî bikaranîne yên ji bo remza ciwaniyê, di destê Cizîrî de digerin tabloyên estetîk yên here ciwan û xweser. Lewra Mela digel temamul, terakum û tecrubeya edebî ya dem û dewrana xwe, zewq, qabiliyet, kariha û dehaya xw ya şairtiyê jî bi awayekî hunermendane tevî dikiyê. Wihareng şair ji hêla hizra estetîk û hunerê ciwankariyê de berhemne xweser û helbestne orjînal derxistine holê. Her wiha bûne cewher û malê edebiyateke xwedî ziravbihîstiyariyeke payebilid û zewqeke estetîk.

3.8.3. Hêmanên Sirûştî

Di estetîka helbesta Cizîrî de hêmanên sirûştî yên wek sosin, simbil, lale, binevş, gulzar, gulşen, buxçe, xunçe, gul, selwî, çiçek, nîhal, gulistan, av, kanî, co, cobar, ber, behr, deşt, çol, çemen, sî, qaz, weşek, şêr, piling, roj û hîv, ber û behr, felek, sema, Çiyayên Tûr, Qendîl, Çemên Dicle, Firat, Nîl û hwd. cihekî girîng digrin. Wek mînak:

Feyza me şubhê Nîl e em dicle û Firat in
Ger şeyş û wer îmam e vê ra ye min keşakeş (Cizîrî, 2013: 320).

Yan jî
Mahîrûyê miskiboyê surpilingê şîrixoyê
Wê bi zulfa şbihê goyê dil ji min bir dil ji min (Cizîrî, 2013: 388).

Yan jî
Binêr li mahê nû û destê qezayê hey û hey
Ne li zer'ê felekê belkê li umre me ye das (Cizîrî, 2013: 312).

Şair van hêmanên ku ji tebîetê deyn digre, ji rastiye diqetîne û wan di nav formeke edebî de wek uslûb û şêwe diemilîne. Wan digêrîne objeyeke razber a

vegotin û tedayiyê. Wihareng dibe simbol û tîmsal ku ciwaniya mutleq a îlahî yan jî ciwaniya dilberê tîne ziman, vedibêje. Wek mînak:

*Sed co û sed cobar e tê sed û guşen û gulzar e tê
Çendan ji eşqê nar e tê safî nezer dî nûr e dil* (Cizîrî, 2013: 364).

Edîb û arif ciwaniya îlahî di rû û sûretê ciwaniya sirûştî de temaşê dike. Lewra di tradîsyona îrfanî û hîkemî ya îslamî de her tiştê li alemê û ciwaniya li ser wan, tezahura îlahî ne. Mela vê hêmanê bi reng û şêweyên cuda ên xayet estetîk û tabloyên xayet zinde û rewnaq di helbestên xwe de bikartîne. Wek mînak:

*Her seher cewlan didit bayê sebayê rast û çep
Sosin û simbil bi mestî tîn semayê rast û çep

Sunbulê ter ya binevş ya sosin û gulçîçek û
Zulfi ya muşkê xeten ya sûretê tuxrasti in* (Cizîrî, 2013: 372).

Ev hêmanên sirûştî yên wek sosin, simbil, gulçîçek di vegotina şair a estetîk de xasma di helbestên wî yên xwedî temaya lîrik de bêhtir derdikevin pêş. Lewra ev helbestên bi van prototîpên sirûştî dagirtî, bi gelemperî di tema û şêwyên xezel, xezelê musemmet de hatine rastin.

3.8.4. Hêmanên Hunerî yên Maddî

Melayê Cizîrî objeyên wek hunerê beşerî jî di vegotina ciwaniyê de bikarîname ku bi destê însan hatine çekirin. Ev huner wek hêmanên maddî li dunyayê hene û navdar in. Her wiha ev hêman, li hemû cîhanê di nav civatên mirovahiyê de wek tîmsal û mînak a estetîk û ciwaniyê tîne zanîn û nasîn. Lewma şair jî vê binhişê wek tîmsala ciwqaniyê ya kes û civatan sîd werdigre. Ew qebûla amme ya di derheq ciwaniya wî berhemê hunerî de, di helbestê de bi xwe berê îmajêke estetîk û tesewireke ciwanî ya bala û rewnaq pêk tîne. Wek mînak:

*Şeraba nabê numanî şefeq da iqdê perwînê
Müselsel mabû reyhanê xetê nazik li nîsrînê
Xerez şiklê te bû Manî ji neqşên Çîn û Maçînê* (Cizîrî, 2013: 478).

Yan jî

Hin ji nik dêrê ve tîn qesta kenîştê hin dîkin

Ne ji van im ne ji wan im min derê xemmarî bes (Cizîrî, 2013: 314).

Di estetîka helbesta Cizîrî de hêmanên wek mabedên dînî yên baweriyên cuda û tiştên hunerî ku li wan mabedan cih digrin ên wek bût, senem, peyker, laleş, zunnar û hwd. hatine emilandin. Lewra ev hêman her çiqas ji aliyê hin civatan ve wek îlah û mabed hatibin pejirandin jî di esasê xwe de îşaretî hebûna Xwedayekî Ehed dîkin. Lewra di rastiyê de xwediyê her ciwanî û îbadetê Xweda ye. Lewma Mela wek piraniya wan şair û arifên serdema klasîk, van hêmanên hunerî yên maddî jî di helbesta xwe de bi awayekî pisporane bikaraniye. Wek mînak:

Ev hûr û perîçehre bût û latê cemalê

Der sûretê tehqîqî Mela eynê mecaz in (Cizîrî, 2013: 375).

Yan jî

Min dil geşte ji dêrê naçim kenîştê qet

Mihrabi wî bi min ra wer da biçîne Laleş (Cizîrî, 2013: 318).

Cizîrî van hêmanên hunerî yên maddî ku di hafîzeyê hevpar a beşeriyetê de wek hêmanên pîroz û bala bi cih girtine, digerin îmaj û sîmgeyên ciwaniyê. Wihareng wê prototîpê ji maneya wê ya xas û teng, herêmi û taybet derdixe û digerin semboleke estetîk di helbestên xwe de.

3.8.5. Hêmanên Kozmîk

Şair hêmanên kozmîk jî wek prototîp di helbesta xwe de bikaraniye. Da ku ciwan û ciwaniyê bi wan hêmanên kozmîk ve sembolîze bike. Lewra ev hêman ji ber ku mezin in, rewneqdar in, têkûz in, paqij in, bi heybet in û hwd. xwedî bandoreke mezin in. Lewma ev hêman di însan de hest û hestiyariyên estetîk ên wek bengîbûn û ecibandin, tirs û xof, beht û heyranî, îhtîşam û ûlwiyet, bêhudûdî û ezamet û hwd hişyar dike. Lewra ev hestên navborî her yeke wî kategoriyeke estetîk e di zanista ciwannasiyê de. Wek mînak:

Serçeşmeya husnê ew e Xurşîd e alem pertew e

Ger bedr e wer mahê new e wer Muşterî yan Zuhre da (Cizîrî, 2013: 34).

Mela prototîpên ciwaniyên yên kozmîk yên wek roj, hîv, brûsk, berq, merîx, kewkeb, stêr, zuhre, zuhel, xurşîd, şefeq, şîpêde, seher, suheyl, muşterî, dewran, mahê new, kêywan, peyk, mîhr, şems, qemer, mahê taban, hîva çardeh, felek, gumbêde mîna, gerdûn, çerxê dewran, afîtab, mahîtab, xerçeng û hwd. bikaranîne.

Mela her yek ji van hêmanan li gor mijar û mebesta helbestê di peywend û konteksên cuda de emilandine. Lêbelê meriv dikare bibêje ku armanca bikaranîna van hemû hêmanan di xaleke hevpar de temerkuz dike û digihêje hev. Ew xal jî anîna ziman a ciwaniyê ye. Xasma vegotina ciwaniya îlahî ye. Wek mînak:

Binêr li mahê nû û destê qezayê hey û hey

Ne li zer'ê felekê belkê li umrê me ye das (Cizîrî, 2013: 312).

Yan jî

Bi derbê kewkeba subhê li meşriq Zuhre tali' bit

Zuhel dûr bit bi şeş bircan û wînda bit bi xerbê da (Cizîrî, 2013: 35).

Di van malikan de şair wan temsil û îmajên ku di fêmdariya serdemê û raya giştî ya wê deme de hukumferma ye, hildide ber çavan. Her wiha wan sembolên kozmîk li gor mebest û hizra xwe ya estetîk di berhemên xwe de bikartîne.

3.9. Zimanê Mecaz û Heqîqetê

Melayê Cizîrî wek şairekî serdema klasîk ku haya wî ji term û tegehên sofîgeriyê û hizr û nêrîna wehdeta wucûdê ya Îbnî Erebi heye. Her wiha agahdar û şopînerê bi hizra metafîzîka sofîgeriyê ye. Heqîqetên metafîzîk ên xeybî ji ber ku razber û bêtixûb in, nakevin bin hed û dudûdan. Lewma ji bo îfadekirina wan, hewce bi zimanekî sembolîk heye.

Di şîra klasîk de her tişt sembola heqîqeteke din a raser e. Însan ber bi heqîqeteke balatir ve dibin. Ji ber vê yekê ye ku şairên klasîk daîma bi zimanê alegorîk ve qise dike. Lewma di qelema şair de her wesfekî bala yê heqîqetê di şîkl û dirûvê mezmûnekî de xwe dide der. Carna ev mezmûn wek hêmanên ciwanî û

delaliyê yên meşûq û dîlberê yên wek zulf, rû, birû, bejn, enî, çav, lêv, ken, meş û hwd. carna jî hêmanên sekr û sexoşiyên yên wek meyxane, saqî, bade, mest, xemmar û hwd. derdikevin pêşberî xwîner. Lêbelê ev hemû prototîp ên di dezgeh û devê şair de wesfên cemala mutleq in. Meriv dibîne ku zimanê sembolîk di şîrên şairên wek Hafîz, Mewlana û Cizîrî de derdikeve asta herî bilind (Okuyucu, 2010: 70).

Li gor Mela alema mecazan, tilsim û tecelliyeke cîhana heqîqetan e. Lewma jî vê hêlê de heqîqet in. Lêbelê kesret û piratiya mecazan, demî, xapînok û arizî ne. Ji ber vê qasê mecaz wek rê û rêbazekê ye ku diçe ber bi vê heqîqetê û bal heqîqeta mutleq. Ji vê hêlê de meriv dikare bibêje ku bîyî mecazan heqîqet nayê fêmkirin. Mela di vê beyta xwe de nîşan dide û dibêje ku mecaz merhele û nêrdîwan in di rêya gihaştina bi bal heqîqetan de:

Neqşê mecaz tilism e mezher ji rengê mîr'atê

Sûret li bal me îsm e me'na bi tecella tê (Cizîrî, 2013: 318).

Li gor ontolojî û epîstemolojiya sofîgeriyê, heqîqetên ûlwî û bala bi aqil nayêne îdrakkirin û tîgihîştin. Lewra di zanyariya îrfanî /îlmê merîfetê ya sofîgeriyê de ev heqîqetên muteal ne obje ne. Ew heqîqeta payebilind a xwedî wucûda mutleq, ne obje/mefûl ye, bîleks fail e. Yanî ne obje ye suje ye. Lewma Mela merîfet û zanyariya qelb û zewqê derdixe pêş ku navenda wê hest û hestiyariyên estetîk in. Her wiha zêde bi agahiyên rasyonel emel nake ku navenda wê aqil e (Doru, 2016: 62). Mela kêmasiya aqil a di tîgihîştina heqîqetê de awha tîne ziman.

Ser bi iczê didirit quwweyê derrakeyê ma

Rece'e'l-eqlû kelîlen we meta qame qe'ed

Heyret û icz e serencami di babê nezerê

Key bi Xaliq nezerê qasirê mexlûqê resed (Cizîrî, 2013: 280).

Mela rêya gehîştina heqîqetê û temkirina tecrubeya wê ya bi ruh û qelb, girêdayî bi merîfet û mecazê dibîne. Wihareng rêya merîfetê navgînek e ji bo wesla bi meqamê fenayê. Ev jî derbasbûna aşîq a ji mecazê bal bi heqîqetê îfade dike. Mela vê rewş û rastiyê awha tîne ziman:

Salik kî ye hatî ji mecazê bi heqîqet

Sûret neşinasî û bi me'na ne fena girt (Cizîrî, 2013: 74).

Di nêrîna şair de eger sûret û herfên şeklî neyêne zanîn û naskirin, maneya pişt wê maddiyat û sebebên de nayête fêmkirin. Lewma divê zahir bê zanîn û heqîqet bi wê navgînê ve tê bi destxistin. Salik kesê di silûka terîqetê de ye û dixwaze bi rêya wê seyr û silûka daîreya di tesewufê de teraqiya ruhî pêk bîne. Her wiha salik mecazen jî rêwiyê rêya heqîqetê îfade dike û ew kesê arif e ku dixwaze bigihêje merîfeta îlahî. Salik bi tecrubeya muhebbeta mecazî dipije û heqîqeta merîfetê bi wê wesîleyê û bi wî rengî nas dike. Eger wê sûret û mecaza wasîte nas neke, nagihêje menaya heqîqetê û merîfetê.

3.10. Cureyên Ciwaniyê li gor Melayê Cizîrî

Zanyar û ehlê tesewufê yên berî Mela, ciwanî bi awayekî gelemperî veqetandine bi du beşan. Cureyê pêşîn wek ciwaniya heqîqî, cureyê duduyan jî wek ciwaniya sûrî bi nav kirine. Melayê Cizîrî ev tesnîfa klasîk red nekiriye. Lê li gor îfadeyên xwe ew jî nû ve pênasê kiriye û daye nasîn. Mela ciwaniyê, wek ciwaniya mutleq, ciwaniya nûra Muhammedî, ciwaniya husna muqeddes, yanî ciwaniya ku eql û ruhê însan temsîla wê dike, ciwaniya sirûştî ku wek ciwaniya sûrî binav dike, di helbestên xwe de aniye ziman (Muhammed, 2008: 112).

Di nêrîna estetîk a Mela de cureyê ciwaniya mutleq îdraka wê bi aqil û hestan ne mumkun e. Bi rêya kemilîna ruh a bi saya eşq û hedsê îmkaneke nasîn û wusûla wê heye. Her wisa ciwaniya nura Ehmedî jî wesileyeke ji bo nasîn û wusûla cemala heqîqî. Husna muqeddes jî cureyekî ciwaniyê ye ku temsîla eql û ruhê însan dike. Ev ciwanî çî mêr çî jin, wek ayatê husn neynikeke rewnaq a ciwaniya mutleq e. Cureyekî din ê ciwaniyê jî ya sirûştî ye ku bi aqil û hestan tê hîskirin. Ciwaniya sirûştî û sûrî wek neqşê bêbeqa ye. Ger di pişt wî neqş û sûretê zahir ê ciwaniya sirûştî de membe'a ciwaniya heqîqî bê keşîfkirin, ew çax ev ciwaniya zahir a mecazî jî dibite rêyeke keşfa cemala rastîn.

Mela di gelek helbestên xwe de qala cure û beşên ciwaniyê kiriye û dîwana xwe de li ser vê babetê hûr bûye. Îcar em dê li ser van cureyên ciwaniyan bisekinin û di ronahiya helbestên şair de rave bikin.

3.10.1. Ciwaniya Mutleq a Îlahî

Li gor Mela Ciwaniya mutleq, sifatekî ezelî yê Xweda ye. Xweda ciwanî yanî husn û cemal bi muşahadeyeke îlmî di zatê xwe de ditiye. Ciwaniya mutleq a îlahî, ciwaniyeke wisa ne ku bi zeman û mekan ve nayête qeyd û bendkirin. Hed û hudûd jê re tune. Ev ciwanî, ezelî ye, qedîm e, tam e, sermedî ye, ciwaniya mutleq çavkaniya hemû ciwaniyan e. Xweda zatê Wacîbul wucûd e, yanî wucûda wî zatî ye, ne girêdayî bi wucûdeke din e. Lewma hê kaînat, hemû gerdûn tunebû, lê husn û cemala îlahî hebû (Alkış, 2014: 56).

Di fikr û nêrîna Mela de ciwaniya mutleq a îlahî ciwaniyeke ruhanî, nûranî û şeffaf e. Hemû hebûn qadên tecelliya ciwaniya îlahî ne. Ev ciwanî nayête îdrakkirinê, aqil û fikir bi vê ciwaniyê tènagihêje. Lewra ciwaniyeke mutleq û razber e. Lewma hiş û hissiyat nikare wê mutlaqiyetê dorpêç bike û bibe waqîfê kunha wê. Nûra wê cemalê li hemû kaînatê îsaye û hemû alem rapêçaye.

Her wesfekî celal û cemalê di wê husna ezel de heye. Ev husn û cemal serçeşmeya hemû ciwan û ciwaniyan e. Xweda xwest ku zatê xwe bi wesîleya zatê xwe û ji bo zatê xwe muşahade bike. Wihareng Zatê Cemîlê Mutleq ku xwediyê ciwaniya Mutleq e, ji bo nîşandana cemala xwe, kaînat wek neynika husna xwe afirandiye (Muhammed, 2008: 158). Mela di derheq vê cemala ceberûtî û husna mutleq awha dibêje:

Destê qudret ku hilavêtî ji bejna te nîqab

Bi cemala ceberûtî me nema perde û hîcab (Cizîrî, 2013: 228).

Ev sûretê mîratê husn jê bû zuhur ayatê husn

Lê bû tecella zatê husn vê husnê ew serçeşme da (Cizîrî, 2012: 34).

Destê qudreta îlahî gava bi cemala xwe ya ceberût tecelli kir, hemû alem eyan û beyan derkete qada hebûnê. Setr û perdeya li ser mewcûdat rabû. Ev ciwaniya serdest a raser serçeşmeya hemû hebûn û ciwaniyan e.

Li gor şerh û şîroveyên Cizîrî meriv dikare ciwaniya Mutleq wek tecelliya zatê muqeddes jî binav bike. Her wiha ciwaniya muqeddes jî eql û ruhê însan yanî ciwaniya jin û mêrê îfade dike. Ciwaniya nûra Ehmedî wek heqîqeta Muhemmedî jî tê pênasekirin. Di ronahiya beytên Mela de derdikeve holê ku cemala mutleq, cemala ehmedî û husna munezzeh hevpariyeke muqeddes pêk tînin. Ciwaniya sirûştî jî ciwaniya cismî, husna sûrî û mecazî tîne ziman. Aniha em dê li ser van ciwaniyan bisekinin û di perspektîfa nêrîna hunerî ya şair de dabeş bikin û binirxînin.

3.10.2. Ciwaniya Nûra Muhemmedî

Nura Muhemmedî li gor îrfan û edebiyata klasîk wek tecelliya ewil a îlahî ye. Her wiha hebûna pêşîn a ku ji nûra cemala Xweda sudûr kiriye, nûra Ehmedî ye. Li gor Mela di silsileya mewcûdat de li rêza pêşîn, ciwanî û şexsiyeta manewî ya Pêxember heye ku modeleke nuwaze û rastiya arketîpî ya alema beşeriyetê ye.

Xweda di xelîfetiya însan de Adem di sûretê xwe de afirandiye. Însanê kamil mazharî vê şerefê ye ku ev mazhariyet bi sûretê manewî ye, ne bi sûretê maddî. Tîmsal û xulaseya vê şexsiyeta manewî ya însanê kamil ruhê Muhammedî ye. Lewra nûra Muhemmedî ademê rastîn û heqîqî ye (Alkış 2014: 152).

Husn û cimal çawa ku wesfê zat in, her wisa nura Ehmedî jî temamker û lazimê zat e. Dîsa ev cimal ji bo zat xesletê eslî ye û nûr jî navê wê bi xwe ye. Her du hevûdu dikemilînin. Lewma nura Ehmedî di serê teceliya cimalê de cih digre. Her wekî ku Xweda ciwan e û ciwanîyê hez dike. Di heman demê de hemû nûr divê ku ciwan be.

Li gor Cizîrî mirov û alema dunyayê madem siha nura rasteqînî ye, ew ji nûra Xweda ronahî werdigirin û ruhê bawermendan jî ji nûra Xweda ye. Lewma bi cemala Xweda jî berçavê me ronî dibe û em dikarin rê biketin/ rê biçin. Çavê me dikare bi saxî bibîne. Bi gotineke din dûrbûna ji nûr û cemala Xwedayî, bêçav mayîne û dûrketina ji tecellaya rasteqîn. Bidestxistina nûr û cemala îlahî jî bi nûra Ehmedî pêk tê. Wesîleya wusûla cemala rasteqîn û rêya here kin û bi silamet a xwegihîna ciwaniya mutleq ew nûr e (Xoşvaw/Balekî 2016: 58).

Mela ciwaniya nura Ehmedî wek jêderka roj û şemsa Xweda diwesifîne. Lewma vê yekê awha tîne ziman:

Mîm metlea şemsa ezel ayîne sifet kir

Lami' ji Erebbê berqê li fexxarê ecem da (Cizîrî, 2013: 50).

Mela li gor zahirê beytê dibêje ku “Mîm” a di navê Ehmed de çavkaniya roja Ehediya ilahî û yektiya Xweda ye. Hz. Muhemmed wek rojhilata roja Yektiya Xweda, yanî wek meşrîq û jêdera Şemsa Ehed e. Hz. Muhemmed bi sifet û wezîfeya xwe, wek ayîne di mahiyet û şexsiyeta xwe de, hebûn û yekbûna Xweda di nav beşeriyetê de îlan kir û li alemê belav kir. Belê Hz. Muhemmed ji nav qewmê Erebbê rohnî da, yanî ji Erebbistanê ye û ji nav Erebban derket. Lê çirûsk û pertewa wê tavê li hukumdar û navdarên milletên din, li ezîz û hêjayên wan da. Wihareng Hz. Muhemmed li dunyayê bûye wesîle, wasite, qasid û burhanê Şemsa Ehed.

Li gor Mela, maddeya hebûnê ya roja ehadiyetê heqîqeta Muhammedî ye. Alema mewcûdat bi ronahiya feyz û fezîleta pêxember pêk hatiye. Lewma qedr û qîmeta alemê ji maddeyê hebûna wî ye. Nûra Muhammedî di qidem de nûra pêşîn e. Paşê jî hemû beşeriyetê yanî alema însaniyetê ji nûra cemala wî îqtibas kiriye.

Di kitêba mubîn a ilahî û lewhê mehfûzê de ku qeder û muqedereta kewn û zeman e, herfa ewil a navê wî ye. Her wiha di serlewhiya wê kitêbê da navê Muhemmed hatiye nivîsîn. Gava qelema qeder û ilmê ilahî herfa pêşîn a navê wî nivîsî, hurgiliyên vî navî derketine holê. Bi saya ilmê ilahî ew herf û nav întiqalî ciwanî û cemala insan kir. Yanî ew nav, bû çavkaniya husn û camal û kemala insan. Lewma Mela di vê derbarê de awha dibêje:

Îsmê te ye mektûbî di dîwana qidem da

Herfek qelema ilmê di teqwîmê reqem da (Cizîrî, 2012: 50).

Li gor şîroveya Mela heqîqeta Muhammedî him ji hêla eşqa ilahî ve dendik û toximê alemê ye. Lewra li pêşberî xwenasîn û xwedannasîna cemal û kemala ilahî, ayîneya herî zîşûûr û herî kullî û berfireh, ji hêla temsîla eşrefê mexlûqat de ku insan e, herî hêja heqîqeta Muhammedî ye. Lewma Mela ji bo vê mezheriyeta şexsiyeta manewî ya Ehmedî dibêje “ayîne sifet kir”.

Her wiha heqîqeta Muhammedî semereyê alemê ye, fêkiyê dara kâinatê ye. Lewra li hemberî ciwanî û cemala mutleq a ilahî, ji ber ku heqîqeta Muhammedî ayîneyeke kullî ye, qest û xwestek û mûrada ilahî herî ciwan û qenc, wî aniye cih.

Lewma di vê noqteya nezerê de di fêkî û encama alemê de jî nûra heqîqeta Muhemmedî heye.

3.10. 3. Ciwaniya Husna Muqeddes: Eql û Ruh

Di nêrîna estetîk a şair de eql û ruh şexsiyeta însan temsîl dîkin. Husn û ciwaniya muqeddes însan e. Însan jî bi wê husna muqeddes ve eks û kopyaya cemala mutleq e. Li gor Mela ciwaniya muqeddes jî wek eql û nefsa kullîye vedîqete bi du beşan. Mela dibêje ku:

Tey kir di nêv tûxrayê îsm teksîrî kir herfên tilism

Husna muqeddes bû du qism hukmê tecellayê we da (Cizîrî, 2012: 38).

Eql di heman demê de neqşê Hewwa û Adem in ku dê û bavên beşeriyetê ne. Adem û Hewwa nûr û ronahiya mewcûdat in. Her wiha xwedî ruhê ûlwî ne. Eql, bêtî ku bi zeman û maddeyê ve bê nîsbetkirin, tazahur kiriye (Muhammed, 2008: 190). Eql û ruhê beşerî ji ber ku sebebê têgihîştin û keşfa wê cemala baqî ne, hevpişk û neynika wê hunsa muqeddes in.

Yek eql û ruhê ezem e mîsbah û nûra alem e

Hewwa û neqşê Adem e bêmuddet û bêmadde da (Cizîrî, 2012: 38).

Ev qismê duduyan, ciwaniyêke mukemmel a muqeddes e. Her wiha ji hêla esaleta xwe ve ji ruh cuda nabe. Ji bo ku her tiştê li kaînatê di bin siya xwe de bihêlin, ruh û nefîs bi hevra hevalbendiyê dîkin. Lewma Cizîrî di vê derheqê de dibêje:

Ê dî ku nefsa kullî ye husnek muqeddes alî ye

Ew jî bi ruh ra eslî ye wan her du hev ra saye da (Cizîrî, 2012: 38).

Di fikriyat û baweriya Îslamî de însan wek “eşrefê mexlûqat” xwedî cihekî payebilind e di nava mewcûdat de. Her wiha wek neynikeke mezherê esma û sîfatên îlahî, kurte û xulaseya alemê temsîl dike. Lewma wek “alemeke piçûk” hatiye binavkirin. Însan wek madena sirên îlahî ye ku “Xweda ew di sûretê xwe de, yanî di sûretê xwe yî manewî de xulq kiriye û ji ruhê xwe puf kiriyê”. Di nêrîna sofîgeriya îrfanî de însan bi wate û temsîla xwe ya xelîfetiya mexlûqat xwedî qîmet û hêjayî ye.

Lewma her çiqas hemû ûzw û bedena însan wek hunerekî îlahî ye, lê manewiyata însan li ser her hebûnê re ye (Ahmad, 2014: 65).

Gava em di vê hêlê de dinihêrin, dibîn ku şaîr di piraniya helbestên xwe de ciwanekê û hêlên cuda yên wê ciwaniyê bi form û mazmûnên kifşe terennum dike. Şîroveya herî nêzîk ya vê ciwaniya wek neynik, bi telmîha “ehsenî teqwîm” pêk tê. Lewma şaîr ji bo ravekirina ciwaniya mutleq a li çavê hiş, ji têgeh û pênasîya “ehsenî teqwîmê” sûd wergirtiye. Lewma dibêje:

Husna te nizanîm bi çi teşbîh bikim

Fî ehseî teqwîmî lew hatiye tefsîrê (Cizîrî, 2012: 444).

Meşûq û dilber her dem bejin bala ye, surperî ye, dêmdur e, zalim e, şepal e, şox û şeng e û hwd. Lêbelê ev ciwana tê teswîrkirin, ciwaneke îdealîst û raser e ku ji peywenda xwe hatiye qutkirin û li paş perdeya maddî û şênber e. Ev ciwan, ne ku kesekî kifşe yan jî îmajê wî ye. Bileks ev ciwan hatiye estetîzekirin. Lewma armanca Mela ne ku rehend û buûdê maddî ya ciwaniyê ye. Bes qest û mebesta wî ciwaniya heqîqî û eslî ye ku di pişt vê rehenda maddî de ye. Lewra şaîr bi rê nîşandana vê ciwaniya beşerî her di qesta ciwaniyeke jortir de ye (Bozkurt, 2016: 198). Lewma Mela di vê derbarê de dibêje:

Lefz û îbaret came ye mehbûbê mena bi xwe ye

Lê xemlê husnek zêde ye lewra bi husnê zîbe da (Cizîrî, 2012: 32).

Yanî însan di nav hemû hebûnê de her çiqas tiştekî piçûk e û hejmara wî li gor ya heywan û nebat û camidan hindik be jî, ji hêla mahiyeta xwe ya manewî ve xwedî maneyeke mezin e. Xweda însan di tîmsala alemê de xuliqandî ye. Lewma însan alemeke piçûk e û di sûretê cemala îlahî de hatiye afirandin. Ev sûretê însan ne yê maddî û şeklî ye. Mahiyeta însan a maneyî û manewî ye ku însanê kamil û ruhê Muhemmedî temsîla wê dike. Lewma Mela dibêje:

Xerq bûm ez di xema îşqê di wextê seherî bû

Ku tecellayê cemalê li mîsala beşerî bû (Cizîrî, 2012: 32).

Li gor Mela husn û cemala îlahî herî baş li ser cinsê beşer tecelli dike. Li gor arîf û edîbên serdema navîn ciwaniya îlahî di çavên însanê mêr de wek jin, di çavên însanê jin de jî wek mêr tê xuyanê. Mela wek şairekî şopînerekî vê dab û nêrîtê ciwaniya îlahî li ser husna beşerî û di nimûnedarî û mezmûnên pûtên ciwaniyê, hûr û perî, reng û sûretê keç û xortên ciwan de nîşan dide. Lewma di nêrîna şair de ciwaniya însanî jî wek ciwaniya mêr û ciwaniya jinê, li ser du beşan tê dabeşkirin.

3.10.3.1. Ciwaniya Mêr

Xweda bi emrê “kun” yanî “çêbe”, xwest ku cemala zatê xwe temaşê bike. Wihareng alemê bi awayekî bê cîla û seyqal afirand. Paşê cemala îlahî îrade kir ku neynika xwe seyqal bike. Adem wek ruhê vî sûretî û cilaya vê eynikê xuliqand. Melayê Cizîrî ciwaniya însan wek armanc dîtîye û ji bo wesla vê yekê rê û rêbazên cuda ceribandîye. Wihareng temaşeyî rû û sûretên bi cimal ên xortên ciwan (mux beçe) kiriye. Jixwe gelek ehlê tesewufê di haletê wecd û cezbeyê de sêyr û temaşeya rûyên xortên ciwan a wek tefekkura neynika cemala îlahî, mubah dîtine (Muhammed, 2008: 204).

Li gor Mela jî çawa ku her tişt, sirûşt, alem, melek, semek, zindî, camid, nebat, heywanat, beşer, şecer, erd û sema û hwd. niynikeke nuwaze ya cemala îlahî ye. Her wisa rûgeşên ciwan, nû ciwanên zî cimal jî wek neynikeke rewneq a cîlweya cemala semedî anîye ziman Lewma Mela dibêje ku:

Muxbeçeyên meyfiroş her seherê tîn sema

Badexuran noşenoş mane li dorê cema

Hin gulê bû enber in hin di şêrîn esmer in

Hin gewherê dane yîn misle Suheylê sema

Hin zerî ne pur sur in ser bi per in dêm dur in

Min ku di çerxê we dî sebr û qerarê nema

Sebr û qerarê ku bir can û ceger hûr dîkir

Zulmê we reng kê dîkir can dibir û dil teba (Cizîrî, 2012: 216).

Di beyta pêşîn a vê xezela xwe de şair bi tabîra “muxbeçe” yî ciwaniya “mêr” tîne ziman. Lewra maneya “beçe” zarokê kurîn/lawîn, yanî xortê nûciwan e. Yanî her

seher û berbanga sibê xortên nûciwanên ciwan tîn reqs û govendê. Aşiq û badenoş jî bi kêf û şahî li dor wan dicivin. Hin ji wan wek stêrka Suheylê dibriqin, hin ji wan esmer in, hin bêhn enber in. Gava ez çav li wan dikevim, sebr û tebata min namîne. Maşûqê awha bi zulumkarî dest da ser sebr û îrada min û dil û ceger li min hûr kir.

Wihareng Mela ji bo nasîn û gihîştina cemala mutleq, ciwaniya beşerî wek neynikeke saf û rewnaq dibîne.

3.10.3.2. Ciwaniya Jinê

Di edebiyata klasîk de jin li hemberî mêr, wek tîmsala ciwaniya mutleq hatiye bi cihkirin. Lewra jin hêmana bingeşîn a ciwaniya beşerî ye. Însan bi hest û hestiyariya xwe ya fitrî ya ciwaniyê ve bi saya cazîbeya hêmanên ciwaniya li cinsê hember, bengiyê wê ciwaniyê dibe. Helbet însan li hemberî ciwaniya tiştên li sirûştê, lerzîn û cezbeyê dikeve. Lêbelê ev qet tu car nagihêje derceya lerza li hemberî ciwaniya însanekî.

Di çavê her cinsî de cinsê hember payebilind e, menîdar e, balkêş e. Lewma gava qala ciwanê dibe, tavi lê însan tê bîra meriv. Însan ji ber ku “bi awayekî herî ciwan hatiye xuliqandin” xwe her tim wek mexlûqê herî ciwan dibîne. Her wiha di nav ciwaniya însan de jî ciwaniya here pêş, ciwaniya jinê ye.

Jin di qada edebiyatê de û di sêgoşeya eşq, aşiq û maşûqê de cihekî girîn û sereke digre. Lewma di şîran de bi gelemperî ciwaniya jinê û hêmanên ciwaniyê yên li ser jinê (çav, por, xal, xet, bejn, lêv, gulî, zulf, birû, zend, sing û ber û hwd.) bi awayekî hûrgilî dibite mijara vegotinê. Jin tîmsala ciwaniya beşerî û objeya esasî ya eşq û temaşeyê ye. Lewma Cizîrî dibêje:

Şox û şengê zuhrerengê dil ji min bir dil ji min

Awirên heybetbilingê dil ji min bir dil ji min

Wê şepalê zulf û xalê dêmdurê gerdênşemalê

Bisketa biskan sema lê dil ji min bir dil ji min (Cizîrî, 2013: 388).

Yan jî

Zerîfî nazikî şengî şifethûrî perî rengî

Bi rojê re tu hevdengî du reştûzên siyahyengî

Kişandin lê ne wek caran xedengên qewsên nûbaran

Ji renga jîr û mûkaran reşandin sîne wek baran

Ji wê derbê pur êşan im sebahulxeyrî ya xanim

Were bînahiya çehvan bibinim bejn û balayê (Cizîrî, 2013: 180).

Jin di helbestên şair û edebiyatnasekî wek Mela de carna bi şox û şengiya xwe, carna bi zalim û şepaltî, bi qetl û kujeriya xwe û carna jî bi nazikî, qencî û delaliya xwe derdikeve pêşberî me. Esas di piraniya berhemên edebiyata klasîk de jin di formeke wisa de tê sêwirandin ku hemû ciwaniyan di xwe de dihevin. Lêbelê di vegotin û behspêkirina Mela de qest û mebest ji jinê her ew ciwanî ye ku tezahura senet û hunerê îlahî ye. Lewma ew awha dibêje:

Reng reng ji husnê sûretan neqş û nîgarên destxetan

Bala û bejn û qametan şîrîn leban pur xende da

Çendî bi xeml û rewneq in tezyîn ji husna mutleq in

Têk cîlweyê nûra Heq in îşqa ezel pê şêwe da (Cizîrî, 2012: 30).

Di van beytan de bi eyan û eşkere dixwiyê ku wesfên wek “bejn”, “şîrîn leb”, “pur xende”, “qamet”, û hwd. her yê jinê ne. Li gor Mela husn û ciwaniya sûretan, neqş û nîgarên destxetan, bejn û bala jinan, xeml û zînetê wan sebebê cezb û cazîbeyê ne. Lêbelê ev hemû wesfên wan ê ciwan, cîlweya cemala Heq in. Îşqa ezela îlahî ku ji cemala layezal a îlahî ye, bi wê wesileyê xwe nişan dide. Yanî tezahura eşqa ezel pêk tê.

3.10.4. Ciwaniya Sirûştî

Li gor Mela ew ciwaniya ku li tebîetê yanî li sirûştê ku li kaînatê tê xuyanê û tê hîskirin, ciwaniyeke mehdûd e. Lewra ev cure husn û cemalet muhdes e, arizî ye. Ev ciwanî girêdayî bi tecellî û îsandina wê cemala îlahî ye ku li kaînatê û li rûyê mewcûdat bixwuyê. Bes ew tiştên li sirûştê ciwaniya mutleq bi qasî qabiliyeta xwe, yanî di derece û çarçoveya qabiliyeta xwe de nîşan didin. Lewma qabiliyeta wan nagihêjê ku hemû haşmet û mutleqiyata ciwaniya îlahî rave bikin. Ciwaniya hîssî ya sirûştî sûretekî ciwaniya mutleq a îlahî ye. Hemû hebûn, wesf û taybetiyên vê ciwaniya saf û nûranî ne.

Di vehonandina şîra Mela de sirûşt bi serê xwe hêmaneke bingehîn û girîng e. Teswîr û xêzkirina tabloyên ciwan ên sirûştî, ji gul, nesrîn, sosin, simbil, lale, rihanê bigre heta deşt û cobar, çem û kanî, ba, bager, seher, spêde, şev û roj, felek û semek, û hwd. bi hemû reng û deng û şengîniya xwe di şîra Mela de cihê xwe digrin. Di dema îcabî de hemû hazirê wextê ne. Mesela:

Her seher cewlan didit bayê sebayê rast û çep

Sosin û simbil tîn semayê rast û çep

Yan jî

Sunbul bi sema tîn û gulan perde dirandin

Bişkiftine al al û hêşîn bûne tarazin

Mela, xuyang û nîşanên ciwaniyên sirûştî, qulibandiye îşaret û ravekerên ciwaniya îlahî. Êdî ku wisa ne, aşiq dikare ciwaniya sirûştî bike wesîle û xwe bigihîne cemala mutleq û heqîqî. Tecelliya nûrên ji ciwaniya mutleq a îlahî, dikare di neynika ciwaniya sirûştî de bibîne, temaşe bike, têbighê (Alkış, 2014: 78). Lewma Mela dibêje ku:

Muhbeta mehbûb û latan pur vekir zîwersifatan

Daye qelb û ruh û zatan roj li mîratê xuyaye (Cizîrî, 2013: 118).

Yanî yar û hezkiriyên li dunyayê yên maddî û sirûştî ruh û dilan cezb dikin. Lewra di sirûştta ciwanan de balkêşî û cazîbe heye. Ev hub û hezî derî li têngihîştin û naskirina serçeşmeya ciwaniyê vedike û di wê neynika lat û mehbûban de roja cematê yanî ciwaniya raser nîşan dide.

Ciwaniya sirûştî, mecaz bi xwe ye û feyz û şemal e ji ciwaniya Xweda. Ev cure ciwanî, qîmet û hêjayiya xwe ji ciwaniya heqîqî û husna saf ya îlahî werdigre. Însan di vê dunyayê de piştî ku ciwaniya sûrî têdighêje, ciwaniya razber dinase û paşê jî derdikeve merteba nasîna ciwqaniya mutleq, ebedî, nemir. Cizîrî ciwaniya heqîqî ji bo xwe wek armanc û meqseda esasî destnîşan kiriye. Her wiha wekî din qedr û qîmet nedaye wan ciwaniyan ku nebûne pire ji ciwaniya heqîqî re. (Muhammed, 2008: 157). Lewma dibêje:

Ne cemala te tecellî bikirit

Me bi xoban bi cemalê çi xered (Cizîrî, 2012: 328).

Mela îşaret kiriye ku nasîn û tehmkirina cureyên cuda yên ciwaniyê, dibe sedemê lêgerîna ciwaniya heqîqî û çavkaniya wê. Ev demajoya nasîna ciwaniya sirûştî li hemberî ciwaniya heqîqî derî vedike û dibe sedemê peydabûn û şênberkirina eşqa ji bo cemala mutleq. Lewra berdewamiya ciwaniya bêeşq û îşqê bêciwanî, ne mumkun e. Lê eşq li gorî îcaba tebîeta wê ciwaniya meşûq e. Eger ciwanî, muhdes, kêr, arizî, û zaîl be, dê ew çax eşq jî wek wê ciwaniya meşûq muhdes, kêr, arizî, û zaîl be. Na eger husn û cemal û ciwanî rasteqîn be û bi maneya herfî û heqîqî be, wê hingê evîna ji bo wê ciwaniyê jî dê rastîn, daîmî, menîdar û pîroz be. Lewra her tişt girêdayî wesfê xwe ye.

BEŞA IV

EŞQ Û ESTETİK LI NIK MELAYÊ CİZÎRÎ

4.1. Mahiyeta Eşqê di Cizîrî de

Eşq bi serê xwe sir û razek e di qada felsefe, dîn û edebiyatê de û her wiha di gelek hêlên jiyânê de. Lewma ji bo fêmkirina mahiyeta eşqê di şîra Melayê Cizîrî de, divê em wek grîzgahekê pêşî li ser kok, peyv û têgeha “eşq” ê bisekinin û lê hûr bin. Lewra maneya ferhengî û têgehî a peyva “eşq”ê ji hev dizên û ji hev feyîzyab dibin.

4.1.1. Eşq û Evîn

“Eşq” yan ji “îşq” peyveke ji zimanê Erebî ye ku ji reha “aşaq” tê. Maneya wê jî “pêçan, pêçandin” e. Maşûq eşqa xwe di alema xwe ya derûnî de bi muhebbeta xwe û di alema derve de jî bi bedena xwe radipêçe. Kifş e ku di esl û esasê eşqê de hevkaşî û cezb û cazibeyek heye. Ev hevkaşî, hevneşî û hevrapêçan, piştî demekê êdî di encama hevnuhumandinê de, aşiq bi maşûqê ve dibite yek wucûd di alema zahir a fîzîkî de (Kılıç, 2012: 46) .

Dîroka di derheq fikra xulqiyet û çêkirina wucûdê de diçe dighêje serdema Yûnana dêrîn. Hin zanyarên vê dewrê gotine ku çavkaniya hebûnê, av, agir, ax û hewa ne. Hin ji wan jî îddia kirine ku yekûn û hevkelijîna van maddeyan, jêdera mewcûdat e. Xeynî van zanyaran, yên ku hebûnê bi esasekî ezelî şîrove dikin jî hene. Eflatun jî wek fîlozofekî serdema Yûnan fikr û nêrîna xwe ya li ser esasê îdeayan derpêş dike. Ev filozof çavkaniya mewcûdat wek alema heqîqî ya îdeayan nîşan dide. Li gor wî di binnegeha wê de jî îdeaya qenc, rast û ciwanîyê heye. Ev her sê îde û eşq wek lazim û melzûmên hev in û jêdera mewcûdat in (Doru, 2012: 97).

Mijara eşqê di pergala felsefe û tesewufê de têgeh û hêmaneke bingeîn e. Esas fîlozofên îdealîst ên serdema antîk, hukemayên bawermend ên serdema navîn, zanyarên Musliman ên dewra klasîk a Îslamî û her wiha mutesewuf, xuliqandina alemê û afirandina însan wek dîrok û çîrokeke eşqê dibînin û wisa şîrove dikin. Her wiha eşq di kevneşopîya sofîgeriya Îslamî de jî mijareke sereke ye ku ji bo şîroveya ontolojîk a muwecûdat xwedî roleke diyarker e. Ji hêla din ve ji bo têkilî û tecrubeya şexsî û mistîk ya sofî ya bi Xweda re jî girîng e. Ew têkiliya di navbera Xaliq û

mexlûq, Xweda û ebd, Xweda û însan ku di Quranê de cih digre, di demajoya dîrokî ya felsefeya tesewufê de qulibiye têkiliya aşîq û maşûqê (Scattolin, 2001: 152).

Di nav çavkaniyên felsefe û tesewufa Îslamî de, jêder û nasên herî sereke bêguman Quran û hedîsên pêxember in. Her wiha Quran û hedîs referansên bingehîn ên dînê Îslamê ne. Di van her du çavkaniyan de peyva “eşq”ê derbas nabe. Lêbelê digel vê yekê maneya ku eşq îfade dike yan jî ew maneyên ku mutesewuf qesta wan dikin jî di van her du çavkaniyên sereke de hene. Di Quranê de behsa têkilî û muhebbeta di navbera Xweda û ebdan de heye (Beqere, 2: 165).

Di dîroka fikriyata Îslamî de têkiliya di navbera Xweda û ebd de, nêzîktayiyên hişk û jihevduker /tebîdkar jî dem bi dem derketine holê. Wihareng di vî warî de mesafeyên dûr û dirêj wek asteng derketine pêş ebdê. Xasma filozofên Îslamî yên wek Îbnî Sîna ku şîroveyan wan ên bo Xweda li ser esasê “tenzîh”ê, her wiha nêrînên wan ên ku hebûnê wek mumkun û wacib dibînin, buye sebebê vê yekê. Hin nêrînên ku Xweda û însan yek dibînin ên wek “nêrîna îttihad”ê û yên wek “Hulûl” ku îdiaya ketina Xwed a nav qelbê însan dikin jî hene. Her wiha nêrîna “Îşraqî” ku têkiliya Xweda û hebûnê wek roj û tavê zerûrî û bi hev ve şîrove dikin jî hene (Doru, 2012: 202).

Di ekola tesewufî ya Îslamî de nêrîna “Wehdeta Wucûdê” gelek berbelav e û pir hatiye şopandin. Wesf û ciyawaziya sereke ya vê fikr û nêrînê ew e ku mesafeya di navbera însan û Xweda de rakirîye. Her wiha têkiliya di navbera ebd û Xweda de gerandiye têkiliyeke estetîk a aşîq û maşûqiyê. Jixwe ev ekol hin caran bi ekolên wek “Hulûl” û “Îttihad”ê re tevlihev bûne, hatiye îltibas kirin. Lewma mutesewufekî wek Hellacê Mensûr bi îddiaya ku her wekî mensûbê nêrîna “Hulûl” û “Îttihad”ê ye, hatiye cezakirin. Lê hal ew hal e ku li gor Mela ew gotina Hellac ya meşhûr ku xelet hatiye dîtin, wek beyaneke bi zimanê dil ya wehdeta wucûdê hatiye nirxandin.

Lewma gotina “enel Heq” ya Hellacê Mensûr ji hêla Mela ve maqûl hatiye dîtin. Mela wê gotina Hellac wek îfadeya dil a wehdeta wucûdê dîtiye. Lewma di vê derbarê de gotiye:

Hostayê işqê dil hevot ser ta qedem hingî disot

Remza enel heq her digot bawer bikin Mensûr e dil (Cizîrî, 2013: 364).

Meriv dikare bibêje ku di fikr û nêrîna Mela de bandoreke muhim a Hellacê Munsûr heye. Mela jî wek Hellac, xwe û alemê di bin hukmê eşqê de dibîne. Her wiha têkiliya ebd û Xweda li ser esasê aşîq û maşûq û estetîkê şîrove dike.

Di dîroka fikrîyata Îslamî de heta Îbnî Sîna, mijara eşqê bi piranî wek qadeke psîkolojîk û exlaqî dihate nîrxandin. Îbnî Sîna hebûnê yanî mewcûdê wek qencî dibîne û jê re dibêje “eşq”. Her wiha tunebûnê jî wek xerabî dibîne. Îbnî Sîna bi fikr û nêrîna xwe ya “eşqê” bandor li ser Îbnî Erebi kiriye. Ji Îbnî Sîna heta bi Îbnî Erebi têgeha “eşqê” di nav fikrîyata Îslamî de wek têgeheke felsefî cih girtiye. Di vê yekê de jî rola Îmam Xezalî diyarker e (Doru, 2012: 95).

Eşq di tesewufa Îslamî de xaleke navendî ye ku bandora wê made û maneyê radîpêçe. Melayê Cizîrî wek şairekî pîspor û warisekî kamil ê muktesebat û mîrasa hûkema, mutesewuf, ûdeba û ûlamayên beriya xwe, fikr û nêrînên xwe yên di derbarê eşqê de herî rihet bi rêya şîrê aniye ziman. Eşq di heman demê de ji ber ku halekî tecrûbî ye, lewma ji muhakemeyên eqlî zêdetir, muwafîqê zimanê şîrê ye. Eşq di fikr û nêrîna Mela de xwedî roleke esasî û têgeheke muşkîlkûşa ye. Mela xwedî muktesebateke kûr û berfireh a felsefî û tesewufî ye. Wî mahiyet û maneya ontolojîk a têgeha eşqê li gor nêrîn û ramana xwe ya felsefî û tesewufî terenum kiriye û nîrxandiye. Li gor felsefeya wî eşq nûra wucûdê, reng û ronahiya alemê û hêza hebûnê ye (Cizîrî, 2013: 7).

Temaya hakim a di helbestên Mela de bêguman eşq e. Helbestên wî bi serdan pê ji mazmûnên eşqê hatine honandin. Mela berî her tiştî eşqê wek heqîqeteke ûlwî, muteal, payebilind dibîne. Lewma li gor wî pênaseya eşqê ne mumkun e. Ji ber ku ûlwiya eşqê mani e ji terîfa wê re. Her wekî ku şewq û ronahiya rojê mani e ji dîtna rojê re. Payebilindîya eşqê jî nahêle ku ew bê dorpêçkirin û kunha wê bê zanîn. Lewma jî çawa ya ku rojê bide nîşandan dîsa roj e. Her wisa jî ew tiştê ku eşqê bide nasîn û zanîn, eşqê terîf bike, dîsa eşq bi xwe ye. Tehmkirin û jiyîna eşqê ye.

4.1.2. Sirra Eşqê

Di dîroka tesewufa Îslamî de ew fikr û nêrîna ku eşqê wek sir dibîne ya Îbnî Erebi, Mewlana û hwd. di nêrîna Mela de jî berdewam e. Nêrînên sofî û filozofan yên di vê qadê û di vî warî de bi piranî nêzî hev in. Di navbera wan de ciyawaziyên piçûk hene. Her wiha şerh û şîroveya eşqê ya erbabê tesewufê hema bêje wek hev in. Li gor vê nêrînê eşq “muamma”yeke mezin e. Ev nêzîktayî ya di derbarê eşqê de bi

heman awayî derbasî fêm û feraseta şiar û edîbên serdema navîn ên wek Melayê Cizîrî jî bûye. Ev “meçhûliyet”a eşqê, bûye sebeb ku muktesebat û terakumeke gewre pêk bê di vî warî de (Doru, 2012: 210).

Ji ber ku eşq qîmet û nirxekî mualla ye, payebilind e, tişteki ji wî hêjatir, ûlwîtir tune da ku terîfa wê (eşq) bike. Lewma eşq nayê terîf û şerhê. Yanî eşq her eşq e. Lewra eşq sir e, raze û muamma ye. Li gor Mela eşq sirek e payeblind a bêterîf e. Eşq sireke îlahî ye. Bes meriv dikare teswîreke tesîra eşqê pêk bîne. Lewra eşq mewcûdeke ezeli ye. Belê eşq him sir e him jî muamma ye. Lewma dibêje:

*Wesfên evîn û işqehê husn û cemala wê şehê
Nayêne şerh û medehê ehzen ji neqşê beşerê*

*Şerhê halê xemê işqa te kû tête nivîsîn
Medhê ewsafê cemala te kuca tê reqemê* (Cizîrî, 2013: 430).

Di fikriyata Mela de eşq ne ew tişt e ku bi aqil bê fêmkirin û ferisandin. Aqil ji ber ku mehdûd e, nikare sira eşqê hel bike û veke. Li gor Mela ev yek bes bi merîfetê pêk tê. Ev jî bi cureyekî zanyariya taybet ve mumkun e. Merîfet ew zanyarî ye ku arif wê bi çavê qelb, bi bîneyê dil bidest dixê. Ev zanyarî jî bi saya eşqê tê qezenckirin. Lewma dibêje ku:

*Guftugoyê merîfet çendî Mela peyda biki
Gewhera merîfetê nagihetê kes bi xîret* (Cizîrî, 2013: 145).

Di nêrîn û ramana Mela de sirra eşqê bi îlmê zahir hel nabe. Lewra ulûmê zahir bes zanyariyên têkildarê bi rûyê/derveyî eşya dide. Hel û keşfa heqîqetê ala û bala ya wek eşqê, ne karê ûlemayê zahir e. Ev yek bes karê arîfan e ku pîspor û wuqûfê merîfeta dil in, zanyar û emelkar in, ehlê hal in. Mela vê rastiyê awha tîne ziman:

*Tu’j Melayî her bipirs esrarê işqê hel diki
Vê muemmayê çi zanit sed Mela û musteîd* (Cizîrî, 2013: 284).

Li gor Mela eşq tecellî ye, tecelliya cemalê ye. Her wiha maneya eşqê, eks û tecelliya li ruh a cemala Xweda ye. Xweda cemîlê mutleq e, ciwanê heq e. Tecelligaha ciwaniya îlahî jî ruhê însan e. Qismekî ji wê cemala xwe daye ruhê me. Ruhê însanî bi vê çirûska ciwaniya ji cemala mutleq mest û heyran bûye; bûye sergeşte û sergerdan. Li pêşberî vê cemala rewnaq û mutleq, dikeve nav beht û heyranîyê. Wihareng dibite aşiq û evîndarê wê cemala ceberut û sermedî. Ruhê însan li hemberî cemala bêmîsal neynikek e (Doru, 2012: 214). Lewra Mela vê nêrîna xwe awha tîne ziman:

Maneyê eşqê bêm çiyê lew min bi çeşmê dil diye

Eksa cemalek safî ye lami' di mîrata me de (Cizîrî, 2013: 28).

Ev beyta bi Farisî ya ku wek maneya Hedîseke qudsî tê rîwayetkirin, bala meriv dikşîne (Ragihandina ji Elif Yalçın, Olgun, 1966: 2652). Lewra ew û beyta Mela hema bigre di heman maneyê de ne, belkî nuansê di navbera wan de hebe:

Men neguncem der semawat û zemîn

Eceb men guncem der qelbê mumînîn (Nursî, 2010: 112)

Kurdî ya vê beyta Farisî:

Ez di hemû erd û asîman de hilnehatim/bi cih nebûm

Ecêb e ku di qelbê însanê mumîn de bi cih bûm

Qelbê însanê bawermend neynika cemala îlahî ye û ji hêla xilqetê ve muqabilê husn û huba îlahî ye. Lewma digel piçûkbûna xwe ya maddî, mezinahî, kulliyet û wuseteke manewî ya ezîm û ecêb nîşan dide. Di vê noqteya nezerê de hemû kâinat li aliyekî, dilê mumîn li aliyekî ye.

Li gor Mela ji bo bidestxistina îlmê merîfetê fîtrateke paqij lazim e. Lewma divê ruhê xwe ji qirêj û gunehan pa bike. Her wiha divê wî ruhê xwe nêzî esliyeta wî ya ewil bike. Wihareng dê zanyarî di wî qelbî de cih bigrin û îlmê merîfetê dê bê bidest xistin. Di derbarê vê de Mela awha dibêje:

Pakîteb' û quwwetek mewzûn divêt

Da nedit senet bi îdmanê xelet (Cizîrî, 2013: 90).

Derdikeve holê ku li gor Mela eşq sirreke îlahî ye. Ev sir jî bes dîsa bi eşqê tê hel kirin. Arîf û mutesewufên me eşqê wek tişteki terîfa wî nemumkun dîtine. Lewma wan di derheq eşqê de serî li sembolan, metaforan, mînakên û çîrokan dane. Ev fikrîyata wan, hevahengê bi şîroveya eşqê ya felsefeya tesewufê ye. Mela jî wek wan hemû şair û edebiyatnasên ku ji ser çeşmeyê heywan qedehek safî vexwarine, yanî eşqa îlahî nas kirine, tem kirine û terenum kirine, rê û rêbazên vegotina vê sirê, di tixûb û çarçoveya îfadeya zimanê şîr û edebiyatê de şerh û beyan kiriye (Cizîrî, 2013: 228).

Belê pênasîya eşqê nayête kirin. Ne mumkun e ku şîroveyên wê yên rasyonel bêtin kirin. Esas tiştê herî hêjayî medh û pesnê eşq e. Lê pesindana wê ya bi kamilî jî ne mumkun e. Lewra cewhereke îlahî ye. Her çiqas eşq bêterîf e lê di derheqê de tê qisedanê. Di felsefeya tesewufê de herî zêde di derbarê mijara eşqê de hatiye qisedan û guftugokirin. Ne ku di derbarê cewhera eşqê de lê di derheq hal û rewşên eşqê, encam û şop û rêçên wê de muktesebat û lîteratureke gewre pêk hatiye.

Fîlozof, hukema, hunermend, arif, edebiyatnas, şair û sûfîyan jî bo vegotina eşqê simbol, çîrok, mînak û teswîrên cihêreng bikaranîne, Ew bi hêmanên estetîk ên wek reng, deng, aheng û xêz, di nav berhemên xwe de îsandîne û xwestîne ku eşqê û eksa wê vebêjin, terenum bikin. Ew kirine malê fikr û nêrînan, êkol û mekteban, huner û edebiyatan. Li gor Mela tiştê herî pir li ser tê axiftin, eşq e. Mela şexsê xwe jî wek pîrê eşqê û ustadê sanî yê eşqê dibîne û di vî warî de jî bi xwe bawer e (Doru. 2012: 112) Lewma dibêje:

Di îşqê şeyxê sanî me bi dil behra meanîme

Lî zî hîcrîn we zî qelbîn şîfaûn fî îşaratî

Tu narê firqetê zanî dikarim ez tehemmul kim

Diyarê kohê Qendîl im meger fîl im di îşqê da (Cizîrî, 2013: 58).

Li gor Mela sirra eşqê hin aşîqan dide sotin û hin aşîqan jî dide gotin. Lewra li hemberî vê sirra îlahî, li pêşberî vê cemal û nûra Xweda, hin evîndar û ehlê dil,

wek perwane yanî wek perperok/minminik bêdeng in. Bi awayekî serxweş û sekran, bi awayekî bê deng û his bûne perwaneyên wê roj û şemsa ezel. Hin ji wan jî li pêşberî wê cemala bêmîsal, bi coş û cezbedarane, her di zar û fixanê de ne. Lewma Mela di vê derheqê de dibêje ku:

Êk ji wan perwane bû soht û fixanek jê nehat

Êk ji wan teşbîhê goyinê bi ah û nale bû (Cizîrî, 2013: 416).

Di Mela de metafora perwaneyê ku wek temsîla eşqa li dor ciwaniyê ye, bi tabloyên here bala û balkêş tê xêzkirin. Perwane carna bi awayekî bêdeng û his feda dibin. Carna jî bi sebeb tîn û şewata ronahiyê kizînî pê dikeve û dizare. Ev wek du rewşên eşqê ne ku di aşiq de xwe dide der.

4.1.3. Eşq Wek Çavkaniya Hebûnê

Tê zanîn ku cara ewil di felsefeya Yûnan de fikr û nêrînên di derbarê hebûnê de bi awayekî sistematîk hatine derpêşkirin. Di vî warî de gelek nêrînên cuda û dij hev derketine holê. Yek ji van jî “wehdeta wucûdê/ yekbûna hebûnê” ye. Yektiya hebûnê, yanî wehdetê wucûd, wek teoriyekê, wek ekolekê, dendikê vê hizrê hê ji wextê felsefeya Yûnan vir ve heta bi fikriyata Îslamî her tim hebû. Ehlê tesewufê derketina holê ya alemê, bi eşqê şîrove kirine. Ev nêrîn bigre ji Îbnî Erebi vir de di piraniya zanyarên mutesewuf de heye.

Di nezer û nêrîna sofîgeran de hebûn û xulqa kaînatê li ser eşqa Xweda pêk hatiye. Yanî sebebê afirandina alemê, eşq e. Têkiliya di navbera Xweda û alemê de û xasma têkiliya di navbera Xweda û nûnerê alemê ku îns e/ insanê mumîn, li ser bingeha aşiq û maşûqiyê ava bûye. Di nav fikra sofîgeriyê de ekola ku wek mumesîlê vê nêrîniye, fikra wehdeta wucûdê ye (Alkış, 2014: 216).

Li gor fikra wehdeta wucûdê ya di tesewufa Îslamî de, alem yek e û ew alema ku ji hêla filozofan ve wek mumkun tê wesifandin, ne li derveyî wucûda Xweda ye. Bi vê nêrîna xwe mutesewuf ne ku înkara alema hestan dikin. Lê li gor wan wucûd ne navekî îştiraqî yê wek mewcûdê ye. Lewma bi wucûdê qesta yekûnekê tê kirin. Ew kesret û pirrengî ya ku li alemê tê xuyan jî nayê wê maneyê ku wucûd tiştekî perçebûn û jihevqetîna wê mumkun e. Lewra kesret û pirhejmarî, nisbî û îzafî ne, ne

heqîqî ne. Alem wek neynikekê ye ku Xweda dixwaze ku teceliya wan nav û sîfetên xwe tê de bibîne û temaşe bike.

Fikra eşqa ontolojîk a zanyar û ehlê tesewufê, bi awayekî gelemperî li ser maneya hedîseke qudsî deketiye holê. Li gor nêrîn û nezera zanyarên sofîger, Xweda bi zimanê hîkmetê gotiye ku “Kuntû kenzen merxfiyen, fexeleqtul xelqe, lî ye’rîfûnî” yanî “Ez xezîneyeke veşartî bûm. Min xulqa mewcûdat kir. Da ku min nas bikin”. Wihareng Xweda alem ji eşqê afirandiye. Ew aşîqê ku ji ezîniya (ene/ enaniyeta) xwe derbas bibe, yanî ji xwe û nefsa xwe bigere, hemû mewcûdat jê re dibin delîl û wî aşîqî ber bi nasîn û muhebeta Xweda ve dibin (Doru, 2012: 215).

Ew tiştê di navbera Xweda û mewcûdat de, yanî di navbeyna Xaliq û mexlûq de sebebê cazîbeyê ye û bingeha hereketa alemê ye, eşq e. Lewma ji hêla zanyarên sofîger ve eşq wek maddeyê ewil (prima materia) û wek muharrîkê ewil hatiye wesifandin. Li gor van zanyaran ew eşqa di dilê wan de jî ji bo “zat”, “sîfat” û “esma” ne (Alkış, 2014: 214). Lewma Mela adi vê derbarê de gotiye:

Eynê kafûrî ye meşreb me ji husna te ye saf

Lew ji eşqa te di dil da me vebû ilmê ‘ubab (Cizîrî, 2013: 228).

Îbnî Erebi li ser bingeha vê hedîsa qudsî ya “Kuntû kenzen...” hebûna alemê ji nekişebûnê ber bi hebûnê, yanî ji sibûtê ber bi wucûdê, pênc merheleyan de şîrove dike. Ev merhele wek “Tenezzulatê xemse” yan jî “hazeratê xamse” tê îfadekirin. Her wisa Erebi eşqa ontolojîk jî di vê neqeb û wetîreyê de wek sebeb û bingeha xwenîşandan û tezahura îlahî diwesifîne. Ev demajoya xulqa wucûdê, xwedî mertebeyên wek Zat, Teayûna pêşîn, Teayûna duduyan, Mîsal, Şehadet in. Di fikr û nêrîna Mela de jî heman şîroveya eşqê ya ontolojîk xwe dide der. Di wucûd û eyaniya van hemû merheleyan de ew eşqa bûnewer/ontolojîk heye. Lewra li gor Mela eşq hebûneke qedîm û ezeli ye (Doru, 2012: 216).

Her wiha hebûneke din ya ku bi eşqê re hevalbend e û wek eşqê qedîm û ezeli, husn e, yanî ciwanî ye. Hê zeman nehatibû xulqkirin, hê alema wucûdê tunebû, hê beriya hemû tecelliyan, eşq û ciwanî ji teref Xaliq ve hatine afirandin. Lewma Mela dibêje ku:

*Hê di ber qal û belayê belku ev alem nebû
Çerx û dewran, dewrê gerdûn gunbedê mîna nebû*

*Erş û kursî hêj di mexfî bûn di kenza qudretê
Husnê Heq bû îstiwayê lamia işqê hebû*

*Nehtibûn hukmê sifatan ew ji zatê lemyezel
Aşiq û maşûqi yek bûn şem' û hem perwane bû (Cizîrî, 2013: 414).*

Di fikr û nêrîna Mela de Xweda gava mûm û meş'ela eşqê vexist, berî her tiştî ew şu'ledar kir, di zatê xwe da nûra cemala bêdawî nîşan daye. Lewma Mela dibêje ku:

*Allah sehergeha ezel yelmûmê işqê şu'le da
Nûra cemala lemyezel zatê tecellaya xwe da*

*Zatê tecella bû li zat bê îsm û asar û sîfat
Sirrên hurûfên aliyat xef bû di sitr û perde da (Cizîrî, 2013: 26).*

Li gor Mela ciwanî û eşq du hebûnên qedîm in, du hevalbendên ji yek çavkaniyê ne. ciwanî û eşq bi hevra ne û bêtî hevûdu nayêtin fikirîn. Jiber ku her mewcûd fîla xwe dixwaze, lewma fîla ciwaniyê ew e ku dixwaze ciwan bibe, dixwaze were hezkirin. Bi gotineke din, ciwanî ji bo hezkirinê ye. Hezkirin, derketina ciwaniyê ya ji quweyê bal bi fîlê ve ye. Hûb û hezkirin, xwe pêkanîn û xwe tehequqa ciwaniyê ye. Lewma ciwanî bi xwe berê tê hezkirin. Yanî ciwanî bi awayekî bê sebeb, bê menfîet, bê qerabet tê hezkirin.

Her wiha xwenîşandana ciwaniyê, ji wesf û fitrata ciwaniyê ye, ji rastiya wê ye. Lewma nezer û çavdêrên temaşevan dixwaze. Fîla eşqê ew e ku bibite aşiq. Yanî eşq her dem li ciwana xwe digere, li pey husn û cemala xwe ye. Her ciwan û cemaal dixwaze xwe rave bike. Ev yek fitrat û tebîeta ciwaniyê ye. Lewma ev meyelena fitrî nayête astengkirin, ne mumkun e ku bê berbendkirin.

Di fikr û nêrîna Mela de eşq û evîn, husn û cemaal, dijê tunebûnê ne, yanî eşq ziddê edemê ye. Wihareng li gor Mela eşq û wucûd hemwate ne, yanî eşq û ciwanî

hebûn e, hebûn eşq e, ciwanî ye. Ciwanî li gor îcaba fitrata xwe, xwe eyan û eşkerekirin divê. Ciwanî perdedariyê qebûl nake. Eşq jî dij û dijberê neman û edemê ye. Nexwe ciwanî û evîn bi hebûnê re yek in. Bi gotineke din, eşq û husn mewcûdat e, mewcûdat husn û eşq e. Lewma Mela vê rastiyê awha tîne ziman:

*Da husn û hub din mezheran kifş kin li her erd û deran
Aşiq bixwînin defteran dilber mehebbetname da*

*Husn û cemal û işqe ye aram di perdê da neye
Mehbûbê lew hetta heye nabit di perde'w xilwe da*

*Mehbûb û xub û dilberan bigrê li wan heftê deran
Dê xwe'j şibak û penceran zahir bikin d'her erde da*

*Bayê evînê ku livî ew qîşt û zulfê ser çevî
Herdem hezar dil da kevî xal lew di damê da neda*

*Eşya di îlmê bûn zuhûr îsman ji feyza îsmê nûr
Teqwîmî best in bêqusûr hukmê sifate seb'e da*

*Vê alemê teqwîmî best her îsmekî fî'la xwe xwest
Hukmê teserruf da bi dest her wî di mulk û qebze da (Cizîrî, 2013: 32).*

Li gor Mela di zatê Xweda de ciwanî û eşq bûne yek. Yanî Xweda eşq bi xwe ye. Wihareng ciwan ew e, aşiq ew e, eşq jî ew e. Ew eşqa ku ji teref qudrete îlahî ve wek şem'û şemal hate şû'ledar kirin, li dor wê ciwanî û cemala îlahî wek perperokê jê re bû perwane. Xweda aşiqê zatê xwe ye. Xweda berî her tiştî zatê xwe hez dike. Lewra yê herî hêjayî hezkirinê Ew e. Wihareng Xweda bêyî ku hewceyî bi ciwniyeke din be, zatê xwe hez kiriye. Lewma Mela awha dibêje:

*Husn û cemalê xwest evîn vêkra di yek zatî civîn
Nûra qedîm bû işq û vîn wan lêkî naz û îşwe da*

*Îşqa ji nûra layezal husn û cemala bêmîsal
Îsandi yelmûm û şemal dîsa xwe lê perwane da*

*Husn û mehebbet her hebû heq aşiqê zatê xwe bû
Muhtacê husnek dî nebû neql û rîwayet pê we da*

*Ew nûr e dayî şewq û tav alem xweyabû ma di nav
Berqên xwe avêtin bilav reng rengi berq û lem'e da (Cizîrî, 2013: 26).*

Ciwanî û eşq di nêrîna Mela de wek têkiliya aşiq û maşûq hatiye teswîrkirin. Ev her du, yanî ciwan û evîn gava di zatê Xweda de bibitin yek, ne ku ev du heb mewcudên cuda ne. Bileks, eşq û estetîk yek in. Ew ji Xweda ne. Her wekî neynik û sûretê di neynikê, ha aşiq ha maşûq, her du jî eks û tecelliya nûra Xweda ne. Lewma di vê mijarê de awha dibeje ku:

*Me'nayi îşqê bêm çiyê lew min bi çaşmê dil diye
Eksa cemalek safî ye lami' di mîrata me da*

*Husn û muhebbet zatek in meşûq aşiq lat ek in
Lê sûret û mîratek in her yek di menayê xwe da*

*Ger dilber û wer aşiq in arîf di vê da sadiq in
Ayîneyê nûra Heq in cih cih di wan da cîlwe da*

*Aşiq ew e, dilber ew e, zahir ew e, mezher ew e
Ruh û bedn gewher ew e d' her şahidên durdane da (Cizîrî, 2013: 28).*

Di nêrîna Mela de ew cwaniyên li rû dunyayê, yanî bi qewlê Mela “esmer”, “mahîrû”, “hûrî”, “wildan”, “perî”, “neyşeker”, “şîrînmeş”, “şox” û “şeng”, “şepal” û hwd. hemû b xeml û xêzên xwe, bi reng û deng û ahengên xwe, bi cazîbe û ciwaniyên xwe, şewq û şemala wê cemala mutleq in. Xweda xulqa wan kiriye, ji ciwaniya xwe teceliyê wan kiriye, ew gerandine neynika navên xwe, tecellîgaha sifetên xwe. Her xwedî cemal û kemal, dixwaze ciwaniya xwe bibîne û bide

nîşandan. Yanî him dixwaze ku xwe bi xwe, cemala xwe bibîne. Him jî dixwaze ku cemala xwe bi wasiteya ayîneyên muqabil, bide nîşndan.

Mela tîne ziman ku di hebûnê de tenê huwîyetek û heqîqetek heye. Em însan, heywan, nebat, cemadat û hemû alem jî di nav vê heqîqetê de ne. Hemû hebûn yanî wucût, eksa ciwanî û eşqa Xweda ne. Yanî em tiştên mewhûm in, ronahî û rewşenya me ji çavkaniya nûrekê ye, em wek eksên di neynikê ne. Lewma Mela dibêje ku:

*D'her şahidek dêm da ji dur ruhek di bexş ba remz û sur
Xettê xubarî nuqtepur katib ji bala nusxe da*

*Herfên kişandî katibî nûra di ruh û qalibî
Yek yek bi îsmê Wahibî îrab û cezm û nuqte da*

*Ev şîkl û sûret sêwwirîn esl in li bala zeyyinîn
Nisbet bi wan em saye yîn tertîbê Xellaqî we da*

*Em têk hewwiyyat in yeqîn îsm in ji mesder muştêq in
Mewhûm û laşey mutleq in eks in di nêv ayîne da (Cizîrî, 2013: 28).*

Li gor Mela ew tişta ku kaînatê yanî hemû mewcûdat ji zerreyan heta bi seyaratan, tîne hereketê û dide seyr û deweranê, mexlûqat di nav cezb û reqseke mest û heyran de dide gerandinê jî eşq e. Lewma dibêje ku:

*Bi evîne melek û çerx û felek tene sema
Rewşen in têki bi mihrê ji sema ta bi semek (Cizîrî, 2013: 346).*

Li gor vê şerh û beyana Mela, rabûna semayê ya hemû “melek”, “çerx” û “felek”an, xwe varqilîna wan û bi xwe hisîn û xwe îdraka wan e û ev yek bi saya “eşqê” pêk tê. Ji stêrk û roj û hêyvên jora semayê bigre heta mesî û semekên binê behrê her tişt, hemû mexlûqat bi “eşqê” rohnî û rewşen dibe (Doru, 2012: 225).

Xweda “eşq” wek dendik û haveynê alemê çêkiriye û di xulq û çêkirina kaînatê de cihekî navendî dayê. Lewma “eşq” di hemû mertebe û merheleyên hebûnê de hevalbend e ji afirandinê re. Di vê hêlê de “eşq” sir û raza alemê ye. Cih û warekî

yan hal û meqamekî ku ev sir sîrayet nekiribê tune (Kılıç, 2001: 171). Lewma Mela eşqê wek puxte û peymana bingeîn a mewcûdat û însan destnîşan dike û dibêje:

Min di ber qal û belayê batin pê re bû evîn
Hê li ser ehda elest im ta bi roja axirîn
Lê divê ku eşkera kim carekê daxa nihîn (Cizîrî, 2013: 204).

Li gor Mela eşq esasê alemê ye û ew soz û peymana ku însan li ser hatiye xuliqandin û pê hatiye ehdkirin jî ew biryan û pevgirêdana bi wê “eşq û evîn”ê re ye. Lewma dibêje ku “evîn” yanî “eşq” hê di serê xulqa alema ruhan de di batinê însan de / di hundurê însan de heye û hatiye derckirin. Ev eşqa ku wek dendik di ruhê beşerî de û beriya çêbûna alemê hatiye çandin, sebebê afirandina alemê ye. Ne ku encama afirandina wê ye.

Li gor Mela eşqa heqîqî ya hêjayî jiyînê, eşqa ontolojîk e. Ew cemala mutleq û eşqa mutleq e. Ev alema şehadetê jî ku li ber çavan e, neqş û tenteneyeke perdedar e li ser wê cemal û ciwaniya mutleq. Yanî lefz û kelam in ji bo wê maneya ciwaniya heqîqî. lêbelê însan exleb mubtelayî bi zahirê ye, maneya wek cewher wunda dike. Ew kes bi qewlê Mela “xertebetên di ebleh” in “ku wan nezer li xwar e”, “bêzî dikan ji qencan”, “nabînîtin berê reş” û ew kes masedeqê vê sîlleyê ne: “camid çi kin bi husnê” ne (Cizîrî, 2013: 318). Ev alema zahir perdepoşîyeke tarî ye. Beyhûde ye ku meriv bi çavê zahir û maddî ve di pişt vê perdeya tarî de dilber û maşûqê bibîne û temaşe bike. Lewma Mela vê rewşê awha tîne ziman:

Lefz û îbaret came ye mehbûbê mena bi xwe ye
Lê xemlê husnek zêde ye lewra bi husnê zîbe da

Min ev mîsal lew bo te best zoran bi zulfan dil vebest
Herçî te dît sûretperest durrê yetîm bêfeyde ye

Pîs û xirab û zişt û ar ma ew bi xemlê tîne kar
Ê’ d qeydê lebsê neyde yar hubbê bi xwe davê neda

*Çarê hilîn yarê bibîn ne d'perdeya tarê bibîn
Sed carî er karî bibîn gul wê di nîva buxçe da*

*Ew bû mûrada Kirdîgar lew kir îrade'w xtiyar
Vî buxçeyê her lê buhar gul geş di baxê xunçe da (Cizîrî, 2013: 32).*

Mela, hedîseya afirandina alemê, wek “kelijîn/ kelçûna behra cûd”ê wesifandîye. Li gor wî xulqa wucûdê, yanî kelçûna behra cûdê, bi saya navê Xweda yê “Wedûd” pêk tê. Ji xwe maneya “Wedûd” têkildarê bi “evin” û “eşqê” ye. Ev îsmê îlahî tê wê maneyê ku “ji mexlûqê xwe hez dike, hezkiriyê mexlûqê xwe ye û her wisa hêjayî hub û heziyê ye” (Cizîrî, 2013: 527). Hemû hezî û muhebet, tevaya eşq û evînan cîlweyên îsmê Wedûd in. Nûra Xweda bi saya navê Wedûd şu'le dide. Wihareng teceliyên bi vî awayî derdikevin holê, dibin sebebê hebûnê, sebebê wucûdê. Tecelliya ewil, ew buyer e ku di wê hedîsa qudsî ya meşhûr de wek “kuntû kenzen mexfîyen../ ez xezîneyeke veşartî bûm...”derbas dibe (Doru, 2012: 218).

Ev beyta Mela vê waqieyê tîne ziman:

*Coşîş ku da deryayê cûd d'ayneya îsmê Wedûd
Carek tecella bû wucûd fûrek ji nûrê jê veda (Cizîrî, 2013: 34).*

Ew eşqa ku pêşî teeyyûn dike û bi tecelliya îsmê Wedûd tê wucûdê, “Heqîqeta Muhemmedî” ye. Heçî ew Hz. Muhemmedê ku wek şexsekî dîrokî ye, şeklê mehdûd ê wê heqîqetê ye ku di zemanekî kifşe û di mekanekî muayyen de tecessum kiriye, muşexxes buye. Ev eşqa taybet a di navbera Xweda û heqîqeta Muhammediye de, çavkanîya wê eşqê ye ku nazilî rû erdê buye. Lewra heqîqeta Muhamediye di temsîl û wekaleta beşeriyet û alemê de wek esl û dendikê dara kaînatê ê, buye maddeya ewil û muharrîkê eslî.

Lewma Xweda di Quranê de bi wî qasidê xwe yê hebîb yanî hezkirî û mehbûb daye gotinê ku “Eger hûn ji Xweda hez dikin, ew çax j mn hez bikn. Da ku Xweda jî ji xwe hez bike.” (Kılıç, 2001: 176). Mela di vê babetê de wha dibêje:

*Mîm metlea şemsa ezel ayîne sifet kir
Lami' ji Ereb berqê li fexxarê ecem da (Cizîrî, 2013: 50).*

Mela di vê beytê de li gor şîroveya sofîgeryê dibêje ku “Mîm” Ehmed, bû hilata roja tenhayiyê. Ji ber ku di fikr û bawerîya mutesewufan de, zatê îlahî di buhurîna xwe ya jî haletê ezelî de ber bi tenhayiyê ve kete sûretê heqîqetê muhammediyeyê. Lewma ew di “Mîm”ê de xuya bû. “Mîm” jî ew herfa ku Ehmed (Yek û Tenha ku Xweda ye) û Ehmed jî hev vediqetîne.

Beyteke bi zimanê Farisî heye ku bi maneya xwe nêzî vê beyta Mela ye. Şairekî Faris yê bi navê Şêx Mehmûd Şebûsterî ku di sedsala heştan a Hicrî de jiyaye ev beyt nivîsiye. Beyt awha ye:

*Zi Ehmed ta Ehmed yek “mîm” ferq est
Cîhanî ender an yek “mîm” xerq est (Cizîrî, 2018: 48).*

Yanî:

*Di navbera Ehmed û Ehmed de “mîm”ek heye
Hemû alem di wê “mîmê” de veşartîye*

Yanî cudatiya di navbera Ehmed ku Xweda ye û Ehmed ku pêxember e, hew herfa “mîm” e. Her wiha dunya di wê “mîm”ê de mijûl e, yanî dunya bi xwe di wê “mîm”ê de veşartîye. Di şîroveya Mesnewîya Mewlana Celaleddînê Romî de jî hatiye ku ferqa Ehmed û Ehmed hew ew herfa “mîm” e ku bi hesabê ebcedê dike “çil”. Ew jî umrê teşrîfa Hz. Muhemmed a bi pêxembertiyê ye (Cizîrî, 2018: 48).

Her wiha beyteke li ser heman mijarê ya bi Tirkî jî heye ku bi qenaeta me heman hêla heqîqeta Muhemmediyeyê tîne ziman. Tê gotin ku ev beyt jî hêla mutesewufê bi navê Azîz Mahmûd Hedayî ve hatiye nivîsîn Beyt ev e:

*Ayinedir bu alem her şey Hak ile kaim
Mir’at-i Muhammed’ten Allah görünür daim (Nursî, 2002: 205).*

Yanî :

*“Ayîne ye ev alem her tişt bi Heqqê qaîm
Di mîr’ata Muhammed Xweda dixwuyê daîm*

Hasil di vê beyta Mela de (her wiha di van her du beytên bi Farisî û bi Tirkî de) ku rasterast li ser rîsalet û heqîqeta Muhemmedî hatine ziman, nûra Muhamedî wek dendik û fêkiyê ewil ê eşqa îlahî, tê tewsîfkirin. Kifş e ku heqîqeta nûra Muhemmedî jî wek wan mijarên din ên eşqa ontolojîk di zimanên sereke yên Rojhilata Navîn de û j hêla debiyatnas û mutesewwufên her milletekî ve bi heman maneyî lêbelê bi zimanên cuda hatine şîrovekirin. Mela jî di Kurdî de bi awayekî ne kêmtî ji edîb û şairên wan miletên cînar û bi ast û estetîkeke bala û balkêş heman heqîqet derpêş kiriye.

Mela di çend beytên din de jî vê mijara heqîqeta nûra muhemmedî hinekî berfrehtir tîne ziman. A. Alkış di kitêba xwe de û mijara xwe ya têkldar de qet behsa van beytên han nekiriye. Her çiqas N. Doru îşaretî van beytan kiribe jî di kitêba xwe de cih nedaye wan.

Di van beytan de jî Mela heman bûyera tecelliya cemala îlahî û dendika wê vedibêje ku heqîqeta nûra Muhemmedî tecelliya ewil a wê eşqê ye. Di beyana xwe ya di vê mijarê de Mela dibêje ku:

*Husnek munezzeh sêwirand nûra hebîb jê afirand
Alem di kunhê heyyirand ruhilqudûs can nefxe da*

*Erş û cîhat lê bû heyat ew şahidê qudsîsîfat
J'bona yeqîna nûrê zat sêwan û şewq û hale da*

*Husna ji îşqê sewwirî xaret kirin hûr û perî
Heçî di kunhê fekkirî ew ma di icz û hîre da*

*Ew sûretê mîratê husn jê bû zuhûr ayatê husn
Lê bû tecella zatê husn vê husnê ew serşexme da*

*Serşexmeyê husnê Ew e xurşîd ew alem pertew e
Ger bedr û wer mahê new e wer Muşterî yan Zuhre da*

*Nûrê ji Nûra Ahmedî sirra sîfatên sermedî
Di ayîneya zatê xwe dî keşfa kemalatê xwe da*

*Ew bû qelem ew bû eqil lew pê hedîsê da neqil
Deryayê îlm ew bû şuxul tefsîlê îlmê cumle da (Cizîrî, 2013: 36).*

Di vê mijara li ser nêrîna Mela ya li heqîqeta eşqê de du xebatên girîng hene. Yek ya Abdurrahim Alkış, ya din jî ya Nesim Doru. Her du lêkolîner jî di kitêbên xwe yên li ser nêrînên Melayê Cizîrî de, gava hatine ser behsa “heqîqeta Muhemmediye”, jî vê beyta Mela ya mewzûbehs ku rasterast têkildarê mijarê ye, serfê nezer kirine yan jî fîrî nekirine. Her wiha bi beytên din ên jî dûrî mijarê, bi awayekî tekellufkarane û bi şîroveyan derhudûd, xwestine mijarê binirxînin (Alkış, 2014: 214).

Li gor Mela heqîqeta nûra Muhemmedî heqîqetek e qedîm e. Xulq û wucûda kaînatê li ser vê bingehe ye. Heqîqeta Muhemmedî rewneqtirîn ayîneya şemsa ehediyetê ye. Alema mewcûdat bi ronahiya ciwanmêriya wî rewşen bûye. Gerdûn qedr û qîmeta xwe, nîrx û wateya xwe ji madena hebûna wî werdigre. Piştî tecelliya nûra muhemmediye, xulqa aqil u ruh ku ronahiya alemê ne û xulqa nefse ku ciwaniya ulwî u pîroz e/ husna muqeddes û bingeha hest û hestiyariya estetîk e, pêk hatye (Muhammed, 2008: 147).

Lewma Mela vê heqîqetê awha tîne ziman:

*Ev reng tecella kir Subûh saqî ji şehkasa futûh
Mey rête cama eql û ruh roj bû di qewsê qubbe da*

*Tey kir di nêv tûxrayê îsm teksîrî kir herfên tilism
Husna muqeddes bû du qism hukmê tecellayê we da*

*Yek eql û ruhê ezem e mîsbah û nûra alem e
Hewwa û neqşê Adem e bêmuddet û bêmaddê da*

*Ê dî ku nefsa kullî ye husnek muqeddes alî ye
Ew jî bi ruh ra eslî ye wan her du hev ra saye da*

*Ayîneyê zatê yek in lew dilber û latê yek in
Vêkra di mîratê yek in hem taze taze işwe da*

*Ew tîn bi cem fer' û esl mail dibin vêkra b'wesl
Nabin ji yek ferq û fesil hukmê wîsalê pê we da*

*Vêkra ku bûne wesl û cem' barîn ji mabeynê du lem'
Îsa ji erwahan du şem' şem'a nufûsan şu'le da (Cizîrî, 2013: 38)*

Li gor Mela di navbera unsûrên alema maddeyê de jî eşq û îltifat heye ku av, agir, ax û hewa ne. Ew jî bi awayekî bê sukûn û bê qerar bi rengê aşiqane di nav dewr û deweranê de ne. Mela li van her çar hêmanên bingehîn hêmanekê jî lê zêde dike. De ka melûm e ku cara pêşîn fikra çar hêmanên esasî li Yûnana dêrîn derkete holê. Zanayarê bi navê Thales çavkaniya hebûnê di “av”ê de didît. Anaksimenes ev çavkanî di “hewa” yê de didît. Heraklitos jî îdia dikir ku eslê wucûdê “agir” e. Herî dawî Empedokles hêmana “ax”ê li van zêde kiriye û gotiye ku di navbera van her çar hêmanan de eşq heye. yanî hevra bûna van her çar hêmanan bi saya eşqê pêk tê (Doru, 2012: 219).

Mela jî fikreke wek vê nêrînê tîne ziman û têkûzî û tenasuba di eşya de û nîzam û întzama di alemê de dispêre têkiliya di navbera van her çar unsûran Lewma Mela vê mijarê awha rohnî dike û dbêje ku:

*Katib bi çerxê cetwelê xweş neqşek avête welê
Kir haşîye heft heykelê nêv kulliyatê xemse da*

*Çar ûnsûr in çar tebiyet in vêkra bi mîzan vêketin
Bi hev ra muxalif sifet in der sûretê şexsiyye da*

*Hetta bi mîzan çar esil bi hevra nebin cem û wesil
Cisman ji hev nabin fesil bazû ji bazû şeq neda*

*Çar ummehat in sê benat her bêqerar in bêtebat
Pur işq û meyl in îltîfat d' vê taze deyrê kunhe da*

*Hin suflewî bazî dîkin hin meylê efrazî dîkin
Xweş reqsek şehbazî dîkin sergeşte ne d' halê xwe da* (Cizîrî, 2013: 44)

Li gor nêrîna Mela çar unsûrên esasî li gor simetrî û sîstemekê tên ba hev û bingeh û binaxeya alema wucûdê pêk tînin. Mela digel pejirandina vê nêrîna han ku ji felsefeya Yûnana antîk derketiye û derbasî nav hîkmet û îrfana Îslamî jî bûye; rê û rêbazeke cuda dişopîne û eşqê wek hêmanekî pêncan yanî wek unsûrekî xamis pêşniyaz dike. Hin lêkolîneran gotine ku sebebê mêyldariya Mela ya bi bal nêrîneke bi vî rengî ew e ku şerh û beyanên

Empedokles û filozofên din ên di derheq demajoya çêbûna wudûda alemê de ji ber ku bêtî xaliq in, yanî li ser înkara Wacîd in. Lewma wî ev nêrîn kêş û kas dîtiye û xwestiye ku bi vî awayî wê tedîl û tekmîl bike. Her wiha di çarçoveya bawerî û nirxdaraziya xwe de jî vê yekê şîrove dike (Doskî, 2008: 1097).

Mela wek zanyar û edebiyatnasekî Musluman ev valahî dîtiye û digel çar unsûrên eslî alema wucûdê, eşqê jî ku unsûreke îlahî ye, wek ya pêncan destnîşan kiriye. Li gor Mela eşq digel ku çavkaniya hebûnê ye, di heman demê de eşq unsûrekî alema wucûdê ye. Ev nêrîn û nêzîktayiya ku Mela nîşan dide ji vê hêlê de jî grîng e ku ev yek nîşan dide ku eşq tiştêkî fitrî ye. Yanî eşq her wekî av û ax, ba û agir e. Her wiha di nav heyatê de ye û ji her alî ve bi heyata însan re têkildar û têkilhev e. Lewma Mela di vê derheqê de awha dibêje:

*Me cewher unsûrik xamis numa îro di tali' da
Di vê teqwîmê insanî li tali' bûne fal ebrû* (Cizîrî, 2013: 403)

Qesta Mela ya ji unsûrê pêncan a di vê beytê de eşq e. Ev yek, ji aliyê şarih û şîrovekerên dîwana Mela de jî “muttefequn eleyh” e. Yanî wan li ser vê tesbîta Mela de li hev kirine (Yöyler, 2006: 714). Bi qenaeta me ev fikr û nêzîktayî nêrîn û çareseriyeke nû tîne holê ji bo pirsgrêkên ontolojîk. Em dixwazin balê bîkşînin ser bersivdana Mela ya li problemeke felsefî di derheq afirandina însan de. Melûm e ku li gor Empedokles her çar unsûr him bingeha alemê ne him jî eslê xulqa însan in. Ev

nêrîn û fikir wek berdewamiya di nav felsefeya Îslamê de di Îxwanê Safa de jî heye (Doru, 2016: 111).

Îxwanê Safa di risaleyên xwe yên li ser cismên tebîî de fikr û nêrînên xwe yên di derheq xulq û mahiyeta bedena însan de di ronahiya nêrîna Empedokles de aniye ziman. Li gor vê nêrînê çawa ku bingeha hemû alemê ev her çar unsûr in, her wisa jî her tiştên di bin feleka hîvê de jî ji van çar unsûran pêk tên.

Her wiha di bedena însan de jî çar eza hene û ev her eza jî ji van çar unsûran pêk tên. Yek serî ye, ye duduyan sîng/ber e. Ewên din jî zik û ling in. Ev her çar eza di alema ontolojîk de her yek temsîla tiştêkî dike. Serî li muqabilî agir e. Lewra di serî çavên têkildarê bi rojê, yanî têkildarê bi ronahî û agir hene û hestiyarî jî ji serî derdikeve. Ezayê sing û ber jî têkildarî bi hewayê ye. Lewra navenda nefes û hewayê bi piranî li vê derê ye. Zik yanî mîdeya meriv bi piranî temsîla avê dike. Lewra hûr û rûviyên meriv têkildarî bi av û şilbûnê ne. Ling jî ji ber ku li ser axê digerin û eleqedarî bi axê ne. Ew jî temsîla unsûrê axê dikin. Lewra çawa ku sê unsûr (av, agir, hewa) li ser axê dsekinin, her wisa jî serî, sîng û zik jî li ser lingan disekin (Muhammed, 2008: 141).

Haya Mela ji gotin û nêrînên Îxwanê Safa hene. Lêbelê Mela şîroveya Safa kêr û naqis dibîne. Li gor Mela jî di heyata însan de ev her çar unsûr hene. Lê ger ev unsûr tenê di heyata însan de bîn hesabandin, ew çax însan hew wek hebûneke maddî û suflî tê nirxandin û melhezekirin. Hal ew hal e ku di nezer û nêrîna Mela de însan ne mewcûdekî suflî ye. Bileks li gor wî însan heqîqetê alî û payebilind e. Lewma ew di dîwana xwe de vê rastiya însan awha tîne ziman:

Cewherê alî ye unsûr me Mela

Bilheqîqet ne ji xwar ustuqûs in (Cizîrî, 2013: 98)

Tiştêkî girîng û balkêş e ku Mela wê nêrînê rexne dike, kêr û naqis dibîne ku xulqiyeta însan berjêrî çar unsûran dike. Nêrîna Mela ya wek parastina unsûrê alî û muteal a pêncan a bi navê eşqê, di esasê xwe de helwest û sekinînek e li hember zihniyeta maddeperest. Esas ne tiştêkî ecêb e ku Mela li çar unsûrên mewcûd ên di derheq bingehebûna wucûdê de, unsûrêkî nû zêde dike. Her wiha zanyar û filozofên din jî hene ku hebûnê ji xeynî van çar unsûran, bi têgehên razber, mucerred yên wek

“ezelîyet”, “ebediyet”, “bêhudûdî”yê ve şerh û îzah dikn. Lêbelê di fikr û nêrîna van filozofan yekî de jî Xweda tune (Doru, 2012: 220).

Li gor qenaeta me valahiya here mezin ya ku Mela di van fikr û nêrînana de dîtiye, tunebûna unsûrekî însanî ye. Yanî noqsaniyeta cewherê însanî. Ew yek jî eşq e. Xala duduyan a girîng jî ev e ku Mela gava eşqê wek unsûreke bingeîn ji bo binaxeya wucûdê pêşniyaz dike, wan her çar unsûrên din bêqîmet nake û wan piçûk nabîne. Xaleke girîng a sisêyan jî ev e ku Mela wek wan filozofan nake ku têgehên wek “ezelîyet”, “ebediyet”, “bêhudûdî”yê, digel wan her çar unsûrên din bikartînin. Lê Mela van têgehên wek “ezelîyet”, “ebediyet”, “bêhudûdî”yê ji bo eşqê diemlîne (Muhammed, 2008: 137).

Wihareng ji îşaret, îfade, beyan û gotinên ji van beytan derdikeve holê ku Mela çavkanî, sebeb û haveynê hebûnê, yanî mayeyê wucûdê, di eşqê de dibîne. Her wiha derdikeve holê ku Mela eşq û cemalê, bi gotineke din, evîn û ciwaniyê wek yek dibîne. Vê fikr û nêrîna xwe jî di gelek beytên helbestên xwe yên di dîwana xwe de bi reng û şêweyên cuda tîne ziman û vedibêje. Li ser meseleyê:

Husnê hub anî zuhûrê îşq e eslê alemê

Eslê eşya da bizanî wan çi esl û madde bû

Rohniya çehvên Mela yî Xaliq e husna te dayî

Hub tinê da min gedayî husn û hub yek çeşme ye (Cizîrî, 2013: 134)

Di fikr û nêrîna Mela de du cure eşq hene ku yeke wî eşqa ontolojîk e. Eşqa duduyan jî eşqa heyînî / egzistansiyal ye, yanî eşqa bi hestiyarî/hissiyata rastîn. Eşqa ontolojîk ew eşq e ku çavkaniya hebûnê ye û her wiha di her merhaleya hîyeraşîk a periyodîk a pêkhatina alema wucûdê de heye. Heçî eşqa heyînî ye, wek eşqa ruhanî û cîsmanî vediqete bi du qisman. Carna jî ev teqşîmat, yanî ciyawazîya eşqa heyînî wek eşqa heqîqî û eşqa mecazî tê bilêvkirin û binavkirin (Doru, 2012: 226).

Hasil meriv wek kurte û xulaseya mijarê dikare bibêje ku eşq wek unsûrekî bingeîn di serê qiseya afirandina gerdûnê de heye. Li gor Mela eşq wek hêmanê pêncan bingeîn û binyada mewcûdat pêk tîne. Her wisa jî cewherê manewî yê însanî jî teşkil dike. Di vê hêlê de nêrîna Mela ya di derbarê çavkaniya eşqê ya di rola membaya hebûnê de, noqsaniyeta nêrînên zanyarên maddeperest jî têkûz û temîr

dike. Meriv dikare bibêje ku ev nezer û nêzîktayiya şair ji bawerî û nirxên wî yên hizrî û manewî dizên û diçûrsin.

4.1.4. Cureyên Eşqê

Di fikr û nêrîna Mela de eşq him têgeheke ontolojîk e him jî heyînî ye. Nêrînên li eşqê yên Mela yên ku em heta niha li ser sekinîn, nêrînên wî yên eşqê ontolojîk bûn. Ev cure eşq, terîfeke wê ya kifşe tune, nakeve qalibê pênaseyekê. Her wiha ew eşq e ku wucûdê dike wucûd, hetta bi wucûdê re yek e. Eşqeke din a hestiyarî, hîssî jî heye ku xwedî hêlên heyatî ye û fonksiyoner e li dunyayê. Ev cure eşq wek eşqa heyînî, eşqa hîssî tê binavkirin. Xasma di heyata însan de ev cure eşq tunebe, ev elamet e ku heyat tune (Bayraktar, 1991: 24).

Di xebata bi navê *El- Cezerî Şair'ul-Hubbî We'l-Cemal /Melayê Cizîrî Sevgi ve Güzelliğin Şairi (Melayê Cizîrî Şairê Îşq û Ciwaniyê)* ya Xalid Cemil Muhammed de behsa cureyên ciwaniyê hatiye kirin. Lêbelê digel ku Mela bi teferuat behsa cureyên eşqê kiribe jî, nivîskarê vê kitêbê mijara “cureyên Eşqê” di bin yek sernavekî tenê de bi awayekî gelemperî qeyd kiriye (Muhemmed, 2008: 75).

Ev jî kêmasiyeke vê xebata navborî ye. Lewra Mela di helbestên xwe de gelek teferûatan dide di derheq rewş û cureyên eşqê de. Bi gelek aliyan ve vê sirra jiyanê û raza hebûnê tîne ziman. Lê me ev beşa “cureyên eşqê” di bin pênc sernavan de li gor nêrîn û nêzîktayiya Mela kategorîze kir. Li gor Cizîrî cureyên eşqê dikare awha bêne dabeşkirin:

4.1.4.1. Eşqa Heqîqî

Di hizra tesewufî de Îbnî Erebi eşqê wek *eşqa îlahî, eşqa ruhanî û eşqa tabîî* veqetandiye bi sê beşan. Li gor Erebi, eşqa îlahî ew e ku Xweda ji me hez bike û Em jî ji Wî hez bikin. Di vî cureyê eşqê de di navbera aşiq û meşûq de muhebbeteke kamil, yanî heziyeke bêkêmasî heye. Ev eşqa heqîqî yan jî eşqa îlahî ji hêla hin hûkema û arifan ve wek eşqa kullî, eşqa cîhanşimûl, eşqa bûnewer/ontolojîk jî hatiye binavkirin. Li gor nêrîna estetîk a serdema navîn a îrfanî, ew îştîyaq û şewq û evîna wan tiştên li alemê, li gerdûnê ha ûlwî ha suflî ji bo xaliqê xwe û meqsûdê heqîqî ye. Lewra hemû hereket û deweran, seyr û cewelana sema û feza û felek hemû eşq û evîneke ji bo muharîkê ewil û xaliq e (Purcevadî, 1998: 392).

Ev cure eşq li gor meyl û fitrata hemû eşya û muwafîqê îrade û îxtiyara însan e û her wisa di daîreya aqil û xwestekê de ye. Ew çax ew eşqa fitrî ya cuz û unsûrên alemê ya li hemberî Xaliq û evîna însan a bi zanetî ya ji mebûdî xwe re dikeve nav vê cureyê eşqê.

Mela vê eşqa di fitreta însan û hemû mexlûqat de derckirî awha tîne ziman:

Min di ber qal û belayê batin pê re bû evin

Hê li ser ehda elest im ta bi roja axirîn (Cizîrî, 2012: 204).

Ehlê tesewufê her çiqas bi gelemberî girêdayî tesnifa Îbnî Erebi bin jî bi pîranî di maneya eşqa heyînî/hissî de qala eşqa ruhanî û cîsmanî yan jî eşqa heqîqî û eşqa mecazî kirine. Wan her çiqas eşqa heqîqî wek bingeh û binyada fikr û nêrîna xwe derpêş kiribin jî red û înkara eşqa mecazî jî nekirine (Ayvazoğlu, 2001: 70).

Di doktrîn û ekolên ehlê tesewufê de eşqa mecazî jî wek tezahureke eşqa heqîqî hatiye dîtin û nirxandin. Li gor vê nêrîn û şîroveyê, eşqa mecazî wesîle, wasita û pire ye ku însan ji eşqa mecazî xilas dike, derbas dike, dibe digihîne eşqa heqîqî. Lewma hezkirin û aşiqbûna însan a li jiyanê, yanî evîna di jiyanê de, balkêşî û cazibeya jinê û mêr a dil û nezeran, watedar û hîkmetbar hatiye dîtinê. Li gor vê şîroveyê, Xweda herî ciwan, herî rind, herî xweşik di însan de û di însanê jin û mêr de tezahur kiriye.

Ew hedîsên Pêxember ku wek “Xweda însan li ser sûretê xwe yan li ser sûretê rehman afirandiye”, “Li dunyayê sê tişt bi min hatine hezkirin: jin, bêhna xweş û nimêj”. li gor vê yekê hatiye şerh û beyan kirin. Li gor Mewlana ew kesê ku bi çavê eşqê binêre, dizane ku her tiştê ku jê hez dike, hezkirna bi Xweda ye. Di nezera wî însanî de her tiştê mewcûd, perdedar e ji Wacîd û Wucûda heqîqî re. Gava însan jî vê dunyayê koç dike û diçe, digihêje Xweda, têdighêje ku ew hemû hezkiriyên wî yên li dunyayê, perde ne (Mewlana, 1974: 54).

Bedîuzeman Seîdê Nûrsî yê Kurdî di derheq vê mijarê de di kitêbeke xwe de dibêje ku “Ev alema şehadetê ya li ber çavan, wek perdeyeke bi tentene ye ku li ser alema heqîqî hatiye raxistin. Îzzet û ezamet dixwazin ku esbab perdedarê destê qudretê bin di nezera aqil de. Her wiha tewhîd û celal jî divêtin ku esbab destên xwe bikşînin ji tesîra heqîqî” (Nursî, 2019: 233). Nûrsî ku ji hêla fikr û nêrîna estetîk de

şopînerekî Melayê Cizîrî ye, alema li ber çavan wek berçevk û perdeyeke tûl dibîne û ev alema şhadete îşaretî wî aliyê camê û perdeyê dike (Cizîrî, 2013: 18).

Aşiqê heqîqî, wek tecelliya sîfat û îsm û cemala îlahî li eşqa beşerî mêze dike. Ev cure eşqê ku Îbnî Erebî behs jê dike, bela ku cinsiyet û şehwetê jî dihewîne, bi temkîn lê hatiye nihêrîn. Mewlana îşaretî bi bal tehlike û wartayên ev cure eşqê dike û dibêje ku ew ên ku ber bayê cinsiyet û şehweta wê eşqê dikevin, cewhera eşqê fêmanakin û bi eslê wê ténagihêjin. Li gor wî eşq esas tiştê rind e, qenc e. Lêbelê gava şehwet û ihtiras û arzû tevlê bibin, ew eşq êdî nabite eşq. Lewra ew rêya ku ji şehwetê diçe eşqê, pir dirêj e. (Doru, 2012: 228)

Di edebiyat û nêrîna tesewufî de dîyalektîka aşiq û maşûqê heye. Ew merheleya eşqa mecazî ku aşiq ji bo meşûq nîşan dide, divê tavlê bê derbas kirin. Lewra eşqeke bi vî rengî cîsmanîtiyê îfade dike û ji ber saîqên cîsî yên heywanî yên di însan de derdikeve holê. Aşiqê rastîn ne li dû eşqa cîsmanî ye, bileks li dû eşqa ruhanî ye. Qest û daxwaza wî her ev e. Eşqa cîsmanî eşqa miriyan e. Heçî eşqa Baqî ye, ew eşqa rûhanî ye ku ne perav û ne qerax heye jê re. Yanî bê sahl e, bê tixûb e. Ya din yanî eşqa cîsmanî ye. Ev cure eşq demî ye, muweqqet e, emanet e, bêdewam e, bêqerar e.

Mela eşqa îlahî wek eksa cemaleke safî dibîne. Her wiha eşq di encama xwestek û vîna cemala sermedi de îşwe dide. Lewma dibêje:

Husn û cemalê xwest evin vêkra di yek zatî cevîn

Nura qedîm bû îşq û vîn wan lêkî naz û îşwe da (Cizîrî, 2013: 26)

Yanî husn û cemal, kemal û heqîqet jixweberê tén hezkirin. Cemal ji aliyekî de kemalê jî îfade dike. Her wiha cemal a bi kemal heqîqeteke îlahî ye. Her xwedî cemal dixwaze ku cemala xwe bibîne û bi çavên ên dinan temaşe bike. Ev yek wesfê cemalê ne. Lewma ev cemala mutleq ji xwe de hezkirin û muhebbetê dixwaze. Lewma nûra qedîm a ji cemala mutleq bû eşq û vîn. Wihareng eşq û naz û îşwe pêk hat.

Eşqa armanc û meqsûd, evîna eslî û esas a di nêrîna estetîk a Melayê Cizîrî de eşqeke heqîqîye, îlahî ye. Herçend li gorî nêrîn û nêzîktayiya wî ya eşqê, eşqên dunyewî û mecazî jî rê li ber a heqîqî vedike û tenê dikare bibe pirek ji bo ya heqîqî

jî, dîsa gelek kêşe û hevrazên vê hene. Ji ber vê qasê cureyên eşqên din bes dikare bibe tezahurek ji bo veguhestina eşqa îlahî (Ertekin, 2017: 83).

Meriv dikare bibêje ku ji gotin û tesbîtên di dîwanê de derdikeve holê ku Mela girêdayî bi tesnîfa eşqê ya Îbnî Erebi ye. Di vê hêlê de şopa Erebi ajotiye. Li gor Melayê Cizîrî esas du cure eşq hene ku yeke wî eşqa ontolojîk e ku eşqa îlahî ye. Ya din jî eşqa heyînî û hissî ye ku carna wek eşqa mecazî û heqîqî carna jî wek eşqa cismanî û ruhanî tê binavkirin. Îşqa ontolojîk qedîm e, ezeli ye û zatê Xweda bi xwe ye. Her wiha di beriya her tiştî de heye û bingeş û binyada wucûdê ye. Zuhûra tecelliya zatê îlahî bi saya eşqê pêk hatiye. Eşqa îlahî hemû hebûn û gerdûn rapêçaye. Lewma Mela di vê derbarê de dibêje:

*Husn û muhebbet zatek in meşûq aşiq latek in
Lê sûret û mîratek in her yek di menayê xwe da*

*Ger dilber in wer aşiq in arif di vê da sadîq in
Ayîneyê nûra Heq in cih cih di wan de cilwe da* (Cizîrî, 2013: 27)

Yanî eşq jî cemal jî ji yek zatê muqeddes in. Ger cemal sûret be, eşq jî neynika wê ye ku tê de dixwuyê. Arif û aşiqên sadîk dilê xwe kirine neynika nûra cemala îlahî. Ew çax dile aşiq dibite ayîneya nûra Heq. Cilweya husn û cemala mutleq di wan de diîse.

4.1.4.2. Eşqa Sûrî

Di fikr û nêrîna Mela de piştî eşqa îlahî ya ontolojîk du cure eşqên din jî hene. Mela bi piranî van cure eşqan wek eşqa ruhanî û eşqa cismanî diwesifîne. Her wiha van her du eşqan di bin navê sûrî de tîne ziman. Her wiha hîssîbûna vê eşqê û têkildariya wê ya bi heyînê re îfade dike. Li gor Mela ev cure eşq ji bo fêmkirin û têgihîştina eşqa îlahî mîqyas û mîheng e. Lewma divê ku ev cure eşq wek dûrbîn û pire bê bikaranîn. Her wiha divê bi mifteya wê ve kilîd û qîfl û muemmaya vê razê bê vekirin û şerhkirin. Lewra ev cure eşq him qîfl û müşkîl û kilîd e him jî miftah û müşkîlkuşa ye. Lewma Mela dibêje ku:

Muhbeta sûrî du qism e qufl û mîftah û tilism e

Hin ji ruh in hin ji cism e nar û nûr e hin hewa ye (Cizîrî, 2013: 118)

Mela wesf û mahiyeta ev cure eşqê di gelek helbestên xwe de îfade dike. Her wisa bi gelek hêlan ve pênasêya wê dike û dide nîşandan. Lewma Mela vê yekê di vê beyta xwe ya li jêr de bi vî awayî tîne ziman:

Hubba cismanî du roj in ger çi dil pir pê disojin

Xef ceger peykan dinojin mislê neqşê bê beqa ye (Cizîrî, 2013: 120).

Li gor şair ev evîna sûrî, salik û aşiq, yanî rêwiyê rêya eşqa rasteqîn dide gerandinê û sewq dike. Ev evin ji ber ku çavkaniya wê hîs û bedena însan e, tehm û lezeta wê hindik e û êş û azara wê jî pir e. Lewma pir bi şewat e û wek tîr kezebê qul dike. Eger ev cure eşq nebe wesîleya evîneke baqî û ji wê sûretê nede derbaskirin, fanî ye, wek neqşê li ser bûz û cemedê zû dimahe, dihele û dibuhure.

4.1.4.2.1. Eşqa Ruhanî

Li gor Mela eşqa rûhanî ya ji cureyê eşqa sûrî, ji mest û sergerdaniya arif û aşiqan a li hemberî husn û cemala îlahî pêk tê. Mela her wiha di beytên helbestên xwe yên ciyawaz ên di dîwanê de behsa hin hêlên ev cure eşqê dike. Mela di vê beyta xwe de jî behsa cureyê eşqa ruhanî dike ku ev eşq beşek ji eşqa sûrî ye. Her wiha taybetî, tesîr û encama wê tîne ziman. Eşqa ruhanî ew e ku aşiq li hemberî maşûq îrade û îxtiyara xwe wunda dike. Hew emirber e ji tiştê ku jê tê xwestin re. Her wisa aşiq zatê xwe ji bîr dike. Di vî cure eşqî de aşiq û maşûq bûne yek. Lewma dibêje ku:

Her kesê muhbet ji ruh e muptelay nûra subbûh e

Wî di dil da sed curûh e cezbe û lerzîn û ta ye (Cizîrî, 2013: 121)

Di nêrîna ciwanînasî ya Mela de her kesê ku evîna wî ji can û giyan be, ew êdî mubtelayê ronahiya Xwedê ye ku di rûyên xweşik de cilweya wî pêk tê. Ew aşiq êdî ne bengiyê zahir û sûretan e. Bes ew sûret û zahir wî digihînin yarê rasteqîn. Ew kesê evîndar bi sedan birîn di dilê wî de hene. Her dem ji ber wê bandora eşqê ta

digre, dilerize û bi cezbe dibe. Ne hişyar dibe ne jî sebr û aramî jê re çêdibe. Heta ku xwe bigihîne mehbûba xwe ya heqîqî (Cizîrî, 2018: 553)

Gava ruhê bawermend yanî giyanê evîndar bibite hakimê bedena wî, dilê salikê rêya heq bibite desthilatdarê nefsa wî, aqil û hişê murîdê cemala îlahî bibite hukumranê mîdeya wî, eşqa ruhanî pêk tê. Yanî ew kes ji zahir û sûretê derbas dibe. Ew çax ev cure eşq aşîqê sadiq hildide bin bandora xwe û li pêşberî wê cemala îxtiyarselb û li hemberî wê ciwaniya îrade şiken dikeve rewşa beht û heyretê. Yanî derdikeve meqamê heyret û heşmetkariyê. Lewma eşqa ruhanî aşîq sermest û sergerdan dike.

4.1.4.2.2. Eşqa Cîsmanî

Cureyê duduyan yê eşqa sûrî ku piştî eşqa ruhanî tê, eşqa cîsmanî ye. Mela hin caran vê eşqê wek eşqa mecazî jî bi nav dike. Li gor wî ev eşq jî nimûneyeke eşqa îlahî ye. Yanî wek fonksiyon di encamê de aşîq digihîne eşqa îlahî. Lêbelê ne muheqqeq e, rêyeke bi kul û kovan e. Wartayên wê pir in. Yanî ne rêyeke eseh e. Hin arizayên vê rêyê hene. Lêbelê aşîq piştî têgihîşt ku ev hemû husn û cemal û ciwaniyên di alemê, cilweyên wê cemala heqîqî ne. Ev ciwaniyên li vê alemê ku sebebê perestîş û bengîbûnê ne, sih û çirûsk in ji wê roja rastîn a cemalê re. Her wiha gava derk û îdrak bike ku ev husnên zahir û ciwaniyên li alemê mecazî û sûret in, ne esl û heqîqet in. Ew çax aşîq bi rêya eşqa mecazê, digihêje meqsed û mirazê. Lewma Mela dibêje ku:

Ev hûr perîçehre bût û latê cemalê

Der sûretê tehqîqî Mela eynê mecaz in (Cizîrî, 2013: 375)

Di vê beytê de şair dibêje ku xwedan ciwanên li rû zemîn- çi îns çi sirûştî, çi jin çi mîr- ku wek senem, pût û lat tene hebandin û sedemê perestîşê ne, di rastiya xwe de mecaz bi xwe ne, ne heqîqet in. Lewra ew ciwanên dunyawî, ne xwedî û xaliqê wê ciwaniya xwe ne.

Ev cure eşq, eşqa sirûştî/ tabîî ye. Di ev cure eşqê de aşîq bes ji bo zatê maşûq jê hez dike. Armanc ji vê eşqê ew e ku her cure xwestek û daxwazên aşîq tetmîn be.

Ji ber ku ev cure eşq şehwetê jî îhtiwa dike, him di însanan de him jî di heywanat de heye. Li gor Îbnî Erebî piraniya însanan vî cureyê eşqê dijîn (Doru, 2012: 226).

Mela eşqa mecazî bo fêmkirina heqîqeta eşqê û têgihîştina eşqa ruhanî lazim dibîne. Lewma eşqa mecazî wek lefz û sûret bi nav dike. Wê wek wesîle, muqedîme, destpêk û pêplûk dibîne ji bo bi destxistina eşqa meqsûd, ji bo derketina diharê evîna rasteqîn. Gava însanê aşiq van wesileyan wek sûret bizanibe û ji sûretê bikaribe derbasî heqîqetê be, ew çax meqsed hasil dibe. Lê ku gava aşiq li sûretê asê be, yan jî wek sûretperest hereket bike û ji wê mecaz û mîrsadê derbas nebe, ew çax di wê neqeb û menfezê de dimîne, dixeniqe.

Piraniya aşiqên eşqa mecazî ku Mela wan wek “zoran” îfade dike, li wan zulf û çengalên eşqa mecazî asê dibin. nikarin eşqa rastîn bibînin. Gava aşiq bi vî rengî muptelayî eşqa mecazî be, êdî “durrê yetîm”, yanî pêxember, resûl, murşîd jî bêfeyde ye. Lewma li gor Mela eşqa mecazî bi warte û dav in. Tehlîkeyên wê pir in. Mela eşqa heqîqî jî wek maneya meqsûd tewsîf dike, di pişt sûret û lefzê de ye. Ew jî bes bi derbasbûn û xelasbûna ji kemîn û kersetên ji eşqa cîsmanî tê qezenckirin. Ji ber vê qasê ye ku Mela dibêje:

Lefz û îbaret came ye mehbûbê mena bi xwe ye

Lê xemlê husnek zêde ye lewra bi husnê zîbe da

Min ev mîsal lew bo te best zoran bi zulfan dil vebest

Herçî te dît sûretperest durrê yetîm bêfeyde ye

Wellah ji her du aleman min husnê canan e xered

Lew min ji husna dîlberan her sun'ê Rehman e xered (Cizîrî, 2013: 119).

Di nezer û nêrîna Mela de ji ber ku eşqa cîsmanî xapînok û demî ye, divê ku ev wetîre, ev demajo aşiq zêde bi xwe ve mijûl neke. Lewra meqseda heqîqî divê neyê jibîrkirin. Meqsed û menzîl jî gihîştina bi eşqa îlahî ye. Gava aşiq xayeya xeyalê xwe jibîr bike, cezb û cazîbeya ciwaniya cismî bala wî dikşîne ser xwe û bi xwe ve meşxûl dike. Lewra gava armanc û xay bê jibîrkirin, malayaniyat û hewesat însan radipêçe û muptelayî eşqa mecazî dike. Yanî mijûliya bi malayaniyatê, meqsedê dide jibîrkirin. Ew jî dibite mehrûmiyeta ji eşqa heqîqî û wesletê.

Hal ew hal e ku ew ciwanî û cemala sûrî ji bo ravekirina cemala mutleq e, çavkaniya wê cemaletê, ne ew cism in ku bûne mezher ji tecelliya cemala sermedî re. Armanc ji cemala sûrî û cismanî, nasîn û hezikirina Cemîlê Mutleq e. Lewra Xweda ev alema zahir bi tiştên ciwan û xirab, zişt û ar, bi xeml û xwar tije kirine. Ew kesê ku van îşaretan, mane û sûretan ji hev dernexe, muptelayî zahir û sûretê yarê be, nakeve dava eşqa heqîqî, nabite salik û rêwiyê rêya heq.

Lewma ji bo ku aşiq ji eşqa mecazî derbas bibe û bigihêje heqîqetê, divê çar û perdeya zahir a li ser ciwaniya mewcûdat û eşya rake. Divê aşiq di bin wê perdedeya ciwaniya zahir de nûra cemala layezal û destê qudreta îlahî bibîne, yanî yara baqî nas bike û bigihêje eşqa heqîqî. Lewma Mela di vê derbarê de dibeje ku:

*Pîs û xirab û zişt û ar ma ew bi xemlê têne kar
Ê di qeydê lebsê neyde yar hubbê bi xwe davê neda*

*Çarê hilîn yarî bibîn ne di perdeya tarî bibîn
Sed carî er karî bibîn gul wê di nêva buxçe da*

*Ew bû murada Girdîkar lew kir îrade û îxtiyar
Vî buxçeyê her lê buhar gul geş di baxê xunçe da (Cizîrî, 2013: 32)*

Li gor Mela eşqa cismanî wek eşqa bilbilê ya bi gulê ye. Ji ber ku bilbil qîma xwe bi gulekê tenê nayne, çavbirçîtî dike û her gula ku dibîne, dibite aşiq, ji ber wê jî êş û azarê dikşîne. Lewma Mela eşqa mecazî bi eşqa bilbilê ya bi gulê sembolîze kiriye. Lewra bilbil bi hewes û hesret muptelayî gula nû pişxivî û xunçe ye. Li ser gulê bengî ye. Lê gava guleke nû bişxivî dibîne, ji gula berê sar dibe û meylî gula nû dike. Lewra eşqa bilbilê li gor objeyê diguhere, demî ye û guherbar e; îstîkrar û qerar di eşqa wê de tune. Lewma Mela dibêje:

*Bilbil û perwane ew fêsl û dem in
Cinsê îşqa min tenê derd û kul e*

*Bilbilan sed gul di çahv in çav li sed gul dî dîkin
Min di baxê gulîzaran yek gul û gulnarî bes*

Gul heta sor in bi tê ve bîn tebessum pê ve pê ve
Bilbilê serxweş di nêv e nexme û nal û newa ye

Herçi cîlwe bû ji navê nû gulek dî girt xunavê
Wî ji dil çû muhbeta vê ew bi ya dî ra teba ye (Cizîrî, 2013: 120)

Li gor Mela eşqa ji ruh çareya eşqa mecazî ye. Her wiha eşqa ruhanî kîmîya û derman e ji nexweşiyên dil re. Yanî derketina ji kemîna eşqa mecazî, bi saya gihîştina ruh a bi eşqa heqîqî pêk tê. Ew jî eşqa ruhî ye. bi saya vî cureyê eşqê aşîq û maşûq digihêjin hev û dibin yek. Yanî di encama eşqa ruhî de aşîq di meşûqê xwe de fanî dibe. Aşîqê ruhî, nefs û cismê xwe jibîr dike, bi hissiyat û riza meşûqê xwe dijî. Lewma aşîq bi meşûq re mezc dibe û bêyî hev nabin. Lewma Mela vê mertebeya eşqê awha tîne ziman:

Her du ruh yek nûrê tav in çerxek û du stêr di nav in
Her du dane murxê dav in îsmê Hey dav lê vedaye

Her kesê muhbet ji ruh e muptelay nûra subbuh e
Wî di dilda sed curûh e lertzîn û cezbe û ta ye (Cizîrî, 2013: 120)

Di nêrîna Mela de ji bo derbasbûna ji mecazê û bidestxistina eşqa ruhanî divê ku ruh ji qeyd û bendên alema kesîf û kesretê bê rizgarkirin. Lewra alema maddeyê ulwiyeta însan digêrîne sufliyetê. Yanî qiymeta însan kêr dike, dixîne jêr. Ruhê însanî jengarî û qirêj dike. Lewma divê însan wan tiştên ku mani û asteng e di navbera wî û mehbûba wî ya heqîqî de bide alî. Xwe ji wan xil û xişan azade bike. Lewra ji bo eşqa rastîn qelbekî sadiq û dilekî safî divê. Lewma Mela di vê derheqê de dibêje ku:

Şemê ser nûr nadirî ger ew nekit perhîzê dil
Zewqê cama îşqê nakit ger nekit îmsakê ruh

Gewherê husnê eda تنها dibit meqbûlê teb'

Ger ne seyqal dit bi nûrê işqê wek hekkakê ruh (Cizîrî, 2013: 226)

Yanî eger aşiq û evîndar dilê xwe ji têkiliyên dunyewî nebire û xwe ji wan neparêze, mûm û meşela raz û siran şewq û şemal nade. Ew çax aşiq nagihêje zewq û lezzeta meya baqî. Şayet talib û salikê eşqa heqîqî bi mecazê ve mijûl bibe û ruhê xwe ji wê îbtîlayê rizgar neke, nagihêje gewhera husnê. Ew cewher bes bi seyqal û cilakirina ruh a ji jeng û qirêjahiya dunyewî bi dest dikeve.

Li gor Mela eşqa cîsmanî wek pêplûk, gêdûk û pirekê ye. Divê ev neqeb û berzex bê derbaskirin. Da ku aşiq bigihêje weslet û kemala xwe. Belê eşqa mecazî pêngaveke girîng e ji bo eşqa ruhanî, lê belê divê di vê navberê de zêde nemîne. Her wisa ev pire divê bê borîn. Ji bo vê yekê jî divê digel esasê dîn û ulûmê zahir, ilmê merîfeta îlahî jî bêne zanîn, rê û rêbaz bêne şopandin. Ev jî digel ilmê hal, ilmê hîkmet û heqîqetê divê bê dîtin. Lewra kesên ku vê merîfetê kesb neke, yanî bidest nexer, nagihê heqîqet û weslê. Lewma Mela dibêje ku:

Salik kî ye hatî ji mecazê bi heqîqet

Sûret neşunasî û bi mena ne fena girt (Cizîrî, 2013: 75)

Li gor Mela eşq cewhera wucûdê ye û hêza bandorker a hebûnê ye. Her wiha paxîşkereke ji bo ruhê însan a ji jeng û pasê. Ev yek bi saya derbasbûna ji mecazê û jiyîna eşqa ruhanî pêk tê û bi dest aşiq dikeve. Ew kesê ku ruhê wî ev yek tem kiribe, heta hetayî ruhê wî pak û paxîş dimîne. Lê yê ku ev eşqa ruhanî tem nekiribe, ruhê wî hey û hey bînefes û nepaxîş, nepak dimîne. Lewra bûye bengî, bende û zebûnê cismaniyat û mecazê. Bes aşiqên sadiq dikarin ji van qeyd û bendan xilas bibin, ji van wartayan rizgar bibin. Lêbelê aşiqên bi vî rengî heqîqî û sadiq kêr in. Her dem peyda nabin. Mela di vê derheqê de jî awha dibêje.

Aşiq'e sadiq di kêr in ma dibê sed can fidê min

Zanim ew najîte bê min aşiq û pur muptela ye

Camê işqê pakê ruhanî tuhûra batin e

Ê nenoşî her we ma hetta ebed napakî ruh (Cizîrî, 2013: 227)

Li gor Mela eşq ji bo tezkiyeya nefsê, ji bo seyr û sulûka rûhanî, mucahede û teraqqiya manewî û hişyarkirina qelb jî şert û pêdiviyeke bingeîn e. Ev wesfên ku me jimartin çawa ji bo ehlê tesewufê û kemalê girîng in û armanc û hedefên heyatî ne. Her wisa jî ji bo mumîn û muslumanekî serdema klasîk yê mutteqqî, arif û salih jî meqsed û menzîlên sereke ne. Di nêrîna Mela de ev cure helwest, tevger, emel û pratîk mumîn ber bi paqîjiya ruhî ve dibe. Şertê esasî û pêşîn ê vê yekê jî ev e ku divê meriv dilê xwe bi eşqa zatê ezel û ebed ve tijî bike. Lazime ku niyeteke xalis û hubbeke ji dil hebe. Wer ne, ew kar û emel, ew ked û emek vala diçe, bêfeyde dibe.

Di vir de balkêşiya tesbîta Mela ya di derheq eşqê de ev e ku eşq ne ku dibe sebebê paqîjiya ji qirêjiyê ya ruhê însan, bileks eşq paqijî bi xwe ye. Yanî eşq hal û rewşek e û her wiha pabûnek e (Muhemmed, 2008: 89).

Cezbe û seyra sulûkê bê mehebbet nabîtin

Cehdeya bê işqq û hub çendî ku kir bêfeyde bû

Salikên işqê yeka yek hewce nînin ez bêjim

Cameya pîrê terîqê ser ji nik şehzade bû (Cizîrî, 2013: 414)

Li gor Mela agirê eşqê aşiq dipijîne û ji qirêjiyan jê pa dike. Eşq paqijker e. Eşq hebûn e û dij û dijberê neman û edem û tunebûnê ye. Her wiha ziddê hudûsê ye jî. Lewra hudûs xirabî û jengarî ye. Hudûs di însan de xerabiyên cihêreng derdixe holê. Piştî wexta dilê însan reş dike û bi xirabiyên tijî dike. Hudûs xerabiya xwe bi rêya xemlên ciyawaz ve di dilê însan de bicih dike. Berterefkirin û xilasbûn însan û dilê însan a ji van reşî, xirabî, jeng û jengariyê, hew bi eşqê mumkun û bes bi ronahî û paxîjiya eşqê tê bidestxistin. Bes bi hêza eşqê ya temîrker, avakar û paxîşker ve ruh û dil vedigerin ser eslê xwe.

Kesên ku dil û ruhê xwe bi xirabî, nerindî, nebaşî, rêşaşî, guneh û guhnedayînan ve reş kiribe, divê xwe teslîmî eşqê bike, bi rêya eşqa heqîqî xwe pa bike û ji perde û astengên li ser dil, li pêşiya qelb û ruh xilas bibe (Doru, 2012: 232). Mela lewma di vê derbarê de awha dibêje:

Wê bi sed pencereyan daye şuaya qidemê

Gumbedê işqê li ser kursiyê dewwarê bqudûs

*Ateşê işqê wucûdê hel dikit şubhetê zêr
Heye mumkun nefîrit zîbeqê ferrarê hudûs*

*Reng û jengê hedesê neqşê hudûsê me ji dil
Bide ber rendeşê işqê ew e qessarê hudûs (Cizîrî, 2013: 78)*

Di nêrîna Mela de eşq îksîreke ku însan digihîne û dikemilîne. Her wiha ji bo dilên birîndar û nexweş kimîya ye. Yanî îksîrek e ku insan sax dike. Wihareng însan dibitîe bal bi ebedê û digihîne eşqa ebedê. Her wiha bi yê ebedî re dike yek. Însanê ku muhebbeta wî ji ruh be, dilê xwe bavêje yarekî baqî, hubba xwe girêde bi meşûqeke daîmî, ew çax dibite bengiyê nûra îlahî. Her wiha guh nade husn û ciwaniyên sûrî, bedewbûn û xweşikayiyên demî, delalên derbasok bala wî nakşînin û wî aşîqî têr û tetmîn nakin. Dizane ku hubba cismî xapînok e, xarînok e, xefletnak û xefletalûd e.

*Nûr e pur nadîr wucûd e gerçî ewwel nar û dûd e
Berqê lami' dê li kû de hub di qelban kîmiya ye*

*Muhbeta mehbûb û latan pur vekir zîwersifatan
Daye qelb û ruh û zatan roj di mîratê xuya ye (Cizîrî, 2013: 119).*

Hasil, li gor Mela ew aşîqê ku ji mecaz û cîsmaniyatê derbas bibe û vê merheleyê wek wesîle, neynik û neqeb bikarbîne, digihêje ava heyatê, wesleta heqîqetê. Her wekî ku Xizir bi destê wî bigre, bibe bigihîne kaniya mirazan. Ew merîfeta ku aşîq li wir kesba wê dike, bi sed cild kitêb bidest nakeve. Ew îlmê heqîqetê yê ku qezenc dike, nabe nesîbê her kesî. Lewra ew îlm, îlmê wehbî ye, ne kesbî ye. Îlmê ledunnî ye, îlmê behra ubabê ye ku ji îlmê eşqa îlahî re tê gotin.

Kesê ku ji teref Xweda de mezherê vê lutfa îlmê eşqê bibe, bi kunha alemê û mewcudatê digihêje. Êdî ew kes dibite wek serraf û eşqa mecazî û heqîqî ji hev derdixe. Çi serab e, çi ubab e; çi cewher e, çi hîcab e, hemû haletan ji hevdu temyîz û tefrîq dike. Lewma Mela dibêje ku:

*Eynê kafûrî ye meşreb me ji husna te ya saf
Lê ji işqa te dil da me vebû ilmê ubab*

*Me ji serçeşmeyê heywan qedehek safî vexwar
Nagihê lezzet û zewqa me bi sed cildê kitab*

*Seherê Xizrê îneyet em birîn çeşmeyê dil
Bi cîhanê me nezer da ku cîhan eynî serab* (Cizîrî, 2013: 228).

Yanî serkaniya ava salikê rêya heq û aşiqê heqîqetê, ciwaniya îlahî ye ku ew kâfur bi xwe ye. Lewma ji feyz û bereketa vê kaniyê her wekî genca “ilmê ubab” ku kitêbeke navdar e, li salik hatiye vekirin. Her wiha zewq û lezzeta ku ji vê serçeşmeya eşqê tê girtin, sed cild kitêb nade. Lewra ev îksîra ku wek bi destê Xoçeyê Xizir hatiye dayîn, eşqa cîsmaniya mecazî diqulibîne eşqa heqîqî. Birînên eşqa mecazî derman dike, wek ava heyatê dibite îlac jê re.

4.1.5. Rewşên Eşqê Li Gor Mela

Di fikr û nêrîna estetîk a Melayê Cizîrî de tişta girîng û nuqtaya nîrengî ew e ku çavkaniya eşq û ciwanîyê yek e. Her wiha tişta girîng ew e ku meriv eşqên cismanî tehm bike û wan nas bike. Wihareng demîbûn û derbasîbûna wan, arizî û arizeya wan firq bike û têbighê. Lewra eşqa li cih bê serfkirin, ew eşqa ji bo husna zatî ye. Yanî ger husn zatî be, layiqî eşqê ye. Eger husn cismanî û şehewî be, ne layiqî eşqe ye û ew eşq dibe mecazî, ew çax ew îesq jî cismanî ye. Lewma Mela dibêje ku:

*Zêr û zîwer dikirin celbê qulûban haşa
Husn û sur zatî nebit qametê meyyadî çî kit* (Cizîrî, 2013: 242)

Li gor Mela însan divê bi vê pratîk û tecrubeya eşqa mecazî û ruhanî, xwe bigihîne çavkaniya eşqê, bigihêje wesletê. Wihareng bi husna zatî re bibite yek. Lêbelê aşiqê di vê rêyê de rastî gelek menzîl, rewş, warte, badîre û bageran tê. Merhele û haletên rêya eşqa mecazî ciyawaz in. Her wiha rewş û rênimayên rêya eşqa ruhanî muxtelîf in.

Di fikr û nêrîna Mela de eşqa sûrî xwedî du rewşên cuda ne. Yanî eşq û muhbeta sûrî li gor îcaba sirûşt û tebîeta xwe, geh xweşî, şadî û kamranî bi xwe re tîne. Geh derd, bela, sotin û hîcranê derdixe holê. Eşqa cîsmanî û dunyewî her çiqas bi piranî kêf û şahîyê dide meriv û carna dibe sebeb ku umir pê xweş dibore. Lê ev rewş demî ye, muweqet e. Gava mehbûba cîsmanî û dunyewî diçe, winda dibe, dimire, ew hestên kêf û şahîyê jî berze dibin, namînin. Di vê muhebbeta dunyewî de jî carna êş û azar, kul û keser, firqet û hirqet hene. Lê ev rewş jî demî ne. Êş û azar esas di eşqa ruhanî de heye, ne di ya cîsmanî de lewma Mela dibêje ku:

Muhbetê mihnet di zor in hub dibê m bê şek bela ye

Umir jî pê xweş diborin sotin û derd û cefa te (Cizîrî, 2013: 116)

Li gor Mela mihnet, bela, derd û sotin malê eşqa ruhanî ne. Lê ew hêla muhbetê ku umir pê xweş diborin, têkildarê bi eşqa cîsmanî ye. Îşqa ruhanî li gor îcab û îktizaya tebîeta xwe, li ser terka zewq û lezzeta dunyewî, mehrûmiyeta ji rahet û seadeta şexsî, dûrketina ji hebûn û dewlemendiyê, îstixnaya ji têrbûn û kenê, ji nexwestina sefa û wesletê derdikeve holê û dimeşe. Divê di fikr û nêrîn û niyeta aşîqê ruhanî de ev îstîxna, ev diltêrî, ev çavtêrî hebe (Bayraktar, 2001: 40).

Meriv gava bala xwe dide helbestên di dîwana Mela de gelek nimûneyên van rewş û halên eşqê dibîne. Êş û izdiraba eşqê, mehrumiyet û mihnetên muhbetê, qehr û azara reqîbî, cewr û cefaya hebîbî, hîcran û hîrket û hwd. hemû cureyên derd û kulên eşqê hene di riste û beytên Mela de. Meriv dikare haletên eşqê û rastî û rewşên evîne yên ku Mela di helbestên xwe de anîne ziman, di bin van sernavan de binirxîne:

4.1.5.1. Firqet û Mirin

Li gor Mela rewşeke eşqê ku wek sebebê pijandin û gihandina aşîq e, firqet û mirin e. Rewşa firqetê ya eşqê him di eşqa cîsmanî de him jî di eşqa ruhanî de tê xuyanê. Firqeta di eşqa cîsmanî de demî ye û bi zewala objeya eşqê ji holê radibe. Wihareng firqetek e yetîmane ye. Lewra gava objeya eşqê ji holê rabû êdî îmkân û îhtimala wesletê namîne. Aşîq êtîm û bêxwedî dimîne (Nursî, 2010: 506).

Di firqeta eşqa ruhanî de bendemayîna wesletê heye. Lewra meşûq ne zaîl e û daîmî ye. Aşîq çiqas jî di nav êş û azarê de be jî ne bêhêvî ye. Lewma êş û azara ji

firqeta eşqa ruhanî hêviyekê di xwe de vedişêre. Ew êş û azar esas tehm û lezzetê bi xwe re tîne. Lewma aşiq yan şair her çiqas bi gilî gazin be jî ji vê agirê vê firqetê, esas ew ji aliyekî de jî memnûn e ji vî halê xwe.

Firqeta eşqa cîsmanî ji ber fiqdê ehabab e. Yanî ji ber tunebûna ehabab têt. Lerwra mehbûba wî dê di dawî de zaaîl bibe, bimore. Lêbelê huzna ji firqeta eşqa ruhanî, ne ji fiqdanê ehabab, bileks ji firqeta ehabab têt. Yanî mehbûb heye lê dûr e. Lewma êş û azar dikşîne. Hemû gilî û gazinên aşiq, şewat û şikayetên evîndar, ji dûredestiya ji yarê ye. Emma di dawî de lîqa heye. Lewma aşiqê eşqa ruhanî di nav huzneke ûlwî de ye û huzna wî ne yetîmane ye. Li gor Mela derman û mifaya firqetê, weslet e, ulfet e, lîqa ye. ew çax rûh û rahet, kêf û seadet derdkeve holê. Aşiq her dem çahvenêrê liqayê ye, guhdêrê mizgîniyekê ye. Li benda xebereke xêrê ye. Lewma Mela di vê derbarê de awha dibêje:

*Sotin û derdê evînê îlletê dax û birînê
Xweş dibit ma ew bi dînê şerbeta lêvan mufa ye*

*Îşqê derdek bê tebîb e lê mufa wesla hebîb e
Kuştîme cewra reqîb e pur leînê rû sîya ye*

*Dûredest im bênesîb im dilber im xanim hebîb im
Pir ji dîna te xerîb im rûh û rahet min lîqa ye*

*Pur mulazim tîm lîqayê mame hetta multeqayê
Min ruhê şîrîn didayê hudhud er mizgîn bidaye (Cizîrî, 2013: 117)*

Mela di helbesteke xwe ya din de ku beytên wê raste rast bi redîfa “feryad ji derdê firqetê” diqede, rewş û haletên firqetê bi awayekî eyan û beyan aniye ziman. Ev helbesta bi 22 beytan pêk tê wek kurte û xulaseya nêrîna Mela ya li haletên firqetê ye. Di van beytan de Mela bandora firqetê ya li ser aşiq bi îfadeyên balkêş û bi derb, bi ciwankariyên bala û berz, xasma bi wan ciwankarî û hunerên teşbîh û îstiareyên tam, tabloyên xayet zindî û estefîk xêz dike.

Melayê Cizîrî her wiha firqet bi gelek hêlan ve rave kiriye û bi zimanekî alegorîk û di nav dirûv û şeweyên cihê de raxistiye ber çavan. Şewata firqetê,

kewandina firqetê, dax û keybên firqetê, dirêj ajotina saetên firqetê bi qasî salan, çavnêriya di firqetê de ya ji bo weslê û hwd. hemû wek rewşên firqetê cih digrin di riste û beytên Mela de xwe didin der. Wek mînak:

*Vê firqetê ebter kirîn feryad ji destê firqetê
Jar û zeîf û zer kirîn feryad ji destê firqetê*

*Pur zer kirîn wek zêri mam çehvên di lutfê pîri mam
Daîm li rê çavnêrî me feryad ji destê firqetê*

*Çavnêrê reftara te bûm muştqaqê gulzara te bûm
Lew dûr ji dîdara te bûm feryad ji destê firqetê*

*Dûr bûm ji wê reft û çûnê wan îşweyan guft û kenê
Nayên bi çahvan min dinê feryad ji destê firqetê*

*Saet li min têk salî bûn daîm li ser dest falî bûn
Herfên dihatin dalî bûn feryad ji destê firqetê*

*Vê firqetê pur dil şewand cerhên qedîm dîsa kewand
Şîşên di sor tê da tewand feryad ji destê firqetê (Cizîrî, 2013: 152)*

Li gor Mela tîreke ji tîra firqetê bi jantir tune. Ne mumkun e ku bêxem û bêelemên ku derdê firqetê neditîne, êşa firqetê fêm bikin. Di nêrîna Mela de derman û mifaya firqetê weslet e. Tiştê ku aşîq bigihîne vî meqsed û mirazî jî di serê serî de sebr û tebat e. Her çiqas aşîq û arif bêtehemmul e, bê aram û bê tebat e jî. Emma we lakîn xeynî sebr û sikûnê, xêncî xamûş û sotina bêdend tu çare nîne. Lewma Mela ji bo şerh û beyana vî haletê eşqê awha dibêje:

*Bi narê fireqtê sohtim ji ferqê ta heta pê da
Xedenga xefletê nohtim ji berqa lamia tê da*

Xedenga firqetê re'd e dilê ew xefletê lê dit
Dibêjim wer cebel bit ew bi ker bit wê di gavê da

Heçî nedî hîcran nebê min dax û key lê ne
Ji bil derbê di hîcranê fîraqa ruh û can kê da (Cizîrî, 2013: 53)

Li gor Mela derd û derba firqetê çiya hildiweşîne. Her wekî tîr û xedeng dil qul dike. Serî heta lîngan yanî serdan pê aşîq dişewitîne û di nav agir û alavê hîcranê de dihêle. Kesê ku derdê hîcranê nedîtibe bila nebêje kul û birînên min hene. Lewra firqet sedemê, newxaşî, jarî û bêyomiyê ye. Kesê ku muhtelayî eşqê be dikeve nav agirê firqetê. Ew kes bi sebeb êşa firqetê jî tim bêxew e, çavên wî tim şêlû dibîne.

Firqet jî mirinê zor û zehmettir e. Kesê ku bimirie, di car kî de dimire, xelas dibe, diçe. Lê aşîqê di firqetê de her car dimire. Digel vê yekê aşîq jî vî halê xwe memnûn e. Lewra hêviya wî ya ji weslê heye. Li gor Mela jî weslet rihetîya can e, heyata dil e. Her wiha dermanê hemû derd û kulên firqetê ye. Mela vê yekê awha tîne ziman:

Derdê xeddar bêm firqet e firqet ji can pur zehmet e
Ya sehl ku aşîq rih dide feryad ji destê firqetê

Wesla te li can û dil heyat e
Men zaqe merareten newa tah (Cizîrî, 2013: 270)

Li gor Mela di eşqê de windakirin, têkçûn tune. Ha wuslet ha firqet, her du jî sebebê îftixarê ne. Lewra eşq bi xwe wek qutbekî ziddê tunebûn û ademê, însan digerrîne bi ebediyetê. Yanî mahîyeta însan a fanî û maddî, diqulîbibe bal bi beqayê, ruyê însan û rêwîtiya wî diguherîne ber bi lîqayê. Ew kesê ku eşqê, ha bi weslet ha bi firqet, tem neke, mirî ye. Yanî kesê mirî, bêçare û di mehwê de ew însan e ku eşq tem nekiriye. Aşîq be jî eşqa ruhanî û îlahî tem nekiriye. Aşîqê bêçare, bênesîb aşîqê eşqa cismanî û mecazî ye (Doru, 2012: 236). Mela lewma awha dibêje ku:

Ê birî eynê beqayê badenoşê îşqê bû
Ê buyî mehwê fenayê aşîqê bêçare bû (Cizîrî, 2013: 416)

Yanî aşiqê ku bi keser û kovanên firqetê bêçare û şerpeze ye, bes ew digihêje beqayê. Aşiq û evîndarê ku çûye eynê beqayê û her wiha gihîştiye meqamê beqayê her ew e. Lewra ew aşiqê ku bi derdê hîcranê birîndar û daxidar e, êş û azara mehw û fenayê dîtiye, her ew liqayê dibîne, wesletê tehm dike. Wihareng ev rewş û hâletê eşqê yê firqetê salik û evîndarê sadiq û badenoş dibite serçeşmeya beqa û lîqayê.

4.1.5.2. Hudûs

Di fikr û nêrîna Mela de hudûs kesreta mewcûdat e û nezera însan ji wehdetê dûr dixe. Yanî hudûs teferruat û hûrgiliyên hebûna herikbar û demî temsîl dike. Lewma însan mijûlî bi xwe dike, yanî bi xwe ve meşxûl dike. Nezer û dîqqeta însan belav dike û bi menfîet û husna xwe ya sûrî û arizî re meşxûl dike. Wihareng bala însan kaşî ser xwe dike û aşiq ji muleheze û heziya ji tewhîdê mehrûm dike. Ji ber vê qasê hudûs mumkun e ku wek kemîn û defîk însan ji rêya eşqa heqîqî derxe û lingan bişiqitîne. Bi vî awayî hudûs dibite xar, stirî û kelem li ser rêya aşiq û êş û azarê dide wî. Dibite mix û bizmar û wî di nav îşkenc û ezabê de dihêlin. Hudûs dibite wek xençer û birek û qesta kuştina aşiq dike.

Ji bo xilasbûn û rizgarbûna ji vê dava hudûsê, nezereke kullî, hîmmeteke alî û înayeteke îlahî lazim e. Wihareng ruh û hiş û dilê însan ji bela û muhtelaya kesretê pa dibe û di pişt perdeya kesretê de nûra wehdetê tecellî dike. Lewma Mela ji bo haletê hudûsê awha dibêje:

Tu sehergeh bi temaşa were bazarê hudûs

Lê te bêfaîde azarî nedit xarê hudûs

Sed girih min di dil in lew ku çep û rastî dikir

Şahê husnê qidemê girihdarê hudûs

Bil ji sultanê qidem min bi tu îqrari nehin

Ger li kaba me nihîn metqeb û bizmarê hudûs

Dil di deryayê qidem Qaf e bi sabit qedemî

Gerçi daîm li serê ferq e me minşarê hudûs (Cizîrî, 2013: 78)

Yanî tu wextê ciwaniyê were bazara alemê temaşe bike. Lê xafil nebe bila ew ciwaniya sûrî te nexapîne. Lê hay ji xwe hebe da kelem û strî û dirikên dunyayê te bêfeyde neêşînin û êş û azarê nedin te. Gava şahê ciwaniya qedîm û ezelî bi sedan zulfên hebûnê yên wek çengal anî pêşberî min, ev daf û kemîn bû sebebê şewişîna min.

Eger bi mix û bizmarên kesretê aşîqê sadiq bê îşkencekirin jî dilê wî di behra qedîmiya Xweda de wek Çiyayê Qaf xurt û muhkem e, naheje û nalerize. Teşqeleyên kesret û fenaya alemê hemû li serserê aşîq kom bin jî guh nadê û ne xem e ji wî re. Lewra ew her di nav kesretê de wehdetê dibine. Yanî kesret û hudûs, hedîse û hewadîs, teferûat û hurgilîyên alemê wî aşîqê sadiq nikarin ji rê derxin û muptelayê madde û fenayê bikin.

4.1.5.3. Mest û Serxoşî

Serxwoşî wek cureyekî halê eşqê di dîwana Melayê Cizîrî de cihekî girîng digre. Ev rewş û rastî beşeke esasî ya tesewira wî ya estetîk e. Mela bîyî ku derkeve dervayî maneya tesewwufî, edebî û îrfanî ya têgeh û mezmûna “serxoşî”yê, wê wek term û mefhûmekê bi mane û sembolan honandiye.

Li gor Mela serxoşî haletekî eşqa îlahî ya wisan e ku xwedî wesfên wek ezeliyet, ebedyet, beqa, qidem, sermediyetê ye. Her wiha hêleke wê ya din jî heye ku têkildarî bi tecellîyên nîşaneyên cemal û ciwaniya îlahî ye. Lewma ev halê eşqê yê ku di lîteratûra sofîgeriyê de wek serxoşî tê îfadekirin, xwedî qîmet û hêjayiyê ye. Aşîqê sadiq ji ber ciwaniya mehbûba xwe bi haletê sekr û sergerdaniyê de tê eşq û cezbeyê. Ev rewş elametê rizgarbûna aşîq a ji qeyd û bendên eql û îrade û cismaniyetê ye. Lewma Mela vê rewşa mest û sekraniya eşqê awha tîne ziman:

Mehbûbî wek ster e govend û îşqebazî

Tekil biçîn semayê hişyar û mest û serxweş (Cizîrî, 2013: 318)

Li gor Cizîrî rêya weslet û lîqaya vê ciwaniyê, girêdayî bi cehda ruhî, terbiyeya giyanî, amadekariya qelbî, bi têkoşîna li hemberî nefs û hewayê ye. Lewra pranga û qeyd û bendên bedenê, ruh di bin esaretê de mehbûs dîkin. Wihreng ruh bînefes dimîne. Di fikr û nêrîna sofîgeriyê de têgeha “serxoşî”yê, haletekî jixweçûn û xeriqînê ye ku bes di ehlê wecdê de tê xuyanê û di encama cereyaneke qewî

derdikeve holê. Ebdê aşiq gava keşfa sifâtê cemalê dike, serxoş dibe, ruhê wî diperpîte, qelbê wî dîwane dibe.

Mela jî wek ehlê îrfanê serxoşiyê bi maneya hiş jê çûnê, wek bêhiş mayînê bikartîne. Haletên wek beht û heyret, mest û sergerdaniya hest û hestiyariyan, fêkî û encamên bade û şeraba eşq û evînê ne. Bi haletê coşîna bi vê şeraba eşqê, bilindbûna bi bal meqamên ûlwî û ketina rewşên alî pêk tê. Cizîrî vê rewşa aşiq di sembola wê dilopê de nîşan dide ku diçe digihêje behrê û ava wê re dibe yek. Wihareng aşiq ji destê dilbera xwe, badeyê dinoşe û ji xwe diçe. Dikeve haletê sekr û sergeşteyê, mest û heyraniyê (Muhammed, 2008: 209). Lewma di vê derbarê de Mela dibêje ku:

Bade mî noşî ji dest çûme ji xwe mame mest

Qitre bi behrê giha behri bi eynê xwe ma (Cizîrî, 2013: 216)

Yanî aşiq ji destê yarê mey vexwar û ji ser hişê xwe çû, xwe winda kir. Her wiha bêhiş ket. Ew îksîra eşqê aşiq ji zindana cismanî û hewcedariyên wî yên maddî difilitîne. Dile wî yê ku madena eşqa heqîqî ye, cihê tecella cemala zat e, bi ciwaniya mutleq ve girê dide û dike yek. Wihareng dilop digihêje deryayê û bi deryayê re dibite yeksan. Li gor şair ev yek di encama rewşa serxoşî û sekranê de derdikeve holê.

Meriv dikare gelek halet û rewşên eşqê yên din jî di helbestên Cizîrî de peyda bike. Li ser meseleyê: esaret, fena, cefa, derd, kovan, agirê eşqê/sotin û hwd. Lewra Mela gelek rewşên eşqê di gelek helbestên xwe de aniye ziman (Ertekin, 2017: 77).

Mela di hin cihan de jî bes amaje bi wan kiriye û bi awayekî sergirtî tenê bi peyv yan telmîhekê ve bi îşaret û bibîrxistinan ve hewaleyî zihn û xeyalê xwendevanan kiriye. Lewma hildana hemû haletan a di bin tixûb û hedên muayen dijwar e. Lêbelê me xwest ku bi van rewşên eşqê yên mehdûd ve îşaretî gelek rewşên din yên mayî bikîn.

4.1.6. Têkiliya Eşq û Estetîkê

Di nêrfîna estetîk a Melayê Cizîrî de evin û ciwanî, yanî husn û hub ji zatê muqeddes in. Ji ber ku zatê îlahî hebûna wî bi xwe ye û hewce bi îlletekî nake, eşqa ji bo zat jî, ji zat cuda nîne. Lewma têgihîştin û nasîna eşqê girêdayî bi têgihîştin û nasîna husn û cemale ye. Rastî û mahiyeta eşq û evînê jî îcab dike ku rastiya

ciwaniyê bê zanîn. Lewra ciwanî, esl û esasê eşqê û sirûşt û serçeşmeya evînê nîşan dide (Muhammed, 2008: 97). Lewma şair di vê derheqê de awha dibêje:

Maneya işqê dizanî ayeta husnê bixûn

Da tu herfên muhebbetê yek yek ji hev kî îmtiyaz (Cizîrî, 2013: 302)

Mela di vê beyta xwe de têkiliya xurt a di navbera eşq û cemalê de li ber çavan radixe. Lewra li gor wî eşq ji cemalê ye û hemû alem jî ji eşqê ye. Yanî eşq wek dendika kaînatê di bingeh û eslê alemê de cih digre. Lewma zanîn û fêmkirina bi berfirehî ya eşqê, girêdayî bi zanîn û nasîna esl û esasê ciwaniyê ye.

Zatê muqeddes husn û cemalê wek tecelliyê nûra ezel, mûm û meşela eşqê vexistiye. Husn û eşq her du jî ji zatê îlahî ne. Çavkaniya husn û cemalê û eşq û evînê yek in. Lewma her du bêtî hev nabin. Her wek fêkiyên ji darekî, wek du kaniyên ji menbayekî, wek du çemên ji behrekê xwedî heman serçeşme û heman medarê ne. Şair gava qiseya cemalê û dasitana eşqê tîne ziman di qesîdeya xwe ya navdar û dirêj a bi sernava “Allah sehergeha ezel” de, di serê serî de bi heqîqeta hevrabûn û yekbûna cemal û eşqê destpê dike. Lewma Mela dibêje:

Allah sehergeha ezel yelmûmê işqê şû'le da

Nûra cemala lemyezel zatê tecellaya xwe da (Cizîrî, 2013: 16).

Li gor Îbnî Erebi jî eşq wek qiymet û nirxekî zatî ye. Her wiha sebeb û bingeha hemû eşq û evînan husn e, ciwanî ye. Eşq ji bo objeya bi husn û cemal derdikeve holê. Lê ew eşq ne ji bo wê objeyê bi xwe ye. Ew çax derdikeve holê ku eşq girêdayî bi husn û cemalê ye. Eşq û hezkirin a ji bo ciwaniyê, bêtî e û ji xwe berê pêk tê (Afifi, 2007: 152). Yanî bi awayekî bêtî menfîet û qerabet, bêtî sebeb û îllet ciwan û ciwanî tê hezkirin. Eşq û muhebbet, wek fîret û tebîta ciwan û ciwaniyê her bi pê re ye. Lewma Mela dibêje ku:

Husn û hub zatê qedîm in lê cuda bûne ji yek

Lê niha îsmê hudûse hîkmet û tefsîl we bû

*Yek di zatê sur şîrînan bû cemal û husn û sur
Yek di qelbê ehlê dil nar û celal û cezbe bû*

*Aşiq û meşûqi elheq her du mîratê yek in
Lew di eslê cem'e da eslê qedîm ayîne bû (Cizîrî, 2013: 158).*

Di nêrîna estetîk a Melayê Cizîrî de husna ezel û eşq hevalbendên hev ên ezeli ne. Ew her du ji zatekî ne û ji kaniyekê dizen û dîsin. Lêbelê li gor hîkmeta îlahî li alema hudûs û kesretê, yanî li hebûna maddî û mulk zahiren ji hev cuda bûne, tefsîlatek ketiye navbera wan. Lê ev cudabûneke arizî ye, tefsîleke nisbî ye, ne heqîqî ye. Di heqîqeta hal de, di alema melekûtê de husn û hub, yanî ciwanî û evin zatê qedîm in û ji yek zatî ne. Her wekî ku Mela dibêje:

*Husn û muhebbet zatek in meşûq û aşiq latek in
Lê sûret û mîratek in her yek di menayê xwe da (Cizîrî, 2013: 28)*

Yanî ciwanî û evin ji zatê muqeddes in. Ew çax aşiq û maşûq jî ew zat bi xwe ye. Lewra ew mûm meşela ji eşqê hatiye vêxistin dîsa ji wê cemala ezeli şûle daye. Esas ew husna ezel ji ber ku bizzat tê hezkirin û her hêjayî hezî û hubbê ye, eşq û aşiqbûna ji bo wê jî, îcab û îqtizaya wê cemalê ye. Yanî eşq û aşiqbûn lazim û şertê wê husna ezel e. Ew husn bê aşiq, ew cemal bê evîndar nabe. Lewma Mela vê yekê awha bi awayekî wecîz û îcazkarane beyan dike:

*Meşşateyê husna ezel çengalê zulfan tabi da
Da işqi hilbitin pêl bi pêl qelbê me pê cellabi da*

*Husna hebîb û lutfê yar avête dil işqa xedar
Lew selbi kir jê îxtiyar wê husnê ev îcabi da (Cizîrî, 2013: 212)*

Li gor hizra estetîk a şair, xemilker û ciwankerê husn û cemala ezeli serê zulfan rewşen û rewneq kir û ew fitiland û wek çengalan nîvxeleqî kir. Ew wisa kir da ku dem bi dem evin ji wê peyda bibe. Yan jî da ku ji ber wê fitilîna zulf û xiştan

eşq pêl bide û dilê Mela yan jî dilê me ber bi xwe ve bikişîne. Her wiha wî dile evîndar bixe nav derd û belayan û bike evd û bende ji xwe re (Cizîrî, 2018: 55)

Di nêrîna Mela de xwedî û kaniya eşqê, husn û cemala ezeli ye. Yanî ya ku eşqa xedar davêje dil û eşqê peyda dike, husna hebîb e. Ew husn û ciwanî ewqas bala û balkêş e ku îrade û îxtiyara aşiq jê dibe. Ew cemal meriv bêhemdî dike bengî û mubtelayê xwe. Jixwe ev yek, ev rewş, ev encam wesf û îcaba ciwaniyê ye. Hîkmet û armanc ji vê yekê ev e ku da cezb û cazîbeya ciwaniyê aşiq wek perwaneyê, wek perperokê bikişîne bi bal xwe ve û li dor xwe bide gerandin û cewelandin. Wek çengala zulfê aşiq nêçîr bike. Aşiq jî husnê bibîne, biceribîne û nas bike. Wihareng aşiq dê bipije û bigihê û wusleta cemala heqîqî, yanî lîqayê, silametiya ruh û raheta can bidest bixe.

Li gor Mela ciwanî û eşq ji yek serçeşmeyê ne. Him cemal him eşq ji zatê Xweda ne. Her du jî di sîfatê kemala îlahî de hevpar in. Lewma ev her du ji hev cuda nabin, ji hev venaqetin. Cizîrî vê rastiya rewşen û vê rewşa rewnaq awha tîne ziman:

Rohniya çahvên Mela yî Xaliq e husna te dayî

Hub tine da min gedayî husn û hub yek çeşme ye (Cizîrî, 2013: 134)

Di vir de Mela bi awayekî eyan û eşkere nîşan dide û her wisa bi qetî dide zanîn ku ciwan û evîn, yanî husn û hub ji yek jêderkekê ne. Ew ji zatekî ne, ji zatê muqeddes in. Yanî ji tecellaya zat a li zat peyda bûne.

Li gor Mela ji ber ku husn û cemala mutleq bê tixûb û bê hudûd e, di serê serî de wek ayanê sabîte mahiyeta wê ilmîye ye. Ew husn û cemala ji nûra lemyezel her ku ji ilmelyeqînê derdikeve eynel yeqînê, li alema şehadetê jî li kaînatê tecelliyên wê husnê ji hêla însan ve jî tê xuyanê. Wihareng nimûneyên wê husnê yên mecazî jî derdikevin holê. Ev tecelliya husna mecaz dibite sebeb ku ciwanî yan jî heqîqeta ciwaniyê ji hêla aşiqên zîşuûr ve, yanî ji hêla însan ve jî bê têgihîştin.

Her wiha eksa wê husn û cemalê di dil û qelban de tîrêjên eşqê dide destpêkirin. Lewma Mela dibêje ku “kê diye heqîqet bêmecaz”. Yanî întiqala ji mecazê bi bal heqîqetê, derbasbûna ji ilmelyeqînê bi bal eynelyeqînê ye. Li gor Mela nûra cemal û ciwaniyê ji mahiyeta xwe ya ilmî diqulibe bi mahiyeta eynî, yanî muşahadeyê. Ev beyta Mela di vê derheqê de xayet rohnîker e:

Lamia husn û cemalê dê ji ilmê bête eyn

Îşqi da jê hilbitin kî dî heqîqet bê mecaz (Cizîrî, 2013: 119).

Di kitêba bi navê “*El- Cezerî Şair’ul Hubbî We’l-Cemal /Melayê Cizîrî Sevgi ve Güzelliğin Şairi*” a Xalid Cemîl Muhemmed a bi Erebi ku ji hêla Umit Demirhan ve hatiye wergerandin bi bal Tirkî, xeletiyek di derheq werger û şîroveya vê beytê de heye. Risteya dawî ya vê beyta Mela, li gor me bi awayekî xelet, wek “hakikatsiz mecazî kim görmüştür”, yanî “mecaz bê heqîqet nabe” hatiye wergerandin bi bal Tirkî ve û li gor wê şîrove lê hatine kirin (Muhammed, 2008: 165). Bi qenaeta me ev werger û şîrove xelet in. Hal ew hal e ku divê Tirkîti ya wê wek “ mecazsiz hakikati kim görmüştür” yanî “ heqîqet bê mecaz nabe” bihata wergerandin û li gor wê şîrove bihatana kirin.

Li gor Mela meyl û îştîyaqa bi eşqê ya ji bo husn û cemalê, ne tenê bi alema muşahadeyê destpê kiriye. Bileks ew îştîyaq û eşq hê di wextê xulqiyeta ruhan de û hêj di dema muqaleme ya “ehdê elest” de heye ku wek muqaleme ya manewî ya îlahî ye ya bi ruhan re. Lewma eşqa ji bo cemalê, yan jî têkilî û hevû du îcabkirina ciwanî û evînê, hê serê çîrok û dîroka xulqiyeta ruhê beşerî de veşartîye. Ev cezb, încizab, îştîyaq û cazîbeya di nav husn û eşqê de ya li alema şehadetê, wek mîras û berdewamiya wê fitret û îsdidadê ye ku di ruhê însan de hatiye çandin û derckirin.

Di nêrîna Mela de dasitana husn û cemala mutleq û qisseyê eşq û evîna muqabilê wê, di haveyn, esl û dendikê wucûdê de heye. Lêbelê şerh û beyana wê bi awayekî qal nayête gotin. Bes bi awayekî bi hal û sir dê dîlfesana husna mutleq bê nasîn. Lewma Mela di vê bendê de awha dibêje:

Hê di ber qal û belayê batin pê re bû evîn

Hê li ehda elest im ta bi roja axirîn

Lê divêtin eşkera kim carekê daxa nihîn

Goftim û ra ma dudagoyê tû yem ey hûr ûl’în

‘Eredet ‘ennî we qale la duaul kafîrîn (Cizîrî, 2013: 204).

Li gor Mela eşq hê di beriya xulqa alem û adem de hebû. Eşq di alema erwah de hevalbendê ruhê însan bû. Di nêrîna ciwanînasî ya Mela de eşq û ruh hevalcêwî ne, digel hev in. Hê wê çaxê ku însan di alema erwah de ehd û peyman dabû

Xwedayê xwe, eşq rêhevalê ruhê însan bû. Yanî ew bûyera xeybalûd a ku bi “qalû bela” tê îfadekirin ji aliyekî de ehda însan a li ser eşqê ye. Yanî li gor Mela ew bersiva “Belê” ya ku însan dabû pîrsa hîkmeta îlahî ya wek “ez ne Rebbê we me?”, pejirandina “eşqê” ye. Lewma ew “belê” ya ji bo qebûla “eşqê”, qebûla ji bo kişandina “bela eşqê” ye. Ji ber vê qasê li gor Mela ew “belê” “bela” ye.

Li gor Mela qiseya eşqa celal û destana husnê, yanî dîrok û çîroka ciwan û evînê, ne mumkun e ku bi gotin û şîroveyan bê ser ziman. Her wiha ne pêkane ku bi awayekî zelal bê şerh û îzahê. Însan belkî heta qasekê bi awayekî hal û hissî bizanin û binasin vê sir û muammayê. Lewma Cizîrî dibêje:

Nayêtin gotin bi qal şerh û beyana husnê tu

Dê bi hal û sir binasin dîlfesana husnê tu

Xweş Mela armancê tîran kir kemana husnê tu

Qisseyê eşqa celal û dasîtana husnê tu

Tilke enbaûn yeqûlûn nasû mînna be'de hîn (Cizîrî, 2013: 204).

Yanî mesele û muşkileya eşq û cemalê wisa bi hêsanî nayête gotin û şîrovekirin. Ev qise di ezel de hebû. Destpêka vê destanê diçe heta sehergeha ezel. Vê qiseya balkêş hemû alem û adem bi xwe re meşxul kiriye. Her dê bike jî. Ev çîrok, ev hikaye, ev mesele dê piştî me jî heta hetayê yanî heta bi ebed berdewam be. Lewra ev qise ji ezelê hatiye. Dê biçe ebedê.

ENCAM

Em dixwazin di dawî de encam û tesbîtên ku me di vê xebatê de bi dest xistine, nîşan bidin û rêz bikin.

Estetîk di serê sedsalên serdema Yûnana antîk de wek mijareke qada felsefeyê derketiye holê. Têgeha estetîkê di zimanê Grekî de ji peyva “aisthesis” pêk hatiye. Di maneya hestpê kirin, hisîn/hiskirin, bihîstin û hestîyarîyê de ye. Ev peyv bedewbûn û spehitiyê îfade dike û ji xweşikiya terkîbên maddeyê bigre heta ciwaniya raser yanî heta zatê Wacîbul Wucûd diçe. Ev hest û hîssiyat beşeke kiryara dîtinê ya însan e. Piştî wextan ev peyv, wek bingeha têgeha estetîk ketiye lîteratûrê. Fîlozofên Yûnan ev têgeh di maneya epîstemolojîk de bikaranîne. Wan zanîna ku meriv bi eqilê xwe digihêjê û ya ku meriv bi hestên xwe bi dest dixê, ji hev cuda kirine. Lewma li gor wan “estetîk” ew zanîn e ku bi rêya hisiyata însan pêk tê û bi dest dikeve.

Di nêrîna felsefî ya Eflatun de bi awayê “mutleq” û “îzafî” du cure ciwanî hene. Ciwaniya mutleq çavkaniya hemû ciwaniyan e û xeybî ye. Ciwaniya îzafî jî ciwaniya li alemê ye û eksa wê ciwaniya mutleq e, demî ye û heqîqetêke wê tune. Nêrîna wî ya ciwaniya mutleq di nav ehlên dînên semawî de, xasma di nav hukema û mutesewufên pêşîn ên Îslamê de wek “ciwaniya îlahî” hatiye nirxandin.

Qasî ku tê xuyanê felsefeya klasîk a Îslamî di derheq estetîkê de, digel esas û referansên xwe yê otantîk, ji nêrînên Aristotales û Platonistên nû jî tesîr wergirtiye. Îbnî Sîna û hûkemayên şopînerên wî di nav vê paşxaneyê zanyarî de xwedî bandor in. Wan bingeş û prensîbên vê ekola felsefî di berhemen xwe de destnîşan kirine. Retorîka felsefî ya Îbnî Sîna ku bi têgehên wek “Wacîb, Wacîbul Wucûd”, “îmkan”, hudûs” û hwd. aniye ziman, di şîrên Mela de jî pir cihekî girîng digre. Sîna zêde rol daye eqil. Lê Mela her çiqas nêrînên wî yê di vî warî de nepejirandibin jî, navê wî wek pîrê felsefeyê di helbestên xwe de zikir kiriye.

Estetîk piştî ku wek qadeke felsefeya hebûnê kete nav zanayên beşerî, digel hûkema û zanayên dînî, edîb û şair jî li ser vê mijarê sekinîn. Li dor vê babetê nêrîn û hestên xwe anîne ziman. Wihareng estetîk geriya qadeke rengîn a edebiyatê jî. Ciwanî ku mijara estetîkê ye, ji hêla piraniya şairên serdema klasîk ve li ser unsurên muştêrek, bi prototîpên kifşe û bi heman uslûbê hatiye sêwirandin. Her wiha ew ciwaniya ku bi şeweyeke yekreng û yekawa dihate ziman, bi rêya îfade û gotinên

alegorîk, girîft û pirmane ya edîb û şairan, rewş û rehendeke nuwaze û orjînal wergirtiye. Edîb û şairan diyardeya ciwaniyê bi temsil, teşbih û îstiareyan û bi xeyalên pir dewlemend ve sêwirandine. Wan estetik di form û kirasên ciyawaz de ji nûve saz kirine û bi mezmûn û gotinên klîşe yên curbecur ên ciwannasiyê ve anîne ziman.

Qada zanistî ya estetikê di dîroka fikriyata Kurdî de li gor fikr û nêrîna klasîk ji hêla zanyar û mutesewufên Kurd ve him bi hizra hîkemî him jî bi nezera îrfanî di berhemên wan de cih girtiye. Di vî warî de navên wek Suhrewerdî, Aynul Qudatul Hemedanî, Şemseddînê Exlatî, Melayê Cizîrî û hwd. derdikevin pêş. Her wiha di zimanê Kurdî de jî nêrîn û perspektîfa estetik a klasîk ji hêla şair û edebiyatnasên Kurd ve mewzûbehs bûye. Şairên Kurd ên berîya Melayê Cizîrî û yên piştî wî jî di berhemên xwe de babeta estetikê anîne ziman. Baba Tahirê Uryan, Eliyê Herîrî, Feqiyê Teyran, Mela Huseynê Bateyî, Ahmedê Xanî, Suwadî, Sîyahpoş, Pertew Begê Hekkarî, Mehî û hwd. di şîrên xwe de babeta estetikê ristine. Van şairên Kurd di edebiyata Kurdî ya klasîk de dab û nêrîteke hizra estetik saz kirine û li dû xwe hîştine.

Mijara estetikê di serdema modern de cara ewil li gor perspektîfa modern bi Kurdiya Soranî ketiye nav dîroka edebiyata Kurdî. Xebatên li ser estetikê bi Kurdiya Soranî wek “Ciwanînasî”, “Êstatîka” hatine îfadekirin. Her wiha navê zanista estetikê di zimanê Erebi de wek “ilmê cemal”, di Osmaniyan de wek “bedîîyat”, di Fransizan de wek “esthétique”, di Almanî de wek “aesthetik”, di Îngilîzî de wek “aesthetics”, di Farisî de wek “cemalşinasî/Zîbayî şinasî”, di Tirkî de jî wek “Estetik/Güzellik bilimi” derbas dibe.

Di nêrîn û nêrîta helbesta serdema klasîk de şîr ne tenê medh û pesn ne ji ciwaniyê re her wiha ne lava û dextalet e ji bo dildar û dîlbera xwedî husn. Bilekis helbest wasiteyeke ji bo anîna ziman a hebûn û yekbûna Xweda ya bi rêya şîrê û keşfa heqîqeta wî ya veşartî ye ya di eşya de. Lewma di vê helbestê de her çiqas tema û mijûlayî li ser ciwanî û evînê be jî, armanca esasî ya şair ew heqîqet e ku hîkmeta îlahî rave bike, jê xeber bide û qasidiya wê bike.

Şair û edebiyatnasên Kurd ên serdema klasîk jî digel hempîşeyên xwe yên ji milletên erdnîgariya Rojhilata navîn, ciwan û ciwanî bi heman nêrîn û nêzîkatîyê şîrove kirine. Ev nêrîn di zimanê wan ê Kurdî de û di berhemên wan ên bijarte de bi awayên herî rewnaq û herî xweser derdikeve pêşîya me. Melayê Cizîrî jî yek ji wan

şairên Kurd ên mezin û berbiçav e ku di helbestên xwe de estetîk yanî hizr û nêrîna ciwan û ciwaniyê bi tabloyên herî rewnaq û herî bala û balkêş xêz kiriye di risteyên xwe de terenum kiriye. Dîwana wî ya muretteb, helbesta wî ya coşîş û beytên wî yên muhkem di vî warî de temsîlkarê banê estetîka zimanê Kurdî ne. Her wiha sertaciya taqa zêrîn a qesra edebiyata Kurdî dikin.

Mela Ahmedê Cizîrî şairekî Kurd ê sedsala 16an e û di wan sedsalan de hukumet û mîrektiyên Kurd xwedî desthiladariyeke xurt bûn. Têkiliya wî bi mîrên Mîrektiya Cizîrê re heye. Ji medhiyeyên wî yên ji bo mîrê Cizîrê tê fêmkirin ku ew şairê qesr û serayê ye. Lewma ew wek şairekî serdema muqtedîr ya mîrên Kurdan tê nasîn û di vê atmosfera îlmî û siyasî de gihîştîye û berhem dane. Ev rewşa rewnaq a serdemê ya sîyasî û îlmî wek xwebawerî, îftixar û pesindan di helbestên wî de jî xwe dide der. Di şî'ra wî ya lîrîk û coşîş de hêmanên ruh ên wek îhtîşam, hessasiyet, xwebawerî û ciwanî derdikevin pêş.

Bingeh û binaxeya ku Melayê Cizîrî naverok û nasnameya helbesta xwe li ser saz kiriye, xwe disêpere paşxaneya fikra dînî, edebî û tesewufî ya muşterek a serdema navîn. Cizîrî jî wek şairekî Kurd ê vê serdemê ku ji vê çavkaniyê behremend buye, îdeyên ciwan û ciwaniyê di tesewira vê muktesebatê de dixwîne, dinirxîne û di helbestên xwe de dihûne. Lê li gor hêza xwe ya îfadeyê, hunermendî û hostatiya xwe ya şaîrane û qabiliyeta ziman û kariheya xwe ya edebî bi form û awayekî xweser dirêse, hildiberîne û pêk tîne. Lêbelê tişta ku meriv divê li ber çavan bigre û her tim di hişê meriv de be ew e ku nêzîktayî û sekna şair ya li pêşberî ciwan û ciwaniyê ye. Di vê babet û tradîsyonê de şair yan jî hunermend ne afirînerê ciwaniyê ye, yanî estetîkê pêk nayne. Şair yan hunermend keşşafê wê estetîkê ye, raveker e; nîşankerê ciwaniyê ye, navnîşan û çavkaniya estetîkê rave dike. Wihareng bi rê û nîşandana ciwaniyên li alemê, xwe digihîne ciwaniyeke raser û serdest.

Melayê Cizîrî gava hizra estetîk yanî ciwaniya ku bi têgehên husn û cemalê îfade dike, bi pênaseya xwe digihêje terîfeke ji wan terîfên herî kûr a hizra ehlê tesewifê. Şair husn û cemalê wek sifetek ji sifetê Xwedê Teala dixwîne û diwesifîne. Di nêrîna şair a hunerî de husn sifetek e ku di zatê Xwedê Teala de bi muşahedeya bi awayekî îlmî tê dîtin. Yanî bi rêya fikr û eqil ku li ser temaşe û tefekurê dişxule, ew merîfet bidest dikeve. Bi qîyas û ceribîna şexsî ew husn û ciwaniya îlmî yanî teorik, vedigere awayekî eynî yanî ew ciwanî bi çav û beden û ruh ve tê hîskirin û di pratîkê de heqîqeta wê tê jiyîn. Lewra Xwedê Teala xwestiye ku cemala xwe bi

muşahedeyeke eynî bibine. Lewma alem wek eynik afirandiye û cemala xwe temaşe kiriye.

Di nêzîktayî û nêrîna estetîk a Mela de ciwanî ya ku cemala mutleq e hê di beriya afirandina kaînatê de hebû. Yanî neynika ku ji mewcûdatê alemê pêk tê, hê tunebu, ew kenza cemalê veşartî bû, mewcûd bû. Yanî wek xezîneyeke veşartî di zatê muqeddes de hebû. Zatê îlahî ji cemala xwe hez kir û îradeya eyanî û eşkerebûna xwe kir. Zatê îlahî xwest ku ji bo zatê xwe temaşeya cemala zatê xwe bike. Mela vê eyanbûnê wek “tecellaya zat a li zat” tîne ziman. Nêrîna li ciwaniyê ya Mela ya di vê babetê de hevdengê fikr û nêrîna hin filozof û sûfîyên Musulman e. Li gor vê nêrînê husn û cemaal dendika hebûnê ye. Ciwanî ji zatê îlahî ye û sermeşka qelema qudretê ye.

Di nêzîktayîya poetîk a Melayê Cizîrî de armanca şair ew e ku bi dûrbîna ciwaniya li alemê binêre, temaşe bike û ji wê sûretê derbas bibe. Wihareng bi wan pêlekanên derketinê ve bilind bibe li derece û asteke ciwaniyê ya serdest. Her wiha li cemala heqîqî û mutleq bigere, keşfa çavkaniya wê bike, derkeve diharê wê husn û cemala bêmîsal. Hîkmet û îlleta lêbarkirina mane û wezîfeyeke bi vî rengî ya li husn û ciwaniyê ev e ku hemû reng, ton, celeb û cureyên ciwanîyê çi xweşikî, delalî, cindîtî, çi spehîtî, zibayî, bedewbûn û rindiya li alemê, ne xwedî wesfekî objektîf in, ne zatî ne. Yanî tu rastiyeke wan, heqîqeteke wan tune. Husna di alemê de tê xuyan bi tena serê xwe tiştekî îfade nake, yan jî dîtî û teswîra wê, meriv nagihîne husn û cemala heqîqî. Lewra ew ciwaniya li kaînatê belav buye, arizî ye, wesîle ye, pire ye ji bo cemala mutleq.

Şair bes dikare bi îşareta husna vê alema zahir xwe bighîne çavkaniya husna heqîqî, Ev yek jî bi qest û nîyeteke îradî û bi nêrîn û temaşeyeke bi menayê herfî pêk tê. Yanî çawa ku di terîfa herfê de derbas dibe ku herf delaletî maneyeke xeyrî xwe dike û îşaretî bi bal wateyeke din dike, her wisa jî ciwaniya li alemê amaje bi çavkaniya cemaleke sermedi û serdest dike. Li gor Mela însan ger bixwaze bigihêje heqîqeta cemalê, divê meriv ji husna mecazî destpê bike.

Mecaz li gor şair temkirin û fêmkirina ciwaniya li alemê ye. Însan bi rêya naskirinê tiştekî hez dike, dihebîne. Lewma di estetîka Mela de mecaz xaleke jênager e di seyr û sulûka keşfa cemala heqîqî de. Yanî nasîn û ceribîna ciwaniyên li alemê, ha ciwaniyên sirûştî, ha beşerî çi jin çi mêr, dendik û bingehek e di rêwitiya vê keşfê de. Şair vê zarûretê bi îfadeya “kî dî heqîqet bêmecaz” tîne ziman.

Mela wek şopînerêkî nêrîna wehdeta wucûdê ya Îbnî Erebî, girêdayî bi metafîzîka sofîgeriyê ye. Rastiyên metafîzîk ên xeybî ji ber ku mucered û bê ser û ber in, nakevin bin hed û hudûdên maddî û şeklî. Lewma ji bo anîna wan a ziman, pêwistî bi zimanekî alegorîk heye. Li gor Mela alema mecazan a maddî, tecelliyeke cîhana heqîqetan e. Ji ber vê qasê ji vê hêlê ve heqîqet in. Lêbelê bi gelemperî kesret û piratiya mecazan, demî, xapînok û arizî ne. Lewma mecaz wek pire û wesayît in ku diçe ber bi vê heqîqetê. Her wiha heqîqeta mutleq bi vê wesîleyê ve tê fêmkirin û nasîn. Ji ber vê qasê li gor şair bîyî mecazan heqîqet nayê fêmkirin.

Di estetîka Melayê Cizîrî de û her wisa bi gelemperî di estetîka serdema klasik de jî ciwanî rasterast bi xwe nayête vegotin. Her wiha wesfên ciwaniyê jî rasterast nabe mijara gotinê. Şair û edîban ciwaniyê bi gelemperî li ser mezmûnên wê yê herî têkûz vedibêjin. Ev prototîp jî tiştên dîtbarî yan jî takekesên xwedî ciwaniya destanwarî ne. Bi vî awayî ew tişt ku temsîla ciwaniyê dike, dibite usûrêkî herî rewneq di navbera hiş û ziman de. Wihareng objeya di rola nûnertiyê de, dikeve dewsa ciwaniyê. Yanî ew dibe ciwanî bi xwe. Bi vî awayî şair bi rêya xususiyeta prototîpê, estetîkê bi awayekî şênber yanî muşexxes li ber çavan radixe û raveyî hiş dike.

Arif û mutesewufên berî Melayê Cizîrî, ciwanî bi awayekî gelemperî veqetandine bi du beşan. Wek ciwaniya heqîqî û ciwaniya sûrî bi nav kirine. Cizîrî redda vê tesnîfa klasîk nekiriye. Lê li gor xwe ew ji nû ve terîf kiriye. Bi vî awayî li gor Mela, cureyekî ciwanîyê, ciwaniya mutleq e. Cureyê duduyan jî ciwaniya muqeddes e ku eql u ruhê însan temsil dike. Cureyê sisêyan ciwaniya nûra Muhemmedî ye. Ev cure ciwanî, îdraka wan bi eqîl û hestan ne mumkun e. Cureyê çaran ê ciwaniyê jî ciwaniya sûrî ye ku wek ciwaniya sirûştî, ciwaniya beşerî ya jin u mêrê ye ku bi eqîl û hestan tê hîskirin.

Mela eşq û evînê jî wek rêya wesleta ciwaniyê dibîne. Temaya hakim a di dîwana Mela de, bêguman eşq û estetîk e. Dîwana wî ji serî heta dawî ji mazmûn eşqê hatiye honandin û bi prototîpên estetîkê tijî ne. Li gor şair ciwanî û eşq du hebûnên qedîm in, du hevalbendên ji yek çavkaniyê ne. Ciwanî û eşq bîyî hevûdu nayêtin fikirîn. Jiber ku her mewcûd fîla xwe dixwaze, her wiha fîla ku ciwanî wê dixwaze jî hezkirin e. Yanî fîla ciwanîyê eşq û evîn e. Bi gotineke dî husn û cemal ji bo eşq û evînê ye. Hub û hezî, derketina ciwaniyê ya ji quweyê bal bi fîlê ye. Hezkirin, xwe pêkanîn û xwe tehequqa ciwaniyê ye. Lewma husn û cemal bi xwe

berê tèn hezkirin. Yanî hub û heziya cemalê bi awayekî bê sebeb, bê menffet, bê qerabet e.

Şair berî her tiştî eşqê wek rastiyeke alî, muteal, payebilind dibîne. Ji ber vê qasê li gor wî terîfa eşqê nemumkun e. Lewra ûlwiyea eşqê mani'ê vê yekê ye. Her çawa ku şewq û ronahiya rojê mani' e ji dîtina wê re. Êlwiyea evînê jî nahêle ku ew bê dorpêçkirin û kunha wê bê zanîn. Ji ber vê yekê jî çawa her ya ku rojê bide nîşandan dîsa roj e, her wisa jî ew tiştê ku eşqê bide zanîn, terîf bike, dîsa eşq û evîn bi xwe ye, ne tiştêkî din e.

Li gor Mela eşq bi eqil nayête fêmkirin. Eqil ji ber ku mehdûd e nikare sira eşqê hel bike. Ev yek bes bi merîfetê pêk tê. Merîfet ew zanyarî ye ku arif wê bi çavê qelb, bi bîneyê dil bidest dixê. Ev merîfet jî bi saya evînê tê qezenckirin. Eşqa ku pêşî teyyûn dike û bi tecelliya îsmê Wedûd tê wucûdê, “Heqîqeta Muhemmedî” ye. Hz. Muhemmed şexsekî dîrokî ye û şeklê mehdûd ê wê heqîqetê ye ku di zeman û mekanekî muayyen de tecessum kiriye. Eşqa xas a di navbeyna Xweda û heqîqeta Muhammediye de, çavkanîya wê eşqê ye ku berjêrî rû zemîn buye. Ji ber ku heqîqeta Muhamediye di wekaleta beşeriyet û alemê de wek dendikê dara kaînatê, buye maddeyê eslî.

Di serê felsefeya antîk vir de wek çar unsûrên eslî yên alemê, av, ax, agir û hewa tê nîşandan. Mela wê nêrînê rexne dike, kêr û naqis dibîne ku xulqiyeta însan berjêrî çar unsûran dike. Mela unsûreke alî û muteal a pêncan a bi navê eşqê li van unsûran zêde dike û wek unsûrê xemse bi nav dike. Wihareng li wan her çar unsûrên maddî unsûreke manewî ya xasê bi însan îlawe dike û xercê kemalata însan a bi madde û maneyê tekmîl dike.

Di nêrîna Cizîrî de esas du cure eşq hene ku yeke wî eşqa ontolojîk e ku eşqa îlahî ye. Cureyê duduyan jî eşqa heyînî û hissî ye ku carna wek eşqa mecazî û heqîqî carna jî wek eşqa cismanî û ruhanî tê teqşîmkirin. Eşqa ontolojîk qedîm e, ezêlî ye û zatê Xweda bi xwe ye. Her wiha beriya her tiştî de heye û bîngeh û binyada wucûdê ye. Zuhûra tecelliya zatê îlahî bi saya eşqê pêk hatiye. Eşqa îlahî hemû hebûn û gerdûn rapêçaye.

Li gor hizra estetîk a Mela, qiseya eşqa celal û destana husnê ne mumkun e ku bi gotin û şîroveyan bi temamî û bêkêmasî bê ser ziman. Ne pêkane ku ev hikaye bi qîl û qalê û bi pênuş û pirtûkan bi awayekî zelal bê şerh û beyanê. Îhtimal heye ku

însan bes bi awayekî hal û hissî heta dereceyekê vê razê têbigihêjin, bizanin û binasin. Lewra ev mesele nayête şerh û defteran û nakeve bin qeyd û cetwelan.

Di nêrîna estetîk a şair de mesele û muşkileya eşq û cemalê muammayeke muşkîlpeşend e, girêyeke kûr e û qufleke dijwar e. Her wisa jî raz û esrareke nihênî ye. Lewma wisa bi hêsanî nayête gotin û şîrovekirin. Qiseya eşq û estetîkê, hevalbendiya wan ji ezel de hebû. Ango destpêka vê destanê diçe heta sehergeha ezel. Ev qiseyeke balkêş e ku hemû alem û adem bi xwe re meşxûl û mijûl kiriye. Her dê bike jî.

Mela dibêje ku ev çîrok, ev hikaye, ev mesele dê piştî me jî heta hetayî yanî heta bi ebed berdewam be, dê li ser zar û zimanan be. Lewra ev qise û dasitana ciwan û evînê, hê ji berî qal û belayê, beriya çerx û dewran, dewr û gerdûnê de hebû û ji alema ezelê hatiye. Her wiha dê biçe ebedê. Lewma heta dunya xweş ava be, alem heta li ser piya be, ev qise û çîrok dê her hebe.

ÇAVKANÎ

Acar, Adnan, (2012). *Estetik*, Doruk Yayınları, İstanbul.

Adak, Abdurrahman (2013). *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, Nûbihar, Stenbol.

Afîfî, Ebul Ala, (2007). “İbnî Arabî de Ayan-i Sabite; Mûtezil Düşüncede Madumat”, Werger: Tahir Uluç, (İbni Arabi anısına Makaleler) İnsan Yayınları, r. 145-155, İstanbul.

Ahmad, Hêmin Omer, (2014). *Hêrmînotîkay Şî'riy Sofîyaney (Mehwî)*, Têza Diktora, Hukumetê Herêmi Kurdistan, Wezaretî Xwendinê Bala û Tiwêjnewey Zanistî, Serokayetî Zankoy Silêmanî, Fakeltê Zimna û Zaniste Mirovayetiyekekan, Skolê Ziman, Beşê Kurdî.

Alan, Ramazan, (2015). *Destpêkek Ji bo Zanista Edebiyata Modern*, Weşanên Peywend, Stenbol.

Alkış, Abdurrahim (2014). *Melayê Cizîrî'nin Dîvânında Tasavvufî Mazmunlar*, Nûbihar, İstanbul.

Alkış, Abdurrahim (2012). “Di Dîwana Melayê Cizîrî de Mertebeyên Wucûdê”, *Bilim Düşünce ve Sanatta Cizre Uluslararası Sempozyumu* (Ed. M. Nesim Doru), Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları, İstanbul. rr. 349-366.

Akın, Ehmed, (2009). “Hermenotîk, Modelên Şîroveyê û Melayê Cizîrî”, *Nûbihar*, , Zivistan, jimar: 110, r. 29.

Akın, Erkan, (2017). *Hunerên Belaxatê Di Xezelên Mela Ehmedê Cizîrî/ Mela Ehmedê Cizîrî'nin Gazellerinde Edebi Sanatlar*, Yüksek Lisans Tezi, Sosyol Bilimler Enstitüsü, Muş Alparsal Üniversitesi, Muş.

Altıntaş, Ramazan, (2002). *İslami Düşüncede Tevhid ve Estetik İlişkisi*, Pınar Yayınları, İstanbul.

Arabî, İbnî, (2017). *Tecelliler Kitabı*, Tercüme: Osman Yolcuoğlu, Gelenek Yayınları, İstanbul.

Arabi, Muhyeddin-i, (2013) *Fütuhat-ı Mekkiye*, Litera Yayınları, İstanbul.

Arat, Nela, (2006). *Etik ve Estetik Değerlerimiz* Say Yayınları, İstanbul.

Arslan, Ahmet (2013). *Melayê Cizîrî*, Yüksek Lisans Tezi, Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Diyarbakır.

- Ayhan, M. (1996), *Kürdistanlı Filozof Ehmedê Xanî*, (Weşanxane ne kifş e), Ankara.
- Aytaç, Gürsel, (2015). *Karşılaştırmalı Edebiyat Bilimi*, Say Yayınları, İstanbul.
- Ayvazoğlu, B. (1989), *İslâm Estetiği ve İnsan*, (1. Baskı), Çağ yayınları, İstanbul.
- Ayvazoğlu, B. (2016), *Aşk Estetiği*, (5. Baskı), Ötüken Yayınları, İstanbul.
- Ayvazoğlu, B. (2001), “İlmü’l-cemâl”, DİA, (ed. Komisyon), (1. Baskı), Türk Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul.
- Ayvazoğlu, B. (2008), *Güller Kitabı*, (10. Baskı), Kapı Yayınları, İstanbul.
- Bal, Metin, (2008). “Yargı Yetisinin Eleştirisinin Kant Felsefesindeki yeri”, Ankara Üniversitesi, Dil ve coğrafya Fakültesi, Araştırma Dergisi, Sayı: 19, r. 83.
- Bayar, A. Gözkdağ, K. Subaşı, K. Uyanık, N. (2019). *Ferhenga Têgehên Felsefî*, Editör: Nesîm Doru, Weşanxaneyê Lîs, Amed.
- Bayraktar, Mehmet. (1991), *Yunus Emre ve Aşk Felsefesi*, İş Bankası Yayınları, Ankara.
- Bodei, R. (2008). *Güzelin Biçimleri*, Dost Kitapevi, Ankara.
- Bozkurt, Kenan,(2016). *Fuzûlî’de Güzellik Tasavvuru*, İnönü Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Türk Dili ve Edebiyatı Ana Bilim Dalı, Esk Türt Edebiyatı, Malatya.
- Bozkurt, Ömer, (2009). “Dinî Çoğulculuk ve Hoşgörü Arasında Molla Ahmed Cezîrî”, *Bilim Düşünce ve Sanatta Cizre Uluslararası Sempozyumu* (Ed. M. Nesim Doru), Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları, İstanbul, r. 367-384.
- Burke, Edmont, (2008). *Yüce ve Güzel Kavramlarımızın Kaynağı Hakkında Felsefî Bir Soruşturma*, Werger: M. Barış Gümüştekin, Bilgesu Yayınları, Ankara.
- Cengiz, Metin, (2016). *Şiir Dili*, Şiirden Yayınları, İstanbul.
- Cevizci, Ahmet, (1999). *Paradigma Felsefe Sözlüğü*, Paradigma Yayınları, İstanbul.
- Cevizci, A. (2014), *Felsefe Sözlüğü*, Say Yayınları, İstanbul.
- Cevizci, A. (2015), *Felsefeye Giriş*, Say Yayınları, İstanbul.
- Cihan, A. K. (2009). *İbni Sina ve Estetik*, Beyaz Kule Yayınları, Ankara.

Coşkun, İbrahim, (2010). “Molla Ahmed Cezerî’nin Vahdet-i Vücutçu Allah Tasavvuru ve Hoşgörücü Kişiliği”, *Uluslararası Şırnak ve Çevresi Sempozyumu* (Ed. M. Nesim Doru), Şırnak Üniversitesi Yayınları, Ankara, r. 561-578.

Cizîrî, Melayê, (2013). *Dîwan*, Çapa Pêncem, Selman Dilovan wer. bi tirkî: Osman Tunç, Nûbihar, Stenbol.

Cizîrî, Mela Ebdusselamê, (2018). *Şerha Dîwana Melayê Cizîrî*, Wergera Ji Erebî Bi Bal Kurdî: Jan Dost, Diyarbakır.

Cîhanî, Perwîz (2013), *Şiroveya Mem û Zîna Ehmedê Xanî*, Weşanên Nûbihar, Stenbol.

Coşkun, Şengül, (2004). *Kültürel İletişim Sürecinde Kalıp Düşüncelerin ve Önyargıların Rolü*, (t.ç.) Teza Akademîk, Ankara Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Radyo ve Televizyon Ana Bilim Dalı, Ankara.

Çam, Nusret, (2013). *İslam’da Sanat Sanatta İslam*, Akçağ Yayınları, Ankara.

Çetinkaya, Bayram Ali, (2015). “Molla Ahmed el-Cezerî/Melayê Cizîrî”, (Doğudan Batıya Düşüncenin Serüveni-Osmanlı’da Felsefe ve Aklî Düşünce-, ed: İnsan Yay., İst., içinde), r.797-822.

Çoban, Ahmet, (2015). *Edebiyatta Üslup Üzerine*, Akçağ Yayınları, İstanbul.

Dedeler, Sinan, (2012). “Grek Estetiği ve Sanat Felsefesinde Önemli Kavramlar”, *Farabi e-Dergi*, Yıl: 2, Şubat, r. 5.

Delice, Didem Yıldırım, (2007). “Estetik Bir Yargı Olarak Güzel”, Ankara Üniversitesi, *DTCF Felsefe Bölümü Dergisi*, r. 6.

Demir, N.-Yılmaz, E, (2009). *Yazılı ve Sözlü Anlatım Türk Dili*, Nonel Yayın ve Dağıtım, Ankara.

Devellioğlu, F. (2013), *Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lugat*, (30. Baskı), Aydın Kitabevi, Ankara.

Doğan, Mehmet(1975). *100 Soruda Estetik*, Gerçek Yayınevi, İstanbul.

Doğan, D. Mehmet, (2000). *Büyük Türkçe Sözlük*, Pınar Yayınları, İstanbul.

Doru, M. Nesim, (2012). *Melayê Cizîrî Felsefî ve Tasavvufî Görüşleri*, Nûbihar, İstanbul.

Doru, M. Nesim, (2016). *Melayê Cizîrî Hakikat ve Mecaz Arasında Bir Süfî’nin Portresi*, Nûbihar, İstanbul.

Duymaz R (2014). “Genç Kalemler Dergisinin Estetik Anlayışı. Yeni Türk Edebiyatı”, Araştırmaları(6): r. 7-42.

Doskî, Muhemmed Emîn, (2008). *Şîrovekirina Dîwana Melayê Cizîrî*, Spîrêz, Duhok.

Doskî, Tehsîn Îbrahîm, (2020). *Baxê Îrem Geşte Li Nav Şi'ra Kurmancî ya Klasik*, Amadekar: M. Zahir Ertekin, Weşanên Dara, Diyarbakır.

Doskî, Tehsin Îbrahîm, (2021). “Melayê Cizîrî û Dîwana Wî”, *Cizîrînasî Maqaleyên Li Barey Melayê Cizîrî de*, W Editor: M. Zahir Ertekin, Weşanên Dara, Diyarbakır.

Eagleton, Terry, (2011). *Edebiyat Kuramı*, Ayrıntı Yayınları, İstanbul.

Eco, Umberto, (2006). *Güzelliğin Tarihi*, Werger: Cevat Akkoyunlu, Doğan Yayınları, İstanbul.

El- Muncîd, (1986) Muncîd Fîl Luxetî Wel E'lam, Darul Meşrîq, Beyrut-Lubnan.

Eminoğlu, Nevzat, (2021a). *Hîzan Dîrok Çand Edebiyat*, Weşanên Peywend, Wan.

Eminoğlu, Nevzat (2020). “Nimûneyên Patronaja Edebî Di dîroka Edebiyata Kurdî de”, *Kurd Bajar û Bajarbûn*, Weşanên Lorya, Wan.

Eminoğlu, Nevzat, (2021b). “Yazılı Kürt Edebiyatının Zenginliği” *Kürd Araştırmaları Dergisi* 1234. Ciltler, Kürd Araştırmaları Yayınları, İstanbul.

Erkal, Abdulkadir, (2009). *17. Yüzyıl Divan Şiiri Poetikası*, (t.ç.)Teza Doktorayê ya Neweşiyayî, Atatürk Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Erzurum.

Ertekin, Nurettin, (2021). “Tesewuf Di Dîwana Melayê Cizîrî de”, *Cizîrînasî Maqaleyên Biwara Şi'rên Melayê Cizîrî*, Editor: M. Zahir Ertekin, Weşanên Dara, Diyarbakır, r. 177.

Ertekin, M. Zahir, (2017). “Agirê ‘Îşqê di Perspektîfa Mela de”, *Mukaddîme*, cîld: 8, (jimar: 1), (Melayê Cizîrî Özel Sayısı), r. 77-93.

Ertekin, M. Zahir, Tehsîn Îbrahîm Doskî, (2019). “Mela Mehmûd an jî Hemîdî: Şairê Berî Melayê Cizîrî û Yekem Mulemme'a Kurdî”, *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, Sal: 5, Hejmar: 9, r. 43-61.

Ebu'l-Ala Afîfî, (2004). *İslam'da Manevî Devrim*, Risale Yayınları, İstanbul.

Exlatî, Şêx Semsedîn, (2015). *Dîwana Şemsedîne Exlatî*, Weşanên Nûbihar, Stenbol.

Ezîz, Hemîd (2021). “Felsefey Ciwanî û Huner”, Kovarî Raman, Jimar: 283/284, r. 90.

Farqînî, Z. (2012). *Ferheng Sözlük Kurdî Tirkî Tirkî Kurdî*, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol.

Geçit, M. S. (2019). “Beyazîd Sancağında Yetişen üç Bilim Tarihçisi Beyazîdi-Celali-Sezgin”, 3. Uluslararası Ahmed-i Hânî Sempozyumu Bildiriler Kitabı, Ağrı. (İslam Bilim ve Kültür Tarihçisi Olarak Prof. Dr. Fuat SEZGİN)

Gündüzöz, Güldane, (2018). *Tasavvuf Tarihinde Nazari İrfan Geleneği: Tarih, Teori ve Problemler*, Fecr Yayınları, İstanbul.

Grabar Oleg, (2010). *İslam Sanatının Oluşumu* (Wer.: Nuran Yavuz), (2. Baskı), Kanat Kitap, İstanbul.

Günay, Mustafa, (2010). *Metinlerle Felsefeye Giriş*, Karaban Kitapevi, Adana.

Hançerlioğlu, Orhan, (2011). *Düşünce Tarihi*, Remzi Kitapevi, İstanbul.

Hartman, Martin, (1904). *Der Kurdische Diwan Des Schech Ahmad*, S. Calvary & Co., Berlin.

Hartmann, Martin, (2015). “Li Ser Edebiyata Kurdî & Melayê Cizîrî”, *Nûbihar Akademî*, (wer. Abdullah İncekan), c. 1., jimar. 3., s. 2., 2015, r. X-X

Hekarî, Pertew Begê, (2014). *Dîwan*, Amadekar: Îbrahîm Tehsîn Doskî, Weşanên Nûbihar, Stenbol.

Heme Salih, Hîmdad Mehmûd (2010). *Bunyadî Binaxeyî Estetîkî Hegel*, Çapxaney Mukriyanî, Hewlêr.

Husên, Kazim Şêx, (2017) “*Ciwanînasîyê Îrfanî Le Şîrekanî Şêx Nûreddînê Birîfkanî da*”, Fakuteya Adab, Tiwêjewey Zanstî, Teza mastirê, Zankoyê Soran, Soran, Herêma Kurdistan- Îraq.

Husên, Cebare Ehmed, (2008). *Estetîkay Deqî Şî'rîy Kurdî Kurdistanî Êraq (1950-1970)*, Dezgay Çap û Pexşî Serdem, Kurdistan Silêmanî.

Hünler, Hakkı (2011). *Estetik'in Kısa Tarihi*, Doğubatı Yayınları, Ankara.

Işık, A. (2013), Din ve Estetik, (2. Baskı), Ötüken yayınları, İstanbul.

Izady, Mihrdad, (2006) *Kürtler*, Weşanên Doz, Stenbol.

İbnü'l Arabî, (2006). *M. Fusûsü'l-Hikem*, çeviri ve şerh: Ekrem Demirli, Kabalcı Yayınları, İstanbul.

İlboğa, Mustafa, (2007). *Platon'un İdeaları ile Whitehead'in Ezeli Objelerin Ontolojik Bağlamda Karşılaştırması* (Teza Mastirê ya neçapbûyî, n.ç.), S. Demirel Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Isparta.

Jusdanis, Gregory, (1998). *Gecikmiş Modernizm ve Estetik Kültür Milli Edebiyatın İcat Edilişi*, Metis Yayınları, İstanbul.

Kavak, Abdurrahman, (2013). “Melayê Cizîrî Divân Şerhleri Arasında el-İkdu'l-Cevherî fî Şerhi Dîvan'ş-Şeyhi'l-Cezerî Adlı Eser”, *Bingöl Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi/ BÜİFD*, cild: 1, jimar: 2, r. 53-67.

Kanar, Mehmet (1998). *Ferhengê Farisî Be Torkî*, İntişaratê Birim, İstanbul.

Kavuran, Tamer –Dede, Bayram, (2013). “Platon ve Aristoteles'in Sanat Etiği, Estetik Kavramı ve Yansımaları”, *Atatürk Üniversitesi Güzel Sanatlar Fakültesi Sanat Dergisi*, Erzurum 2013 (23), r. 50.

Kılıç, Cevdet, (2009). “Plotinos'ta Südurla İnen ve Aşkla Yükselen Çift Kutuplu Hakikat Anlayışı”, *Kelam Araştırmalar Dergisi*, Ocak Cilt: 7, r. 39.

Kılıç, Cevdet, (2010). “Şeyh Ahmed el-Cezerî'nin Şeyh San'an'a Bakışı”, *Uluslararası Şırnak ve Çevresi Sempozyumu* (Ed. M. Nesim Doru), Şırnak Üniversitesi Yayınları, Ankara. r. 579-588.

Kılıç, Mahmut Erol, (2012). *Sufî ve Şiir*, İnsan Yayınları, İstanbul.

Kavak, Abdulcabbar, (2015). “Melayê Cizîrî ve Tasavvufî Kürt Edebiyatının Gelişim Dönemi”, *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, sal:1, cild: 1, jimar: 2, Kasım, r. 48-66.

Koç, Turan (2018). *İslam Estetiği*, İsam Yayınları, İstanbul.

Kurtoğlu, Zerin, (2000). *Plotinos'un Aşk Kuramı*, Asa Yayınları, Bursa.

Külekçi, Numan, (1995). *Açıklamalar ve Örneklerle Edebi Sanatlar*, Akçağ Yayınları, İstanbul.

Macit, Muhsin, (2012). *16. Yüzyıl Türk Edebiyatı*, Anadolu Üniversitesi Yayınları, Eskişehir.

Macit, Muhsin, (2010). *Edebiyat Bilgi ve Teorileri El Kitabı*, Grafiker, Ankara.

MacKenzie, D. N., (2006). “Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran”, *Zend*, wer. Samî Berbang, Jimar: 9, r. 88.

Mem, H. (1997). *Mamosteyê Sêyemîn Xanî*, Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê. Stenbol.

Mevlana, (2006). *Mesneviden Seçmeler*, Alkım Yayınları, İstanbul.

Muhammed, Halid Cemil, (2008). *El- Cezerî Şair'ul-Hubbî We'l-Cemal (Melayê Cizîrî Sevgi ve Güzelliğin Şairi)*, çev. Ümit Demirhan, Hîvda, İstanbul.

Nasr, S. Huseyin, (1992). *İslam Sanatı ve Maneviyat*, Wer: Ahmet Demirhan, İnsan Yayınları, İstanbul.

Neqşebendî, Xiyasedîn, (2021). *Felsefa Ciwaniyê Estetîk Nihêlîzm Yan Enîgma*, Hewalê Damezrandina Tîwrekê, Dihok, Herêma Kurdistan Federe, Iraq.

Nursî, Bediüzzaman Said-i, (2010). *Sözler*, Weşanên Zehra, Stenbol.

Nursî, Bediüzzaman Said-i, (2009). *Mektûbat*, Weşanên Zehra, Stenbol.

Nursî, Bediüzzaman Said-i, (2002). *Barla Lahikası*, Weşanên Zehra, Stenbol.

Nursî, Bediüzzaman Said-i, (2019). *Koma Gotinan /Sözler* (Wergera bi Kurdî: Muhammed Zahid Melazgîdî) Weşanên Zehra, İstanbul.

Okay, M. Orhan, (1990). *Sanat ve Edebiyat Yazıları*, Dergah Yayınları, İstanbul.

Okay M. Orhan, (2005). *Poetika Dersleri*, Hece Yayınları, Ankara.

Orkin, Şeyhmus, (2015). *Di Berhemên Feqiyê Teyran de Hêmanên Tesewîfî*, Zanîngeha Mûş Alaparslanê, Enstîtuya Zanistên Cîvakî, Şaxa Makezanista Çand û Zimanê Kurdî, Teza Mastirê, Muş.

Olgun, Tâhiru'l-Mevlevî (1966). *Şerh-i Mesnevî*, c. 5, (wer: Tâhir-ul-Mevlevî), Selam Yayınları, İstanbul.

Orman, Enver (2010). *Estetîk Lisans Ders Notları*, İstanbul Üniversitesi Açık ve Uzaktan Eğitim Fakültesi, İstanbul.

Özden, H. Ömer, (2002). “Helenizm Öncesi Yunan Felsefesinde Güzellik Anlayışları”, Atatürk Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi, Sayı: 17, r. 66.

Öz, Ruhullah, (2019). *Sufnin Akidesi Molla Ahmed el Cizîrî Örneği*, Şırnak Üniversitesi Yayınları, Mardin.

Öz, Ruhullah, (2013). *Molla Ahmed el-Ciziri'nin Divan'ında Kelami Konular*, Yüksek Lisans Tezi, Harran Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Şanlıurfa.

Özervarlı, M. Sait, (2005). “Molla Cezerî”, *DİA*, İstanbul berg: 30, r. 241-3.

Palacios, M. Asin, (1979). *İbnî Arabî Hayâtûhû we mezhebûh* (Wer: Abdurrahman Bedevî), Beyrut.

Özgül M. Kayahan, (2001). “Şiir, Şair ve Sair”, Hece, Türk Şiiri Özel Sayısı, S. 53-54-55, Mayıs-Haziran-Temmuz, r. 210-226.

Par, A. Hikmet (1984). *Osmanlıca-Türkçe Sözlük*. Yelken Matbaası, İstanbul.

Parsa, Seyîd Ehmed, (1397). *Ciwankarî Le Edebî Kurdî da Be Şêwazekî Nû*, Întişaratê Nalî, Sinendec- Kurdistan, İran.

Pürcevadî, Nasrullah, (1998). *Bûyê Can /Can Esintisi İslam’da Şiir Metafiziği*, Farsça’dan Çeviri: Hicabi Kırlangıç, İnsan Yayınları, İstanbul.

Resul, Îzedîn Mustefa, (1990). *Melayê Ciziri, Ştêk Derbarey Jiyan û Berhemî*, Weşanên Zankoy Selaheddîn, Hewlêr.

Reşîd, Mes’ûd Cemîl, (2014). *Rolê Tewaterên Helbijartin û Rêzkerinê di Çêkirina Rîtma Hozana Klasîkî ya Kurdî da: Dîwana Melayê Cizîrî weku Nimûne*, Ekdîmyay Kurdî, Erbîl.

Saraç, M. A. Yekta (2012). *Eski Türk Edebiyatına Giriş Nazım Şekilleri*, Anadolu Üniversitesi Yayınları, Eskişehir.

Secadî, Bextiyar (2016). *Waneyê Giştî – Bijardey Qonaxî Karnasî Zeban û Wêjey Kurdî*, Weşanên Kovar, Seqiz- Kurdistan, İran.

Secadî, Bextiyar, (2022). *Ferhengê Zarawey Rexneyî îngilîzî-Kurdî-Farisî*, Zankoyê Kurdistan, Sine-İran.

Siyahpoş, (2011). *Seyf-ul Milûk û Bedî-ul Cemal*, Amadekar: Bedirxan Amedî, Weşanên Nûbihar, Stenbol.

Soylu, Kerem, (1998). “Melayê Cizîrî”, Nûbihar, , Gulan, jimar: 62, r. 25.

Septioğlu, Abdulmukit, (2005). *Melayê Cizîrî Divanî’nın Şerhi*, Nûbihar, İstanbul.

Seyqelanî, (Dr.) Elî Kerîmyan, (1492 H.). *Mibanî Zîbayî Şinasî Der Îrfanî İslamî*, Çapê Evel, Sazmanî Mutalae ve Tedvînî Kutubî Ûlumî İnsanî, Danişgahayî Semt, Merkezî Tehqîq ve Tewsîeyî Ûlumi insanî ve Danişgahî Geylan, Tabistan, Tehran- İran.

Sönmez, Nesim, (2015). “Hâfız-ı Şîrâzî - Melayê Cizîrî Karşılaştırması (Aşk, Gül, Bülbül, Rinde, Züht Ve Dini Semboller Açısından)”, Journal of International Social Research . Oct, Vol. 8 Issue 40, p. 137-149.

Scattolin, G,. (2001). “İslam Tasavvufunda Allah Sevgisi”, İngilizceden Çeviren: Ali Galip Gezgîn, *Tasavvuf İlmî ve Akademik Araştırmalar Dergisi*, S: 5, Ankara: r. 252.

Şimşek, İ. (2014). “Antik Çağdan Alman İdealizmine Estetik Bir Değer Olarak Güzellik”, Atatürk Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi, 41.

Tarlan, Ali Nihat, (1998), *Fuzulî Divanı Şerhi*, Akçağ Yayınları, (1. Baskı), Ankara.

Taşdelen, Demet, (2012). *Estetik ve Sanat Felsefesi* (Editör: Ahmet İnam), (Birinci Baskı), Eskişehir Üniversitesi Anadolu Açık Öğretim Fakültesi Yayınları, Eskişehir.

Taşkent, Ayşe, (2013). *Güzelin Peşinde*, Klasik Yayınları, İstanbul.

Tayfur, Mehmet, (2013). *Melayê Cizîrî Hayatı Divanı ve Tasavvufî Görüşleri*, Yüksek Lisans Tezi, Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Diyarbakır.

Tek, A. (2019). *Melayê Cizîrî Jıyan û Tesîra Edebî Şerha Xezelên Bijartî*, Weşanên Nûbiharê, Stenbol.

Teyran, Feqiyê, (2021). *Dîwan, Wergêr: Ali Karadeniz*, Weşanên Nûbihar, Stenbol.

Timuçin, A. (2009), *Sorularla Estetik El Kitabı*, (1. Baskı), Bulut Yayınları, İstanbul.

Timuroğlu, Vecihi, (2013), *Estetik*, Berfin Yayınları, İstanbul.

Towensend, Dbney, (2002). *Estetiğe Giriş*, Çev: Sabri Büyük Düvenci, İmge Kitapevi, İstanbul.

Todorov, Tzvetan, (2001). *Poetikaya Giriş*, (Wergêr: Kaya Şahin), Metis Yayınları, İstanbul.

Turan, Abdalbaki, (2010). *Melayê Cizîrî Divanı ve Şerhi*, Weşanên Nûbiharê, İstanbul.

Turgay, Nurettin, (2011). “Ahmed el-Botî el-Cızîrî ve Divanında Kur’an’a Yaklaşımı”, *Mukaddime*, cild: 4, jimar: 4, r. 139-157.

Tunalı, İsmail (2011a), *Grek Estetik’i*, Remzi Kitabevi, İstanbul.

Tunalı, İ. (2011b), *Estetik*, Remzi Kitabevi, İstanbul.

Uyanık, Mevlüt, (2012). *Felsefî Düşünceye Çağrı*, Elis Yayınları, Ankara.

Xanî, Ehmedê, (2015). *Mem û Zîn*, Amadekar: Huseyn Şemrexî, Weşanên Nûbihar, Stenbol.

Xanî, Ehmedê, (1992). *Nûbar*, Fırat Yayınları, İstanbul.

Xoşnav, Hêmin Umer Ahmad & Yadgar Resul Balekî, (2012). “Nûr û Şêweknî Le Şî’rî Cezerî da/ Nûr û Şêweyên Wê Di Helbestên Melayê Cizîrî de”, *Kovarê Akadîmyayê*, Jimar: 32.

Xoşnav, Hêmin Omer, (2009). *Şî’rîyetî Deqî Çîrokî Kurdî Lêkolîneweyekî Şêwazgerîyî Praktîkîye*, Çapxaney Wezaretî Roşenbîrî, Herêmi Kurdistanî Eraq, Hewlêr.

Xoşnav, Hêmin Umer Ahmad, (2012). “Derwazeyek Bo Îstatîka”, *The Voices Is a Daily Endependent Kurdhis Online Newspaper*, Saturday, Aprel, 24 th.

Wellek, R., Varren, A.(1993). *Edebiyat Teorisi*. Wer: Ö. F. Huyugüzel, Akademi Kitabevi, İzmir.

Yalçın, Elif, (2019) “Mesnevi’ye Göre İnsani Kamilin Kalbi Vasıfları”, Bitlis İslamiyat Dergisi / Journal of Bitlis Islamiyat, Hejmar:1, Heziran/June r. 1-23.

Yalçın Mehmet, (2001). *Şiirin Ortak Paydası Şiirbilime Giriş*, Cumhuriyet Üniversitesi Yayınları, Sivas.

Yavuz, Ziya, (2021). *Alman İdealizminde Değerler Sorunu ve Nicolai Hartmann’ın Değerler Etiği*, Doktora Tezi, Ankara Yıldırım Beyazıt Üniversitesi, Sosyal Bilimler Fakültesi, Felsefe Ana Bilim Dalı, Ankara.

Yetkin, Suut. Kemal, (2007). *Estetik Doktrinler*, Palme Yayıncılık, (1. Baskı), Ankara.

Yıldırım, Nimet, (2006). *Fars Mitolojisi Sözlüğü*, Kabalcı Yayınları, İstanbul.

Yılmaz, Mehmet, (2012). “Mela Ahmedê Cizîrî’nin Kültür Dünyası”, *The Journal of Academic Social Science Studies (IASSS)*, Vol. 5 Issue: 1, rr. 259-271, February.

Yılmaz, Mehmet, (2010). “Mela Ahmedê Cizîrî’nin Şiirinde Mitolojik Unsurlar”, *Uluslar arası Şırnak ve Çevresi Sempozyumu* (Ed. M. Nesim Doru), Şırnak Üniversitesi Yayınları, Ankara rr. 615-624.

Yıldırım, Kadri, (2004). “Werger û Şîrovekirina Dîwana Melayê Cizîrî”, *War*, Bihar, Jimar: 15, r. 112.

Yıldırım, Kadri (2018). *Kürt Medreseleri ve Alimleri Teorî ve Müfredat*, Cilt: 1, Weşanên Avesta, İstanbul.

Yıldırım, Ömer, (2002). *Açık Öğretim Felsefe Ders Kitabı*, Atatürk Üniversitesi Yayınları, Erzurum.

Yiğit, Mesut (2021). “Müftü Mahmut Bilge ve Dünya Manzûmesi Adlı Kasîdesinde Tasavvufî Temalar”, *Harran İlahiyat Dergisi, Harran İlahiyat Juornal* Sayı/Issue: 46, Aralık/December 2021, 73-99

Yöyler, Celaleddin, (2006). “Li Ser Dem û Jiyana Melayê Cizîrî”, *Zend*, jimar: 9, r. 82.

Zivingî, Mela Ehmed Bîn Mela Muhemmed El Bohtî El, (2013). *Î'qdul Cewherî Fî Şerhî Dîwanul El Şeyxul El Cizîrî*, Weşanên Nûbihar, Editör: Süleyman Çevik, Stenbol.

Zîss, Anver, (2011). *Estetik*, Hayalbaz Kitap, İstanbul.





